



NAVEROKA HEJMARA 16

Sernivîsar, r. 2

Husein Muhammed

Baneşan (nîda) di kurdî de, r. 4

Selîm Biçûk

Cînav, r. 14

Halil Aktuğ

Nivîsîna cînavê "kî, kê", r. 31

Zeynelabidîn Zinar

Hokerên bêpîvan û bêkêşan, r. 35

Xebatên ziman(nasî)

di navbera lehceyên kurdî de, r. 43

Samî Tan

Hevalnav (rengdêr), r. 49

Dengnasî

Dengê J – peydabûn û guherîn, r. 69

Ezedîn Rotîn û Ş.Dêrikî

Qertafên diyariyê, r. 75

Rûken Sarili

Nêrînên li ser peydabûna zimên, r. 77

Bahoz Baran

Ravek, r. 80

Zinar Ednan Mele

Tesîra erebî û soranî li ser kurmancî,
r. 92

Baban Seqizî

Awirêk li helumercî zimanê kurdî, r.
96

Amed Tigrîs

Pêşgir û paşgir, r. 107

Çetoyê Zêdo

Metnên şanoya kurdî, r. 149

Zeynep Sultan Atli

Berhevdana çend varyantên
"Siyabend û Xecê", r. 180

David Crystal

Daşinasnayîşê Kitabê "Qetlê
Ziwanan", r. 184

Murad Ciwan

Mirovê pîrziman û mîletê pîrziman, r.
193

SERNIVÎSAR

Kerem bikin hejmareke nû ya kovara zimanê kurdî *Kanîzarê*, xwandevevanên hêja. Di vê hejmarê de jî em bi nêzîkî 250 rûpelan vekolîn û xebatên li ser zimanê kurdî bi kurmançî, soranî, zazakî û inglîzî dixin xizmeta we yên hêja de.

Di vê hejmarê de **Husein Muhammed** li ser baneşanan anku peyvên gazîkirinê (nîda, interjeksiyon, bi inglîzî *interjection*) di zimanê kurdî de pêşkêş dîke. Nivîsarên wî yên din di vê hejmarê de li ser xebatên ziman(nas)î yên di navbera lehceyên kurdî de û herwiha li ser dengê J ne.

Ji **Selîm Biçûk** em vê carê nivîsareke li ser cînavên kurdî belav dikin. **Halil Aktug** jî li ser cînavên pirsyarkî "kî, kê" dinivîse.

Zeynelabidîn Zinar li ser hokerên bêpîvan û bêkêşan dinivîse. **Samî Tan** hevalnavên (rengdêrên) kurdî dide nasîn.

Bahoz Baran ravekên kurmançî bi awayekî giştî dide nasîn. **Ezedîn Rotîn û Ş. Dêrikî** bi taybetî behsa qertaf û ravekên rewşa diyar ya navdêran dikin.

Rûken Sarili teoriyên li ser çawaniya peydabûna zimanî/zimanan pêşkêş dîke. **Abdusamet Yigit** nêrînên xwe li ser morfolojîya hin peyvên kurdî dinivîse. Amed Tigrîs hewl dide hemû pêşgir û paşgirên peyvsaz yên kurdî li gel nimûneyên wan rêz bike.

Çetoyê Zêdo li ser dîroka şanogeriya kurdî dinivîse û hewl dide hemû berhemên şanoyî rêz bike. **Zeyneb Atli** çend guhartoyên dastana Xecê û Siyabendî dide ber hev.

Bi soranî em nivîsa **Baban Seqizî** li ser rewşa zimanê kurdî bi taybetî li Rojhilata Kurdistanê belav dikin. Bi zazakî em beşek ji kitêba **David Crystal** ya li ser zimankujiyê pêşkêş dikin.

Bi inglîzî vê carê em hem li ser belavkirina berhema **Rêbîn Kerîmî** ya derbarê çemandina (tewandina) lêkerên kurdî berdewam dibin û hem jî dest belavkirina beş bi beş ya bawernameya doktorayê ya **Laura Mahalingappa** li ser hînbûna ergatîviyê di kurmancî de dikin.

Kerem bikin û kovara xwe *Kanîzarê* û bi hêviya ku hûn xêrê jê bibînin!

BANEŞAN

Husein Muhammed

MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

Baneşan (bi inglîzî *interjection*)¹ hinek peyv an gotin in ku hest û bertekên (karvedanên, reaksiyonên) ji nişkê ve pê tên derbirîn anku îfadekirin. Bo nimûne:

- ay!
- ey!
- de, dê!
- of!
- ox!
- way, wey!
- ya!
- hey, hê!
- hey gidî!
- hadê, haydî, haydê!
- lo, lê!
- hîhî!
- î!
- maşella!
- bismilla
- yella, wella, billeh!
- be', beh!
- 'ew, hew!
- keçê!
- hop!

1

- kuro!
- wee! weeh!
- Xwedêyo, Xwedêwo!

Baneşan birreke peyvan ya piralî û tevlihev e. Tê de hin peyv hene ku bi tenê baneşan in, bo nimûne

- of!
- ay!
- wey!

PARVEKIRINA BANEŞANAN

Çendîn awayên cuda yên parvekirina anku dabeşkirina baneşanan li ser sinif û kategoriyên cuda hene.

Yek ji awayên parvekirinê li ser bingehê eslê birrên peyvan e. Lê gelek peyvên din jî di nav de hene ku bi eslê xwe ji birrên din yên peyvan – bi taybetî ji navdêran – in yan jî ji baneşanekê û navdêrekê peyda bûne, bo nimûne:

- "yella, billeh!" ji "ya Allah, bi Allah" yan "bismilla!" ji "bi ismi Allah" anku "bi navê Xwedê"
- "Xwedêyo, Xwedêwo" ji "Xwedê" ku navdêr e û paşgira "-yo, -wo"

Parvekirineke din li ser bingehê kêteyên peyvan e. Gelek baneşan yekkîteyî e, bo nimûne:

- ay!
- of!
- ax!
- hêy!
- wey!

Di heman demê de piraniya wan herwiha peyvên wisan in ku tenê wek baneşan tên bikaranîn.

Baneşanên dukîteyî yan pirkîteyî adeten bi eslê xwe ji birrên din yên peyvan in, bo nimûne:

- yella!
- maşella!
- Xwedêyo!

- kuro!

Parvekirineke din dikare li gor bikaranîna baneşanan be, bo nimûne:

- baneşanên keyfxweşiyê
-
- baneşanên qehirînê
- baneşanên pesndanê
- û hwd.

Heman baneşan dikare bo derbirîna çendîn hestên ji hev cuda – heta hestên dijber jî – bê bikaranîn. Loma bo nimûne, peyvên wek "ax, ox, oy" dikarin hem bi mebesta dilşadiyê û hem jî êş û keserê bînin emilandin. Tenê kontekst dikare diyar bike ka mebest jê çi ye. Bo nimûne:

- Oy, serê min çend diêşe.
- Oy, ew çend xweş stranan dibêje.

BANEŞANÊN GIŞTÎ

Hin ji baneşanan di kurdî û di gelek zimanên din de jî ji aliyê bikaranîna xwe ve giştî ne. Ev tê wê maneyê ku ew dikarin bo hestên ji hev cuda – heta hestên dijî hev – jî bînin bikaranîn. Tenê berdewamiya axiftinê diyar dike, ka ew bi çi mebestê li filan derê hatiye xebitandin.

Di kurdî de bi kêmî ev baneşan giştî ne:

- ax, ah
- ey, hey
- oy, hoy
- ox
- wey, way

Bo nimûne, baneşanan "ax" hem bo hesteke xweş û hem jî bo hesteke nexweş dikare were bikaranîn:

- Ax, ev xwarin çend xweş e!
- Ax li vê rewşa me ya kembax!

BANEŞANÊN HESTÊN NEXWEŞ ÊŞ, EZYET, HESRET Û NEXWEŞIYÊ

Hinek ji baneşanên di kurdî de bi berfirehî bo diyarkirina hestên nexweş (bo nimûne êş, azar, ezyet, hesret, xemgînî) tên bikaranîn, ev in:

- ay
- ax
- of
- ax
- hey
- heyhat
- hey, heyho
- way, wey, wey li min, wey li min, wey li minê, wey li mino

BANEŞANÊN GAZÎKIRINÊ

Di kurdî de hin ji baneşanên bingehîn yên bangkirinê, hawarkirinê, gazîkirinê û balkişandinê ev in:

- ey, hey
- hê, hêy
- o, ho

Hinek ji baneşanên gazîkirinê ne bo mirov lê bo bangkirina heywanan tên bikaranîn:

- şoş, ço! (gazîkirina keran)
- tehe, ho! (gazîkirina çêlek û mangayan)
- dah! (gazîkirina hespan)
- pisî, pisî! kit, kit! (gazîkirina pisîkan / kitikan)
- dîd, oşt! (gazîkirina kûçikan / seyan)
- tû, tû! (gazîkirina mirîşkan)
- haş! (gazîkirina pezî)

BANEŞANÊN BERSIVDANÊ

Hinek ji baneşanan wek bersivê yan bertekê (karvedanê, reaksiyonê) bo axiftina kesên beramber tê bikaranîn. Bo nimûne:

- im

- him
- aha, iha, ha

Li gel belavbûna telefonan, silava inglîzî "hello" di kurdî û piraniya zimanên din jî de wek baneşana bersivdana telefonê belav bûye. Di kurdî de ew wek "helo" yan jî li gor forma bêjkirina xwe ya fransî wek "elo" tê gotin.

BANEŞANÊN HÊVÎKIRINÊ

Hinek ji baneşanan bi mebesta îfadekirina hêvî û daxwazê tên kirin.

Di kurmancî de baneşana daxwazê ya serekî "xwezî" û varyantên wê ne: "xwezîka, xwezka, xweska, xwezila..."². Ew di soranî de jî bi forma "xozge" li kar e. Bi eslê xwe ew têkilî peyva "xwastin, xwestin" e:

- Xwezî Kurdistan azad bibe!

Baneşeke din ya hêvîkirinê ya di kurdî û zimanên din yên misilmanan de berbelav "înşallah" û varyantên wê yên wek "înşella, îşela, inşallah..." e. Ew ji erebî ye û maneya "Xwedê bike, Xwedê hez bike" dide. Carinan li cihê wergerên wê yên kurdî jî tên xebitandin, wek "Xwedê bike, Xwedê hez [bi]ke". Wek dijbera wê jî, gotina "Xwedê neke" tê emilandin gava ku mirov hêvî dike ku tiştekî xirab/nexwastî neqewime:

- İnşella ti xirabî neqewime.

BANEŞANÊN PESINDANÊ

Baneşanên pesindanê yan methekirinê ew peyv in ku tên gotin gava ku kesê guhdar tiştekî baş kiribe.

Peyva xwemalî "aferim" li gel formên xwe yên cuda-cuda "aferin, aferî, aferîm, aferîn" ji mêj ve bi vê mebestê tê bikaranîn. Ew peyveke kurdî-îranî ye ku ketiye hin zimanên din jî, bo nimûne tirkî.

² Bo hemû varyantên peyva "xwezî", binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/xwez%C3%AE>

Ji peyvên xwemalî lêkera “bijî” (yan “bijît, her bijî, her bijît”) û formên wê yên pirhejmar “bijîn” (yan “her bijîn”) tevî eslê xwe yê lêker jî di pratîkê de wek baneşan tên bikaranîn.

- Her bijî, te karekî baş kir!
- Bijî azadî!

Gava ku mirov bixwaze îfade bike ku tiştê baş yan spehî yan jî bibereket e û pesnê wî tiştî bide yan jî daxwaza qencyê jê re bike û bixwaze ku bixêr be, hingê gelek caran baneşana “maşella” (maşellah, maşela, maşaellah...) tê gotin. Ew ji erebî ye û maneya “eger Xwedê hez bike” dide.

- Maşela, keçikeke çend delal e!

Van dehsalên dawiyê peyva “bravo” jî bi maneya “aferim, bijî” pir belav bûye.

Ew bi eslê xwe ji îtalî ye lê li piraniya zimanan belav bûye:

- Bravo, tu zîrek î!

BANEŞANÊN EMIRKIRINÊ

Hejmareke baneşanên emirkirin, fermankirin, teşwîqkirin û handanê di kurdî de hene.

Baneşana giştî û berbelav ya kurt “de, dê, dey” e. “De” di kurmanciya navendî, “dê” di kurmanciya rojhilatî û “dey” jî di soranî de serdest e:

- de/dê were
- de/dê ka em biçin
- de/dê ka bêje te çî kir

Baneşaneke din ya berbelav herwiha “ha” ye. Bo nimûne:

- Bixwe, ha! (illeh divê ku tu bixwî! ne ku tu nexwî!)
- Were, ha! (illeh were, çawa be jî divê ku tu werî!)

Li gel formên neyînî yên lêkeran, “ha” qedexekirinê xurttir dike (li jêrtir binêrin).

Ji mêj ve baneşana “yella” (yela, yellah...) jî di kurdî û zimanên din jî yên misilmanan de tê bikaranîn ku ji erebî “ya Ellah” (ya Xwedê, bi qeweta/alîkariya Xwedê) e.

Bi taybetî li Bakurê Kurdistanê herwiha baneşana ji tirkî “haydî, hadê, hadî, haydê” jî niha berbelav bûye. Ew ji tirkî herwiha ketiye gelek zimanên başûr-rojavaya Ewropayê jî, bo nimûne albanî, bosnî û romanî.

Baneşaneke devokî jî bi taybetî di kurmançî de li Behdînan tê bikaranîn ku “hilo” ye ku maneya “rabe” dide. Mirov dikare bibêje ku ew “baneşaneke lêkerî” ye ji ber ku ne tenê bi maneya xwe dişibe lêkeran (hilo = rabe) lê herwiha wek lêkerên fermanî herwiha forma xwe ya pirhejmar jî heye: “hilon” (rabin).

BANEŞANÊN QEDEXE- Û HIŞYARKIRINÊ

Baneşanên qedexekirinê ew peyvik in ku pê tiştek li mirovî tê qedexe- anku memnû- û yasaxkirin û baneşanên hişyarkirinê jî ew peyv in ku mirovî ji hebûna xeterî yan tirsekê agadar dikin.

Baneşana qedexekirinê ya belkî herî ber belav di kurmançî de “hiş” e ku li hin deveran her wiha wek “his” jî tê bikaranîn. Di soranî de ew bi awayê “wiş, wuş” e. Ew herwiha carinan bi awayê “hişşş” tê dirêjkirin û carinan jî tenê wek “şşş” tê gotin û nivîsîn.

Baneşana “hiş, hişşş, şşş” peyvikeke onomatopoetîkî û navneteweyî ye. Bo nimûne, bidin ber inglîzî “hush, shush, shh”. Di kurdî de carinan li şûna “hiş” û varyantên wê, peyva “iskut, uskut” yên esil-erebî tên xebitandin.

Bi mebesta rawestandîna anku qedexekirina livînê, di kurdî de bi taybetî di axiftina li gel zarokan de peyva “hop” dihat bikaranîn. Ew hevdenga peyva “stop” e ku vê dawiyê ji inglîzî belavî kurdî û gelek zimanên din jî bûye. Lê berovajî baneşana “hilo”, peyva “hop” ti formeke din nîne loma yekhejmar û pirhejmar herdu jî “hop” in. Hevwateya wê “stop” jî bi heman awayî ye.

Bo xurtkirina qedexekirinê çend baneşan hene: “ha, hê, hêy, lê, lo”:

- Nekenin, ha!
- Negirî, lê!
- Neçe, lo!
- Nelivin, hê!

Bo hişyar- û agadarkirina ji tirs û tehlîkeyan jî “hê, hêy, ho” dikarin bèn bikaranîn:

- Hişyar bin, hê/hê/ho/hoy!”

Baneşaneke din ya bi mebesta hişyarkirina ji tires peyva “bive” ye ku bi taybetî di axiftina li gel zarokan de tê bikaranîn gava ku ew ji tiştê kel (zêde germ û şewitîner wek agirî) tê agadarkirin:

- Bive, dest nekiyê!

BANEŞANÊN MATMAYÎNÊ

Baneşanên ecêgirtîbûnê yan matmayînê ew peyvik in ku tèn gotin gava ku kesek ecêbgirtî dibe yan jî carinan ji ber ku xwe nerazî dike.

Hinek ji wan baneşanan ev in:

- be, be', beh! (به ع)
- 'ew, 'ewww (عهو، عهووو)

BANEŞANÊN NEFRET- AN NALETKIRINÊ

Bi maneya nalet- yan nefretkirinê di kurdî de gelek caran “tif” (yan varyanteke wê, bo nimûne “tifû, tû”) ya bi eslê xwe navdêr wek baneşan tê bikaranîn. Bo nimûne:

- Tif, ev çi hal e?!

Bi mebesta nefretkirina li bêhneke yan xwarineke pir nexweş, gelek caran baneşana î' (ئيع) yan 'î' (عيع) tê bikaranîn:

- 'î', ev çi ziqn e.
- 'î', çi bêhneke pîs jê tê.

BANEŞANÊN ZARVEKIRINÊ

Baneşanên zarvekirinê ew baneşan in ku li gor hin dengên tebîî û xwezayî tèn gotin. Hinek ji van baneşanan di kurdî de wiha ne:

- bom!

- teq!
- diring!
- gurm!

Bo nimûne:

- Bom, topek pê ket.
- Teq teq, li derî da.
- Gurm, dengê birûskekê hat.

PEYVÊN MALBATÎ WEK BANEŞAN

Gelek peyvên malbatî di kurdî de bi forma xwe ya gazîkirinê (vokatîv) wek baneşan tên bikaranîn. Bo nimûne, ev hinek ji wan in:

- kuro!
- babo! bavo!
- dayê
- dadê
- lawo!
- yadê!
- yabo!
- keçê!

Mirov dikare çendan ji wan di hevokan de bi kar bîne:

- Wey babo/bavo, ev çi hal e!
- Lawo, de were!

Sebebê ku “babo” û “lawo” li vê derê baneşan in ew e ku ew ji maneya xwe ya bingehîn veqetiyaye. “Wey babo/bavo” li vê derê ne gazîkirina yekser ya babe/bavê xwe ye lê gotineke îfadekirina hestên xurt e ku bi gelek caran bi baneşanan tê kirin.

BANEŞAN DI STRANAN DE

Çend baneşan di hin stranên kurdî de pir tên bikaranîn.

Yek ji wan baneşanan “tew tew” yan “tewe tewe” ye ku guhdarên dengbêjan li civatan di ber stranên folklorî re dibêjin. Bi wê dixwazin diyar bikin ku stran xweş e yan jî guhdarîkirina wan ya li stranê berdewam e. Bi wê herwiha bêhnvedanekê didin dengbêjî.

Baneşana din ya berbelav di hin cûrên stranên de “lorî” ku bi taybetî bi awayê temamkirî yê “de lorî, lorî, ..., lorî” tê xebitandin. Bo nimûne:

- “De lorî lorî, kurê min, lorî / bavê te kuştin, dayik bi gorî” (ji helbesteke Cigerxwînî)

”Lorî” bi eslê xwe lêker e, ji ”lorîn, lorandin” lê bêyî pêşgir û paşgirên lêkeran tê xebitandin û loma dikare wek baneşanekê were hesibandin.

BANEŞANÊN DÎNÎ

Baneşanên dînî ew peyv in ku mirov pê sond dixwe yan jî daxwaza lêborînê ji Xwedê dike yan jî pesn û senaya mezinahiya Xwedê dide yan jî alîkariyê / qewetê ji Xwedê dixwaze.

Hinek bi eslê xwe ji erebî ne lê hinek ji peyvên kurdî hatine çêkirin.

- Xwedêyo, Xwedêwo, ya Xudê
- ya Reb, ya Rebî
- welleh, billeh, tilleh
- yella
- bismilla
- maşella
- subhanella
- elhemdulilla
- şikir (ji Xwedê)

Hinek jê hê jî tenê di kontekstên dînî de tên bikaranîn. Bo nimûne:

- estexfirullah!
- subhanella!

Lê hinek jî ketine zimanê giştî. Bo nimûne:

- yella
- wellah

- inşella
- maşella

Ji aliyê gotin û nivîsînê de bi çendîn awayên cuda di kurdî de peyda dibin ku hinek ji wan dengên eslî yên peyvê di zimanê erebî de di kurdî de jî diparêzin lê hinek jî gelek ji peyva bingehîn dûr ketine. Bo nimûne:

- wellah, wellah, welleh, welle, wele, wila, wile...
- elhemdulillah, elhemdulilla, elhemdulla, elhemdula, elhemdila, hemdila, hemdile...

BANEŞAN JI ZIMANÊN EWROPÎ

Van dehsalên dawîn çend baneşan ji zimanên ewropî ketine kurdî û zimanên din jî yên Rojhilata Navîn.

Baneşana herî berbelav di kurdî de ji zimanên ewropî ihtimalen "elo, helo" ye ku di bersivdana telefonê de tê bikaranîn. Baneşana din ya gelek berbelav "stop" ya bi maneya "raweste, bisekine, nelive" (yan jî "rawestin, bisekinin, nelivin") e.

Baneşaneke din ya berbelav ya ji zimanên ewropî peyva "bravo" ye. Ew hevwatera peyva "aferim" ya kurdî ye lê gelek caran li cihê wê bi mebesta pesndanê tê bikaranîn.

Ji ber ku gelek ji baneşanan di gelek zimanan de wek hev yan nêzîkî hev in, zehmet e mirov bi taybetî derbarê baneşanên yekkîteyî de bibêje ka ew ji kîjan zimanî hatine yan jî ka her zimanî ew di nav xwe de çêkirine.

Bo nimûne, mimkin e ku baneşana "waw" ya bi mebesta matmayînê ji zimanekî ewropî hatibe yan jî di kurdî bi xwe hebûbe yan hatibe çêkirin.

CÎNAV

SELÎM BIÇÛK

Cînav

Cînav, di zimanê Kurdî de peyveke şûna navan digire. Mîna:

Hogir diçe şoreşê.

Ew diçe şoreşê.

Hacer qehreman e.

Ew qehreman e.

Hacer ala şoreşê bilind kir.

Wê ala şoreşê bilind kir.

Gelê Kurd dijmin lerizand.

Wî dijmin lerizand.

Wek tê xuyakirinê, cînavên: Ew, ew, wê û wî şûna Hogir, Hacer û gelê Kurd digirin û di hevokê de bi delameta van navan radibin.

Beşên cînavan

1. Cînavên kesok (kesanî):

Ev cînav şûna navên kesan digirin. Ew jî, du awa ne:

1. Awayê rast:

A- Yekhejmar

Kesê yekemîn, yê ku dipeyive **Ez**

Kesê duwemîn, yê ku pê re tê axaftinê **Tu**

Kesê sêyemîn, yê kû axaftin liser e û ne amade
ye **Ew**

B - Kom

Kesên yekemîn, yên ku dipeyivin **Em**

Kesên duwemîn, yên ku bi wan re tê axaftinê **Hûn**

Kesên sêyemîn, yên ku liser wan tê axaftinê û ne li wir in **Ew**

2. Awayê tewandî

A - Yekhejmar

Kesê yekemîn, yê ku dipeyive **Min**
 Kesê duwemîn, yê ku pê re tê axaftinê **Te**
 Kesê sêyemîn, yê ku axaftin liser e lê ne li wir e
 jibo nêr **Wî**
 jibo mê **Wê**

B - Kom

Kesên yekemîn, yên ku dipeyivin **Me**
 Kesên duwemîn, yên ku bi wan re tê axaftinê **We**
 Kesên sêyemîn, yên ku liser wan tê axaftin û ne amade ne **wan**

1. Awayê rast

Bi lêkerên derhingêv re
 Di dema berê(buhêrk) de berkarê durust tên:
 Xebat(î) ez dîtîm. wî ez
 dîtîm.

Şêrînê tu dîtî. wê tu dîtî.
 Dilberê ew dît. wê ew dît.
 Hewesê em dîtî. wê em dîtî.
 Comerd(î) hûn dîtî. wî hûn dîtî.
 Şevger(î) ew dîtî. wî ew dîtî.
 Cînavên: Ez, tu, ew, em, hûn û ew di hevokên jorîn de berkarên durust in.

Di dema niha de (nihok) kirde (kiryar) tên:
 Ez xebat(î) dibînim. Ez wî dibînim.
 Tu şêrînê dibînî. Tu wê dibînî.
 Ew Dilberê dibîne. Ew wê dibîne.
 Em Hewesê dibînin. Em wê dibînin.
 Hûn comerd(î) dibînin. Hûn wî dibînin.
 Ew şevgerî dibînin. Ew wî dibînin.

Cînavên: Ez, tu, ew, em, hûn û ew di hevokên jorîn de kirde(kiryar) ne.
 Di mandê de (pêşdemê de) kirde tên
 Ezê gulê av bidim.
 Ezê wê av bidim.
 Tuyê (tê) sêvê bixwî.
 Tuyê wê bixwî.
 Ewê Amedê pîroz bike
 Ewê wê pîroz bike.
 Emê serxwebûnê bibînin.
 Emê wê bibînin.
 Hûnê şoreşê pêş de bibin.
 Hûnê wê pêş de bibin.
 Ewê Newrozê geş bike.
 Ewê wê geş bike.
 Cînavên: Ez, tu, ew, em, hûn û ew di hevokên jorîn de Kirde ne (Kiryar in).

Bi lêkerên nederhingêv re :

Di herdeman de kiryar (kirde) tèn. Mînak:

Nihok

Ez difirim.

Tu difirî.

Ew difire.

Em difirin.

Hûn difirin.

Ew difirin.

Pêşedem

Ezê biçim

Tuyê(tê) biçî.

Ewê biçe.

Emê biçin.

Hûnê biçin.

Ewê biçin.

Bûhêrk

Ez ketim

Tu ketî.

Ew ket.

Em ketin.

Hûn ketin.

Ew ketin.

Ev awayê cînavan di herdeman de bi lêkerên nederhingêv re tèn bikaranînê, lê bi lêkerên derhingêv re, tenê di dema nihok û pêşerojê de tèn bikaranînê. Herwiha bi navan re bi alîkariya lêkera "bûn" tèn bikaranînê. Mînak:

Ez kurd im.

Tu kurd î.

Ew kurd e.

Em kurd in.

Hûn kurd in.

Ew kurd in.

Ez im.

Tu yî.

Ew e.

Em in.

Hûn in.

Ew in.

Ez pale me.

Tu pale yî.

Ew pale ye.

Em pale ne.

Hûn pale ne.

Ew pale ne.

2. Awayê tewandî

Ev awayê cînavan tenê bi lêkerên derhingêv re tên bikaranînê:

a. Di dema berê (buhêrk)de kirde ne (kiryar in).

Min al hilgirt

Te al hilgirt.

Wê al hilgirt.

Wî al hilgirt.

Me al hilgirt.

We al hilgirt.

Wan al hilgirt.

b. Di dema niha (nihok) de berkarê durust in.

Nazê min dibîne.

NazNazê te dibîne.

Nazê wê dibîne.

Nazê wî dibîne.

Nazê me dibîne.

Nazê we dibîne.

Nazê wan dibîne.

c. Di pêşedemê(mandê) de berkarên durust tên:

Gulê dê min bibîne.

Gulê dê te bibîne.

Gulê dê wê bibîne.

Gulê dê wî bibîne.

Gulê dê me bibîne.

Gulê dê we bibîne.

Gulê dê wan bibîne.

d. Di herdeman de berkarên ne durust tên:

Azad (î) li min dixê. (Nihok)

Şêrînê li te xist. (Buhêrk)

Şermînê dê li wî bixê. (Pêşedem)

Ev awayê cînavan bi navan re nayên bikaranînê. Em dibêjin:

Ez şoreşger im.

Tu kurd î.

Ew bedew e.

Di Kurmancî de nabe, em dibêjin :

Min şoreşger im.

Te kurd î.

Wê bedew e.

Cînav hemû bêzayend in (bêcins in), tenê di awayê tewandî de, kesê sêyemîn

(wî, wê) bizayend e." Wî " jibo nêr û " wê " jibo mê tê bikaranînê. Mînak:

Hawar dijmin lerizand. Wî dijmin lerizand.

Hacer dijmin lerizand. Wê dijmin lerizand.

Cînavên kesok herdem kirde yan jî, berkar in.

2. Cînavên bêhêl

Cînavên bêhêl di kurdî de herdem berkar in û şûna cînavên kesok digirin.
Cînavên bêhêl ev in: **Ê, hev, êk, xwe.**

Ê

Ev cînavê bêhêl, herdem yekhejmar e, li dû lêkeran tê û şûna " wî " û " wê " digire. Mîna:

Min tiving da Sozdarê. Min tiving da wê. Min tiving dayê.

Min gul da Azad. Min gul da wî. Min gul dayê.

Sozdarê -> wê -> ê

Azad -> wî -> ê

Ev cînav bi daçekên (ji, li, bi, di) re dibe yek û bi vî awayî cînavên lihevxiştî tên çêkirinê. Mîna:

Li wî xist	Lê xist
Li wê xist	Lê xist
Bi wî çû	Pê çû
Bi wê çû	Pê çû
Di wî de çû	Tê de çû
Di wê de çû	Tê de çû
Ji wî pirsî	Jê pirsî
Ji wê pirsî	Jê pirsî
Li wî (li wê)	Lê
Bi wî (bi wê)	Pê
Di wî (di wê)	Tê
Ji wî (ji wê)	Jê

Mînak:

Min li dijmin xist.

Min li wî xist.

Min lê xist.

Şêro ji şêrînê pirsî.

Şêro ji wê pirsî.

Şêro jê pirsî.

Ez bi pê nûsê dinivîsînim.

Ez bi wê dinivîsînim.

Ez pê dinivîsînim.

Ez di zanîgehê de me.

Ez di wê de me.

Ez tê de me.

Cînavê bêhêl " ê " şûna berkarên durust digire. Mîna:

Min gula sor da Hêvînê.

Min gula sor da wê.

Min gula sor dayê.

Lê ev cînav bi daçekan re şûna berkarên ne durust digire. Mîna:

Min ji Gulê pirsî.

Min ji wê pirsî.

Min jê pirsî.

Hev

Ev cînav ji (hev û din) ku di şûn de bûye: hev din , hatiye kurtkirinê û bûye hev. Hev, şûna berkarên durust jî, û yên ne durust jî, digire. Mînak:

Me hev dît.

Gulê û Hacer hev dîtîn.

Gerîla û gundiyan hev dîtîn.

Me li hev xist.

şêrînê û Sozdar ji hev pirsîn.

Gundî û polîs bi hev çûn.

Cînavê "hev" bi daçekan re dibe yek û cînavên lihevxiştî çêdike.

Bi hev Pev

Ji hev Jev

Di hev Tev

Li hev Lev

Mînak:

Em bi hev re çûn. Em pev re çûn.

Ji hev çûn. Jev çûn.

Di hev de bûn. Tev de bûn.

Li hev hatin. Lev hatin.

Êk

Ev cînav jî, bi wateya " hev " tê. Ji (êk û din) ku di şûn de bûye (êk din) hatiye kurtkirinê û bûye

êk. Ev cînav jî , mîna hev tê bikaranînê. şûna berkarên durust digire.

Mînak:

Noşîn û Hêvî êk dîtîn.

Cegermij û Noşeng êk pîroz kirin.

şûna berkarên ne durust jî, digire. Mîna:

Me ji êk (jêk) pirsî.

Roşeng û Noşeng li êk (lêk) xistin.

Cînavê bêhêl " êk " bi daçekan re dibe yek û cînavên lihevxiştî çêdike.

Bi êk Pêk

Li êk Lêk

Ji êk Jêk

Di êk Têk

Mînak:

Em bi êk hatin Em pêk hatin.

Em li êk hatin Em lêk hatin.

Em ji êk çûn Em jêk çûn.

Em di êk de çûn Em têk de çûn.

Xwe

Ev cînavê bêhêl bi cînavê (rajêr) tê binavkirinê. Cînavê "xwe" şûna nav û cînavên nêr û mê kom û yekhejmar digire. Mînak:

Min al da destê hevalê xwe.

Ez ji gelê xwe re dibêjim: " An kurdistan, an Kurdistan ".

Dema ku kirde û berkar di hevokê de yek kes be, cînavê "xwe" şûna berkar digire. Mîna:

Min xwe nas kir.

Te xwe dît.

Wî xwe şîşt.

Cînavê "xwe" herdem berkar e, lê carnan bi kirdeyekî din re dibe kirde, dema du kes bi kar radibin. Mînak:

Ez û hevalê xwe çûn çiyê.

Min û hevala xwe pirtûk xwend.

Nasîn

1. Dema çend cînav di hevokê de hebin, li gor kesan rêz dibin:

Ez, tu, ew, em, hûn, ew.

Min , te, wî, wê, me, we, wan.

Mînak:

Ez û ew, em çûn bajêr.

tu û ew heval in.

2. Eger di hevokê de çend lêker bi kirdeyekî pêk hati bin, kirde careke tenê tê gotinê. Wek:

Ez çûm, gihîştim û vegeriyam.

Lê eger lêkerin derhingêv û hin nederhingêv bin li gor lêker cînav tê bikaranînê:

Ez çûm , min dît.

Ez çûm , min xame kirî.

Hevoka : Em çûn , me hesp ji xwe re kirî. Hin bi vî hawayî bikar tînin:

Me çû hesp ji xwe re kirî.

3. Cînavên nîşandek

Ev cînav şûna navên dûr û nêzîk, bi awakî ku van navan nîşan dikin digirin. Ev cînav ev in:

1. Cînavên ku dûrbûn û nêzîkbûna navê ku şûna wî digrin, diyar nakin, lê tenê hejmar û zayenda navdêr diyar dikin.

Jibo zayendê nêr û yekhejmar : **yê**

Yê ku te dît hevalê min bû.

Jibo zayendê mê û yekhejmar : **ya**

Ya ku te dît şoreşger bû.

Jibo koma herdu zayendan : **yên**

Yên ku te dîtî gerîla bûn.

Ev cînav bi serê xwe nayên. Herdem bi cînavên girêdanê (ku) re tên û kirde ne.

2. Cînavên nîşandek jibo navdêrên nêzîk : Ev

Ev hat.

Ev hevalê min e.

Ev hevala min e.

Ev cînav li gor navderê ku nîşan dide, tê tewandinê:

Jibo nêr yekhejmar dibe: Evî

Evî kalî got.

Jibo mê yekhejmar dibe: Evê

Evê keçê ez dîtîm.

Jibo nêr û mê kom: Evan

Evan keç û xortan got.

Gelek caran tîpa "e" ji " evî, evê, evan " tê avêtinê û dibin: Vî, vê, van.

Jibo kûrkirin û xurtkirina hizra nîşandinê "ev" bi zêderê re tê û dibe : eva, evê, evên.

Evê hat heval e.

Eva hat şervan e

Evên hatin gerîla ne.

Carna "ha" dikeve dawiya cînavê nîşandek û zêderê û ew jî, dibe cinavekî nîşandek :

Evê ha, eva ha, evên ha.

Evê ha Azad e.

Eva ha şêrîn e.

Evên ha Azad û şêrîn in.

3. Cînavên nîşandek jibo navderên dûr: Ew

Ew xort kî ye?

Ew hevala min e.

Ew heval hatin.

Ev cînav jî, li gor navê ku nîşan dike, tê tewandinê.

Jibo nêr, yekhejmar dibe: Ewî

Ewî xortî çi got?

Jibo mê, yekhejmar dibe: Ewê

Ewê keçê xelat girt.

Jibo nêr û mê kom dibe: Ewan

Ez ewan keç û xortan hez dikim.

Ji bo kûrkirin û xurtkirina hizra nîşandinê "ew" bi zêderê re tê û dibe: Ewê, ewa, ewên.

Ewê hat xortekî jîr e.

Ewa hat keçeke bedew e.

Evên hatin xort û keçên gundê me ne.

"Ha" dikeve dawiya cînavê nîşandek û zêderê û ew bixwe jî, dibe cinavekî nîşandek: Ewê ha, ewa ha, ewên ha.

Ewê ha li ber xwe dide.

Ewa ha xebatê dike.

Evên ha têkoşer in.

"Ew", di awayê xwe yê tewandî de, gelek caran "a" davêje û dibe: Wî, wê, wan

Wî xortî xweş got.

Wê keçê tiving hilgirt.

Wan keç û xortan serî hildan.

Di vê rewşê de, ji wateya hevokê mirov cudayî dixwe navbera cînavên kesok (wî, wê, wan) û cînavên

nîşandek (wî, wê, wan).

Cînavê nîşandek (ev, ew) kirde jî, û berkar jî, tên bikaranînê.

Lêkerên derhingêv bi evî, evê, ewî, ewê re

Nihok

Di nihokê de, ev cînav şûna berkarên durust û ne durust digirin:

Ez ewî (ewê) dibim dibistanê.

Ez evî (evê) dibim seyranê.

Beran li ewî (ewê) dixê.

Beran li evî (evê) dixê.

Buhêrk

Di buhêrkê de, ev cînav şûna kirde digirin:

Evî (evê) nan xwar.

Ewî (ewê) pîvaz xwar.

Di vê rewşê de şûna berkarê nedurust jî, digirin:

Berên li evî (evê) xist.

Berên li ewî (ewê) xist.

Pêşedem

Di vê demê de şûna berkarên durust û nedurust digirin:

Ezê ewî (ewê) bitirsînim.

Ezê ewî (ewê) bibînim.

Mamoste wê ji ewî(ewê) bipirse.

Mamoste wê ji evî (evê) bipirse.

Lêkerên derhingêv bi (ev, ew) re

Nihok

Di nihokê de şûna kirde digirin:

Ev nên dixwe.

Ew avê vedixwe.

Pêşedem

Di pêşedemê de, şûna kirde digirin.

Evê min bigire.

Ewê te bibîne.

Buhêrk

Di buhêrkê de, şûna berkarê durust digirin:

Min ev dît.

Min ew xwar.

Lêkerên nederhingêv bi (ev, ew) re

Herddem şûna kirde digirin.

Ev çû welat.

Ew ji Botanê tê.

Ev diçe dibistanê.

Ew difire.

Evê bikeve avê.

Ewê ji bajêr derkeve.

Lêkerên derhingêv bi (evan, ewan) re

Buhêrk

Di buhêrkê de şûna kirde digirin:

Evan xwar.

Ewan em dît.

Nihok

Di nihokê de şûna berkarê durust û ne durust digirin:

Ez evan dibînim.

Ez ji wan dipirsim.

Pêşedem

Di pêşedemê de şûna berkarê durust û ne durust digirin

Ezê evan bişînim welat.

Ezê ji wan bipirsim.

Nasîn

Hin cînavên nîşandek di devok de awayên xwe winda kirine û ketine awakî din:

Evê ha	vîna	vaya	
Eva ha	vêna	vaya	
Evên ha	vêna	vana	evana
Ewê ha	wîna	waya	
Ewa ha	wêna	waya	
Ewên ha	wêna	wana	ewana

Lê ya durust ev e:

Ev, evî, evêha, evê, evaha, evan, evên, evênha.

Ew, ewî, ewêha, ewê, ewaha, ewan, ewênha.

Cînavê nîşandek "ev" bi bêjeyên : şev, roj û sal re dibe "ê".

Ev şev	îşev
Ev roj	îroj
Ev sal	îsal

4. Cînavên pêgehîn (girêkî)

Cînavê pêgeh dikeve paşîya navdêr an cînavêkî din û wan bi hevoka di pey wan re girê dide. Cînavê pêgehîn di zimanê kurdî de yek e. Ew jî, ev e: Ku Cînavê "ku" di hevokê de, carna kirde û carna berkar e.

Kirde

Ê ku tu dîtî heval bû.

Mirovê ku tu dîtî heval bû.

A ku tu dîtî şoreşger bû.

Keça ku tu dîtî şoreşger bû

Berkar

Ê ku te dît gerîla bû.

Kesê ku te dît gerîla bû.

A ku te dît şehîd ket.

Keça ku te dît şehîd ket.

Evê ku tu dibînî mamoste ye.

Cînavê (ku) bi zêderê re tê bikaranînê :

Ê ku, a ku, ên ku, êd ku

Cînavê (ku) bi cînavên nîşandek re tê bikaranînê: Evê ku, eva ku, ewê ku, ewa ku, evên ku, evêd ku, ewên ku, ewêd ku,.

Mînak:

Xameya ku min kirî sor e.

Hespê ku te kirî boz e.

Ev çiyayê ku tu dibînî Cûdî ye.

Azadê ku tu nas dikî hevalê min e.

Di zimanê kurdî de, ji cînavê pêgeh û pê ve

(ku)yeke din heye pêwend (gihanek) e ev (ku)
 du hevokan digihîne hev û herdem li pey
 lêkeran tê. Mîna:
 Em hatin ku em bixwînin.
 Em diçin çiya ku em azad bibin.

Carna (ku) bi wateya heke tê ,
 hingê (beriya lêker) jê re tê gotinê.
 Ku gel serî hilde emê azad bibin.
 Ku gerîla bên gund emê dilşad bibin.

5. Cînavên pirsîyariyê

Cînavên pirsîyariyê di hevokên pirsîyarî de,
 şûna navan digirin û li gor pêkhatina hevokê carna berkar û carna kirde ne.
 Cînavên pirsîyariyê ev in:
 Kî, kê, kîjan, çi, çend, ku, çima, jiber çi, çawa,
 kengî, ji kengî ve, li kuderê, bi kuderê ve, ji kuderê ve, di kuderê re, di
 kuderê de, ma,...

Kî (ki)?

Ev cînav di hevoka pirsê de şûna navê mirovan digire.

Di lêkerên derhingêv de:

Buhêrk

Kî? şûna berkarê durust digire. Mîna:

Te kî (ki) dît.?

We kî(ki) tirsand?

Nihok

Kî? şûna kirde digire. Mîna:

Kî sêvê dixwe?

Kî bersiva min dide?

Pêşdem

Kî? şûna kirde digire. Mîna:

Kiyê (kî dê) pirtûkê bixwîne?

Kiyê (kî dê) min bigire?

Di lêkerên nederhingêv de

Kî? Herdem kirde ye.

Kî hat gund?

Kî diçe bajêr?

Kiyê biçe bajêr?

Kî? Tê tewandinê û dibe (kê?).

Kîjan?

Ev cînavê pirsîyarî ji van bêjeyan tê bikaranînê: (kî, ji, van, yek) yan jî, (kî,
 yek, ji van) û li gelek deverên Kurdistanê , bi van awayî tê bikaranînê: kîjan,
 kujan yan jî, kîjik.

Ev cînav jibo kes û tiştan tê bikaranînê. Kîjan, li gor navdêra ku şûna wê digire tê tewandinê û bi navê nêr re dibe: Kîjanî û bi yên mê re dibe: Kîjanê.

Bi koma herdu zayendan re dibe: Kîjanan. Mînak:

Kîjanî ji van Azad dît ?

Kîjanê tu dîtî ?

Kîjanan pez çêrand ?

Bi lêkerên derhingêv re

Buhêrk

Di dema berê de şûna kirde û berkar digire.

Kirde

Di vê rewşê de, kîjan tê tewandinê:

Kîjanî kirî ?

Kîjanê got ?

Kîjanan dît ?

Berkar

Di vê rewşê de, kîjan nayê tewandinê:

Te kîjan pirtûk kirî ?

Te kîjan keç dît ?

Te kîjan xort dît ?

Lê dema Kîjan dibe berkarê nedurust, tê tewandinê. Mîna:

Te li kîjanê xist ?

Te ji kîjanî pirsî ?

Nihok û pêşedem

Di şûna kirde de kîjan nayê tewandinê. Mîna:

Kîjan dikire ?

Kîjan dê bibîne ?

Lê di şûna berkar de tê tewandinê:

Tê kîjanê bibînî ?

Tu ji kîjanî hez dikî ?

Ewê kîjanî bikire ?

Emê ji kîjanî bipirsî ?

Bi lêkerên nederhingêv re

Herdem kirde ye û nayê tewandinê:

Kîjan hat ?

Kîjan diçe ?

Kîjan dê bê

?

Kê?

Ev cînavê pirsiyarî şûna navên mirovan digire.

Di lêkerên derhingêv de

Buhêrk

Di dema berê de, kê şûna kirde digire:

Kê got ?

Kê kiras kirî ?
 Nihok û pêşedem
 Kê şûna berkarê durust digire:
 Tu kê dibînî?
 Tê kê bitirsînî ?
 Di herdeman de (kê) şûna berkarê ne durust digire. Mîna:
 Te li kê xist ?
 Tu ji kê dipirsî ?
 ewê ji kê bipirse ?
 Kê, bi lêkerên nederhingêv re nayê bikaranînê.
 Cînavê pirsîyariyê (kê), (kî) bi xwe ye di awayê tewandinê de ye.

Ku?

Ev cînav şûna navê cih û deveran digire. Mîna:
 Tu li ku bûyî ?
 Tu ji ku tê ?
 Ku dever xweş e ?
 Cînavê ku ji avêtina bêjeya (dever) ji kudever hatiye kurtkirinê.
 Tu ji ku yî ?
 Tu ji kudeverê yî ?
 Tu ji kuderê yî?
 Carna cînavê kîjan cihê (ku) digire û kîjan der tê bikaranînê, yan jî, (kî) û dibe kîder. Ev cînav bi daçekan re tîn bikaranînê: Ji kîderê? Ji kuderê? Di kîderê de?
 Di kuderê de? Bi kuderê ve? Bi kîderê ve? Di kuderê re? Di kîderê re?

Çi?

Ev cînav, di hevoka pirsê de, şûna navên bêgiyan (bêrih) digire.

Di lêkerên derhingêv de
 Herdem berkar e. Mîna:
 Te çi kirî ?
 Tu çi dikirî ?
 Ewê çi bikire ?
 Tu li çi dixî ?
 Ewê li çi bixe?
 Te li çi xist
 ?

Di lêkerên nederhungêv de
 Herdem şûna kirde digire. Mîna:
 Çi hat ?
 Çi diçe ?
 Çiyê biçe ?
 Cînavê pirsîyariyê (çi) bi bêjeyên din re tê bikaranînê û cînavên pirsîyariyê çêdike:
 Bi cînavê (ma) re dibe: Çima?

Ma tu hatî ? Çima tu hatî ?

Ma tu lal î ? Çima tu lal î ?

Ma tu bindest î ? Çima tu bindest î ?

Bi cînavê (ma) mirov pirs dîke jibo ku agahdarê tişteki bibe. Lê dema çî bi ma ve dibe, mirov haydar e ji wê agahiyê, lê dixwaze nepejirîne û neqayîlbûna xwe liser diyar bike. Yan jî, sedem û egerên wê agahiyê bizani be:

Ma tu kurd î ? Çima tu kurd î ?

Çî, bi bêjeya (awa) ve dibe çî awa û çawa tên çêkirinê. Bi cînavê pirsiyarî (çawa) miriv li hal û rewşa tişteki, mirovekî, kesekî (mirov, candar) dipirse:

Tu çawa yî ?

Hespê te çawa ye ?

Xaniyê te çawa ye ?

Rojên te çawa derbas dibin ?

Tu çawa debar dikî ?

Çî, bi daçekên " jibo, jiber, jibona" re tê girêdanê û cînavên pirsiyariyê " jibo çî? jiber çî? jibona çî " çêdike. Bi van cînavan em sedem û egerên tiştan dipirsin:

Jiber çî tu duh nehatî malê ?

Jibo çî em bindest in ?

Jibona çî ev kuştin û talan ?

Çend?

Ev cînavê pirsiyarî şûna hejmarnavan digire:

Te çend gul jê kirin ?

Te çend keç dîtî ?

Çend gerîla hatin gund ?

Çend gundî çûn şoreşê ?

Tu çendan dibînî ?

Cînavê pirsiyariyê (çend) tenê, di koma herdu zayendan de tê tewandinê:

Te ji çendan pirsî ?

Tu çendan nas dikî ?

Çend, carna cînavê nependî (nebinavkirî) ye:

Min çend şoreşger dîtî.

Ez çend rojan li gund mam.

Di vir de (çend) bi wateya (hinek) tê û wateya xwe ya pirsiyariyê winda dîke.

Kengî?

Bi vî cînavê pirsiyariyê, mirov li dem û çaxê buyerekê dipirse:

Kengî tê bê(yî) mala me?

Kengî emê hev bibînin?

Kengî tu çûyî gund ?

Kengî, bi daçeka (ji.... ve) cînavê pirsiyarî (ji kengî ve) çêdike:

Ji kengî ve tu neçûyî welat ?

Ji kengî ve tu li vir dimînî?

Ji kengî ve dibistana we dest pê kiriye ?

Ma?

Bi vî cînavê pirsyariyê mirov liser tiştêkî agahdar dibe:

Ma tu dizanî bi kurdî bixwînî?

Ma ev çi rewşa em tê de ne ?

Ma tu hozan î ?

Gelo?

Ev jî , mîna " ma" ye û carna pê re tê.

Gelo! Emê bi ser kevin?

Gelo! Ew çû welat ?

Ma gelo heye em rizgar bibin?

Ma gelo heye em bibin xwedî welat ?

6. Cînavên nependî (nebinavkirî)

Ev cînav şûna navan bi awakî nependî û nenaskirî digirin. Di zimanê kurdî de gelek cînavên nependî hene, ji van cînavan:

Yek, heryek, tu, tukes, kes, tu, tutişt, herkes, hertişt, tiştêk, hin, hinek, filan, behvan, hîç, gişt, hemû, hemûkes, her, tev, hîn, hinek, çend, çendek, pir, gelek, tenê, mirov, heçî,... Mînak:

Min tukes nedît.

Yekê digot yekî: Li me pîroz be yekî!

Herkes dibêje : Bijî Kurdistan!

Ez tiştêkî dibînim.

Gişt dibêjin: An serkeftin, an serkeftin!

Tev dibêjin : An Kurdistan, an Kurdistan!

Cînavên nependî mîna navan tînan tewandinê:

Yek, yekî, yekê, yekan, kes, kesî, kesê, kesan,...

7. Cînavên xwemalîn (arzî, xwedanî)

Ev cînav şûna navekî ku xwedanekî wî di hevokê de heye digire. Cînavên xwedanî ji du cînavan bi hev dikevin. Cînavên xwedanî ev in :

Jibo nêr, yekhejmar :

Yê min, yê xwe, yê te, yê evî, yê evê , yê ewî, yê ewê, yê me, yê we, yê evan, yê ewan.

Jibo mê , yekhejmar:

Ya min, ya xwe, ya te, ya evî, ya evê, ya ewî, ya ewê, yê me, yê we, yê evan, yê ewan.

Jibo koma herdu zayendan :

Yên min, yên xwe, yên te, yên evî, yên evê, yên ewî, yên ewê, yên me, yên we, yên evan, yên ewan.

Her cînavêk ji du cînavan pêk hatiye, mîna: Yê min. Cînavê pêşî "yê" hejmar û zayenda tiştan diyar dike, lê cînavê duwemîn "min" hejmar û zayenda kesê xwedanê wî diyar dike. Dema cînavê duwemîn cînavêkî nîşandek be, wek: Yê evî, ji bilî zayend û hejmar dûrbûn û nêzîkbûnê jî, diyar dike.

Mînak:

Gula min. Ya min.

Destê ewî. Yê ewî

Guliya ewê. Ya ewê.

Çiyayên me. Yên me.

Kirasê evê.

Yê evê.

Cînavên xwedanî ji cînavên nependî jî, çêdibin, Wek:Ya filan, yê hinekan, ya tukesî, yên kê,...

8. Tewandina cînavan

Cînavê pirsyariyê " kîjan? "

Rêz	Awa	Mê	Nêr	Kom
1	Rast	Kîjan?	Kîjan?	Kîjan?
2	Bang	-----	-----	-----
3	Tewandî	Kîjanê?	Kîjanî?	Kîjanan?
4	Bihevre	Kîjanê re?	Kîjanî re?	Kîjanan re?
5	Tevayî	Kîjanê ve?	Kîjanî ve?	Kîjanan ve?
6	Cîwarî	Kîjanê de?	Kîjanî de?	kîjanan de?

Cînavên pirsyariyê " kî? " û " çî? "

Rêz	Awa	Kî?	Çî?	Mê	Nêr
1	Rast	Kî?	Çî?	Çî jin?	Çî xort?
2	Bang	-----	-----	-----	-----
3	Tewandî	Kê?	Çî?	Çî jinê?	Çî xortî?
4	Bihevre	Kê re?	Çî re?	Çî jinê re?	Çî xortî re?
5	Tevayî	Kê ve?	Çî ve?	Çî jinê ve?	Çî xortî ve?
6	Cîwarî	Kê de?	Çî de?	Çî jinê de?	Çî xortî de?

Cînavên nîşandek " ev " û " ew "

Rêz	Awa	Ev-Mê	Ev-Nêr	Ev-Kom	Ew-Mê	Ew-Nêr	Ew-Kom
1	Rast	Ev	Ev	Ev	Ew	Ew	Ew
2	Bang	-----	-----	-----	-----	-----	-----
3	Tewandî	Evê(Vê)	Evî(Vî)	Evan	Ewê(Wê)	Ewî(Wî)	Ewan

4	Bihevre	Evê re	Evî re	Evan re	Ewê re	Ewî re	Ewan re
5	Tevayî	Evê ve	Evî ve	Evan ve	Ewê ve	Ewî ve	Ewan ve
6	Cîwarî	Evê de	Evî de	Evan de	Ewê de	Ewî de	Ewan de

Cînavên kesok

Rêz	Awa	1Tek	2Tek	3Tek	1Kom	2Kom	3Kom
1	Rast	Ez	Tu	Ew	Em	Hun	Ew
2	Bang	-----	-----	-----	-----	-----	-----
3	Tewandî	Min	Te	Wî/Wê	Me	We	Wan
4	Bihevre	Min re	Te re	Wî/Wê re	Me re	We re	Wan re
5	Tevayî	Min ve	Te ve	Wî/Wê ve	Me ve	We ve	Wan ve
6	Cîwarî	Min de	Te de	Wî/Wê de	Me de	We de	Wan de

Nivîsandina cînavkê pirsyariyê "kî" û "kê"

Halil Aktuğ

Komxebatê cînavka pirsyariyê "kî, kê" wiha pêşniyar kiriye.

"Grûpa xweser

Grûpa tewandî

kî

kê

kîjan

kîjanî (di cihê navdêrên nêr de)

kîjan

kîjanê (di cihê navdêrên mê de)

kîjan

kîjanan (di cihê navdêrên pirhejmar de)

"Pirsên ku bi cihnavên pirsiyarî yên grûpa xweser dest pê dikin, bersivên wan ji cihnavên kesî yên grûpa xweser dihên wergirtin û weha dihên nivîsîn:"

Nimûne:

Kî dibêje?

Ez dibêjim.

"Pirsên ku bi cihnavên pirsiyarî yên grûpa tewandî dest pê dikin, bersivên wan ji cihnavên kesî yên grûpa tewandî dihên wergirtin û weha dihên nivîsîn" (rûpel 151)

Nimûne:

Kê got?

Min got."

Ez pêşniyara komxebatê kê dibînim. Pêşniyara Komxebatê ne ilmî ye.

Lazim e ku bê îzahkirin.

Di vê mijarê de ezê fikrên xwe pêşkêş bikim.

Kî

Kî hat? Bersiv (Ew hat.)

Tu bi kê re çûyî? Bersiv (Ez bi wî re çûm.)

Tu ji kê re dibêjî? Bersiv (Ez ji wê/wî re dibêjim.)

Tu bi kê ve çûyî? Bersiv (Ez bi wî/wê ve çûm.)

Tu bi kîjanî ve çûyî? Bersiv (Ez bi wî ve çûm.)

Tu ji kîjanî re dikirî? Bersiv (Ez ji wî re dikirim.)

Tu ji kîjanê re dikirî? Bersiv (Ez ji wê re dikirim.)

Tu kîjanê dibî? Bersiv (Ez wê dibim.)

Tu çûyî kîjan bajarî? Bersiv (Ez çûm wî bajarî.)

Tu li dara kîjan sêvê dinêrî? Bersiv (Ez li dara wê sêvê dinêrim.)

Tu ji kîjan sêvan dixwazî? Bersiv (Ez ji wan sêvan dixwazim.)

Balkêşî: Peyva “kîjan” bi peywira cînavka pirsyariyê, ku bireser be, gruba cînavka “ez” ê nabe kirdeyê wê hevokê.

Mînak: Te kîjan bir? Bersiv (Min ew bir.)

Balkêşî: Peyva “kîjan” bi peywira rengdêrê, hem bi gruba cînavka “ez” ê re hem jî bi gruba cînavka “min” ê re tê bi kar anîn.

Kê

Kê got? Bersiv (wê/wî got.)

Te kîjan bir? Bersiv (min Ew bir.)

Te bi kê re nan xwar? Bersiv (min bi wî /wê re nan xwar.)

Te ji kê re got? Bersiv (Min ji wê/wî re got.)

Te bi kê ve kir? Bersiv (Min bi wî/wê ve kir.)

Te bi kîjanî ve kir? Bersiv (Min bi wî ve kir.)

Te ji kîjanî re got? Bersiv (Min ji wî re got.)

Te ji kîjanê re got? Bersiv (Min ji wê re got.)

Te li kîjan bajarî nan xwar? Bersiv (Min li wî bajarî nan xwar.)

Te li dara kîjan sêvê nêrî? Bersiv (Min li dara wê sêvê nêrî.)

Te ji kîjan sêvan dixwest? Bersiv (Min ji wan sêvan dixwest.)

Balkêşî: Peyva “kîjan” bi peywira cînavka pirsyariyê, ku bireser be, gruba cînavka “min” ê dibe kirdeyê wê hevokê.

Mînak: Te kîjan bir? Bersiv (Min ew bir.)

Balkêşî: Peyva “kîjan” bi peywira rengdêrê, hem bi gruba cînavka “ez” ê re hem jî bi gruba cînavka “min” ê re tê bi kar anîn.

Cînavka pirsyariyê “kî, kê”

Berî her tiştî, divê em cînavka “kî, kê”yê serast bikin.

Cînavka pirsyariyê “kî”:

Cînavka “kî” bi lêkerên negerguhêz re tê bi kar anîn. Bersiv bi gruba cînavka “ez” ê tê dayin.

Mînak: kî çû? Bersiv (Ez çûm.)

Balkêşî: Ku lêker negeruhêz be jî, cînavka “kî” di nava qalibê daçekê de bê bikaranin, Wê demê “kî” tê tewandin dibe “kê”

Mînak: Tu bi kê re çûyî? Bersiv (Ez bi wî re çûm.)

Di vê hevokê de lêkera “çûyin” negeruhêz e. Divîbû cînavka “kî” bê bikaranîn lê cînavka “kî”

di nav qalibê daçeka “ bi.....re ”yê de hatiye bikaranîn. Bûye “kê”.

Cinavka pirsyariyê “kê”:

Cinavka “kê”bi lêkerên gerguhêz re tê bi kar anîn.

Mînak: kê got? Bersiv (Min got.)

Cinavka pirsyariyê “kîjan”

Ku “kîjan” cinavka pirsyariyê be, sadece gruba cinavka “min”ê dibe kirdeyê wê hevokê.

Mînak: Te kîjan anî? Bersiv (Min ew anî.)

Kirdeyê vê hevokê cînavka “min”ê ye. Di şûna “kîjan”ê de jî “ew” hatiye bi kar anîn.

Balkêşî: Peyva “kîjan” bi peywira cînavka pirsyariyê, ku bireser be, sadece gruba cînavka “min” ê dibe kirdeyê wê hevokê.

Rengdêra pirsyariyê “kîjan”

Ku “kîjan” rengdêr be, bi herdu grubên cînavkan re jî tê bi kar anîn.

Mînak: Tu çûyî kîjan bajarî? Bersiv (Ez çûm wî bajarî.)

Te li kîjan bajarî nan xwar? Bersiv (Min li wî bajarî nan xwar.)

Balkêşî: Peyva “kîjan” bi peywira rengdêrê, hem bi gruba cînavka “ez” ê re hem jî bi gruba cinavka “min” ê re tê bi kar anîn.

Cinavka pirsyariyê “kîjanî û kîjanê”

Cînavkên “kîjanî û kîjanê” bi herdu celebên cînavkan re jî tên bi kar anîn.

Tu bi kîjanî ve çûyî? Bersiv (Ez bi wî ve çûm.)

Tu ji kîjanî re dikirî? Bersiv (Ez ji wî re dikirim.)

Tu ji kîjanê re dikirî? Bersiv (Ez ji wê re dikirim.)

Tu kîjanê dibî? Bersiv (Ez wê dibim.)

Te bi kîjanî ve kir? Bersiv (min bi wî ve kir.)

Te ji kîjanî re got? Bersiv (min ji wî re got.)

Te ji kîjanê re got? Bersiv (min ji wê re got.)

Qertafa li dawiya “kîjanî û kîjanê” qertafên zayendê ne. Eslê van hevokan waha ye.

Te ji kîjan zilamî re got? Tu kîjan keçikê dibî? Peyva “zilamî û keçikê” ketiye. “î” û “ê”ya li dawiya “zilamî û keçikê” hatiye dawiya rengdêra

“kîjan”ê. Rengdêra “kijan”ê ji rengdêrê ketiye. Bûye “kîjanî û kîjanê” êdî di peywira cînavka pirsyariyê de ne.

Balkêşî: Kirdeyê her du gruban jî bi gruba “min”ê tê dayin. Di şûna “kîjanî û kîjanê” de cînavka “wî û wê” tê bi kar anîn.

Em dikarin vê bêjin: Cînavka “kîjanî” ji bo zayenda nêrîtiyê ye.

Cînavka “kîjanê” ji bo zayenda mêyîtiyê ye.

Di hevokên navdêrî de bi gelemperi cînavka pirsyariyê “ki” tê bi kar anîn.

Bersiva cînavka pirsyariyê “kî” yê bi gruba cînavka “ez”ê tê dayin.

Mînak: Kî zava ye? Bersiv: (Ew zava ye.)

Kî bûk e? Bersiv: (Ew bûk e.)

Kî şivan e? Bersiv: (Ew şivan e.)

Kî kebanî ye? Bersiv: (Ew kebanî ye.)

HOKERÊN BÊPÎVAN Û BÊKÊŞAN

Zeynelabidîn Zinar

Bêguman di Zimanê Kurdî de hin hokerên pîvan û kêşanê yê qiyasî hene ku zêde bala kesî nakeve ser wan û jixwe pîvan û kêşana wan zêde nakeve hafîzeyaya meriv. Xasma jî nivşên nû, ageh ji wan nînin, ji ber ku miqdarê wan, bi metro û kîloyan çênabe. Lê her kes rind dizane ku metro û kîlo çî ne û pîvan û kêşana bi wan çiqas û çewan in.

Ji bilî metro û kîloyê, hin ji wan peyvên ku hoker in, lê ew di nava xwe de jimareke wek kîlo û metroyê dihewînin û dema behsa wan tê kirin jî, kes behsa kêşana wan bi kîlo û pîvana wan bi metroyê nake, tenê navê wan tê gotin, her kes dizane ku çiqas e.

Ev peyvên li jêrê ku li gor rêza alfabeyê wek nimûne hatine rêzkirin, di wan de hem kîlo û hem jî metro veşartî ne, fermo em bala xwe bidin wan ku çewa ji aliyê Kurdan ve têne bikaranîn:

- BAR: Eger bar, ê heywanên weke ker, hêstir, axte, olaq, hesp û huştur be, bi gotina barek genim, barek êzing, barek mewîj, barek dimsê û gwd. Tê de pêgirek heye û wek kîlo kêşanê ji 60 kîloyî heta 300î ye. Lê kes behsa kîlo û metrê nake.

- BERMIL: Di bermilê de tiştên weke zadê dirûtî, giya, êzing, hejik, pûş û tiştên wisa hene. Giraniya van jî li gor cûnê xwe kêm û zêde dibe. Bi gumana ji pênc kîloyî heta 20î ye. Tê de çendî ku jimar jî heye, lê kes behsa kîlo û metrê jî nake.

- BIRR: Bi gotina "birr"ê, ne jimara bi metroyê û ne jî kêşana bi kîloyê heye, lê bi jimarê miqdara tiştên heyî ji 10 hetanî 30-40î ye. Mînak: Birrek zilam ji rê ve tên... Herweha navê leyztikekeke kurdî jî heye ku bi "Birr"ê navdar e.

- BAQ: Tijekirina valahiya di nava gehandina serê tiliya eşed û ya beranî de

Peyva baqê ji bo tiştên weke gul, nîskên şîn, nokên şîn, rihan, pûng, rimbêz, cax, kereng û tiştên wisa re tê gotin. Di baqê de jimareke kifş heye, lê ew jimar jî li gor cûnê xwe tê guhertin. Mînak, dema "baqek gul" bê gotin, jimara gulan 3-6 e. Dema "baqek nîsk" bê gotin, tê de 15-20 şax hene û yê din jî wisa. Li ser vê peyvê Gotineke Pêşyan jî weha heye: "Heçî zane jixwe dizane, lê yê nizane dibêje 'mesele li ser baqê nîskan e.'" Di kurmancî de ji "baq"ê re "qevdik" jî gotin. Mînak, min qedek qelem daye hevalê xwe.

- CELEB: Peyva Celebê çendî ku ji pezê kirrînê re tê gotin û herweha ji wan kesên ku pez dikirin re jî CELEB tê gotin, lê di peyvên wisa de jimarde heye û ji 20 hetanî 70-80 serî pez e.

Kesê ku pez dikire eger yek be, jê re celeb nayê gotin û navê wî tê hildan. Lê kirox eger ji yekî zêdetir bin, hingê celeb têne gotin.

- CEMIK: Diyar e ku cemik nivê têrrê ye. Dema cemek, yan cemik hate gotin, tê de li dora 25-30 kîlo tiştên weke savar, genim û hwd heye. Lê eger tiştên weke sîl, çimento û hwd bin, hindê giraniya cemekî digîje 50-60 kîloyî.

- ÇÊNÎ: Ev peyva Çênî, weke çêtî jî tê gotin. Lê tenê ji bo goşt û zihêlê çerm tê gotin, bi gumana ku tê de 100 heta 200 gramî goşt heye. Mînak: Çênîyek goşt bide pisîkê bila bixwe.

- COL: Ev peyv zêdetir ji pez re tê gotin, wek jimar ji kerî hindiktir e. Jimara kerîyek pez eger 500 be, jimara colek pez, wê li dora 80-100 be. Îcar dema col bête gotin, kêr-zêde diyar e ku jimar çiqas e û pêdiviya gotina jimara di colê de tune.

- CÛM: Peyva cûmê ji gutlek herî, kils û cixsa ku pê dîwarê kevir çêdibin re tê gotin. Bi gumana ku cûmek li dora 2-3 kîlo heye. Ji xeynî vê, gotina peyvika cûmê ji tiştêkî din re nayê gotin. Çendî ku gotina cûmek benîşt, çûmek rûn, eger bête gotin jî, ev şûfîne ye û ji rastiye dûr e.

- DAW: Peyva dawê ji pêşiya kirasê dirêj re tê gotin. Çendî ku ev peyv ketiye nav stranên Folklorê Kurdî jî, lê amûreke barkêşanê ye jî. Gelek jin dawa xwe tije tiştên weke sêv, meqîj, gûz û wekî din dikin û bi qederê 10-15 kîlo hildigirin. Herweha daw, cihê sitar û veşartinê ye jî. Pir kes di binê dawa jinan de ji xeterên giran felat bûne.

- DÊZ: Peyva dêzê çend tiştan re tê gotin, weke dêzek çîlo, dêzek kêran, dêzek hej û hwd. Ev peyv herî zêde bi çîlo ketiye nêv Ferhenga Kurdî. Dema Kurd di meha gulanê de hejîkên darên Mazî diçin, li çiyê dikin dêz, bi hawayekî wisa çêdibe ku ji berf û baranê jî şil nabe û zivistanê bi taxûk û xizakan çîlo tînin û didin pezê xwe. Di dêzek çîlo de bi sedan gurzên çîlo hene.

- EBOR: Peyva eborê, ji birra masî, kew û hin trûdên dî re tê gotin. Wek jimar nayê zanîn. Dema masî di demeke kifş de pir zêde bi hev re digerin û li çeman belav dibin, tê gotin ku "Çaxê eborê masiyan" e. Lê navê cûreke masî bi xwe jî EBOR e. Dema kew û hin balindeyên din jî ku bi jimareke zêde bi hev re digerin û xelk diçe hêleya wan, tê gotin ku Eborê Kewan hatiye...

- GARAN: Di peyva garanê de jimar ji sedî zêde ye, dewarên stûr û sewalên weke ker û hespan bi giştî ji aliyê gavanê gund ve têne çêrandin.

- GURZ: Li jorê di peyva "çilo" de peyva gurz hatiye bikaranîn. Gurzek çilo, gurzek giya, gurzek gez, gurzek zil, gurzek qose û hwd de, jimareke wisan e ku nayê zanîn ka çiqas e, lê tijekirina navbera valahiya nava herdu milan re gur tê gotin.

- GUTL: Tîpa L pir qalind tê bilêvkirin û ji tiştên weke ewr, herî û tiştên wisa re tê gotin. Ji gutlê re di klasîkên kurdî de ÇITR jî hatiye gotin. Mînak, gutlek ewr derket û teyrok jê barî. Gutlek herî, ji cûmekê hindiktir e. Dema yek zêde benîşt di devê xwe de bicû, tê gotin ku "guttlek benîşt xistiye devê xwe."

- KERÎ: Kerî, ji pezê reş û spî re tê gotin, ango mih û bizin. Jimara kerê digije heta 500î. Peyva kerî, ji sisiyan didoyê nanê tenûrê re jî tê gotin. Dema yek bêje: Keriyeke nan bide min, bi qederê mezinatiya destekî merivan nan e.

- KÊX: Zebeş, gindor û tiştên wisa dema ji nava baxçe û bostên têne berhevkirin û li cihekî kom dibin, jê re KÊX tê gotin. Çendî ku têne jimartin, lê jimara kêxê wek kîlo ne diyar e.

- KÊŞ: Peyva Kêşê, ji bo genimê li benderê, koma mewjên ku li ber tavê hişk bûne û ava xwê ya ku ziwa bûye re tê gotin. Lê jimara van, kêşan û pîvan, ne diyar e.

- KEWAR: Wek dolabekê ye ji axê çêdibe û tê de dexl tê parastin. Dema kewar tê gotin, pêre pêre pîvaneke zad a bi elb û olçekê tê hişê meriv. Lê belê kirîn û firotina zad bi kewaran nayê kirin. Bi gumana ku 5-6 kêl zad dikeve kewarekê û her kêlek genim jî 120 kîlo ye.

Berê di mala piraniya Kurdan de yek, an du kewar hebûne ku zimhêha salane tê de diparastin.

- KÎS: Kîs bi piranî ji cawê qalind çêdibe û hinek jî ji kunif çêdibe. Kîs jî, mezin û piçûk hene. Yê mezin heta 80-100 kîlo zad dikevê. Yê piçûk jî bi zêran navdar e. Digotin, kîsek zêrê filankeso heye. Ew kîsê ku zêr diketinê, li dora du û sê kîlo bûne. Min kîsên zêran nedîtine, lê kîsên ku mecîdî û çerxî tê de dihatin parastin pir bûn.

- KOD: Di kurdî de "kod" heye û "kodik" heye. Kodik piçûk e, ji textikê tenik çêdibe û tê de dimsa tîr tê parastin, hinek jî rûnê tewaş tê de diparêzin. Koda ku zad tê pîvan jî, mezin û piçûk heye. Ya mezin, cihê duwazdeh kîlo genim e, ya piçûk jî cihê 6-7 kîloyan e.

- KOM: Ev peyva "kom"ê pirtexlît e û bi tiştêkî taybet nehatiye binavkirin. Çi tiştê ku pir be û li ser hevûdu têkeve ber çavan, bi wî tiştî kom tê binavkirin. Çend mînak:

- Komek genim (dema li bänderê xirê ser êk bûbe).

- Komek xwelî.

- Komek êzing.

- Komek laşên mirî.

- Komek fîşek. Û gwd.

- KÛP: Ev kûpê ku ji axê çêbûye û di kûreyê de hatiye qelandin, di malên Kurdan de pir zêde tene bikaranîn. Kûp jî mezin, piçûk û nîvçe hatine çêkirin. Çi tiştê ku di kûp de hebe, kûp bi wî tê navdarkirin, weke kûpê dimsê, kûpê qelyê, kûpê zêran, kûpê avê û gwd.

Min hin kûpên mezin mezin dîtine ku merivekî normal diket navê. Lê hin kûp jî hene ku sê-çar lîtir dims dikeve navê.

Kûp di nava Kurdan de bi du tiştan navdar in: Kûpê qelyê û kûpê tewaşî. Li ser kûpê qelyê hin çîrokên folklorî jî hene.

- MIŞTAXE: Ev peyv ji bo tirîyê ku li kergehê hatiye komkirin da bibe dims an mewîj û tiştên wisa re tê gotin. Miqdarê tirî di miştaxê de pir zêde ye, lê zehmet e ku bi kîloyê were kişandin. Tê de kêşan veşartî heye. Lê xwediyê miştaxê dizane ku çend selik di miştaxeyê de hene. Her selikek jî kê-m-zêde li dora 35-40 kîlo heye.

- PARÎ: Ji tiştên pêgir re Parî tê gotin. Tê de hem giraniya bi kîloyê heye, hem kêşan û hem jî pîvan heye. Lê kêşan û pîvana Parîyî ne diyar e. Ji nan, penîr, helîl, bastêq û tiştên wisa re tê gotin. Lê ji bo tiştên ruhn weke av, dims, mast û tiştên wisa re nayê gotin.

- PÊŞ: Dawa kirasê jinan dema tije sêv, gûz û tiştên wisa be, jê re Pêşek tê gotin. Lê wek kîlo ne diyar e, kê-m-zêde li dora 8-12 kîloyan heye.

- QALIB: Li bo gelek tiştên pêgir û hin tiştên xwarinê re Qalib tê gotin. Weke qalibek sabûn, qalibek helîl û hwd. Ji qalibê re kêşan û pîvan heye, lê nayê zanîn ku çiqas e.

- QEVD: Tijekirina nava destekî ji tiştên weke giya, gul, firîk û hwd re tê gotin. Ji wan tiştan re kêşan û pîvan çendî ku hene jî, lê ne diyar in û bi gotina Qevdê, qevdek, yan qevdik hatine sîordarkirin.

- REF: Di kurdî de gelek peyvên hevwateriyên Refê hene, lê gotina Refê tenê ji bo trûdên ku difirin re tê gotin. Gotineke Pêşiyên jî li ser vê heye: "Her teyr bi

refê xwe re difire.” Mesela, refek quling, refek qaz, refek kew, refek kevok û gwd.

- RÊL: Ji bo gutlek darên şîn di erdê de tê gotin. Mesela, kem, devî, satar, rêl û daristan. Çendî ku meriv kare darên di Rêlê de bijmêre, lê belê pir zehmet. Îcar xwediyên rêlan kê-m-zêde dizanin ku çend dar di rêla wan de hene. Darên rêlê hem tene pîvan û hem jî tene kêşan, lê ev hawe nayên bikaranîn.

- RÊSÎ: Ew giyaya ku hatiye çînîn û dema ku hêj ter e, li hev hatiye badan re Rêsi tê gotin. Rêsi hem tene kêşan û hem jî tene pîvan, lê kirîn û firotina wan, bi liban çêdibe.

Gudiyên Kurdistanê dema rêsi ji bo alifê sewalên xwe di zivistanê de hazir dikin, dizanin ku dirêjîya rêsiyan çiqas e û kêşan jî çiqas e.

- REVD: Peyva Revdê, tenê ji bo birrek gur tê gotin. Çewa ku di Mewlûda Kurmancî de jî hatiye gotin, revdek gur li dora 7-9an e. Lê dema peyva Revdê hate gotin, her kes dizane ku gur in û kê-m-zêde çend in.

- ŞAX: Peyva Şaxê ji bo çend tiştên cuda tê gotin. Weke şaxên darê, şaxên çiyê, çaxên nêrî (qiloç) û hwd. Di gotina şaxê de pîvan û kêşan çendî ku heye, lê belê îmkana ku meriv karibe çêbike tune.

- ŞO: Peyva Şoyê, tenê ji bo penîr tê gotin. Dema şîr bi havênê penîr dimeyînin û piştê bera torbeyê doq didin, gutleke grover û hinekî hişk çêdibe. Ji wê gutlê re, Şoyek Penîr tê gotin. Di şoyê de hem kêşan û hem jî pîvan heye, lê kes behsa wan nake. Tenê dema firotanê, penîr bi kîloyan tê firotin.

- TELÎS: Ev peyv ji wî çewalê ku ji kinif hatiye çêkirin re tê gotin, mezin e û bi qederê 120 kîlo dext dikeve navê. Jixwe hin zevî hene ku dema tov lê direşînin, bi telîsan dihesibînin.

- TÎP/TÎPÎ: Ev peyva TÎPÊ, ji bo sê tiştan tê gotin: Tîpek siwar, ji heftan zêdetir siwar in. Tîpên alfabeyê, yanî bi erebî herf. Tîpa berfê, ew berfa bi şid û ba ku li hin deverên çiya çêdibe re tê gotin. Gundî dibêjin, em hatin filan deverê û tîpiyê em girtin.

- ZEMBÎL: Selikek e ku ji şivikên dara biyê çêdibe û devê wê fireh e. Di zivistanê de pîvana êmê dewaaran weke kayê ku didin dewarên stûr, bi zembîlan e. Ji bo her çêlek, ga, hesp û sewalên wisa re her yekê zembîlek ka, ji bo dewarên baqûrî re jî, her yekê nîv zembîl ka dixin afirê wan.

Bi hêviya ku ciwanên me li peyvên wisa lêkolîn bikin û gelek peyvên ku wenda bûne yan nayên bikaranîn, bidin jiyandin.

Xebatên ziman(nas)î di navbera lehceyên kurdî de

Husein Muhammed

Wek diyarî bo mamê hêja Îsmâîl Şahîn

Van çend dehsalên dawiyê xebatên li ser lehceyên cuda yên zimanê kurdî zêde û berfireh bûne. Hin ji wan lêkolînan bi kurdî û hinek jî bi zimanên din in.

Lêkolînên zimanî yên bi kurdî adeten li ser wê lehceyê ne ku kitêb bi xwe jî pê hatiye nivîsîn. Bo nimûne, kitêbên zimanî/rêzimanî yên bi kurmancî bi piranî behsa taybetmendiyan kurmancî, yên bi soranî qala taybetmendiyan soranî û yên bi zazakî jî aqlebe behsa xusûsiyetên zazakî dikin.

Lê herwiha bi taybetî vê dawiyê hin berhem bi lehceyeke kurdî li ser lehceyeke din jî ya kurdî hatine pêşkêşkirin. Hinek ji van berheman hewl didin qisekerên lehceyekê hînî lehceya din bikin lê hinek jî tê dikoşin wekhevî û cudahiyan du yan zêdetir lehceyên kurdî bi xwandevanên xwe binasînin.

Hinek ji berheman kitêb an nivîsarên li ser rêzimanê ne. Hinekên din jî ferhengên dulehceyî yan pirlehceyî ne.

Di vê nivîsara xwe de em ê van xebatên bi lehceyeke kurdî li ser lehceyeke din ya kurdî binasînin. Herwiha wek diyariyeke bo sala nû ya 2018 em ê piraniya van berhemen hêja di malpera Zimannas de bixin ber destê xwandevanên kurdî.

Xebatên zimanî yên pûtedana bi lehceyên din jî

Li gel ku hinek lehceparêzên bêhteng di nav ferhengszaz û rêzimannivîsên kurd de he(bû)ne jî, lê piraniya zimannas û rêzimannivîsên kurd hemû lehceyên kurdî wek zengînî û dewlemendiya zimanê kurdî pejirandine û li gor şiyar û taqeta xwe pûte bi wan jî kiriye anku giringî û bayex daye wan jî.

Piraniya rêzimannivîsên kurdî (hem rêzimannivîsên kurd û hem jî yên biyanî) di berhemên xwe de cih daye tenê lehceyeke kurdî (kurmancî, soranî, zazakî) û bi tamamî yan jî bi piranî lehceyên din piştguh kirine. Mirov dikare bi hêsanî vê yekê fehm bike ji ber ku cudahiyên navbera lehceyên serekî yên kurdî (bo nimûne kurmancî, soranî û zazakî) de gelek mezin in. Bi taybetî bo kesên ku dixwazin hînî kurdî bibin, dê barekî gelek giran û herwiha sergêjker be eger mirov di heman demê de hewl bide rêzimana kurmancî, soranî, zazakî, hewramî û hwd. pêşkêş bike.

Lê bi merema hînbûna lehceyekê bo zanayên lehceyeke din yan jî bi mebesta berhevdanên zimannasî, hejmareke berheman hatine nivîsîn ku balê dikişînin ser lehceyên din jî yên kurdî.

BERHEMÊN RÊZIMANÎ YÊN LEHCEYÊN DIN

Mirov dikare behskirina rêzimana lehceyên din bi çend awayên jêrîn parve bike:

- 1) behskirina du yan zêdetir lehceyên kurdî di heman berhemê de di berhemên bi zimanên biyanî de
- 2) behskirina rêzimana du yan zêdetir lehceyên kurdî di heman kitêba bi kurdî de
- 3) şirovekirina rêzimana lehceyeke kurdî bi lehceyeke din ya kurdî.

Li gor ku haya me jê heye, yekem car ku di heman berhemê de behsa rêzimana du lehceyên kurdî (kurmancî û soranî) hatiye kirin, kitêba efsere înglîz **E. B. Soane** ya bi navê *Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language*

(Rêzimana zimanê kurmançî anku kurdî) ye ku sala 1913 hatiye weşandin.³ Soane gelek ji nimûneyên xwe pêşî bi kurmançî û paşî jî bi soranî dide. Lê mixabin kitêb ji sistematîkiya zimannasî dûr e û di nimûneyan de jî gelek xeletî hene.

Yekem hewldana cidî ya berhevdana du lehceyên kurdî kitêba **Sadiq Behaedîn Amêdî** *Rêzimana Kurdî: Kurmançîya jorî û jêrî ya Berhevkirî* ye ku sala 1987 hatiye weşandin. Kitêb bi kurmançî û bi alfabeya kurdî-erebî ye lê herwiha bi berfirehî cih dide soranî jî. Vê dawiyê kitêb bi alfabeya kurdî-latînî jî hatiye belavkirin.⁴

Sala 1996 kitêbeke din ya berhevdana rêzimana lehceyên kurdî bi navê *Kurdîzan – rûberîna zaravên kurdî* derket ku ji aliyê **Fêrgîn Melik Aykoç** ve bi kurmançî hatiye nivîsîn. Kitêb 300 rûpelî ye û hewl dide hemû lehceyên kurdî bi cudahî û wekhevîyên wan ve bide nasîn. Nivîskarê kitêbê bi taybetî şarezayî lehceyên kurmançî û zazakî ye. Em tevahiya vê kitêbê li vê derê dixin xizmeta xwandevanên kurdî.⁵

Sala 2012 kurterêzimana soranî bi kurmançî ji aliyê **Husein Muhammed** ve li ser internetê hat weşandin. Nivîskar cudahî û wekhevîyên dengnasî, peyvnasî û teşenasî yên kurmançî û soranî dide nasîn.⁶ Paşî heman xebat ji aliyê **Hasan Aslan** ve ji kurmançî li zazakî hat wergerandin û bû yekem berhema li ser rêzimana lehceyeke din ya kurdî bi şirovekirina zazakî.⁷

Sala 2013 kitêba *Gramera Kirdkî (Zazakî) ya Roşan Lezgîn* bi şirovekirinên bi kurmançî derket. Di vê kitêba sistematîk de beş bi beş rêzimana zazakî bi kurmançî tê şirovekirin, nimûne tên pêşkêşkirin û herwiha tekstên edebî yên bi orijînalê xwe ya zazakî li gel wergerên xwe yên kurmançî tê de cih digirin. Kitêb hem bi kêrî hînbûna zazakî tê û hem jî bo berhevdana cudahî û wekhevîyên kurmançî û zazakî hêja ye.⁸

³ Malpera Zimannas kitêbê li vê derê belav dike:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2017/01/soane.pdf>

⁴ <http://www.kitapyurdu.com/kitap/hevberkirina-kurmancisorani-rezimana-kurdi-kurmanci-ve-sorani-dilbilgisi/289269.html>

⁵ Malpera Zimannas kitêbê li vê derê belav dike:

<https://wordpress.com/post/zimannas.wordpress.com/3641>

⁶ Binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/09/rezimana-sorani-bi-kurmanci/>

⁷ Binêrin: <https://ziwanzan.wordpress.com/2016/03/19/78/>

⁸ Binêrin: <http://www.zazaki.net/haber/ji-bo-kurmancan-gramera-kirdk-zazak-1564.htm>

Tenê salekê dûv re anku sala 2014 jî kitêba *Hevberkirina rêzimana zazakî û kurmancî* ya **Seîd Veroj** derket. Kitêb beş bi beş kurmancî û zazakî dide ber hev. Hem nimûne û hem jî şirove bi herdu lehceyên zazakî û kurmancî hatine nivîsîn.⁹

Salek piştî wê anku 2015 vê carê jî yekem rêzimana kurmancî bi soranî derket. Kitêba *Rêzimanî kurdî – kirmancî serû* ya **Nerîman Xoşnaw** rêzimana kurdî – bi taybetî devoka behdîni – bi alfabeya kurdî-erebî bi xwandevanên soranîxwîn dide nasîn. Em li vê derê tevahiya kitêbê belav dikin:

<https://zimannas.wordpress.com/2018/01/01/rezimana-kurmanci-bi-sorani/>

FERHENGÊN LEHCEYÊN DIN

PEYVÊN LEHCEYÊ DI FERHENGÊN LEHCEYEKE DIN DE

Piraniya ferhengên kurdî li ser bingehê lehceyekê hatine danîn. Ew bi awayekî sistematîkî peyvên lehceyekê, maneyên wan peyvan bi lehceya bijartî û awayên bikaranîna peyvan li gor wê lehceyê pêşkêş dikin. Eger hevok û nimûneyên bikaranîna peyvan di ferhengê de hebin, hingê jî ew hevok adeten tenê bi lehceyekê ne. Herwiha gava ku ferheng bi zimanekî biyanî û kurdî be, dîsa teqîben her ferheng peyvên biyanî tenê li lehceyekê werdigerîne.

Lê dîsa jî piraniya ferhengvanên kurdî cih didin hinek peyvên ji lehceyên din jî. Bo nimûne, di ferhenga *Henbaneborîne* ya **Hejar** yan ferhenga *Kurdistan* ya **Gîw Mukriyanî** de ji bilî peyvên soranî (ku lehceya serekî ya van herdu ferhengan e), dîsa gelek peyvên kurmancî û hinek peyvên hewramî jî hene. Yan di *ferhenga kurdî-tirkî* ya **D. Îzolî** de ji bilî peyvên kurmancî (ku lehceya serekî ya vê ferhengê ye), dîsa hinek peyvên soranî û zazakî jî cih digirin.

Hinek ferhengên kurdî ti agahiyên li ser lehceya filan peyvê diyar nakin: Bo nimûne, Hejar di ferhenga xwe de nabêje ka kîjan peyv ji kîjan lehceyê wergirtiye.

Hinek ferheng diyar dikin eger filan peyv ne bi lehceya serekî be: Bo nimûne, D. Îzolî li ber peyvên soranî S û li ber yên zazakî jî Z datîne.

⁹ <http://www.kulturname.com/?p=8982>

Hinek ferheng jî hewl didin lehceya/lehceyên her peyvê diyar bikin: Bo nimûne, Gîw Mukriyanî di ferhenga xwe de hewl dide li pey her peyvê lehceyên ku ew peyv tê de tê bikaranîn pêşkêş bike.

Lê cihdana peyvên lehceyên din di ferhengên kurdî de kêm-zêde tişteki tesedîfî ye. Hinek peyvên lehceyên din jî cih digirin lê piraniya peyvên lehceyên din cih nagirin.

Bo nimûne, D. Îzolî di ferhenga xwe de cih dide peyva zazakî "pî" (bab, bav) lê cih nade lêkera giring "kerdene" (kirin). Yan **Şefîq Qezaz** di ferhenga xwe ya *Şarezor* ya soranî-înglîzî de cih dide peyva kurmancî "vir" (vê derê) lê cih nade lêkera gelek giring ya kurmancî "kirin".

FERHENGÊN DULEHCEYÎ Û PIRLEHCEYÎ

Vê dawiyê çend ferhengên kurdî belav bûne ku peyvên lehceyeke kurdî bi lehceyeke din ya kurdî şirove dikin.

Yekem ferhenga peyvên lehceyeke kurdî bi şiroveyên lehceyeke din ferhenga *soranî-kurmancî* ya **Husein Muhammed** e. Ferheng yekem car wek ferhengokekê beş bi beş di destpêka salên 2000 de li gel kovara *Mehname* li ser Internetê dihate belavkirin. Lê piştî herfên A – Ç, danerê ferhengê hest bi pêwîstiya hebûna ferhengeke berfireh ya soranî-kurmancî kir ku bikare di wergerandinê de alîkarî wergêrên kurd be. Ji herfa D pê ve ferheng hatiye berfirehkirin. Ew heta niha bi beşên A – Ç kurt û ji herfa D heta herfa R jî bi berfirehî li ser internetê di malpera Wîkîferhengê de hatiye belavkirin. Nivîskar niha jî li ser beşa S dixebite û armanc ew e ku heta sala 2020 beşên S – Z biqedîne û beşên A – Ç jî berfireh bike.

Ferheng pêşî tenê bi alfabeya latînî bû anku peyvên soranî jî bi latînî hatine nivîsîn û li gor rêzbendîya alfabeya kurdî hatine rêzkirin lê paşî danerê ferhengê awayê nivîsîna serpeyvan bi alfabeya kurdî-erebî jî diyar kiriye.

Hemû ferheng dikare li vê derê were dîtin û bikaranîn:

<https://ku.wiktionary.org/wiki/P%C3%AAvek:soran%C3%AE-kurmanc%C3%AE>

Wek kitêb heta niha sê ferhengên mezin yên peyvên lehceyeke kurdî bi şiroveyên lehceyeke din hatine weşandin.

Sala 2009 *Ferhenga Kanî* ya **Mihemed Salih Pêndroyî** derketiye ku peyvên kurmançî bi soranî rave dike. Ferheng bi alfabeya kurdî-erebî ye anku hem peyvên kurmançî û hem jî yên soranî bi alfabeya kurdî-erebî hatine nivîsîn. Di ferhengê de texmînen 12 000 peyv hene. Ferheng dikare li vê derê bê dîtîn û bikaranîn: <https://wordpress.com/post/zimannas.wordpress.com/3644>

Tenê salekê piştî *Ferhenga Kanî* ya kurmançî-soranî, anku sala 2010 ferhengeke mezin ya hewramî-soranî jî hat weşandin. *Ferhengî Wişenname horamî – kurdîy nawendî* ya **Cemal Hebîbullah** nêzîkî 40 000 peyvên hewramî bi soranî şirove dike. Ferheng bi alfabeya kurdî-erebî hatiye nivîsîn lê çend herfên din jî li gor pêwîstiyên dengnasiya hewramî li alfabeya kurdî-erebî hatine zêdekirin. Ferheng dikare li vê derê bê dîtîn û bikaranîn. Em wek malpera Zimannas tevahiya vê ferhengê li vê derê belav dikin: <https://wordpress.com/post/zimannas.wordpress.com/3648>

Di heman salê de anku 2010 herwiha ferhengeke mezin ya zazakî-kurmançî û kurmançî-zazakî jî belav bûye. *Ferheng Kirmanckî (Zazakî) – Kurmançî / Kurmançî - Kirmanckî (Zazakî)* ya **Çeko Kocadag** ji zêdeyî 1000 rûpelan pêk tê û tê de 40 000 peyvên zazakî û kurmançî li hev hatine wergerandin. Ev tek ferhenga dulehceyî ya kurdî ye ku di heman demê de duberî ye jî anku ne tenê peyvên lehceyekê bi lehceya din şirove dike lê ji du beşan pêk tê ku di beşa yekem de peyvên zazakî û şiroveyên wan yên kurmançî û di beşa duyem de jî peyvên kurmançî li gel şiroveyên wan yên bi zazakî hatine rêzkirin.¹⁰

Serencam

Armanca vê nivîsarê ew bûye ku xebatên (rê)ziman(nas)î di navbera lehceyên kurdî de bi kurtî bi xwandevevanan binasîne. Me hewl daye ku di vê mijarê de amaje bi berhemên giring bikin lê guman jê nîne ku ne tenê ev berhem di vî warî de cih digirin. Mimkin e ku yek an çend xebatên din jî yên giring hebin ku me ji bîr kiribin an jî me hay jê nîne.

¹⁰ Agahiyên zêdetir li ser ferhengê bo nimûne li vê derê hene:

<https://www.timeturk.com/ku/2010/12/17/ferhenge-zazaki-kurmanci-derket.html>

Bi şanzî mirov dibîne ku êdî hêdî-hêdî qisekerên lehceyên cuda ne tenê bi rêya medyayê lê ji aliyê zimannas, rêzemannivîs û ferhengvanan ve jî bi hev tîn nasandin û lehceyên wan êdî aşnayî hev dibin. Berhemên heta niha destpêkek û bingehê baş e ku xebatên siberojê li ser bînan danîn û xezîneyeke berhemên ziman(nas)î û rêzimanî bi vekolînên kûrtir û têrkertir bikeve ber destê me.

HEVALNAV (RENGDÊR)

Samî Tan

Her wekî ji nav jî diyar e, "hevalnav" tê ber navdêran û reng, dirûv û teşeya wan vedibêje; hin caran hejmar û mêjera wan vedibêje. Celadet Bedirxan bi mebesta ku rengê navdêrekê didêre jê re gotiye "rengdêr".

Gelek kesan jê re "hevalnav" gotiye. Di zaravayê soranî de jî jê re "awelnav" dibêjin ku tê wateya "hevalnav"ê. Bi baweriya mejî peyva "hevalnav" zêdetir di cihê xwe de ye. Ji ber ku ew hevaltiya navdêrê dike, navdêrê jî gelek aliyên ve bi mirov dide nasîn.

Hevalnav ji aliyê wateyê ve du bir in; "hevalnavên çawaniyê" û "hevalnavên diyarkirinê". Hevalnavên ku di binyata xwe de hevalnav in, ew reng, dirûv û teşeyên navdêran didêrin û yên ku di binyata xwe de tiştêkî din in, lê dema dikevin beriya navdêrê hinek taybetiyên navdêrê ji me re vedibêjin, ew jî hevalnavên diyarkirinê ne.

Bo nimûne, gava em dibêjin; "reş", "kinik", "çavşîn" tiştêkî tê ber çavên mirov. Yanê ev peyv kesekê/î yan jî tiştêkî bi mirov didin nasîn, wekî; "kera reş". "lawikê kinik", "keçika çavşîn" ... Ev giş hevalnavên çawaniyê ne.

Hevalnavên diyarkirinê çendanî û mêjcra tiştan bi awayekî teqez an jî ne teqez nîşan didin.

Mînak:

Ev mirov haf.

Wê keçikê nan xwest. Hinek mirovan gazî me kir. Çar avahiyên wî hene. Kijan zilamî got!

Çend berxik hene?

Ji cureyên hevalnavan bi tenê hevalnavên çawan iyê yê resen in, ew cure hevalnav ji bilî qertafên payeyê tu qertafan wernagirin û di nav hevokê de nayên guhartin.

Lê hevalnavên diyarkirinê di bingeha xwe de cînavk fl jimarnav in, wekî hevalnavên şanîdanê, jimarîn û nebinavkirî guherbar in. Ew cure cînavk ditewin, heta navdêran jî bi xwe re ditewînin.

Mînak:

Vî mirovî got. Vê keçikê nivîsî. Van daran bîne.

Hevalnav ji hêla peyvsaziyê ve

Ji aliyê peyvsaziyê ve hevalnav jî wekî cureyên din ên bêjeyan dibin du birên sereke; "xwerû" fl "nexwerû" yê nexwerû jî dibin du cure: "hevedudanî", "pêkhatî",

Hevalnavên xwerû, hêmanekê tenê di nava xwe de dihewînin.

Wekî; na. tûj, reş, spî, kesk, jîr; berz, xweş, şor, kal, pir, qenc, pak, zer, bilind, belek, baş, çê. heja, kesk....

Dema ku mirov wan hevalnavan parçe bike, tiştêkî watedar ji wan demakeve.

Hevalnavên hevedudanî

Hevalnavên hevedudanî ji çend hêmanên serbixwe hatine pê.

Peyvên ku wan pêk tînin jî bi serê xwe xwediyê wateyekê ne, lê heval nava nû wateyeke nû digire. Her wekîji mînakan jî diyar dibe, yek ji wan peyvan ku ev hevalnav pêk anîne bi serê xwe xwediyê wateyekê ne. Bo nimûne di heval nava "pozbilind" de hem "poz" hem jî "bilind" watedar in

Hevalnavên hevedudanî bi çend awayan pêk tên:

1- Navdêrek tê ber hvalnavekê û hevalnaveke nû pêk tîne:

Hevalnavên hevedudanî bi piranî bi vê rêbazê pêk hatine.

Minak: çavreş. cangiran, destsivik, pozbilind, payeherz, navno, porspî, porkej. devçepel, guhbel, serşûnik, diranpîj, meşwerdek, parîmezin...

2- Her wiha hin earan jî hevalnav berî navdêrê tê û bi vî awayî hevalnaveke nû pêk tê.

Mînak: kêmxwê, pîrbêj, têrxwê, têrtijî, kêmaqil, xweşmêr, bilindwar, kalemê; pîrejin...

3- Hin earan jî du navdêr têne ber hev û hevalnavekê pêk tînin. Mînak: serteşî, gerdembilûr, bejnrihan, devgirêz, devşikeft, pozberan, devşorbe, ziktêr, destgopal, diranpîj, çavxezal, cegerxwîn...

4- Hin earan daçekek tê ber navdêrekê yan jî dikeve navbera du navdêran û hevalnavekê pêk tîne.

Mînak: likar, jîp iya, lirê, nelirê, jidil, devliken, devbixwîn, rûbimast, dilbikul, çavligoşt, bejnlihev, dilbiêş, babidev. çavlirê, destodev...

Hevalnavên pêkhatî û qertafên ku wan pêk tînin

Hevalnavên pêkhatî bi alîkariya peyveke watedar û qertefan pêk tînin. Wekî mînak; "tirsonek n, "gundi", "jîrek ". "bengî", "navdar ". "watedar "...

Her wekî ji mînakan jî diyar e, peyvên "tirs ", "gund", "jîr ", "beng", "nav" bi xwe bêjeyên watedar in, lê qertafên "<onek", " ek", "<î", "<dar" wateyên nû dane wan.

Pêşgir

Hin paşgir û pêşgir hene ku hevalnavan pêk tînin, pir kêmin. Em ê çend hebên ku bi piranî têne bikaranîn, hildin dest. Em pêşî bala xwe bidin pêşgiran:

lho-/: ji rayeka lêkeran a dema niha hevalnavan çêdike. Mînak: hozan, hogir, honas, hoker, hodar...

lzir-/: Mezinbûn û resenbûna taybetiyeke neyînî nîşan dide. Mînak: zirker (kerê rastîn), zirdîn...

lkele-/ digel navdêran hin hevalnavan jî çêdike, Mînak: kelepîr (vanê ne pîr), kelejîn, ke/emê}..

/qeş-/: Ev di bingeha xwe de ji bêjeya qaşo tê lê wekî pêşgir jî cih girtiye.

Mînak: qeşmer...

Daçekên "bi-" û "bê-" û hokerên mîna "ser-", "bin-", "ber-" tên ber navdêran û pê hevalnav çêdibin.

Ibi-/: binav, bibext, bihêvî, bimirûz, dilbikul, biceger. bişans, bikeser; bijan...

/bê-/: bêbext, bêhêvî, bêqidûm, bêceger, bêbawer, bêteşe, bêaqil, bêşans...

Bi hokerên cih ên mîna "ser", "bin" û "ber" jî gelek hevalnav pêk tî.

Mînak: serdest, bindest, berdest...

Içele-l ji hevalnav ekê hevalnaveke din pêk tîne. Mînak: çelaxwar, çelawîç

Daçeka neyiniyê lne-l li vê derê rola pêşgîrê bi cih tîne. Mînak: nezan, nexweş, nemir, neçar, newêrek..

Hevalnava lbed-l jî di kurdî de êdî rengê pêşgîrê wergirtiye. Mînak: bedbext, bedbîn, bedawaz, bednav...

Paşgir

Di kurdî de wekî navdêran, hevalnavên pêkhatî jî bi alîkariya paşgiran tene dariştin.

I-î/: Ji lêkeran hevalnavan çêdike. Ji van hevalnavan re lêkerên di rewşa raweya çêbiwar de tî gotin.

Mînak: ketî (ketin), lewitî (lew itîn), peritî (peritin), xwestî (xwestin)...

Her wiha I-î/yeke din heye, mensûbiyetê nîşan dide ew jî hevalnavan çêdike.

Mînak: gundî, bajarî, xerzî, botî, mirdêsî, reşî, silivî... I-al ji rayeka lêkerê ya dema niha heval navê çêdike. Mînak: beza (bezîn), zana (zanîn)...

/-gînl digel navdêran hevalnavan jî çêdike. Mînak: lezgîn, xemgîn...

I-asa/: ji nava hevalnavan çêdike. Mînak: dêwasa, qerase, hûtasa...

/-awer/: ji navan hevalnavan çêdike. Mînak: cengawer, dilawer, giyanewer...

/-ak!: ji navan hevalnavan çêdike.

Mînak: ronak, sêlak, şilak...

/-ane/: ji navan hevalnavan çêdike. Mînak: jinane, mêrane, şêrane, aştiyane...

/-bar/: ji rayeka lêkeran hevalnavan çêdike. Mînak: dîtbar; xwarbar, guherbar, guhêzbar...

/-dar/: ji navdêran hevalnavan çêdike. Mînak: ma/dar, baldar; watedar...

/-mend/: ji navdêran hevalnavan pêk tîne. Mînak: bawermend, hunermend, aqilmend...

/-e/: ji lêkeran hevalnavan çêdike.

Mînak: xwende, bende, bijarte...

/-ek!: Ji navdêr û hevalnavckê, hevalnaveke nû çêdike. Mînak: Zîrek, dizek, çi/ek, kulek, tirek, fisek,...

/-în/ ji navdêran hevalnavan çêdike.

Mînak: zivîn. zêrîn, darin, şîrîn, germîn, sarîn...

/-ok!: Ev paşgir hin caran navdêran hin caran jî hevalnavan çêdike.

Mînak: şermok, tirsok, qerfok, kenok, revok...

/-nakl ji navdêran hevalnavan çêdike. Mînak: tirsnak, xeternak, derdnak, xemnak...

/-onekl ji navdêran hevalnavan pêk tîne. Mînak: tirsonek, bizdonek...

/-yar/ ji navdêran hevalnavan çêdike. Mînak: hişyar, bextyar, bihizyar, zanyar...

/-ele/: ji navdêran hevalnavan çêdike. Mînak: rewtele, çenge/e...

/-ezar/: ji navan hevalnavan çêdike. Mînak: şermezar, tengezar, dexesezar...

I-ar/: Ev paşgir digel navdêran hevalnavan jî pêk tîne. Mînak: mirar, xewar, kevnar...

Hin paşgirên din ku hevalnavan çê~ikin:

I-ûdl şerûd... I-col nîvco... I-ganl bazirgan... I-ijl paqij, lavij

1-

azl tolaz... I-werl hunewer, serwer... I-oxl dayox, çûndox, kirox

1-

oyîl şermoyî, germoyî.:

I-êr/: ji navdêran hevalnavan çêdike. Mînak: dilêr, gelêr...

I-ik/: digel navdêran wateya biçûk û delalokiyê dide hevalnavan. Mînak: kinik, reşik, xweşik...

Rayeka dema niha ya hin lêkeran ji wekî paşgir hevalnavan pêk tînin.

I-kuj/: mêrkuj, hêvîkuj, mirovkuj.. I-mêj/: xwînmêj. şîrmêj...

I-rêj/: xwînrêj, avrêj, xwêdanrêj... I-ker/: zêrker, derewker; hêsanker... I-revîn/: xemrevîn, dilrevîn...

I-xwaz/: xêrxwaz, aştîxwaz, azadîxwaz, şerxwaz, dilxwaz... I-bir/: rêbir, hêvîbir..

I-xur/: kedxur, kurtêlxur, bertîlxur, malxur, mîratxur... I-avêj/: peravêj, dûravêj, kurtavêj...

I-bêj/: plrbêj, xweşbêj...

I-bîn/: dûrbîn, çakbîn, hûrbîn, bedbîn, tengbîn... I-gir/: alîgir, piştgir, destgir...

I-firoş/: welatfiroş, aqilfiroş, xwefiroş, agahifiroş

I-kêş/: şûrkêş, balkêş, zehmetkêş, tîrkêş, xemkêş

I-xenêq/: gurxenêq, pezxenêq...

Divê neyê jibîrkin ku gelek qertafên bêjesaz ku hevalnavan çêdikin, di heman katê de navdêran jî çêdikin. Lewre hinek qertafan di her du cihan de jî cih girt.

Hevalnavên kompleks

Di pêkanîna hevalnavan de carinan hinek rêbazên cuda jî tînin bikaranîn. Gelek hevalnavên nexwerû hem hevedudanî hem jî pêkhatî ne. Hin caran du bêjeyên hevedudanî tîne ba hev heval-

naveke nû pêk tînin, her wekî peyva "serîhildayî" hin caran hevalnaveke hevedudanî qertafekê werdigire û dibe hevalnaveke nû. Bo nimûne, "sergewezî", Ji bilî vê yekê jî hinek rêz û rêzikên pêkanîna hevalnavan hene.

1- Carinan jî bi dubarekirina hevalnavan bi guherîna gihaneka "û" bi awayê "o" û bi cihkirina tîpa "m" li destpêka peyva duyemîn, hevalnavcke nû tê çêkirin.

Mînak: soromoro, xwaromaro, şaşomaşo, kevnomevno, şînomîno, reşomeşo...

2- Bi dubarekirina navdêrê û alîkariya paşgira "-î" jî hevalnav têne çêkirin.

Mînak: gulgulî, qulqulî, kerkerî, xelekxelekî, gincirginciri, xalxalî, parçeparçeyî....

3- Hinek rêbazên din hene ku wateya heval navê xurt dikin. Mînak: çiksayî, çîlspî, sorgevez, sipsor; kip kes k, ripreş...

Cureyên hevalnavan

Hevalnav dibin çend celeb. Mirov dikare bi awayekî giştî di bin van sernavan de wan ji hev cuda bike:

Hevalnavên çawan iyê (wesfîn)

Hevalnavên şanîdanê

Hevalnavên pirsyariyê

Hevalnavên nebinavkirî

Hevalnavên jimarîn

Hevalnavên çawaniyê

Hevalnavên çawaniyê her wekî ji navê wan jî diyar e, çawaniya navdêrê nîşan didin. Ev hevalnav bi du awayan bi navdêrê re têkildar dibin; bi alîkariya veqetandekê wekî "mirovê baş", "keçika bedew", "xortê jêhatî". "kesê qure". "zaroka şûm". "dara hişk", "xaniyên kevirî... "û bi alîkariya lêkera "bûn" mîna "Ev dar hişk e.", "Xaniyê me fireh e.", "Hevalên min jêhatî ne.", "Birayê min serhişk e. II

Mirov dikare ji mînakên jî fêhm bike ku hevalnavên çawaniyê hevalnavên resen in. Ew di nava hevokê de ji bilî qertafên payeyê tu qertafan nagirin û di wan de tu guherîn çênabe. Ew ji aliyê zayend û rnêjerê ve neguhêrbar in. Ew qertafên tcwangê nagirin, veqetandekên ku piştî hevalnavan tên jî jixwe ne veqetandekên hevalnavan in, ew veqetandekên navdêran dubare dikin, zayend û mêjera navdêra wê nîşan didin. Lewre jî divê ji hevalnavên çawaniyê cuda bînin nivîsandin. Bo nimûne, gava em dibêjin; "Heva/a di/geş a jîrek." Veqetandeka "a" ne veqetandeka hevalnava "di/geş" e, lê veqetandeka "heval" e.

Hinek kes dema du hevalnavên li pey hev rêz dikin, veqetandeka duyemîn dikin "<i>î", yanê dibêjin: "hevala çeleng î delal". Ev bikaranîn çewt e, jiber ku "-f" veqetandeka navdêrên nêr e, lewma jî mirov nikare li pey navdêrên mê bi kar bîne. Qertafa "-," cihê "-ê" digire, lê tu car nikare cihê "-a"yê bigire.

Jixwe di hin devokan de li şûna veqetandeka "-ê" qertafa "-1" tê bikaranîn. Mînak, li cihê ku bibêjin "Bavê min got.", dibêjin; "Bavî min got. " Ji ber vê egerê mirov dikare bibêje; "Hevalê delal î ciwanmêr haf. ", lê nikare bibêje, "hevala delal î xweşik", divê mirov bibêje, "hevala delal a xweşik", carinan jî "a" dibe "e" ev hevok bi rengê, "hevala delal e xweşik" derdikeve pêşberî mirov.

Mînak:

Hevala min a çeleng baş dixebite. Birayên min delal in.

Dayika niştîman li ber dilê min ezîz e. Dara gûzê ya bilind sî daye dora xwe. Karika biçûk winda bûye.

Birayên min ên mezin /i dor xwarinê civiyane. Xwişka min a çavşîn çûye gund.

Warê xweş warê me ye.

Mirovê pîr hurmetkar e.

Hespê spî xweş dibeze.

Erdê hişk, asîmanê dûr.

Min yek ji rindikan dît.

Di hevalnavên çawaniyê de mijarek jî neyînîkirina wan e.

Neyînîkirina hevalnavan bi alîkariya hokera "ne" tê kirin. Ew berî hevalnavan tê û neyîniyê nîşan dide.

Mînak:

Ev xwarin ne xweş e. Ew gotin ne hêja ye.

Ev zilam ne qenc bû. Ev keçik ne bedew e. Ev kes ne ciwan e.

Ev welat ne pir sar e. Zarokên we ne biçûk in. Ew mirov ne camêr e.

Di zimanê devkî de li şûna "ne" piştî hevalnavê "nîn" an jî "nin"tê bikaranîn, her wekî "Ev welat pir sar nîn e.", "Ev çiya bilind nîn e." lê bi baweriyê min ev aloziyê pêk tîne, ji ber ku "nîn" nîşaneyê nebûn û tunebûnê ye. Lewre jî divê ev form di zimanê nivîskî de neyê bikaranîn.

Payeya hevalnavan

Di hevalnavên resen ango hevalnavên çawaniyê de paye heye. Ji ber vê yekê me mijara payeyê piştî hevalnavên çawan iyê danî. Paye asta navdêr û rewşa wan a li hemberî navdêrên din nîşan dide. Di kurnanciyê de sê payeyên bingehîn hene: "payeya asayî", "payeya hevrûkirinê" û "payeya berztirîn".

Em dikarin bi mînakekê mijarê rave bikin. Peyva "bilind" hevalnaveke di payeya asayî de ye. Dema em bibêjin; "Dara gûzê bilind e" ev li ser pîvanên bilindiyê tu tiştî nabêje, tê zanîn ku li gorî pîvanên giştî ew dareke bilind e. Lê dema dareke din hebe, mirov wan her du daran bide ber hev, wê gavê mirov ji yekê re dibêje "Ev dar ji ya din bilindtir e." Heke dareke j i hemû darên beyî bilindtir li holê hebe, wê gavê divê mirov bibêje; "Ev darji hemûyan bilindtir e", "Dara herî bilind eve".

Ji bill van şêweyan mirov dikare bi awayê "Dara bilindtirin ev e." jî bibêje. Ev şêweyê dawîn her çi qas ji zaravayê kurmanciya jêrîn (sorani) hatibe wergirtin jî, niha di zimanê nivîskî de bi berfirehî tê bikaranîn.

Payeya asayî:

Di vê payedariyê de rewşa asayî ya hevalnavê heye. Hevalnav li
vê derê qertafan wernagire û tu bêje nayên ber hevalnavê.

hevalê baş

gundê xweş

mala fireh

xaniyê textîn

keçika çavreş

Ev heval haş e.

Ev xanî fireh e.

Ev avsar e.

Di rewşa asayî de paye bi gelemperî tê nîşandan. Dema me got, "mirovê baş"
em qala başiyeke asayî dikin.

Payeya hevrûkirinê:

Di vir de çend tişt bi hev re têne hevrûkirin. Du tişt an dê mîna hev bin û bi qasî
hev bin an jî yek j i wan dê bi taybetiyeke xwe jiya din kêm an jî zêdetir be.
Hevrûkirina tiştên dişibin hev bi alîkariya hinek hokerên pileyî yên mîna, "bi qasî
hev, hindi hev, wekî hev, mina hev" tê kirin. Hevrûkirina tiştên ji hev cudatir jî
carinan bi alîkariya hokerên pileyî yên mîna "hinekî, gelekî, piçekî... Il û bi piranî
jî bi alîkariya paşgira "-tir" pêk tê. Em pêşî ji bo tiştên dişibin hev hin mînanan
bidin:

Mînak:

Ew bi qasî te mezin e.

Bi zimandirêjîya xwe wekî hev in. Bejna we hindî heve.

Pênûsa te ne ewende sor e. Çîroka wî pir xweş bû.

Bejna wî zêde bilind hû.

Şîva êvarî ecêb xweş bû.

Bi awayekî gelemperî payedariya hevrûkirinê bi paşgira "<tir" tê nîşandan.

Ew ji te biçûktir e. Sêvji hêjîrê xweştir e.

Beybûn ji Sosinê ciwantir e. Ga ji bizinê girantir e.

Payeya berztirîn:

Payeya berztirîn di kurmanciya gelêrî de bi alîkariya hokcrên pileyî "herî û tewrî" pêk tê. Lê di zimanê nivîskî de ligel van hokeran paşgira "<tirîn" jî tê bikaranîn. Ev paşgir di zaravayê kurmanciya jêrîn de û di zimanê farisî de heye, lê hê nû ketiye kurmancî.

Mînak:

Gûzên herî xweş li Gûzereşê hene. Temenê dirêjtirîn li welatên pêşketî ye.

Şêvên tewrî xweş li Xelatê bi dest dikevin. Darên herî bilind li ber avê ne.

Mirovên kiniktirîn li Çînê ne.

Em çend mînakan jî ji her sê payeyan bidin:

Birayê min biçûk e. Ez jê mezintir im.

Kekê min mezintirînê me ye.

Tirî xweş e. Lê sêv ji tirî xweştir e. Fêkiya xweşiktirîn xox e.

Îsotên aliyê me tûj in. Lê yên Mêrdînê tûjtir in. Îsotên herî tûj li Rihayê peyda dibin.

Divê bê zanîn ku radeya payeya hevalnavan bi xwe jî heye û ew pîvan bi hejmaran û bi hevalnavên nebinavkirî têne nîşandan.

Mînak:

Piçekî mezin e. Hinekî mezin e. Gelekî mezin e. Pir mezin e.

Pir û pir mezin e.

Çar salan ji te mezintir e. Du bihostanji te dirêjtir e.

Sê gavan ji zeviya mefirehtir e. Heta tu bêjî bes mezin e.

Ew ji gelean mezintir e.

Ewji hemûyan mezintir e

Ew geleki ji ya din mezintir e. Bi qasî serê derziyê ne girîng e.

Carinan diyarkirina payeya herî zêde bi awayekî din jî pêk tê.

Qertafa dengê pêşîn ê rengdêrê tê pêşiya qertafa "-ip"ê bi vî awayî xurtbûna radeya rengê hevalnavê tê nîşandan.

Mînak: nipnû, rip reş, sipsar. kipkesk, hiphişk, xipxweş, sipsor; zipzer. çipçê...

Dema mirov dibêje, "nipnû" wisa tê zanîn ku pir nû ye. Ev yek ji bo mînakên din jî wisa ye, di hin bêtayan de ew "<ip" bi awayên din jî derdikeve pêşberî mirov, her wekî "vitûvala", "vikûvala" û "virtûvala", lê forma bi gelemperî bi "ip"ê tê çêkirin.

Hevalnavên şanîdanê

Ev hevalnav, bi xwe cînavkên şanîdanê ne. Cînavkên me yê şanîdanê "ev", "ew" dema ku ev dikevin ber navdêran wan nîşanî mirov didin, dibin hevalnavên şanîdanê. Gava em bibêjin, di hevoka "Ev çû mala xwe. 1/ de "ev" cînavk e, lewre cihê kesekî girtiye, wî nîşanî mirov dide, lê dema ku mirov heman hevokê bi şêweyê "Ev heval çû mala xwe. n saz bike, wê demê "ev" dibe hevalnav. Hevalnavên "ev" û "ew" hevalnavên xwerû ne û tîn ber navdêrên xwerû.

Mînak:

Ev gundî duh ji bajêr hatin.

Ev heval ji min re navê xwe nabêje. Ev malji mala me xweşik/il' e.

Ev kurik xwarziyê min e.

Ew kurik şagirtê min e.

Ev re: ê bavê min e.

Ew re: ê bavê min e.

Her wekî ji mînakan jî diyar e, hevalnava "ev" navdêrên nêzîk, "ew" jî yê dûr nîşan dide. Pirjimariya wan jî bi alîkariya lêkerê û cînavkên kesandinê tê zanîn.

Mînak:

Ev pêlav baş e. Ew pêlav haş in. Ev sêv sar e.

Ev sêv sor in. Ev çakêt nû ye. Ew kinc nû ne. Ev gore kevn in. Ev kum kevn e.

Min ev sêv xwm:

Te ew sêv xwarin.

Ev mirov diçin bajêr.

Ev keçik diçe dibistanê. Ev keçik diçin dibistanê.

Her wekî me di mijara cînavkan de jî dabû xuyakirin di zimanê gelêrî de "eve/eva" û "ewe/ewa" tê gotin, ji bo yê pirjimar jî "evana/evene" û "ewana/ewene" tê gotin. Dema ku ev cure cînavk dibin rengdêr ew qertaf derbasî navdêrên piştî xwe dikin. Dema ku mirov bala xwe dide cînavkên zaravayên din mirov dibîne ku ev formeke kevnare ye. Bo nimûne di soranî de jî cînavka şanîdanê "eme" ye. Lê vê formê di zimanê nivîskî de cih negirtiye, ji ber ku ew paşgir wekî bargiranî hatine dîtin, ji holê rabûne.

Mînak:

Ev mirove/ev mirova diçe.

Ev mirovana/mirovene diçin. Ev tişte/ev tiştta baş e.

Ev tiştana/tiştene baş in.

Ew kesana/kesene diçin ku derê?

Ew gundana/gundene bi destê kê hatin wêrankirin?

Di hin devokan de pirjimariya hevalnavan bi veqetandekan jî tê nîşandan.

Mînak:

Ev mirov yê baş e. Ev pêlav yê baş in. Ev sêv ya baş e.

Tewanga hevalnavên şanîdanê

Ev hevalnav, her wekî di mijara cînavkên şanîdanê de hate gotin, ditewin; qertafên tewangê "-P", "-ê" II "<an" digirin O "ev" dibe; "evi" (nêzîk-nêr), "evê" (nêzîk-mê), "evan" (nêzîk- pirjimar).

Ew jî dibe; "ewî" (dûr-nêr), "ewê" (dûr-mê), "ewan" (dûr-pirjimar). Di zimanê nivîskî de "e"ya destpêkê dikeve, ew jî dibin;

"vî", "vê", "van"; "wî", "wê", "wan".

Ev cure hevalnav navdêrên tewandî nîşanî mirov didin. Taybetiyeke hevalnavên şanîdanê yê tewandî ev e ku bi xwe re navdêrên li pey xwe jî ditewînin.

Mînak:

Min ji wî hevalî re got. Wê hevalê ji min re negot.

Wan hevalan li mala me nan xwm~ Vê keçikê ez nedîtim.

vî lawikî têr nan nexwar Van rebenan çî digot?

Rêgeza giştî ya ji bo tewangê ji bo hevalnavên şanîdanê jî derbas dibe. Yanê di lêkerên gerguhêz de, di demên borî de kirde, di demên niha û bê de jî bireser ditewe.

Mînak:

Min ev heval dit. Wî hevalî ez dîtîm.

Ez van hevalan dibînim. Ew heval min dibînin. Vê keçikê nan ani.

Ev keçik pirtûkan tîne.

Hevalnavên şanîdanê yê şibandinê

Celebeke din a hevalnavên şanîdanê heye ku mirov dikare wekî "hevalnavên şanîdanê yê şibandinê" bi nav bike. Her wekî; "wiha ", "wisan ", "wilo ", "halo ", "werê ", "hani", "weta "...

Mînak:

Çar xwişkên wî hene.

Du pismamên wî hatin. Pênc hevalên wî pê re çûn. Çil keziyên xwe şeh kirin. Du mihan hikire.

Heft riyên bide ber x\Ve. Çaryek nanî bixwe.

Ji pêncan yekê xwarinê min xwar. Du gîskan bifiroşe.

Hevalnavên jimarî li gorî taybetiyên jimarnavan ji hev cuda dibin.

1- Bi jimamavên bingehîn hevalnav:

Mînak:

Çar hevalên min hatin alikariya min. Du bûkên mala apê min hene.

Pênc xwarziyên min bi hev re dixebitin. Bi tîrekê du nîşan hildan.

Ciwanan li ber dibistanê bîst dar çandin. Di tewleyê de sed mehî û pêncî hesp hene.

Kî dikare şazdeb qesr û qonaxan di deh salan de ava bike?

2- Jimamavên rêzin berevajî jimarnavên bingehîn piştî navdêran

tên û bi veqetandek rîza navdêran nîşan didin.

Mînak:

Di salnameya kurdî de meha yekê (yekemîn) adar e. Di dersa çaran (çaremîn) de mamoste nexweş ket.

Min gava pêncan (pêncemîn) avêt, ez gihîştim ber dêrî. Di hejmarê sedî (sedemîn) de min xwe ji bîr kir.

Ez negihîştim hevalê sihî (sihemîn) da ku wî hişyar hikim.

3- Bi hejmarên şikestî ango dabeşkirinê hevalnavên jimarî Mînak:

Min du nan û nîv anîn malê. Bozên çaryek kîlo goşt kirî.

Ji sisiyan duyê xwarinê wi xwar.

Hevalnavên nebinavkirî

Cînavkên nebinavkirî dema ku têne ber navdêran dibin hevalnav. Mînak, gava em bibêjin, "Hinek mirov hatin vir. ", tête zanîn ku mirovin hatine, lê hejmara wan ne diyar e ango nebinavkirî ye. Her wiha dema ku em bibêjin, "Min piçek xwarin xwar" jî dîsa mîqdara xwarinê ne diyar e. Ji hevalnavên wiha re nebinavkirî hatiye gotin.

Mînak:

Hin berx li mêrgê diçêrin. Gelek kar hatin kirin.

Her zarokek bi aliyekî ve reviya. Filan hevalî ji min re got.

Tu mirov bêyî welat nikare bijî. Hemû gundî ji hozekê ne. Çend heval hatin mala me. Birek mirov li wir in.

Hevalnavên pirsyariyê

Ev cure hevalnav tên ber navdêran û ji wan pirsra hevalnavan dikin, ji ber vê yekê ev nav li wan hatiye kirin. Her yek ji hevalnavên pirsyarî pirsra cureyeke hevalnavan dike.

Hevalnava pirsyarî ku pirsra hevalnavên çawaniyê dike "çawa" ye. Di hevoka "Zozan hevaleke baş e " de ji bo naskirina heval navê divê em pirsra "çawa" arasteyî navdêrê bikin. Yanê em bibêjin; "Zozan hevaleke çawa ye?" Bersiva wê dê jixweber "baş" be. Her wekî tê zanîn "baş" li vê derê heval nava çawaniyê ye.

Di kurmancî de ji bilî peyva çawa gelek peyvên ku xwediyê heman wateyê ne, hene. Wekî; "çito ", "çilo ", "çerê ". I Jer wekî çawa em di mijara hevalnavên şanîdanê yên şibandinê de jî li ser rawestiyabûn, bêje hevedudanî ne. Ew ji bêjeya "çi" û peyvên "awan, lewn û tehr" pêk hatine. Her çi qas di zimanê devkî de ev peyv giş bên bikaranîn jî, di zimanê nivîskî de bi giranî "çawa tê bikaranîn.

Mînak:

Li bajêr bihayê nê giran e. Bihayê nê çawa ye? Giran e.

Zinar hevaleyê qenc e.

Zinar hevaleyê çawa ye? Qenc e.

Dara gûzê bilind e?

Dara gûzê çawa ye? Bilind e.

Her weki ji mînakên li jor jî diyar e, heval nava çawa yeke xwerû ye û natewe.

Jixwe hevalnavên ku pirsar "çawa"yê dikin jî xwerû ne, ji ber ku ew ji aliyê mêjer û zayendê ve ne guherbar in.

Hevalnava pirsyarî ya ku pirsar hevalnavên nîşandanê dike "kîjan"

e.

Mînak:

Ev hevalji gund nû hatiye. Kîjan hevalji gund nû hatiye? Ev heval.

Vî hevalîji min re navê xwe negot. Kîjan hevalî ji te re navê xwe negot? Vî hevalî.

Wan kûçikan nanê şivên xwm:

Kîjan kûçikan nanê şivên xwar? Wan kûçikan.

Ew mirov cihê xwe nizanin. Kîjan mirov cihê xwe nizanin? Ew mirov.

Hevalnava pirsyarî "kîjan" navdêra li dûv xwe ditewîne. Bo nimûne:

Kîjan hevalî got? Wî hevalî got.

Kîjan mirovan rexne li we girt? Wan mirovan rexne li me girt.

Kîjan keçikê navê xwe negot? Wê keçikê navê xwe negot.

Pirsa hevalnavên şanîdanê yên şibandinî jî bi hevalnava "çawa" û hinek hemwate yên wê tê kirin. Ew jî hevalnavên mîna; "wiha ". "wisan ". "wilo ", "halo n... ne.

Mînak:

Ez hevlekî wiha me. Hevlekî çawa? Hevlekî wiha me.

Xebata me her roj wisa ye. Xebata me çawa ye? Wisan e.

Ew nanê halo naxwe. Nanê çilo naxwe? Nanê halo.

Bajarî mirovên wilo ne. Bajarî mirovên çilo ne? Mi ro vên wilo ne.

Hevalnava ku pirsra hevalnavên jimarîn dike "çend" e. Mirov bi alîkariya "çend"ê hejmara tiştê hîn dibin.

Mînak:

Du sed karker ji kar hatin avêtin. Çend karker ji kar hatin avêtin? Du sed karker.

Du bira bi hev re ketin şer. Çend bira bi hev re ketin şer? Du bira.

Pênc zevî hatin avdan. Çend zevî hatin avdan? Pênc zevî.

Çar hezar gund hatin valakirin. Çend gund hatin valakirin? Çar hezar gund.
Hevalnava "çend" jî wekî "kijan"ê navdêrê ditewîne. Ji ber ku çend pirsra tiştên
pirjimar dike, mirov bi riya tewanga çendê mêjera navdêrê hîn dibe.

Mînak:

Çend zi/aman simbêlên xwe kur kirin? Tu çend gavan diavêjî?

Ez sê gavan diavêjim.

Ew çend nanan dixwazin? Ew sê nanan dixwazin.

Ji hevalnavên pirsyarî "çi qas" pirsra hevalnavên kuji aliyê mêjerê ve nayên
hejmartin dike. Hevalnavên nebinavkirî yên ku hejmara wan ne teqez e bi "çi
qas"ê tên pirsîn. Çend mînak ji bo vê hevalnava pirsyarî:

Çi qas xwarin ma? Piçek xwarin ma.

Çi qas karê me hate kirin? Hinek karê me hate kirin.

Her wiha hin caran hevalnavên j imarin jî bi çiqasê tên pirsîn. Mînak:

Çi qas dar hatin birîn? Sed dar hatin birin.

Çi qas mirov gihîştin cihê kar? Du sed mirov gihîştinê.

1 [er wiha bi hevalnava çiqasê asta payeya heval navê jî tê pirsîn. Mînak:

Çi qas mezin e? Pir mezin e.

Çi qas dirêj e? Piçekî dirêj e.

Tewanga çiqasê derbasî navdêrê dibe. Mînak:

Çi qas goştî bikirim? Çi qas avê vedixwi?

Nîşe: Tiştê ku xuya dike peyva "qas" ji "qiyas" a erebî hatiye, bêjeya xwerû bi kurdi "çend" e, ewjî ji peyvên "çi" û "hend" tê pêk hatiye. "Hend" Îro hi gelemperî bi dirûvê "hind" tê bikaranîn, bêjeya hevrûkirinê ya kurdî ewe. Ji bilî "çend" tê, di peyva "ewende" de Jî heman mantiq heye. Peyv ji "ew" û "hende" pêk hatiye. Cinavkên nebinavkirî "hin", "hinek" û qertafa nebinavkirinê "-in "]! ji heman peyvê tên.

Dengê J – peydabûn û ketina wê

Husein Muhammed

Herfa J / j di nivîsîna kurdî-latînî de nîşana dengê "paşpidûyî yê xişokê nevizok yê bilerz" e. Mebest ji "paşpidûyî" ew e ku derxistina wî li paşpidûyan e anku ziman ji pidûyan paşvetir bi devî dikeve. Mebest ji xişokiyê ew e ku dengêkî xişxişî yê hewayî ji gewriyê tê. Merema "bilerz" jî ew e ku di dema çêbûna vî dengî de perdeyên dengî dilerizin.

Li vê derê mirov dikare guh bide vî dengî:

http://en.wikipedia.org/wiki/File:Voiced_palato-alveolar_sibilant.ogg

Heman herfa J di fransî, portugâlî, tirkî û hin zimanên din de wek kurdî bo diyarkirina heman dengî tê bikaranîn. Di gelek zimanên Rojhilata Ewropayê ew deng bi herfa ž (Z-ya kumikek li ser) tê nivîsîn. Di transkripsiyonê de gelek caran di gelek zimanan de bi cotferfên ZH û hin caran jî cotherfên JH tê nivîsîn. Bi alfabeya dengnasî ya navneteweyî (IPA) ev deng bi nîşana [ʒ] anku bi Z-yeke çengal li bin tê diyarkirin.

Di alfabeya kurdî-erebî û alfabeya farisî de ev deng bi herfa ج̈ tê nivîsîn. Cudahiya wê ji herfa ج (Z) ya alfabeya erebî ew e ku di Z de nuqteyek li ser herfê heye lê di J de sê nuqte. Di zimanê standard yê erebî de ne ev deng û ne jî ti herfên taybet bo wî peyda nabin. Di alfabeya kurdî-krîlî û di piraniya zimanên krîlînivîs de herfa Ж (gir) û ж (hûr) bo vî dengî dihat nivîsîn.

Li aliyekî din, di inglîzî de J bi piranî bo diyarkirina dengê wek C ya kurdî tê nivîsîn. Bo nimûne, navê inglîzî "John" wek "Con" tê gotin. Di piraniya zimanên Bakur, Navend û Rojhilata Ewropayê de J bo dengê wek Y ya kurdî tê bikaranîn. Bo nimûne, bi almanî "ja" (erê, belê) wek "ya" tê gotin. Di bin tesîra van zimanan de, di IPA-yê de jî [j] bo diyarkirina dengê wek Y ya kurdî tê nivîsîn.

Peydabûn û rêjeya J

J di kurmancî de dikare li destpêk, nav û dawiya peyvê peyda bibe:

- destpêk: jin, jiyan, jar, jajî, jehr...
- nav: bajar, bejn, rijandin...
- dawî: dirêj, roj, gêj...

Li gor lêkolînên me¹¹, rêjeya herfa J di nivîsên kurmancî de 2 % e. Yek ji giring yên zêdehiya herfa J daçeka "ji, jê" ye ku pirr tê bikaranîn û wisa rêjeya herfa J di nivîsan de zêde dike. Herwiha peyvên "jin, jiyan, jîn" û formên wan yên çemandî vê rêjeyê zêde dikin.

Lê wek din J di kurdî de dengêkî nadir e û kêr peyda dibe. J herwiha hem di zimanên cîranên kurdî de (erebî, tirkî, ermenî, aramî) û hem jî yên lêzimî kurdî de (farisî, zimanên din yên hindûewropî) yan kêr e yan jî heta qet peyda nabe (bo nimûne di erebiya standard û di aramî de).

Peydabûna J ji dengên din

Ji aliyê dîrokî ve J di kurdî de jî dengêkî bi rêjeyî nû ye. Di zimanên kevn û navîn yên îranî de (avestayî, farisiya kevn, pehlewî) li cihê J ya kurdî bi piranî dengêkî din heye. Herwiha di nav zimanên nû yên îranî de jî, bo nimûne di farisî û zazakî de li cihê J ya kurmancî dengêkî din heye. Bi awayekî giştî mîrov dikare bibêje ku rewş wiha ye:

- kurmancî û soranî: J
- zazakî: C
- farisî û pehlewî: Z
- avestayî: Ç / C

Em dikarin çend nimûneyan bidin:

- kurmancî û soranî: jin
- zazakî: cinî
- farisî û pehlewî: zen
- avestayî: cinî-

¹¹ Husein Muhammed: Rêjeya herfan di nivîsên kurmancî de
http://nefel.com/kolumnists/kolumnist_index.asp?MemberNr=33

- kurmancî û soranî: roj
- zazakî: roc¹²
- farisî û pehlewî: rûz / roz
- avestayî: reoçeh-

Carinan jî J ji Ş yan S ye:

- kurdî: hejmar, jimare, jimartin, -jimêr-
- farisî: şumar
- peştûyî: şmêrêl
- sanskrîtî: smarati
- proto-hindûewropî: *smer-

Herwiha:

- "jidandin" ji "şidandin" ji erebî ji "şedde, şedîd"
- "cejn", bide ber farisî "ceşn", avestayî "yesne-"

Di maka zimanên hindûewropî de anku di proto-hindûewropî de li cihê van hemû dengan G yan K hebû. Paşî ew di îraniya kevn de bûye Ç û piştî hingê jî bûye C, Z yan J. Wek ku ji tabloya li jêr diyar e, ev deng hemû lêzimî hev in.

Heta niha jî gelek caran C di kurmancî de dibe J:

- "îja, îjar" ji "îca, îcar" ji "î-" + "car"
- "wijdan" ji erebî "wicdan"

Peydabûna J ji dengên din bi piranî dîrokî ye anku deng hin bi borîna demê re guherîne û bûne J.

¹² Forma zazakî ya standard li gor Koma Xebatê ya Vateyê "roj" e lê di piraniya devokên zazakî de "roc" e. Bijartina forma "roj" wek forma standard bi armanca nêzîkkirina zazakî li gel zaravayên din yên kurdî hatiye kirin.

J (sor) û lêzimên wê (şîn) li gel konsonantên din (reş) yên kurdî

CIH →	du- lêvî	lêvî- didanî	pidûyî	paş- pidûyî	ban- devî	paşdevî	ser- gewrî	zima- nokî	qirrikî
AWA:									
BÊVILÎ	m		n						
GIRTEK									
- bêlerz	p		t			k		q	?
- bilerz	b		d			g			
XIŞOKÊN									
VIZOK									
- bêlerz			s	ş		x			
- bilerz			z	j					
XIŞOKÊN									
NEVIZOK									
- bêlerz		f		ç			h		h
- bilerz		v		c					
JENOK			r						
TENGAV	w		l		y				

© Husein Muhammed 2014

Guherîna J bi dengên din

Ji aliyê dîrokî ve, J di kurmancî de dengê biserketî ye: wî cihê gelek dengên din girtiye û bergeha xwe berfireh kiriye. Hêsan e mirov nimûneyên ku tê de dengên din bûne J peyda bike. Lê zehmet e mirov peyvên xwerû yên wisa pêşkêş bike ku berê tê de J hebû lê niha bûye dengê din.

Dîsa jî ne tenê dengên din bi J diguherin lê carinan J jî bi dengê din diguhere. Hema-hema herdem ev deng Ş ye. Lê ev guherîn ne dîrokî ye. Ew ji encama çemîn û çemandina peyvê ye: J dengê bilerz e anku di derketina wî dengî de perdeyên dengî di gewriyê de dilerizin. Lê di kurdî de gava ku dengê bêlerz tê pey dengê bilerz, vî dengê bilerz jî li gel xwe dike bêlerz. Dengê giring yê bêlerz T ye (hevbera wê ya bilerz D ye). Gava ku ev T tê pey J, hingê J ji ber tesîra T dibe Ş:

- rehê dema niha "-kuj-" (di-kuj-im, na-kuj-im) + T → kuşt (ne "*kujt")
- rehê dema niha "-birêj-" (di-birêj-im, na-birêj-im) + T → biraşt (ne "*birajt")
- rehê dema niha "-rêj-" (di-rêj-im, na-rêj-im) + T → rişt (herwiha "rêt" lê ne "*rijt")

Herwiha carinan K ya bêlerz jî (ku hevbera wê ya bilerz G ye) J dike Ş:

- kurmanciya navendî: kîjan

- kurmanciya rojhilatî: kîşk
- kurmancî: mejî / mêjî
- soranî: mêşk (ne *mêjk)

Di hin devokan de (bi taybetî di behdînî de) jî "ji" ya daçek gelek caran tê kurtkirin ("i" jê dikeve) û "j" jî dibe "ş":

- ji malê → ş'malê
- ji niha ve → ş'niha ve

Dîsa "jî" (herwiha) ya kurmancî di soranî de wek "-îş" e:

- kurmancî: dest jî
- soranî: destîş

Varyantên J, C û G di peyvên ji ewropî de

Di kurdî de gelek peyv vê dawiyê ji zimanên ewropî hatine wergirtin. Di gelek ji wan peyvan de dengê J heye:

- biyolojî, jeolojî, jîlet, jîla, kronolojî, sosyolojî...

Di nivîsên kurmancî de bi piranî ev formên van peyvan yên serdest û standard in. Lê carinan mirov varyantên wan yên bi C yan G jî dibîne:

- biyolocî, ceolocî, cîlet, cîla, kronolocî, sosyolocî...
- biyologî, geologî, gîlet, gîla, kronologî, sosyologî...

Herwiha helbet di nivîsîna van peyvan de hin dengên din jî dikarin biguherin. Bo nimûne, "jîlet" wek "jîlêt" yan "gîlet" mîna "gîlêt" jî tê dîtin.

Formên bi J bi piranî ji tesîra frensî (bi rêya tirkî yan farisî) ne. Formên bi C ji inglîzî (bi rêya erebî) ne. Formên bi G dikarin bo nimûne ji rûsî, almanî, swêdî bin. Lê hemû formên van peyvan ew e ku ew ji peyvên yûnaniya kevn yan jî ji latînî hatine çêkirin. Di nivîsîna kurmancî de formên bi J serdest û standard in.

Ketina J

J carinan ji dawiya peyvê dikeve. Bo nimûne, peyva "roj" di gelek devokan "ro" ye. Peyvên ji wê çêkirî jî wek wê bê dengê J ne:

- rojhilat → rohilat
- rojava → roava
- Rojhat → Rohat
- Rojbîn → Robîn

Lê hin nimûneyên awarte jî hene:

- "rojname" nabe "*roname"

Di peyvên "îro / evro" û "nîvro" de formên bê J serdest û standard in, ne formên bi J (îroj / evroj, nîvroj) tevî wê jî ku forma xwerû ya serdest û standard "roj"

Herwiha rehê dema niha yê lêkera "gotin" anku "-bêj-" (di-bêj-im, na-bêj-im) di hin devokan de û di gelek devokên din de jî di axiftina sivik de bê J ye anku "-bê-" ye: "di-bê-m, na-bê-m".

J ji rehê dema niha yê lêkera "avêtin" jî dikeve:

- -avêj-: di-avêj-im, na-avêj-im → -avê-: di-avê-m, na-avê-m

Qertafên Diyarîyê

Ezedîn Rotîn û Ş.Dêrikî

Di vê nivîsê de mebesta me ji “diyarîyê” diyariya zayend û jimara navan e. Di zaravayê Kurmancî de sê komên bingehîn ên qertafên diyariyê hene. Yek; di ravekê de qertafên peyva raveber(veqantandek), dudu; qertafên tewangê û a sisêyan jî; qertafên bangkirinê(baneşan) ye. Gava ku raveber nebinavkirî be qertafên raveberê diguherin û dikeve formeke din. Em tîpên kelijandinê nejmêrin, ji vê xalê pê ve tu xalên awarte tune ne.

1) Qertafên diyariyê ên raveberê: Ku raveber binavkirî be mêbûn, nêrbûn û pîrbûna wan bi qertafên “a, ê, ên”, ku raveber nebinavkirî be mêbûn, nêrbûn û pîrbûna wan bi qertafên “(ek)e, (ek)î, (in)e” diyar dibin.

a) Raveber binavkirî be: a, ê, ên

Mînak: Min çêleka belek dot. Beranê kel dikira li min xista. Mirîşkên we tên hewşa me.

Îsal livaya berxan kême e. Bayê sor bi te keto! Deriyên malan vekirî bûn.

b) Raveber nabinavkirî be: (ek)e, (ek)î, (in)e. Di vê xalê de hin kes “ek” û “in”ê tevî qertafên ravebera nebinavkirî nakin. Wekî sedem jî dibêjin: “Ji xwe “ek” û “in” qertafên navdêrên nebinavkirî ne.” Rast e, ji xwe “ek” û “in” qertafên navdêrên nebinavkirî ne. Lê gava ku em di dersan de bibêjin “Qertafên navdêrên nebinavkirî ‘e’, ‘î’ û ‘e’ ne.” dê tevliheviyek çê bibe. Ji ber vê yekê divê em “ek” û “in”ê jî tevî qertafên ravebera nebinavkirî(veqetandekê) bikin.

Mînak: Çêlekeke belek, Beranekî kel, mirîşkine we

Livayeke baş, Gayekî xurt, Deriyine hesinî

2) Qertafên diyariyê ên tewangê: Gava navdêr ditewin mêbûn, nêrbûn û pîrbûna wan bi qertafên “ê, î, an” diyar dibe. Li vê derê xaleke hêjayî gotinê heye ku ‘piştî rengdêrên şanîdanê ên tewandî’ ne tê de Kurmancên bakurî hema hema “î” ya navdêrên nêr bi kar naînin. Xaleke din jî li gelek hereman tewîna hindurîn heye.

a) “ê”, “î” û “an”:

Mînak: Vê hevalê ji min re got. Vî hevalî nan ji me re anî. Van hevalan ez dîtîm.

Ez pîvazê diqêşêrim. Ez kevirî dişikînim. Ez bizinan diqusînim.

Patoza kayê îsal nehat. Bîna nêriyî tê. Divê em çarçoveyên deriyan sererast bikin.

b) Tewîna hindurîn: Ji ber ku têtîliya vê xalê mijara ne re tune ye, ez ê tenê mînakan bidim.

Mînak: Qiloçên berên (beranî) mezin in. Ava mêst (mastî) bi ser min de rijîya. Min nanê bajêr (bajarî) kirî. Dengê pêz(pezî) tê.

3) Qertafên diyariyê ên bangkirinê (baneşan): Di bangkirinê de mêbûn, nêrbûn û pîrbûn bi qertafên “ê”, “o” û “(i)no” diyar dibin. Di vê xalê de bahsa tîpên kelijandinê jî heye lê ji bo dirêj nebe em bahsa wan nakin.

Mînak: Hevalê, were ba min! Hevalo, te çi anî!? Hevalino, werin em nêr bixwin!

Derziyê, te xwe di çavê vî re kira! Birawo, birawo, te ez kuştîm birawo! Gundîno, malîno, hewar, hewar!

NÊRÎNÊN LI SER PEYDABÛNA ZIMÊN

Rûken Sarili

Gelo ziman çawa afirîye/afirîne?

Bi nêrîn û teoriyên cuda yên zimanzanan re, nêrîn li ser du esasan kom dibin.

1. Li gorî nêrîna yekemîn; Ziman ji çavkaniyeke îlahî tê û ev çavkanî yekane ye. Ango Xwedayî ziman ji mirovan re wekî diyarî daye û bi dayîna zimên, nirxên nû li nirxên mirovahiyê zêde kirine. Ji ber vê yekê jî dibe ku hemû ziman ji zimanekî zêde bûbin. Li gorî nêrînên gelek feylesof û zimanzanan, ji van kesên ku xwedî vê baweriyê ne re: “Monojenîst” tê gotin.

2. Li gorî nêrîna duyemîn; Ziman ji teoriyan pêk tê û ji çavkaniya îlahî nayê bawerkirin.

Ji kesên ku vê nêrînê diparêzin re: “Polîjenîst” tê gotin. Li gorî kesên ku li ser vê baweriyê ne; Mirovan cara yekemîn bi jest, mîmîk û liv û tevgera dest û milan xwe derbirîne. Paşê jî remz û derketina dengî, xwe spartine zimên, peyv derketine holê û ev pergala roj bi roj pêşve çûye, bi pêşveçûnê re berfireh bûye.

Lê nêrînên zimanzanan ên li ser afirîna peyva yekemîn, ji hev cuda ne. Ne pêkan e ku zimanzan bi hemû zimanan bizanibin. Kîjan ziman kevn e, di ser kîjan zimanî re çend sedsal derbas bûne..? Ev jî teqez nayê zanîn. Ji ber vê yekê çavkanî yek be jî, ji yekê zêdetir be jî, afirîna peyva yekemîn pir girîng e. Li ser afirîna peyva yekemîn, nêrînên cuda hene.

TEORIYA DENGVEDANÊ

Teoriya dengvedanê, ji aliyê Max Muller ve derketiye holê. Li gorî vê nêrînê; Mirovan bi dengvedana heyînên ku deng derxistine, ziman afirandiye. Ango dengên ku di xwezayê de ne, hatine remzkirin, peyv hatine çêkirin û axaftin dest pê kiriye. Dengên çûk û ajalên, dengên ewr û ezmên û dengê avê, ji bo afirîna peyvên modelekê radixe ber çavan. Li gorî teoriya dengvedanê; Xizmtiya zimanên jî bi dengên dengvedanê ve girêdayî ye û xwe dispêre vê yekê. Ji xeynî vê, ev teorî dengvedana peyv û dengên ku di zimanê zarokan de ne, wekî fermanê nîşan dide.

TEORIYA BANEŞANÊ

Li gorî vê teorîyê, peyvên yekemîn ji baneşanan pêk hatine. Mirovan reaksiyonên xwe yê yekemîn li hember bûyerên ku di cih de diqewimin, hestên wekî bêhtengbûn û şaşbûnê bi riya baneşanê derbirîne. Her wiha ev baneşan hatine dubarekirin û peyvên din ji xwe afirandine.

TEORIYA KARÎ

Li gorî teoriya karî, dema ku mirovan kar kirine û di wê dema ku kar hatine kirin de dengên ku derketine, ji mirovan re watedar hatine û ji wan dangan peyvên yekemîn afirîne. Ango çavkaniya zimên kar e. Dibe ku di vê rewşê de pêşî lêker derketibin û paşê ji lêkeran nav pêk hatibin.

TEORIYA DERÛNIYÊ

Ev teorî afirîna bingeha zimên bi deng, mîmîk û jestan diparêze. Kesên ku vê teorîyê diparêzin, zarokan mînak digirin û wiha dibêjin; “Zarok pêşî daxwazên xwe bi mîmîk û jestan derdibirin, dûre hêdî hêdî berê xwe didin peyvan.”

Her wiha mirovan wekî ku zarokek kifş kiribe, ziman kifş kiriye. Pêşî ji bo her dengê mîmîkeke paralel hebû. Ger ku wiha be, peyv ji mîmîk û jestan afirîne. Hestên cuda yên wekî birçîbûn û bextewariyê, pêşî bi mîmîk û pê ve girêdayî bi qîrîn û miremirê xwe nîşan dide. Paşê dengên yekîteyî û tevgerên destan derdikevin holê. Di qonaxa dawîn de jî bi sembolan ango bi peyvan tîr derbirîn. Dûre jî derbirînen bi wêneyî û nivîskî derdikevin holê.

TEORIYA HÎVÊ

Di sala 1922'yan de ev teorî ji aliyê zimanzanê Alman: Ernest Böklen ve hatiye diyarkirin. Li gorî nêrîna wî; Li hîvê hinek taybetiyên mîstîk hene. Mirovên yekemîn, teşeyên li ser rûyê hîvê şibandine devî. Wekî ku hîv axiviye fikirîne û bi remzkirina wê tevgerê teşe dane devên xwe. Her wiha peyvên yekemîn û ziman derketine holê.

RAVEK

Bahoz Baran

Peyvek, dema ku ji aliyê hinek peyvên din ve tê ravekirin, ravek derdikeve holê. Peyvên ku ravekirinê çê dikin êdî dibin qalib û nayên parçekirin. Di ravekê de du hêman hene, yek raveber e(rave dibe), yek jî raveker e(rave dike). Raveker ji aliyê wesf, rewş û mêjerê ve raveberê tamam dike. Raveber bêtir li pêş e, raveker li dawiyê ye.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
Deriyê	malê
Pirtûka	dibistanê
Keçika	mezin
Gula	sor

Weke ku ji mînakan jî diyar e, raveker raveberê ji hinek aliyan ve tamam dike. Ku di ravekan de wesfên rengdêran hebin ew ravek ravekên rengdêran in; ku peyv ji hinek aliyan ve bîn tamamkirin û diyarkirin, ravekên navdêran derdikevin holê.

Divê em diyar bikin ku di hinek ravekên rengdêran ên mêjerî, nîşanî û yên diyarkirî de cihê raveber û ravekerê diguhere, hêmanên rengdêrîn tên pêşî.

Mînak:

Çar zarok Ji sedî şêst kar

Vî lawikî nan xwar. Vê pirtûkê bistînin.

1. Ravekên Navdêran

Navdêrek dema ku ji aliyê navdêreke din ve bê diyarkirin, raveka navdêran çê dibe. Di raveka navdêran de du hêman hene: raveber, raveker.

Raveber: Hêmana ku ji aliyê ravekerê ve tê diyarkirin raveber e. Raveber ji bo ku bi ravekerê ve bê girêdan pêvekên hevbendiyê “-ê,-a -ên”ê distîne. Ev pêvek zayend û mêjera raveberê diyar dikin.

-ê→ nêr -a→ mê -ên→ pirjimar

Mînak:

Raveber Raveker

Bêhna nanî

Serê keçikê

Darên çiyayan

Nîşe: Dema ku du dengdêr bî bal hev tîpa alîkar ‘y’ tê bikaranîn.

Pîştî Pêvekên Nedyariyê Pêvekên Hevbendiyê

Pêvekên hevbendiyê, dema ku piştî pêvekên nediyariyê tên, diguherin.

Pêvekên nediyariyê ev in: -ek(Nedyar-Yekjimar→Ji peyva ‘yek’ê tê.)

-in(Nediyar-Pirjimar→Ji peyva ‘hin’ê tê.)

Minak:

Hevalek hat.

Hevalin hatin.

Piştî Pêvekên Nediyariyê Rewşa Pêvekên Hevbendiyê

<u>e (Mê)</u>	<u>-î (Nêr)</u>	<u>-e (Pirjimar)</u>
Dare <u>k</u> e me	Çiyayekî <u>bilind</u>	Darin <u>e</u> me
Hevale <u>k</u> e baş	Hevalekî <u>baş</u>	Hevalin <u>e</u> baş
Roje <u>k</u> e xweş	Deriyekî <u>vekirî</u>	Zarrokin <u>e</u> nerhet

Raveker: Hêmana ku raveberê diyar dike raveker e. Dema ku vî karî dike ew jî pêvekên diyariyê “-î, -ê, -an”ê digire. Ev pêvek zayend û mêjera ravekerê diyar dikin.

-î→ nêr

-ê→ mê

-an→ pirjimar

Mînak:

Raveber Raveker

Destê yekî

Sêva jinikê

Ezmûnên dibistanan

Li Gorî Teşeyî Ravekên Navdêran

- A. Ravekên Resen:** Ji du hêmanan pêk tên, yek ji wan raveber û yek jî raveker e. Raveberpêvekên hevberpêvekên digire; raveker jî pêvekên diyariyê digire.

Pêvekên Raveberê

-a

-ê

-ên

Pêvekên Ravekerê

-ê

-î

-an

Mînak:Dara tuyêSerê yekîDarên gûzan

Eger raveker ji peyveke nêr pêk hatibe û tê de tîpên 'a,e'yê hebin, ew tîp dikarin bitewin û bibin 'ê'.

Mînak:Kevirê dîwêrDeriyê xênî

- B. Ravekên Hevalbend:** Di van ravekan de raveber an jî raveker ji du hêmanan pêk tên. Di ravekên bi vî hawî de hewce nake ku pêvek du caran bî bikaranîn, peyva dawiyê bê diyarkirin bes e.

Mînak:Derî û kevîrê xênîDest û piyê me

Kevirê dîwar û çiyayî

Gula kulîlk û darê

Hişyarî: Dema ku tîpa dawî ya peyvan bi "î"yê û "ê"yê bi dawî bibe, hewce nake ku careke din ew peyv pêveka diyariyê bigirin.

Mînak:

Milê derî

Bingeha xanî

Mala Zînê

Hişyarî: Carinan peyvên nêr û mê bi hev re din nava ravekekê de cih digirin, di vê rewşê de peyva dawî tenê tê diyarkirin.

Mînak:

Çîmento û kevirê dîwarî

Destê Hesên û Zeynebê

- C. Ravekên Girêdayî:** Du an pirtir ravekên navdêran dikevin nava hev û bi hev ve tînan girêdan. Divê di çêkirina ravekên girêdayî de du ravek hebin.

Mînak:

Pelên darê+ Dara Gûzê= Pelên dara gûzê

Hêviyên jiyane+Jiyana wî= Hêviyên jiyana wî

Enstituya Kurdî+ Enstituya Amedê= Enstituya Kurdî ya Amedê

Nîşe: Ku peyvên rengdêrî bikevin nava ravekê û peywendiyê bi wesfekî din re çê bikin, ew cure ravek nabin yên girêdayî. Ji ber ku li holê tenê ravekek heye, peyva rengdêrî tenê pêwendiyê çê dike. Di van ravekan de pêveka hevbendiyê ya duyemîn dikeve rola pêwendiyê û cuda tê nivîsîn.

Mînak:

Şaredariya Amedê ya mezin.

Kurê Leylayê yê biçûk.

Pirtûka wî ya li dibistanê

2. Ravekên Rengdêran

Navek dema ku ji aliyê rengdêrekê ve bê diyarkirin, raveka rengdêran çê dibe. Di raveka rengdêran de jî du hêman hene: raveber, raveker.

Raveber: Hêmana ku ji aliyê ravekerê ve tê diyarkirin raveber e. Raveber ji bo ku bi ravekerê ve bê girêdan pêvekên hevbendiyê “-ê,-a -ên”ê distîne. Ev pêvek zayend û mêjera raveberê diyar dikin. Bervajiyê ravekên navdêran, ravekerên rengdêran pêvekên diyariyê ‘-î, -ê, an’ê nagirin.

Mînak:

Raveber

Raveker

Dilê

jar

Sêva

sor

Guliyên

zirav

Ava

sipîsar

Raveker: Hêmana ku raveberê ji aliyê wesf û mêjerê ve diyar dike raveker e. Rengdêr dema ku hêmanekê diyar dikin pêvekên diyariyê '-î, -ê, an'ê nagirin. Tenê di awayê nîşanî de wan pêvekan digirin.

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
----------------	----------------

Mala	<u>xweş</u>
------	-------------

Gundê	<u>vala</u>
-------	-------------

Keçika	<u>rind</u>
--------	-------------

Nîşe: Dema ku rengdêrên hejmarî û nîşanî derdikevin holê raveber û raveker cih diguherin.

Mînak:

<u>Raveker</u>	<u>Raveber</u>
----------------	----------------

Çar	zarok
-----	-------

Ji sedî çar	erd
-------------	-----

Ev	kuri
----	------

Ew	keçik
----	-------

Di ravekên rengdêrên nîşanî de ku diyarkirin hebe raveber û raveker bi hev re pêvekên diyariyê digirin.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
----------------	----------------

<u>Vî</u>	lawikî
-----------	--------

Wê keçikê

Wan hevalan

Ji Aliyê Teşeyî ve Ravekên Rengdêran

- A. Ravekên Resen:** Ji raveber û ravekerê pêk tên. Raveker ji aliyê wesf û mêjerê ve raveberê diyar dike.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveber</u>
Dara	mezin	Ev	lawik
Gula	zer	Çar	nan
Deriyê	şîn	Pênc	pirtûk

- B. Ravekên Hevalbend:** Li holê raveberê û çend raveker hene. Ew raveker, bi raveberê ve girêdayî ne. Di van ravekan de ji bo girêdanê pêvekên pêwendiyê, daçek û gihanek pir tên bikaranîn.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveber</u>
Sêva	bi bêhn û xweş	Ji sedî pênc	erd
Deriyê	hesin ê mezin	Hebik û nîv	nan
Hevalê	qenc ê dirêj	Du mîtro û nîv	qablo

Nîşe: Rengdêr weke ku me li jor jî destnîşan kiribû carinan di nava ravekên navdêrîn de jî cih digirin.

Mînak:

Şaredariya Amedê ya mezin

Keçika Leylayê ya biçûk

- C. Ravekên Lêkernavî:** Li holê raveber û ravekera ku ji gellek hêmanên pêk hatiye heye. Di ravekerê de lêkerek di peywira rengdêre de tê bikaranîn û dibe lêkernava rengdêrîn. Gihanek û daçek jî di van ravekan de pir tîn bikaranîn. Ev qalib nayên parçekirin, weke hêmanekê ne.

Mînak:

Pirtûka ku te ji min stendibû li ku ye?

Mala ku li ber çavên me şewitîbû hat çêkirin.

Nanê ku ji destê lêwik kete erdê êdî nayê xwarin.

Xaniyê çêkirî, nabin ji me re.

ÇEWTIYÊN KU TÊN KIRIN

Dema ku em bala xwe didin nivîsên heyî em dibînin ku di vê mijarê de gellek çewtî tîn kirin. Carinan pêvek kêmtîn nivîsîn, carinan şaş tîn nivîsîn. Gellek caran di awayê rastnivîsê de pirsgerêk derdikevin holê.

1. Pêvekên diyariyê yê ravekerê kêmtîn tevlihevî derdikeve holê, gellek caran ev çewtî tî kirin, carinan jî ravekên rengdêrîn û yê navdêrîn tîn tevlihevkin:

Mînak:

Azadiya mêr Azadiya jin Hunermendê berxwedan

Jiyana şêr Bandora muzîk Pirsgirêka Kurd

Odeya meqam Têkoşîna jin Nexweşiya çav

Dema ku em pêvekan li van ravekeran zêde nekin, tevlihevî çê dibe. Di herdu mînakên ewil de ‘azadî’ dibe jin an jî dibe mêr û raveka navdêran weke raveka rengdêran xuya dike. Di rewşên wisa de em bêtir pêveka pirjimariyê ‘an’ê bi kar tînin. Ku kesek bê qestkirin em dikarin pêvekên ‘î’ û ‘ê’yê lê zêde bikin. Lê ev awa di Kurmacyî de hindik tê bikaranîn.

Awayên rast divê weha bin:

Azadiya mêran/mêrî Azadiya jinan/jinê Hunermendê
berxwedanan/berxwedanê

Jiyana şêran/şêrî Bandora muzîkan/muzîkê Pirsgirêka Kurdan/Kurdî

Odeya meqaman/meqamê Têkoşîna jinan/jinê Nexweşiya çavan/çavî

2. Divê pêveka mê ya ravekerê bê bikaranîn, gellek caran em dibînin ku ev pêvek nayê bikaranîn. Bêtir di helbest û stranan de ev çewtî pir tê kirin.

Mînak:

Azadiya Kurdistan

Kesên li Swêd

Festîvala Zîlan

Rûpela cîhan

Pêveka mê ya diyariyê divê di ravekan de bê bikaranîn. Guhdarekî/e Kurd pir bi rehetî dê fêmbike ku ev hevok ne li gorî bilêvkirina Kurdî ne. Divê ew hevok weha bin:

Mînak:

Azadiya Kurdistanê

Kesên li Swêdê

Festîvala Zîlanê

Rûpela cîhanê

3. Pêveka ravekerê ya nêr gellek caran nayê bikaranîn. Lê divê ji bo zimanekî bipergal û xurt divê êdî em wê jî bi kar bînin.

Mînak:

Hevalê Hesenî

Qalikê nanî

Goştê gayî

Devê gurî

4. Pêveka diyariyê ya pirjimar 'an' jî gellek caran kêmtê nivîsîn.

Mînak:

Min pirsê dewara kir.

Wan hevala got.

Dengê zaroka xweş tê.

Divê em di nivîsê de wê biparêzin û binivîsin:

Min pîrsa dewaran kir.

Wan hevalan got.

Dengê zarokan xweş tê.

Tesîra erebî û soranî li ser kirmanciya Dihokê

Zinarê Ednanê Melleyî

Min bertir got ku kirmanciya Dihokê keftiye bin bandora erebiyê û soraniyê. Ez dê evro hindek behsa wê bandorê bikim. Helbet bandora wan li ser peyv û nijar û derbirînên kirmanciya Dihokê diyar e. Lê ez dê evro taybet li ser peyvan binivîsim.

Ev ji 1000 salan bitir e ku diyaneta îslamê hatî nav me. Ji ber ku zimanê îslamê erebî ye û cîranên me jî ereb in, me bivêt nevêt, bandor dê her hebit. Ez niha behsa diyanetê nakim. Ez dê carekê taybet li ser wê binivîsim. Lê ez dê behsa bandora cîrantiyê bikim. Bab û bapîrên me peyvên cîranên me mîna bûkan bi kiras û rengên kurdî înan nav mala me. Lê me di van salan da peyv bi reng û kirasên wan yê resen înan nav mala xwe û danan serê malê. Ji wê kambaxtir; me ew kirasên bab û bapîrên me li wan peyvan kirîn ji ber wan kirin û kirasên wan yê berê careka dî li wan kirin. Bab û bapîrên me digot “te’sîr” an jî “tesîr”, lê gelek kes niha dibêjin “tesîr” (bi S ya fis). Gelek kes niha dibêjin: tewazi’, remedan, rîda’, htd (yan’ tamam wek’ ereban dibêjin). Nimûneyên weha mişe ne. Bandora erebiyê li ser kirmanciya Dihokê bes nebû, ya soraniyê jî hat ser. “Xwe” ya kirmanciyê di soraniyê da “xo” ye. Ji ber ku Dihok nêzîkî deverên soranan e, gelek kes li Dihokê û dewrûberên wê jî dibêjin “xo”. “Kênc”, “bandor” û “tesîr” bûn “karîgerî” û “kartêkirin”, “reng” û “awa” bûn “şêwe”, “ferq”, “cida” û “cidahî” bûn “ciyawaz” û “ciyawazî”, “guhorîn” bû “gorankarî”, “çima” bû “boçî”, “dijwar” û “dijwarî” bûn “tund”, “tundrew” û “tundûtîjî”, “varê” bû “yaxî”, “piştewanî” bû “piştgîrî”, “piştgermî” bû “piştbestin”, “berevanî” bû “bergirî”, “dem” û “gav” û “çax” û “heyam” jî bûn “mawe”, htd. “Gozar” û “yaxî” û gelek peyvên dî yê farisan jî bi xêra soraniyê hatin nav kirmanciya me. Min dît ku “spasdarî” jî bû “supasgozarî”. Helbet ev hema hindek reşreşk bûn. Mirovî jibo nivîsîna wan dem û biyav divên.

Seydayê min, Edîbê Çelkî, “kênc”ê dinivîsit. “Kênc” niha zêdetir di warê pizîşkiyê da diêt xebitandin. Dema endamekê leşê zaroyekî diêşt, dayika wî dipirsit ka kî dera wî bertir tûş bûye. Ew dibêjt zaroyê xwe: ew êşan “kênc” (=bandor) a birîna berê ye. Van şeş mehên borî, hindê ciwanên gundî bûbûn hevalên me. Axivtina wan gelek şîrîn e, ew bi rastî şekirê dişkînin. Lê mixabin ku ew zimanê xwe kêm û nehejî dibînin. Ew xwe ji bo têbîniyên ser feysbûkê jî çav li kirmanciya navenda Dihokê dikin. Min pirsyara peyva “zor”ê ji yek ji wan kir. Wî got: “zor” yanî “gelek”. Lê “zor” di soraniyê da yanî “gelek”. Ew di kirmanciyê da manaya “gelek”ê nadit. Ew mana ya “zehmet”ê, “tadarî”yê û “kotekî”yê didit. Em dibêjin: “ez bi zorî dişem karê xwe bikim”, “ew zordar e”, “evîn zor e”, htd. Me êdî “mejî”yê xwe jî winda kir. “Mejî” jî bû “mêşk”. Ji xwe dema zaroyek nehewyêt, em dibêjin: “mêşka hatî wî”. “Mêşk” di kirmanciyê da ji bo dewaran jî diêt gotin. “Dabeşkirin” û “têper” jî di kirmanciyê da manayên gelek kirêt didin.

Dibê em peyvên xwe yên resen winda nekin. Bila ew peyvên ji mêje hatî nav zimanê me û cihê xwe kirî bimînin. Bê wan her nabit. Lê îrana peyvên nû û têkhelkirina zaravayan bi koretî xetereka mezin e. Dibê têkhelkirin ji herdu aliyên ve bit.

Min berî niha got ku bandora erebiyê û soraniyê li ser kirmanciya Dihokê ne tenê di peyvan de diyar dibit. Ew di nijar û derbirînan de jî diyar dibit. Her zimanekî destûra xwe heye. Lê zimanê kurdî zêde kevtiye bin bandora zimanên serdestan. Erebiyê bandoreka yekcar mezin li ser kirmanciya me heye. Bandora erebiyê heta ser hestiyên me jî çûye. Kirmanciya rojavayê jî kevtiye bin bandora erebiyê. Herwekî ku kirmanciya bakûrê kevtî bin bandora tirkîyê. Li dû nijara kirmanciyê, dibê kirde anku biker li pêşiya hevokê û lêker anku kar li paşiya hevokê bit. Hindê kes dibêjin: alayê Kurdistanê pêk diêt ji çwar rengan. Ev li gor destûra kirmanciyê nîne. Dibê em bibêjin: alayê Kurdistanê ji çwar rengan pêk diêt. Tiştên weha di kitêbên Dihokê jî de mişe bi ber çavên mirovî dikevin. Xwe seydayên pişkên kurdîyê jî van şaşiyên dikin.

Gelek ji nivîserên Dihokê nivîsarên xwe li ser bingehekê erebî dinivîsin. Berî heyamekê, hevalekî kitêba xwe ji bo kesekî kir diyarî. Wî li ser kitêbê nivîsî, “diyarî ye bo seydayê hêja filanî. Di gel rêzgirtinê”. Dema min ji wî pirsî ka çima wî bi kurdî nenivîsî, ew kenî. Min got wî: peyvên te bi kurdî ne, lê derbirîna te bi erebî ye. Herwekî te nivîsî, “hediye îla ustadî elezîz filan me’e ihtiramî”. Arêşeyeka dî ya bandora erebiyê li ser kirmanciya me nehêlana doxê tewandinê ye. Hindê hevalên me yên mizûrî dibêjin, “filan got”. Ew qet nabêjin “filanî/filanê

got". Yanî doxê tewandinê li nik wan nemaye. Ev bandor li ser deverên dî jî heye. Romannivîsê me yê hêja, Hesenê Birehîmî jî weha dinivîsit. Dihokî bi erebî bazirganiyê bi dikan û mal û milkê xwe jî dikan. Xelkê me li ser dîwaran dinivîsit "dikan bo kirê, xanî bo firotinê, htd." herwekî erebek dinivîsit "dikan lîlîcar, beyt lîlbey', htd."

Xema destûr û rêzimanê ji xema peyvan hêşta girantir e. Dema xwîndkarên min ên rojavayî ji min dixwast ku ez dersê ji wan re bişerhînim, keyfa min gelek dihat. Herçende ferhenga kurdên rojavayê zêde kevtiye bin bandora erebiyê, lê wan destûr û rêzimanên kirmanciyê gelek baş parastine. Ew dîtin û nêrînên xwe bi peyvên kurdî û erebî li ser nijareka kirmancî ya xweşik dinijînin. Çarekirina ferhengê ji ya destûr û rêzimanê gelek sanehîtir e.

Ez nabînim ku soraniyê bandoreka weha mezin li ser vî warê zimankî yê kirmanciya me hebit. Kirmancî û soranî du zaravayên zimanê kurdîyê ne. Cidahiyan navbera zaravayan ji cidahiyan navbera zimanan bi xwe biçûktir in. Lê Soraniyê bi wan cidahiyan biçûk jî gelek tesîr li vî warê kirmanciya me nekiriye. Reng e jî sedema wê ew bit ku soranî ji nû weha xort bûye. Kirmancên Hevlêrê û Akreyê û hindêk deverên dî yên nêzîkî soranan ji yên hêrvetir bitir kevtîne bin bandora soraniyê. Lê ew bandor êdî ber bi belavbûnê ye. Ji ber nebûna delîveyê, ez niha çî nimûneyan nadim. Lê ez dê car bi car li ser van tiştan binivîsim.

hindêk kes vê atafê baş dibînin. Ew dibêjin ku ev ji bo hevgirtina zimanî û peydabûna zimanekê pîvankî baş e. Lê ez weha nabînim. Ev ne têkhelebûn û hevgirtin e, ev serdestbûna soraniyê û bindestbûna kirmanciyê ye. Dibê em rêyê li vê atafê bigirin.

Awirêkî kurt Le helumercî zimanî Kurdî be giştî û Rojhelatî Kurdistan be taybetî

Baban Seqizî

Pêşekî

Be zimanêkî sakar û sade, mirovayetî be giftugo le yekdî tê degen û zimanîş rabirdû û êstay komellga be yekwe peywend dedat. Boye ziman her le dstipêkî mêjûy mirovaytî, zîndûtrîn û pir remizu raztirîn dyardî hezrîy û ramanî mirovaytî buwe û heye.

Ziman awênî ferhengîy û mêjûy komllane, ke firetir le her dyardîkî tir çend û çonî hellsukeut û kirdarî komellga derdxat. Detwanîn billên: ziman, roh û rewanî mirovayetîye.

Zimanewanan bawerryan waye ke ziman, sîstimêk le nîşanekane, ke komellêk le mirovekan le serî rêk kewtûn û wek emrazêk bo derrbirrînî boçûn û raman be sûdiwergirtin le dengî dyarîkiraw bekarî dênên. Kewate ziman yekêk le bunyadekanî yekcar girîngî jyane, boye be degmen mirovêk peyda debêt ke le qisekirdin be zimanî daykî xoy, çêj wer negirêt, serrerray ewe ke zimanekanî tirîş fêr bûbêt û beseryanda zall bêt, bellam zimanî hest û nestî, her zimanî zigmakye ke bo yekemcar lew rêgawe zimanî depişkwêt.

Xoy seretayîtrîn mafî her mirovêk eweye ke be zimanî daykî xoy qise bikat û binûsêt û bixwênêtewe. Katêk em mafe le mirovêk bêbeş bîkrêt, tunditrîn zebir le bwarî derûnî, kesayetî û hizrî pêy degat. Dabirran le zimanî daykî, ew kese bo hemîşe tûşî kêşe dekat û peywendî le nêwan bîrkirdin û qisekirdinî lenaw debat û twana û petansyelî kem ekatewe.

Eger le astêkî berfirawantir seyrî keyn, minallanî ew geley ke mafî perwerdeyan be zimanî zigmakî nîye, astî perwerdeyan lexwareweye û geşekirdinî ferhengîşyan nizme, ca têkişkanî

kesayetî û lenawçûnî nasnameşyan bimênêt ke le diway çendîn bere, îdîndîtî ew gele asîmîle û lenaw deçêt.

Bêguman nasnamey her takêk detwanêt çendha şit bêt, wek: nasnamey dînî, nasnamey komellayetî, nasnamey twêj û çîneyetî, nasnamey regezî û... hî tirîş, ema girîngitrîn nasname, nasnamey zimane, çun pêş ewey ke mirov pey be nasînî ewe bibat ke çe dînêkî heye, çe regezêkî heye, kîjan twêj û çîne û le astî komellayetî nedare ya zengîne û tenanet le kam willate û pasportekey hî kwêye, nasnamey zimanîye. Boye fîlsufan û zimanewanan bawerryan waye ke mirov le xanûy ziman bîr dekatewe û zimanî daykî bes zimanî peywendî nîye, bellkû zimanî daykî, zimanî dill û hest û sirûşe. (Haydgir – Allmanî)

Lay her mirovêkî azadîxwaz û dîmukirat aşkiraye ke ziman nek hereşe nîye, bellkû gencîne û samanêkî bê sinûre ke astî pênasekirdinî, le pirdî peywendî nêwan mirovekan berfirawantire. Be kurtî zimanî daykî girîngitrîn pêname, diruşim û regeznamey neteweyeke. Baştirîn bellge Fînîqyekanî Lubnan û Surye, Egbitekanî Mîsr, Berrberrekanî Merakêş û Cezayer, deyan tîre û binemalley Kurd le Êraq û Suryen, ke zimanî xoyan le dest dawê û bûn be Aereb û wek mamosta Hejar debêjêt: le Aerbîş aerbitrin.

Awrrêkî xêra le zimanî Kurdî

Kes natwanêt hhaşa leme bikat ke sirûd û tîkstekanî pîrozî Zerdeşt be taybet sirûdekanî Gatay Avêsta, be zimanî Madî buwe. Sererray hemû çewaşekaryek ke le layen dagîrkeran û rojhellatinasî rojawayî û birrêk Cûlekewe le ser zemanî peydabûnî Zerdeşt kirawe, bellam hemû bellgekan ewe desllimênêt ke Avêsta tîkstêkî Madî buwe û ser be zimanî Kurdîye û be pêçewaney ewey ke zimanî Avêsta, zimanêkî mirduwewe û nemawe, êsta le naw dû şewe zimanî Hewramî û Zazayî mîratî yekcar berçawî becê hêştuwe. Nûserî le pertûkî “Mêjûy Mad” nûserî rûs Dyakonof, ewîş bawerrî waye ke zimanî tîkstekanî Avêsta, zimanî Madî buwe.

Pilînusî Romî, le sallanî 23 79 . pêş zayîn, le bergî 3 le pertûkî, Mêjûy Xorrsik, denûsêt: Zerdeşt le binemalley Made û Avêstay be zimanî Madî nûsîuwe. “Herodot”îş dellêt, le netewey Mad ke nawyan le berdînûsekanî bizmarî Bêstûnîş hatuwe, zimanî Gatakan zimanî Madekan buwe.

Mînorsikî bawerrî waye hemû zarawekanî êstay Kurdî, le mêjûyekî dêrînî behêz serçawe degirêt ke ewîş zimanî Madekan e.

Hrtisfilld, Darmistitr û Mécerson, hemûyan bawerryan waye ke serçawey zimanî kurdî, Madîye.

Mamosta Gîw Mukiryani dellêt: kontirîn pertûkî Kurdî nawî Dînkurd ya DînKurd ke be zimanî Pehlewî (Pallewanî) nûsrawe ke zimanî Lurrî û Kelhorî û şwanane. Azerbud le paş hêşî supay îslam debêjêt: min ke Azerbud, kurî Hemed û pêşeway Badînanim, pertûkî DînKurdim le kagheze dirrawekan ko kirdewe û be alîkarî Xuday dilovan hemûyanim nûsînewe.

Bêguman xallî girîng le katî lêkollînwî Avêsta brçaw dekwêt, wêkiçûnî jimarîkî zor berçawî wajekanî êstay Kurdî û Avêstaiye ke be asanî dekirêt diway têprbûnî hezaran sall, hêştâ binasrêwe.

Xallî zor ballkêş le wirûjandinî em layeney zimanî Kurdî eweye ke zimanî dara û zengînî Kurdî lew katewe ke le zimanî ayîn û felsefey Behdînyewe be zor dabirra, îdî ew pîrozî û girîngî pêşûy xoy nema û bû be zimanêkî lanewaz û bêkes. Hawkat be pêçewane lew katewe ke ziman û nûsînî Aerebî bû be zimanî ayînî pîroz û zimanekanî Turkî û Farsî bûn be zimanî desellatdarî û fermanrrewayî, îtir resenî û zengînî zimanî Kurdî şarawe ma.

Bêguman hatin û rîmanî împiratorakanî coracor le Mîzupatamya û rojhellatî nawerrast û rûdawekanî mêjûiy, koçkirdin û be taybet ledaykbûnî ayînekanî cyawaz, fakiterekani serekîn, ke dewrî ballayan hebuwe le pirj û billawbûnewe û nehêştin û zallbûnî zimanêk be ser zimanêkî tir.

Bellam zimanî Kurdî emrro be dirêjayî mêjû, be hoy gorranî barî komellayetî, ramyarî, abûrî, herrêmî, dirawsê û dagîrkeranî coracor, hawkat pan û berîn bûnî willatî Kurdistan le barî cughrafyayî, û dabirran û parçekirdinî Kurdistan le sedekanî 17 ta seretakanî sedey 20 yş, goranî zorî beserda hatuwe û fakiterekani serekîn bo hebûnî zarawekanî rengawrrengî zimanî êstay Kurdî.

Xane û şwênî zimanî Kurdî

Dekirêt bêjîn zimanekanî Hîndî wek: Pencabî, Beharî, Bengalî, Bakiratî, Racasanî û Hîndî rojawa û rojhelatî. Yan Derî, Belûçî, Esîtî, Tacîkî, zimanekanî Pamîr û Piştû û Ourdu letek zimanî Kurdî lenaw xêzanêk cêgayan bibêtewe, bellam qebillandnî ewey ke zimanî Kurdî zaraweyek ya likêk lew zimananeye, be dillnyayî helleye.

Boye pêwîste dillnya bîn ke be pêçewaney ew boçûnane ke pênasey zimanî Kurdî, be likêk le zimanekanî Êranî û ya ser be Farsî bêt be helle bizanîn. Be pêwîstî dezanim amaje be çend zimanewanî biyanî bikem ke ewanîş berperçî ewe deden ke zimanî Kurdî likêkî Farsî bêt: Jan Dumrigan, bawerrî waye ke zimanî Kurdî zarawey Farsî nîye bellkû zimanêkî taybete, ema letek Farsî deste xoşke û le farsîyş kontir e.

Firdirîk Mulêr debêjêt ke zimanî Kurdî be hîç şêwe le zimanî Farsî negîrawe, sererray ewe ke le barî rêzmanî û waje nizîkayetyan letek yek heye, bellam Kurdî taybetmendîhaykî xoy heye ke tenha taybet be zimanî Kurdîye û bawerrî waye ke lenaw komelle zimanekanî Êranî bedî nakirêt.

Sîdnî Sîmîs dellêt ke zimanî Kurdî le Farsî zor kontire û ewîş nûsrawekanî bizmarî Bêstûn be mîratî zimanî Kurdî dezanêt.

Herwehaş pirofsorî Emrîkî, Rabirt Kînit le sallî 1953 nûsrawekanî bizmarî Bêstûnî kirde latînî û Mîrweysî, mamosta Kurd le Emrîka, le berawerdî letek zimanî Kurdî emroy kird û derkewt ke berdinûsekanî bizmarî Bêstûn zor xomallîtir leweye ke mezeney dekira. Mîrweysî le pertûkî “Gerranewe bo Mîdyay” debêjêt: Darîwş patşay Hexamnşî, sererray ewey ke êmpiratorî Mîdyay rûxand û dû berekî xiste naw glanî Arî, bellam karêkî başî kird û zimanî Arîy be nûsrawe le Bêstûn wek bellgey hhaşahellnegir bo êmey becê hêşt. Ê le nûsrawkey Darîwş dellêt eme zubanî Arîye û wek çawî xotan bîparêzin.

Zarawekanî zimanî Kurdî

Willatî Kurdistan herweha ke bist be bistî, mêjûy çend hezar sallî le xoy hheşar dawê û willatêkî dêrîne, gund be gund, nawçe be nawçe, mellbend be mellbend û herêm be herîmîşî, awa le zarawê û şêwezarî cyawaz zengîn û dewllemende û detwanêt nawndî lêkolînewye bêt bo zmanewanan. Her boye mêjûnasan û zmanewananî bêgane û xoyî, zimanî Kurdyan be çend zarawey serekî dabeş kirduwe, wek:

Şerefyanî Bitlîsî zimanî Kurdî be 4 zarawey Kirmancî, Soranî, Kelhurrî û Lurrî dabiş kirduwe. Mînursikî le ser cughrafyay Kurdistan, zimanî Kurdî be 3 zarawey Başûr û Rojawa û Rojhellat dabeş kirduwe.

Tewfêq Wehbîş zimanî Kurdî be 5 zarawey dabeş kirduwe: Kirmancî bakûr, Kirmancî başûr, Lurrî, Goranî û Zazayî.

Muhhemedemîn Zekî Beg,îş be 4 zarawey dabeş kirduwe: Kirmancî, Kelhurr, Goran, Lurr. Mamosta Mehemed Xallîş herweha be 4 zarawey Zazayî, Kirmancî rast (Soranî, Babanî, Mukiryani, Erdellanî, Kelhurrî, Goranî), Kirmancî çep (Bakûrrî, Botanî, Badînanî, Hekarî, Bayezîdî, Şemdînanî), Lurrî (Bextyarîy, Lekî, Feylî) dabeş kirduwe.

Bellam baştirîn rêgay zanstî bo desnîşan kirdinî zarawekanî Kurdî, çonyetî rêzman, wişe û nirxandinî fonetîk ya belêwkirdinî zarawekanî Kurdîye. Zorbey lêkolîneran, zimanewanan, û mêjûnasanî byanî û xoyî kokin le ser çwar zarawey serekî. Willatî Kurdistan çon be çwar parçe dabeş kirawê, zimanî Kurdîş gwaye çarenûsî wek willatekey, be 4 zarawey serekî dabeş buwee: 1. Kirmancî jûrû, 2. Kirmancî xwarû, 3. Goranî û Zazayî, 4. Lurrî û Kelhurrî

1. Mellbendekanî Kirmancî jûrû

Be pêy jimarey axêweran, gewretrîn zarawey Kurdî Kirmancî jûrwe. Şar û mellbendekanî Mako, Wirmê, Sellmas, Xoy, Tergewer . Mergewer, Biradost, birrêk gundî Hewşar, Qûçan, Bcnurd, Kelat, Dergez, Şîrwan, Farab, Rûdbar û Demawend le Rojhellatî Kurdistan û naw

Êranda, Zaxo, Dehok, Akirê, Amêdî, Şengar, Barzan û birrêk gundî êstay Musl le başûrî Kurdistan, Îrewan le Ermenstan, jimareyek le gundekanî Kazaxistan, Dagistan, Qirqîzstan û Gurcstan û şar û şaroçkekanî bakûrî Kurdistan û jimareyek le herêmekanî naw Turkiye, rojaway Kurdistan û birrêk le herêmekanî naw Sûrye û Lubnan

Zaraway Kirmancî jûrûş, şêwezarekanî: Behdînanî, Botanî, Bayezîdî, Şemdînanî, Hekarî û Quçanî le xoy degirêt.

2. Mellbendekanî Kirmancî xwarû (Sorani)

Şar û mellbendekanî: Sine, Seqiz, Bane, Merîwan, Tîkab, Dîwandere, Cwanro, Mehabad, Serdeşt, Boka, Myandiwaw, Şino, Neghede, Rewanser, Sewllawa, Leylax, Gerrûs, Sayenqella û Hewşar le Rojhellatî Kurdistan, Rewanduz, Hherîr, Pijder, Kerkûk, Dukan, Kifrî, Kelar, çemçemall, Şeqllawe, Koye, Qelladizê, Silêmanî û Pêncwên le Başûrî Kurdistan degirêtexoy.

Zaraway Kirmancî xwarûş şîwezarekanî: Soranî, Babanî, Mukiryani, Erdellanî û Cafî le xoy degirêt.

3. Goranî û Kirmanckî (Zazayî)

Pêwîste eme biwtrêt ke sererray ewey ke her dû herêmi axêwerani Zaza ya Kirmanckî û Goran le barî cughrafyayî le yek dûrn, bellam rîşey her dû, le seretada yeke û paşmawey resenî zimanî Avêstayîn.

Şar û mellbendekanî: Jawerro, Hewramanî Text, Newsûd, Pawe, Rêjaw, Merîwan le Rojhellatî Kurdistan, Tewêlle û Byare û birrêk gund le başûrî Kurdistan û herweha jimareyek le hozekanî Goran û Hewşar, Xaneqîn, Zengene û Syamensûr le Rojhellat û Başûrî Kurdistan, herêmgelêk le Dersîm, Xarpût, Erzencan, Amed, Urfa û Bitlîs le Bakûrî Kurdistan

Zaraway Goranî û Zazayîş şîwezarekanî Hewramî û Zazayî le xo degirêt.

4. Lurrî û Kelhurî

Şar û mellbendekanî: Endîmşîk, Melayêr, Dizfûl, Şarîkurd, çwarmehhall, Poştiko, Memesenî, Xuremawa, Elşter, Sûsengird, Kirmaşan, Îlam, Mahîdeşt, Dînewer, Qesrişîrîn, Bîcar, Eywan, Kengawer, Somar, Musyan, Dêhlurran, Abdanan, Sunqirî Kulyayî, Mêhran, Serpillî Zehaw, Kerend, Hersîn, Twîsrikan, Esedawa, Dallaho, Kamyaran, Rêjaw, Xusrewî, Birucerd, Poldoxter, Elîguderz, Neyrîz le Rojhellatî Kurdistan û Êranda, Mendelî, Bedire, Kût û Xaneqîn le Başûrî Kurdistan û Şêxbiznî le Bakûrî Kurdistan û naw Turkye le xoy degirêt.

Lurrî û Kelhurîş şêwezarekanî Lurrî, Îlamî, Feylî, Kelhurî, Bextyarî, Lekî, Sûsengirdî û Şîrwanî û Şêxbiznî le xo degirêt.

Êran, syaset û hellwêstî le tek firezmanî

Em qeware syasîye ke le diway sallî 1935 nawî Êranî lê nira, willatêkî fire netewew fire zimane û her yek lem netewane, ziman, mêjû û ferhengî taybet be xoyan heye, bellam desellatdaranî Êranî le 70 sallî rabirduwe, hîç katêk zimanêkî tiryân bêcge le farsî be fermî nenasîwe.

Be pêy mêjû û gwahî gelî Kurd le Rojhllatî Kurdistan, ta pêş le şorişî gelan, le sallî 1979 (1357 hetawî), her core giftugo Leser perwerdey zimanî Kurdî le Êran û tenanet qiskirdin be zimanî Kurdî le debistan û xwêndîngakan û hemû nawndkanî fermî Êran yasax û naqanunî bû. Ya be têkirra şitêk be nawî ziman, bo Kurdî, bê wate bû û wekû zarawîkî şikaw û bin lehcî jêr Farsyan dezanî.

Le serdemî dîkitorî bîst salley Reza Xanî Mîrpenic, ke paşan bû be Reza Şah, le sallî 1920 zayînî (1300 hetawî), rijêmî Reza Şah le diway girtin û kuştinî azadîxwazan, komellêk syasetî ferhengî û piropagendey bo perepêdanî bîrî şovênstî û hjmunî ramanî nijadî sertir, ke be "Aryayî" nawbangî der kird, le naw hemû Êran destî pê kird. Hawkat le diway geşekirdinî bîrî faşîsim le Ewropa le salleanî 1930 û hatne ser karî partî Nazî be rêberî Adulif Hîtlêr le Allman,

Reza Şah û layengîranî be piştigîrî le faşîstekanî Ewropa, hêrşêkî berfirawanî ferhengî û nîjadperstaneyan le dijî netewekanî naw Êran peyrrw kird.

Bîrokey nîjadî Aryayî le lay Hîtlir be kurtî, kesanî sipî û çawşîn û qij kall bû, her çende xudî Hîtlêr biro û qijî reş bû, bellam lay rijêm û layengîranî Êranî be watey paşmawey împiratorî Hexamenşî bû, ke gwaye farsekanî emroy le xo degirt.

Lem serdeme bîr û ramanî faşîstî le layen Nazîyeken û layengiranyan bo naw Êran dizey kird û bîrokey şovênîstî “Allmanî. Aryayî” geşey send.

Dewllemendan û arbaban û fîwdalanî Êranî firetir le her kes rakêşî bîrokey berterîxwazî û xo be zyatrizanî Nazîstekan bûn, boye lew eyalataney ke Faris nebûn, guşaryan le ser zêdetir bû. Hellbet lem myaneda rijîmî Reza Şah twanî jimareyek rûnakbîr û melay ayînî Faris rakêşî bîrî xoyan bikat.

Le rastîda bîrî şovênîstî û lûtberzaney emroş lenaw birrêk le xellik û desellatdaranî Êranîda, ke le beşêk le edebiyat, ferheng û syastî emroşyan, xoy denwênêt, mîratî 70 sallî nûseran û lêklîneranî Pan Êranîstî serdemî pallşayetî Pehleweykane ke ta êstaş her berdewame.

Mirov ke seyrî nûsîn û pertûkekanî 70 sallî rabirdû le Êran dekat, be rûnî debînêt ke em nûserane nek her mañî çarenûsî siyasî. ferhengî netewekanî naw Êran be fermî nanasn, bellkû le jêr allay yekyetî neteweyî Êran ya le jêr perdey asayeşî willat, nikûlî le hebûnî netewekanî tir deken û berdewam bangeşey ewe deken ke kurdî, Lorrî û Belûçî dyalêkit û zaraweyekî piçûkin û lik û popî zimanî Farsîn. Hawkat Turkî û Arebîş be zimanî bêgane dezanin, ke le serdemî Megholekan û hêrşî supay Îslam be ser beşêk le xellikî Faris ziman, zall buwe.

Le serdemî rijêmî Pehleyekan, perwerdey zimanî daykî, bêcge le Farsî qedeghe bû û nûsîn û çap û billawkerawey Kurdîş herweha siza û zîndanî hebû.

Bellam le mawey damezrandinî dû komar: Komarî Kurdistan û Komarî Azerbaycan, le nêwanî

sallekanî 1945 bo 46, xwêndin û nûsîn, çapemenî û billawkirdinewey Kurdî û Azerî be fermî peyrrew û cê be cê kira. Hellbet paş çen sall le diway serkutkirdinî Komarî Kurdistan, sereta le radyoy Taranda, paşan radîwkanî Kirmanşan, Sine, Mehabad û Wirmê bernamey hunerî û musîqay Kurdî be şeweyekî sinûrdar û bertesik le jêr çawdêrî çirrupirî Sazmanî Emnyetî Sawak, billaw dekirayewe û paşan le bonekanî hhkumetî, goranî û hellperrkêy Kurdî le telewîzîwnekanî uстанekanî Kurdişîn billaw dekiraywe, ke her em syasete le serdemî desellatdarî Xumeynîş peyrrew kirawe.

Serdemî Xumeynî

Le diway şorrşî gelanî Êran le sallî 1979, qonaxêkî nwê le Êran be giştî û le Rojhellatî Kurdistan be taybtî hate arrayewe. Beşêk le şarekanî Kurdistan be destî îdarey Kurdî hêzî pêşmerge berrêwe çû û ta hatnî Erteş û Pasdaran û dagîrkirdinî Rojhellatî Kurdistan, le pall Farsî, zimanî Kurdî le xwêndingakan kemukurit qisey pê dekira û le astêkî zor kem denûsra. Ema zimanî Arebî bexit rûy tî kird û be hoy îslamî bûnî rijêmî Êranî, derfet be tewawî boy rexisa û le pall Farsî û Engilîsî, xwêndingakan naçar kiran ke perwerdey Arebî be çirrupirî peyrrew bikrêt.

Bendî 15 destûrî binçîneyî Komarî Îslamî Êran

Pêwîste lêre amaje bewe bikrêt ke diway damzirandinî komarî îslamî Êran, destûrî binçîneyî Êran gorranî be serda hat û le bendî 15 destûrî komarî îslamî Êran dest nîşan kira ke:

Ziman û nûsînî hawbeşî xellkî Êran Farsî ye. Bellge û dêkumêntekan û nûsînekanî defterî û pertûkî xwêndin debêt bem ziman û nûsîne bêt, bellam bekarhênanî zimanekanî herêmî û qewmî le çapemenî û destigakanî rageyandin û perwerdey edebyatî ewan le xwêndingakan, le pall zimanî Farsî azade.

Farsî: *Ber asas asl panzidehom qanun asasî Îran "zeban û xet rismî û moşterek merdom Îran Farsî ast. Asnad û mokatebat û motun resmî û ketab dersî bayd ba în zeban û xet başid welî*

astifade az zebanhay mehlî û qewmî der metbuat û resaneh hay giruhî û tedrîs adebyat Anha der medars, der kenar zeban Farsî azad ast.” (bo agadarî lem bende 21 wişey arebî bû)

Hellebt zor kes û layen hîwadar bûn be bûnî em birrge, ke rêga bo zimanekanî tir xoş bikrêt, bellam bûnî em bende le naw destûrî Êranda be watey piştigîrî û hawkarî dewllet bo zimanekanî tir nebuwe û nîye. Raste be qanûn zimanî daykî azade, ema xwêndingakan naçar nakat ke derfetî fêrbûn bo zimanî daykî amade û lebar bikat. Ke wate mafî fêrbûn û perwerdey zimanî daykî netewekanî danîştîwî naw Êran nûsrawe, ema le diway têpirrînî pitr le 30 sal hêştâ be kirdiwe hîçî bo nekirawe û perwerdey zimanî Kurdî le debistan û xwêndingakan qedegheye.

Xallî hawbşî rijêmekanî Patşaytî û Axundî lemeda bû ke her dû bawerryan waye ke Êranî bûn û Aryayî bûn be zimanî Farsî bestirawe û yekyetî neteweyy û yekyetî willat hemûy girêdawî zimanî Farsîye û serçawey yekyetî willat û nîştimanî Êrane û em bîrokeş tenanet le naw mêşkî zorbey xellkî Êran wek Ryallî Êranî çap buwe.

Boye desellatî rijêmî Farsî Êran, hemîşe be çawî nadost seyrî zimanekanî tirî kirduwe û berdewam zimankenî tirî wek reqîbêk bo xoy seyr kirduwe û wek hêzêkî neyar û metrisîdar, ke dujminî desellate, seyrî kirduwe û rêgadan be perwerde û fêrbûnî zimanî daykî bo gelanî Kurd, Belûç, Lur, Azerî, Armenî, Turkemen, kêşekanî neteweyy pere pê dedat û destipêke bo cyabûnewe le Êran.

Debêt eme biwtrêt ke be hoy hewl û têkoşanî hêzekanî siyasî Kurd, ksaytî serbexo, xwêndikaran û roşenbîranî Kurd û netewekanî tir le Êranda, zemîney perwerde û xwêndin be zimanî daykî, le pay serdemî desllatdarî patşaytî, lebartir buwe, ç le astî bîr û ray giştî û ç desellatîş. Le diway sallî 1991 le Wirmê, bo yekm car be şîwyekî serbexo, ksanêk hestan bo xolî perwerdey zimanî Kurdî be 2 alfabetî Kurdî Latînî û Arebî û çapkirdinî govar û heftename û manginame be Kurdî û Farsî le derewî desllatdarayî dewllet û paşan em hewl û têkoşane le şarkanî dîkî Rojhllatî Kurdistan û tenaent Taranîş peyrrew kira û ta êstaş nawe nawe berdewame.

Le hellbijardinkanî em diwaye serok komarî le Êranda, bellên û giftî kandîdakan sebareet be cêbecê kirdinî bendî 15 destûrî binçîney Êran, mafî zimanî daykî û mafî ferhengî netewekanî naw Êran mijarî hemûwan bû û her yek, bellênî birîqedarî deda.

Paşan dewllet rênwênîyekî sebarete be perwerdey zimanekani herêmi û mîletekani bo birrêk le danşigakanî Êran rewane kird.

Ke be gwêrey em fermaney dewllet, wezaretxanekani, zanst, lêkollînewe û dahênan, tendirûstî, derman û rahênanî pizîşkî û danşigay azadî îslamî rêgayan pê dedirêt ke 2 beş le xwêndinî ziman û edebyat, peywend be zimanekan û zarawekanî herêmi le Êran wek: Kurdî, Azerî, Belûçî û Turkemenî le danşigakanî nawendî ew ustanane be şêwey dillxwaz fêr û perwerde bikrêt, bllam be kirdar, ta be êsta hîçî bo nkirawe.

Hemû nîşanekan û ezmûnî pitir le 30 sallî komarî îslamî Êran ew rastîye deslimênêt ke desellatdarî tîwkiratîkî êranî, mafe seretayyekanî gelanî naw êran nadat, boye pêwîste kurd pişt be xoy bibestêt bo perwerdî rollekanî.

Em birrge le diway çen hefte le hellbijardinekanî serok komarî le encumenî ballay şorşî ferhengî, be ferhengistanî ziman û edebî Farsî û kumîtey ferheng û şarstanyetî Êran û Îslam rageyandira, ke be gwêrey nirxandinî ewan, ziman û zarawekanî dyarîkiraw detwanin çen xall le bernamekanî xwêndinyan le jêr çawedêrî ewanda le zanko hebêt.

PÊŞKÎT Û PAŞKÎT

Amed Tigrîs

Çend gotin

Ewropî ji kîteyên ku tên pêş peyvan re prefîks û yên ku tên paş peyvan re jî suffîks dibêjin. Prefîks û suffîks bi serê xwe ne tişt in lê derna ew tên pêş an jî paş peyvê, wateyeke nû didin wê û peyveke nû çêdibe.

Celadet Bedirxan ji prefîksa latînî re gotiye pêşkît û ji suffîksa latînî re jî parkît, Qanadê Kurdo û Mûrad Ciwan pêşpirtik û paşpirtik, Kamran Bedirxan pêşdanî û paşdanî, Reşîdê Kurd xurdepêş û xurdepaş, Torî pêşgir û paşgir, Feqî Hu-seyin Sagnîç pêşqertaf û paşqertaf, Selîm Biçûk pêşgîn û Paşgîn nivîsîne. Belê, ji derî van nivîskarên ku min navên van li jor nivîsîn çendên din jî gramera kurdî nivîsîne lê ne bi kurdî, bi tirkî îzah kirine, ji ber wê yekê jî ez rastî kurdiya wan nehatim. Baş e ku bi tirkî şirove kirine ku ew jî bi kurdî bûya, dê çend navên din jî li prefîks û suffîksan bihata kirin û tevlihevî bêtir bûbûya.

Dema mirov li van gramernivîsên kurdî dinêre, baş dibîne ku di warê navlêkrina prefîks û suffîksên latînî de jî afirandêr dîsa Celadet Bedir-xan bi xwe ye. Yê din li ser sofraya hazir danîne, jê tê xwarine û heta rêtine. Loma min termînolojiya

Celadet Bedirxan durist dît û bi kar anî.

Emîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot 34 pêşkît û 103 parkîtên kurdî destnîşan kirine û ji her yekê re çend nimûne jî dane. Bi vê yekê re gelek pêşkît û parkît hene ku ji bîr kirine û çendek jê jî ku îro di zimanê rojane de nayên bi karanîn, li ser wan rawestane. Wek: "ban, asî, nivaz, îtik, îvk, oyî, vanî, dok"... Min pêşkît û parkîtên weha di nav rêza rivîsînê de ku cîyê wan hatiye, yek bi yek destnîşan kiriye. Mûrad Ciwan jî li ser pêşkît û parkîtên kurdî rawestayê û wî jî 17 pêşkît û 56 parkît destnîşan kiriye. Gramernivîsên din ku min navên van. û pirtûkên wan ên

gramerê li dawiya vê berhemê nivîsîn, bi tenê navên 20-30 pêşkît û parkîtên kurdî destnîşan kirine.. Hema hema hemûyan bi awayekî bêserûber û bêrêza alfabetîk hema çawa hatiye bîr û hişê wan nivîsîne.

Di zimanê kurdî de dikare pêşkît û parkît ji hinek kîteyên serbixwe, daçek, bêjeyên neyînî (negation), zayende, hoker, navdêr û ji hinek pêşkît û parkîtên taybetî pêk bên. Lê ew ji çi cure û rengên peyran dibin bila bibin, wezîfe û erkên wan yek e û ji ber vê yekê jî, li gor vê taybetiya xwe navên wan pêşkît û parkît lêkirine. Êdî ew taybetî û rolên xwe yên berê wenda dikin û peyvên nû diafirînin.

Mirov dikare bibêje ku wek gelek zimanên din, zimanê kurdî jî bi saya pêşkît û parkîtan dize û hejmara wate û bêjeyan zêde, dewlemend û xurtir dibin.

Di nav proseseke dûr û dirêj de an jî di nav xebata ziman a aktîv de wek ku di her warê zimên de guhertin çêdibin, herweha di warê pêşkît û parkîtan de jî, guhertinên mezin çêdibin. Di vê prosesa dûr û dirêj de, dikare carnar hejmarên cure yên pêşkît û parkîtan kêm û carnar jî zêde bibin. Li gor rewş û taybetiyên her zimanî, rewş û hejmara pêşkît û parkîtan jî tê guhertin.

Teknîk her ku bi peş dikeve, tiştên nû tên dîtin, bi wê re jiyana civatî jî tê guhertin. Kar û mijarên nû derdikevin holê, navên nû li wan tên kirin. Li gor hewcedariya dem û civata nû ziman jî bi pêş dikeve û xwe li gor civat û teknîka nû diguhêre. Di ziman de termînolojî tê guhertin û peyvên nû tên dîtin. Hejmara bêjeyên ferhenga kurdî zêde dibin. Di vî warî de kar û wezîfeyekî girîng dikevin ser pêşkît û parkîtan ku bi alîkariyan wan gotinên nû tên çêkirin. Helbet her ziman xwedî çendek taybetî û prensîban e û rêbazên çêkirina peyvên xwe hene. Pêwîst e ku çêkirina peyvên nû li gor prensîb û taybetiyên ziman bin. Heger mirov ji her aliyê ve ji prensîb û taybetiyên pêşkît û parkîtan zimanê xwe ne serwext û agahdar be, rabe bi serê xwe peyvên nû, pêşkît û parkîtan nû çêbike an jî yên ne di cî û lê de bikarbîne, wê demê li ser navê pêşxistina ziman mirov ziman dikuje. Ji kesên weha re zimankuj dibêjin. Divê kesên zimanzan an jî yên bi ziman re mijûl in, baş bizanibin ku kîjan pêşkît û parkît ji bo peyvên kîjan kar û warî nû diguncin an jî lê tên. Wek mînak mirov nikare ji kesî ku gul bifroşe re bêje "gulkar, gulker," an jî "gulvan" û hwd. Navê wî/wê "gulfiroş" e.

Her gramernivîsê kurd giranî daye ser devoka herêma xwe. Wek ku tu berhemên din ên ku di vê mijarê de hatine nivîsîn nedîtibin, nexwendibin. Bi navê "gramera Kurmancî" an jî "rêzimana/ê Kurmancî" bi awayekî cîdî pirtûk nivîsîne lê ji binî ve pêşkîtên kurdî ji bîr kirine û

bi tenê nivê parkîtan nivîsîne. Him jî parkîtên ku herî zêde rojane tên bikaranîn di pirtûkên wan de tune ne lê yên ku di nav gel de nayên bi karanîn û ew bi xwe nikaribûne ji wan re du an sê nimûne bibînin, di van pirtûkên xwe de ew bi cî kirine û nimûne dane. Pêwîst e ku ev mijar baş zelal bibe û gotûbêj li ser bê kirin. Bi taybetî ev nivîskarên xwedî "gamer" an jî "rêzimanên kurmancî", divê carek din li dûv xwe vegerin û li ser vê mijarê hûr û kûr bibin.

Ew bi tenê li ser zaravayê kurmancî rawestane, soranî û dimilî negirtine berçav. Halbû ku di van 20-30 salên dawî de, bê hejmar gotinên soranî ketine nav zaravayê kurmancî yê nivîskî. Em êdî parkîtên wek: "nûs, nêr, are" û hwd. di kurmanciya rojane de bi kar tînin. Parkît hene ku li hinek herêman him di kurmancî û him jî di dimilî de tên bi kar anîn. Wek parkîta "ox."

Belê, di prosesa nivîsandina kurdî de, îro çarçove û qalibê klasîk hatiye şikandin. Zarava têkilbûne, kurdî bi pêşketiye û dewlemend bûye. Rêzimanivîs divê êdî ji îro şûn ve, vê prosesê bi-girin ber çav. Rêziman li gor zimanê jîndar û rojane tên nivîsîn û vejîn. Êdî bi tenê mînakgirtin û şirovekirina gramera Celadet Bedirxan têr nake. Piştî gamer nivîsandin ne karê her nivîskarî an jî rojnamevanî ye. Bi serê xwe zanyarî û pisporiyeke taybetî û mezin dixwaze. Karê prosesêke dûr û dirêj e. Ne karê çend roj û mehan e. Ew kesên ku gamerên kurmancî nivîsandine û binivîsîn, pêwîst e ku li derdora gramera Celadet Bedirxan nezivirin, hinek tiştan jê neçîrpînin û bervajî nekin. Divê ew, bi awayekî zanistî prensîb û rêbazên nû bibînin, lê zêde bikin û heger yên şaş û çewt hebin destnîşan bikin. Kopî tucar ji orîjînalê ne baştir e. Heger tiştêkî nû tune be, wê demê ne hewce ye ku mirov gamer binivîse lê mirov dikare yên ku hene sivik û hêsantir bike.

Ev pêşkît û parkîtên ku ez li jêr rêz dikim, ne îcadên min in û ne jî tnin afirandiye; yên ku heta niha hatine nivîsîn û bikaranîn, min li ser wan lêkolîneke biçûk kir, ka çi hene û kê çi nivîsiye. Heta îro çewtî û kêmasî çi ne? O min xwest û heta ku ji destê min hat hejmara mînakên zêde binivîsim. Ez dikarim bibêjim di warê hejmarên pêşkît û parkîtan de heta îro tu kesek xebateke weha nekiriye û ku kiribe jî ez bi xwe lê rast neha-time. Di vî warî de min teknîka herî dawî bikaranî û bi komputerê li bêjeyan gerîm.. Di destê min de çi yên kevn û çi yên nû, çiqas tekstên kurdî di dîsketan de hebûn, min li ser wan kar kir. Ji bo hinek pêşkît û parkîtan bi alîkariya teknîkê ez bi rojan li duv wan geriyam lê hezar mixabin ez jî nikaribûm ji çend pêşkît û parkîtan re zêde nimûne bibînim. Ev di her zimanî de weha ye, hinek zêde tên bikaranîn û hinek jî gelek kêr lê dîsa jî ew wek pêşkît û parkît tên pejiran-din.

Parkîtên wek "î" , " ê" , " o" , " ik" , "ok" , "tir" bê hejmar û bê sînor in. Mirov dikare bîne piştî gelek bêjeyan. Ji ber vê yekê, ez li ser yên weha zêde ranewestîm û min bi kurtî ji bo wan çend nimûne nivîsî.

Ez li ser bêjeyên hevdudanî ranewestam û min dest neda wan. Ji xwe ew li derî vê mijarê ne.

Mirov bi wan dikare bi hezaran bêjeyên nû çêbike.

Gelek nivîskar, xwendekar û xebadkaren med-yaya kurdî pêşkît û bi taybetî parkîtan şaş û çewt bikartînin. Bi taybetî şandiyar, nûçegîhan û nivîskarên kurd an jî yên ku bi kurdî dinivîsin, dibêjin qey bi tenê du cure parkîtên kurdî hene. Ew jî "kar" û "van" in. Halbû ku bi qasî ku min di ve xebata xwe de tespît kir hejmara pêşkîtan 42 û yên parkîtan jî 138 in. Heger mirov pêşkît û parkîtên biyanî yên ku îro ketine nav zimanê me û em di pratîkî rojane de bikartînin jî bihesbînin; wê demê hejmara pêşkîtan dibin 52 û yên parkîtan jî dibin 143. Bi vê mebestê min xwest ku mijara pêşkît û parkîtên kurdî piçek zelal bikim û herwe-ha li gor rêza alfabetîk em bibin xwedî ferhengo-keke pêşkît û parkîtan jî.

1. ba-

babidest, babilîsok, baçermek, badan, bafi- roke, bager, bakêş, bakur, baperik, bapêç, bapêş, bapêketî, bapîvan, bapûk, basûr, başûr, bawêşîn, bawişk, bazin...

Di wateyên ji hevbûn, tesîr lêkirin, pekandinê de tê bikaranîn.

2. ber-

berav, beravêtî, berba, berbajar, berban, berbang, berbanî, berbejn, berber, berberî, berberojik, berbext, berbelav, berbiçav, berbihev, berbûk, berçavk, berçem, berdar, berdest, berdes- thilatdar (muxalefet), berdevk, berdêl, berdêlî, berdil, berdilik, berendam, berêvar, berfîreh, bergeh, bergerî, bergirî, berhem, berhemdarî, berhev, berhevdan, berhevkin, berhevok, berhe- wa, bergirtin, berjêr, berjewend, berjewendî, berkanî, berkel, berketî, berketin, berkeş, berkêşan, berkeşok, berkêr, berkurk, berlêker,

bermal, bermalî, bermayî, bermêj, bermilk, berna-me, bernamzet, bernas, bernav, berpeyî, berpêş, berpêşkirin, berpîrsîyar, berrûmet, bersêl, bersing, bersingande, bersiv, bersûc, bertêrker, bervajî, ber-vale, berwar, berxwirênî, berxistî...

Pêşkîteyê hokerî ye, gelek berfireh, berhem-dar û kêrhatî ye. Di kurdiya nivîskî de roleke mezin û gîfîng dilîze û her ku diçe bi vê pêşkîteyê gelek bêjeyên nû û taze tî afirandin.

3. bê-

bêalfabe, bêaramî, bêarî, bêav, bêbav, bêbextî, bêçek, bêdê, bêdengî, bêexlaq, bêgav (bêçare), bêhêl, bêjin, bêkar, bêkes, bêkêr, bêmal, bênamûs, bêniştîman, bêpar, bêpayan, bêpirtûk, bêpere, bêre bêrûmet, bêrojname, bêserûpa, bêşeref, bêxanî, bêxwedî, bêzarok Pêşkîta "bê" bi xwe negasiyon e. Ew tê pêş peyvê û wateya neyînî dide peyva nû.

4. bi-

biber, bibe, bicî, biçe, bidestkirî, bihatin, bijîşk, bikêrhatî, bimêzîne, binivîse, birengîne, biser, biserketin, bixwe, bizelqîne, birêz....

Pêşkîta "bi" tê pêş lêkerê û formên bilanî û fermanî dide peyva nû.

Hinek nivîskarên kurd "bi" ya daçek wek pêşkît dihesibînin; ev ne rast e, ji bo ne pêşkît e, ew daçek e lê dikare bibe pêşkît jî. Di zimanê Hînd-ewropî de pêşkît û parkît bi bêjeyê ve tî nivîsîn lê daçek bi serê xwe tî nivîsîn. Wek bi bav, bi ber, bi rûmet, bi bext, bi xêr...

5. bin-

binav, binbar, bindest, bindestî, bincil, bincame (durû), binçav, binçeng, bingeh, binguh, binkiras, binling, binmal, binpalas, binpî, binpêkirin, binpoz, binsazî, binsimêl, binyat, binziman, binzik...

Pêşkîteke hokerî ye û bêtir di wateyên dizî, veşartin, girtin, zexelî û esas de tê bikaranîn.

6. da-

dabestin, dabeş, dabezîn, daberizîn, dabi-nartin, dabiristin, dadan, daçek, daçikandin, daçikiyan, daeliqandin, dageriyan, dagerandin, da-girtin, dagirtî, dagîr, dahatin, dahatû, dahatû-perest, dahatûxwaz, dahatûxwazî, dahênan (yarat-ma), dahêner, dahilandin, dahiştin, daketin, dakêşîn, dakişîyan, dakişandin, dakutandin, dali-qandin, damezrandin, damezrandêr, danezan, danivîsandin, daniştin, danîn, danêr, daqurtandin, dapar, dapelandin (damlatma), dapêçîn, darêjan din (form), darêjtin (derlemek), darêjker (derleyi-ci), darêjnivîs (derleme), darizandin, datanî, daves-tin, dawestin, dawerivandin, dawêşandin, daxistin, daxuyanî, daxwaz, daxwazname...

Pêşkîta "da" tê pêş peyvê û wateyên nizim, veger û daketinê dide peyvê.

7. der-

Du mehneyên wê hene:

1:Pêşkîteke lêkerî ye û ji lêkera "derketin" çêdibe, tê pêş bêjeyê û wateyeke nû peyda dike.

deranîn, derbûn, derçûn, derketin. , , derxistin, derxûn...

2:Mehneya "tê de" dide peyvê.Herwekî:

Derpê(Ango ê di piyan de,ê di nav lingan de),derpêş(Ê di pêş de),derhal(ê di hal/rewşê de,ango di vê rewşê de,di cih de,heman),dergûş(ê di gûşê/hembêzê de,bebek),derheq(di heqê(yekî)de

8. di-

dibe, diçe, digerîne, dikare, dileqîne, dinivîse, direngîne, dişibe, dixwe, dizane...

Pêşkîta "di" tê pêş lêkera û formê derna niha û fireh dide lêkerê. Ev pêşkîteke gelek kêrhatî û bi ber e, di zimanê nivîskî de roleke mezin dilîze.

9. dij-

dijber, dijhev, dijmin, dijmintî, dijmin (çêr), dijûn, dijraber, dijwar.... Ev pêşkîteya han wateya berxwedan, reqabet û muxalefetê dide.

10. dû-

dûajo, dûmahîk, dûxan, dûzan... Di wateya berdewamiyê de ye.

11. hem-

hembajarî, hember, hembêz, hemdem, hemdemî, hemkar, hempa, hemsale, hemwelatî....

Li hinek deveran "him" û li hinek deveran jî "hem" tê gotin.

12. her-

heraftin, herbilîn, herbijî, herçend, herçiqas, herdem, herroj, hergav, hertim, herweha...

Di wateya berdewamiyê de ye û gelek ne bi-karhatî ye.

13. hev-

hevbajar, hevbend, hevber, hevbeş, hev-buha, hevcivan, hevcure, hevçerx, hevdem, hevdeng, hevdil, hevdîtin, hevdu, hevgel, hevgirêdan, hevgirtin, hevgîn, hevjin, hevkar, hevkêşe, hevmal, heval, hevnasî, hevpa, hevpar, hevpişe, hevpey-man, hevpeyvîn, hevok, hevrê, hevrenge, hevring, hevta, hevrû, hevsal, hevsar, hevpeyvîn...

Pêşkîta "hev" wateya yekbûn û yekîtiyê dide.

14. hil-

hilanîn, hilawistin, hilavêtin, hilberîn, hilbestin, hilbezîyan, hilbezandin, hilibijartin, hilibijêr, hilibirîn, hilibûn, hilçinîn, hildan, hilfîran-din, hilgirtin, hilketin, hilkêş, hilkişandin, hilkişîyan, hilkirin, hilpekîyan, hilgavtin, hilperkîn, hilpu-fandin, hilqetîn, hilqetandin, hilweşîyan, hilweşandin, hilxistin...

Pêşkîta "hil" tê pêş peyvê û wateyên bi-lindbûn, rakirin û rabûne dide peyvê.

15. î-

îca, îro, îsal, îsot, îşev..

Pêşkîta "î" dema fê pêş peyvê, peyva rengdêra îşarkî pêk tê. Pêşkîta "î" wateya niha dide bêjeyê lê zêde ne kêrhatî ye. Mirov nikare jê re çend nimûneyên din jî bibîne.

16. jê-

jêbir, jêbirîn, jêbûn, jêçûn, jêdarxistin, jêderk, jêderxistin, jêgerîn, jêgirtî, jêgirtin, jêhat, jêhatî, jêhatin, jêket, jêketin, jêkêm, jêkêmkirin, jêlî, jênager, jêqulkirin, jêtijî (kabîlîyet), jêxistin...

pêşkîta "jê" tê pêş peyvê û form û wezîfeyên hêzbûn, zêdebûn, kêmbûnê dide peyvê.

17. lê-

lêanîn, lêburîn, lêbûn, lêçûn, lêdan, lêgerîn, lêgirtin, lêguncîn, lêhatî, lêhatin, lêhûrbûn, lêker, lêketin, lêkirin, lêkom, lêkolîn, lêkûrbûn, lêmêzekirin, lêniştin, lênerîn, lêpêçan, lêpirsîn, lêsiwarkirin, lêsobûn, lêsozkirin, lêşikandin, lêşibandin, lêvegerîn, lêxistin, lêzivirandin...

Ev pêşkît kurtkirina cînavên wî/wê û hinek navdêran in û bi lêkerê ve tîn nivîsîn. Wateyeke nû dide peyvê û wê diguncî ne. Pêşkîteke bi berdar û kêrhatîye.

18. li-

likar, lirê, livegerê, liçûyînê, libûyînê, liki-rinê, lipê, lizanabûnê...

Daçeka "li" bûye pêşkîte. Pêşkîta "li" tê pêş peyvê û wateyên cî, girêdan û tîkilbûnê dide dîyar kirin.

19. lihev-

lihevbûn, lihevçûn, lihevdan, lihev hatin, lihevketin, lihevkirin, lihevexistin...

Bêjeyên ku ji vê pêşkîtê çêdibin, wateyên (Êkilî û rewşê didin dîyarkirin.

20. ma-

ma(a)lîne, ma(a)xife, majo, ma(a)lêse, ma(a)vêje...

Pêşkîta "W" tê pêş lêkerên ku bi tîpa a destpêdikin û dema fireh û niha û forma fermanî bikartînin.

21. me-

meke, meçe, mexwe, mere, menivîse, mebêje, meşo, meyîn...

Pêşkîta "me" tê pêş lêkerên dema niha û fireh ku formê fermanî û neyînî digirin. Di şûna pêşkîta "me" de, ya "ne" jî tê bikaranîn.

22. na-

nabe, naçe, nake, nakokî, nalebar, namerd, naşêm, naşîn, naşêrîn, naxwaze, naxwe...

Parkîta "na" negasiyona dema fireh e û bi vê pêşkîtê bêjeyên neyînî tên çêkirin.

23. nav-

navber, navçar, navçe, navda, navdeng, navder, navderketî, navdewletî, navgundî, navmalî, navnetewî, navik, navkêl, navmal, navmalî, navmil, navling, navran, navser, nav-teng...

Pêşkîteke hokerî ye, tê pêş peyvê û wateyê nû dide wê. Pêşkîteke bi berhemdar û kêrhatî ye.

24. ne-

nebanok, neberd (aza), nebez (bêtirs), necamêr, necamêrî, neçar, neçarî, nedervazî, nedîyar, neguharbar, negehîştî, nehênî, nejê, nejin, nekes, nelê, netna, neman, nemir, namerd, nemêr, nelê (uymaz), nenas, nepandin, nependî, neprogramkirî, neqencî, nerast, nerasteder, nerind, neroz, nesax, nesazî, neşûştî, nexwarbar, nexweş, neyar, neyînî, nezan, nezani..

"Ne" bi serê xwe negasîyon e, bi bêjeyê ve tê nivîsîn û bêjeyê nû çêdike.

25. ni-

nikar, nikarî, nikarok, nikirîn, nikare, nişê, nizane...

"Bê, me, na, ne" û "ni" negasiyon in. Dema ji yek ji van negasiyon bê pêş peyvê û bi peyvê ve were nivîsîn, wê demê wezîfeyê pêşkîtê bi cî tînin û wateyeke din didin peyvê. Di nav pêşkîtên Cela-det Bedirxan de bi tenê negasiyona "bê" heye. "Me, na, ne" û "ni" tune ne. Mûrad Ciwan van hemû negasiyonan wek pêşkîte bikaranîye û ev rast û duristir e. Ewropî jî li gor hevokê negasiyonan wek pêşkîte bikartînin.

26. nîv-

nîvçe, nîvekar, nîvekarî, nîvekîr (qebe), nîverê, nîvkurd, nîvkurd û nîvtirk, nîvmirov, nîvro...

Pêşkîteyekî hokerî ye, rewş û taybetiyê dide dîyarkirin.

27. par-

parçe, parkît, parsû, parzemîn, parzûn.

Pêşkîta "par" du wateyên wê hene: yek di wateya "paş" de û ya duyem jî di wateya "parkirin" de ye.

28. paş-

paşber, paşdanî, paşgotin, paşketî, paşling, paşmayîn, paşmêr, paşnav, paşroj, paşeroj, paşîv, paşlêker, paşveçûn, paşvekişandin, paşxistin...

Pêşkîteyeke hokerî ye. Pêşkîteya "paş" wateyên jar, neduristî û yê dema borî, veger û kevn didin bêjeyên nû.

29. pê-

pêbaz, pêbend, pêbilîn, pêbûn, pêçan, pêçî, pêçûn, pêdan, pêdanî, pêdabûn, pêdaçûn, pêdakirin, pêdaketin, pêdaxistin, pêdivî, pêew lebûn, pêgeh, pêger, pêgermok, pêgih, pêgirt, pêhesîn, pêkan, pêkanîn, pêkenîn, pêketin, pêkîrin, pêlav, pêlêkîrin, pênas, pênivîs (pênûs), pênûs, pêpar, pêşandar, pêşane, pêşanî, pêşarî, pêşeng, pêşewa, pêşing (kok), pêvajo,

pêveçûn, pêvedan, pêvebûn, pêvekirin, pêvehatin, pêwend (gîhanek), pêwendî, pêxistin, pêxwar, pêxwarinî,

Li hinek herêman di şûna pêşkîta "pê" de "vê" jî dibêjin. Pêşkîta "pê" tê pêş peyvê û wateyên alîkarî, îstîqamet û têkiliyê dide peyvê.

30. pev-

pevçûn, pevdank, pevdeng, pevgirêdan, pevkirin, pevrabûn, pevxistin...

Wateyên hevaltî û têkilî dide peyvên nû.

31. pêş-

pêşbazî, pêşangeh, pêşdar, pêşber, pêşketî, pêşbirî, pêşbirik, pêşbînî, pêşdanî, pêşdaraz, pêşdîtin, pêşeng, pêşgîr, pêşgotin, pêşîn, pêşketin, pêşkêş, pêşkêşkar, pêşkoj, pêşmal, pêşmerge, pêşnav, pêşnîyaz, pêştemal, pêşnûma, pêşveçûn, pêşverû, pêşwazî, pêşxistî...

Pêşkîteyê hokerî ye û kêrhatî ye. Di kurdiya nûjen de her ku diçe ev pêşkîte bêtir tê bikaranîn.

32. pis-

pisaxa, pismam, pismîr, pîsxaltî, pîsxal...

Di farisî de "pis" tê wateya "kur". Di kurdî de her çi qas kêr be jî, ev pêşkîte tê bikaranîn.

33. pişt-

piştband, piştdayîn, piştderî, piştekan, piştevanî, piştrast, piştgir, piştgirî, piştmeş, piştşîv, piştwerî...

Ev pêşkîte wateyên alîkarî, hevalbendî û saxle-miyê dide bêjeyên ku jê çêdibin.

34. ra-

rabazîn (destdirêjî), rabide, raber, rabestin (tarz), rabezandin (êrîş), rabûn, raburandin, rabûrî (mazî), raberdû, raçandin (dokunmak), raçav (di çav de derbaskirin), radan, rader (mas-tar), radest (teslim), rageş, ragirtin, ragîhandin, rahêlandin, rahiştin, rajandin (silkinmek), rajêr,

rajoy, raker, raketin, rakişandin, rakirin, ramîsan, rapelikîn, raparastin, rapelikandin, rapêçan, raperîn, rasantin, raser, raserîn, rawek, rawe, rawêj (tewirhelwest) raxistan, rawestandin, rawes-tok (stasyon), rawerîn (lava), raxistin, razan... Pêşkîta "ra" tê pêş peyvê û wateyên hêz, pêşvebirin û pêşxistinê dide peyvê.

35. rû-

rûbar, rûber, rûçerm (bêşerm), rûçik, rûda, rûdan, rûgeş, rûgirtî, rûken, rûmet, rûneşûştî, rûniştin, rûpel, rûpişt (astar), rûreş, rûxweş...

Ev pêşkîte rewşê dide dîyar û zelalkirin.

36. ser-

serbajar, serbaz, serben, serbend, serbest, serberjêr, serberz, serbilind, serdest, serder, serderî, serevraz, sergerm, serhawa, serhev, serheng, serhevde, serhişk, serjinik, serker, serlêdan, sermaye, sernav, sernerm, sernivîs, sernivîskar, sernizim, sernûçe, serserî, sersing...

Ev pêşkîte bêtir hêz û rewşê dide dîyar û zelal-kirin.

37. tê-

têber, têbinî, têdan, têdayî, têdeman, têderxistin, têderxistinok, têçûyî (satirbaşi), têfiran din, têgeh, tegehîştî, têgehî, têger, têgerandin, têgîn, têhelkêşan, têhildan, têkber, tê(k) birin, tê (k)çûn, tê(k)dan, têketin, têkil, têkilî, têkîrin, têkoşer, têkoşîn, têkuz, têper, têrebûn, têrel, têrekirin, têwerbûn, têwerdan, têwerkîrin, têxistin, têxistinî...

Pêşkîta "tê" tê pêş peyvê û wateyên hebûn, zanîn, nirx û hatinê dide peyvê.

38. ve-

veanîn (bukmek), vebestin, vebijartin (ayıklama), vebijandin (eritmek), vebirîn (kesin, ozet), vebirrîn, vebûhtî, vebûn, veciniqîn, veçinîn (tamîr), veçirîyan, veçirandin (sokmek), vedan, vedeng, vedizîn, vedigindirî, vedor, vefirî, veger, vegerîn, vegerandin, vegevîzîn, vegirêdan,

vegirtin, vegotin, vegirtox, veguhastin, veguhêrîn, vehatin, vehewîn, vehêl, vehist, vehistî, vehîn, vehustan, vejan, vejen (enerjî), vejîn, vekarî, veke, veketin, vekirin, vekeşan, vekişîn, vekît (heceleme), vekîtandin (heceleme), vekolîn, vekuştin, vemagîn, vemalaştin, vemalîn, vemirîn, velîstin (burkulma), venasîn, venuhurî, venanadin, venêrîn, veniştin, venîn, veresandin, verêbûn, ve-rojtin, vepijiqîn, veqetandin, veqetandek, veqelaştin, vepirsîn, vereşan, vereşîn, verêj, verêkirin, verestin, veristî (serbest), verisîn, veşartî, veşartok, veşartgeh, vetewşandin (sersemlemek), vewestan, vexumala, vexwarin, vexwendin, vezandin, vezelandin...

Pêşkîta "ve" tê pêş peyvê û wateyên paşveçûn, paşvekişandin, ji nû ve jîyandin û dubarekirinê dide peyva nû. Pêşkîteyeke bi berdar û kêrhatî ye. Di zimanê nivîskî de her ku diçe bêtir tê bikaranîn û popîler e. Di zimanê swêdî de nêzîkî kîteya "om" e. Wek nimûne dema ku mirov bixwaze bi swêdî bêje ji nû ve binivîse "skrîva otn" dibêjin, ji nû ve bizewice "gîfta om." dibêjin. Ev pêşkîteya me di pêşrojê de dikare wezîfeyê "om" a swêdî bigire.

39. vê-

vêkdan, vêket, vêketin, vêsan (tenefus), vêsandin, vêseh, vêsîn, vêxistin... Ev pêşkît weha ne bi ber û dewlemend e. Li gelek deveran di şûna tîpa "v" de ya "p" jî dibêjin. Wek nimûne di şûna "vêket" de "pêket." dibêjin.

40. wer-

weranîn, werçerxati, werger, wergêr, wergir, wergirtin, wergîr, werkirin, werzan, werzêr

Pêşkîta "wer" tê pêş peyvê û wateyên guhastin û nûkirinê dide peyva nû.

41. xwe-

xwebînî xwebûn, xwemal, xwepê- şandan, xwepêşandêr, xwerist, xwerû, xweser, xwevekişandin...

Cînava "xwe" tê pêş bêjeyê û bêjeyeke nû diafrîne. Bêjeyên ku tên afirandin hema hema di heman wateya ne di bin tesîra kes û cî de ne.

42.

Ji derî van pêşkîtan hejmarên nav tên pêş peyvan û peyvên nû diafirînin. Ji ber vê taybetiyê mirov dikare ji van hejmaran re jî bêje pêşkîte.

Wek nimûne: Yekcar, ducan, ducanî, dudil, dudar, durû, sêber, sêgoşe, sêrê, çaralî, çargoşe, çarkuj, çarme-dor, çarmil, çarpê, çarrê, heftreng....

Balkêşî û jêrenotek

Pêşkîteyên (prefîksên) latînî û grekî ketine nav hemû zimanên cîhanê. Her çend kêm be jî di kur-diya devkî û nivîskî ya îroyîn de çend pêşkîteyên latînî û grekî jî tên bi karanîn. Çend nimûne:

- antî- (dij) antîkomunîzm, antînazîzm
- auto- (oto- xwe bi xwe) - otomatîk
- înter- (nav) înternasyonalîzm, înternet
- mîkro- (biçûk) mîkroskop, mîkroorganîzm
- multî- (gelek) multîmilyoner, multînasyonel
- pre- (pêş) prefabrîk, prekapîtalîzm
- post-(paş, piştî) postkapîtalîzm, postmodemîzm
- super- (gelek mezin) supermarket, superzeka
- tele- (kontrol) teleskop, telefon, teleferîk, teleteknîk
- trans- (ji ser de, ji aliyê din) transport, transît

Paşkît

1. -a

ajna, aşna, axa, biraza, ciwana, fama, pêşewa, şar(e)za, silîva, xama, xwenda, zana... Parkîta "a" rewşa huner, hêz û xwedayetî dide dîyarkirin.

2. -ahî

beredahî, biçûkahî, dirêjahî, dûrahî, germahî, gewrahî, keskahî, mezinahî, nêzîkahî, pahnahî, reşahî, sermahî, sorahî, şînahî, şîrînahî, tengahî, tirşahî Rewşeke pirhejmar û taybetî dide diyarkirin. Her çiqas tîpa "h" gîhanek be jî êdî formeke taybetî girtiye.

3. -ajo

biskîletajo, dûajo (alîkar), cotajo, erebea-jo, hespajo, kerajo, otobusajo, otomobîlajo, taksîajo... Ji lêkera "ajotin" çêdibe. Zêde ne bi kêrhatî ye.

4. -ak

heftak (cureyê kemberê), ronak, xenak...

Ev parkît rewş û taybetiyê dide dîyarkirin û ne parkîteke weha bikêrhatî û dewlemend e.

5. -al

çangal, delal, gopal, heval, hewal, kendal, kortal, pergâl, postal, repal (rût û repal), sûtal, şekal, şengal, teral... Rewş û taybetiyên dide dîyarkirin.

6. -an

aliyan (noçkirî), aryan, bozan, dalyan, gulan, germi(y)an, heyran, hozan, kêşan, kolan, kotan, lekan, lîlan, loran, rîşan, sermi(y)an, şîlan, zîlan, zîzan, zoran, zozan... Parkîta "an" ji bo navdêrên gelehhejmar jî tê dawîya hemû navdêran. Wek gundan, bajarên, jinan, zarokan û hwd...

7. -ane

aştî(y)ane, bavikane, bersingane (gulaş), ciwane, çendane, çilane, dayikane, dewrêşane, dilsojane, gawirane, heftane, hovane, jinane, kurda- ne, korane, mehane, mestane, mêrane, mijane, mîrane, pirane, pişkane (muşterek), rojane, salane, serekane, şahane, şevpeştane, tekane, yekane, zik- makane, zîrekane... Ew di wateya wek wî/wê de ye û parkîteke gelek bi ber û dewlemend e.

8. -anî

boranî, çortanî, doşanî, gavanî, giranî, hêsanî, keranî, koranî, mêranî, mirovanî, piranî, şivanî, xortanî... Wek wî/wê an jî dişibe ew tişt, kes û pîşeyên ku navên wan didin.

9. -anok

çivanok, kevkanok, miştanok, tiştanok, xiştanok... Di wateya tiştên biçûk de tê bikaranîn û piçek jî bîhna hîle û huner jê tê.

10. -ar

be(y)ar, debar, di(y)ar, cotar, gotar, guftar (sohbet), guhar, hilbijar, jengar, kevnar, kirar, kovar, komar, nivîsar, noqar (vaftîzkar), pingar, pûtar, rengar, sergotar, şerar, şîşar, xewar, xîzar... Di wateyên cuda cuda de tê bikaranîn. Wek pîşe, navdêr, rengdêr û hewd.

11. -are

bijare, dilare, kevnare, kujare, mikare, pişare (xwarina ji bo banga dawetê), seyare (êrîşkar)... Wateyên baştir, hêjatir an jî kevntir dide bêjeyê.

12. -tî/etî

bajartî, bavîtî, biratî, bûkîtî, cahştî, dostîtî, durûtî, dûrîtî, gundîtî, kirîbetî, kerêtî, ke-sayetî, komelayetî, kûrîtî, malbetî, kurda(ye)tî, mi-rovayetî, xinametî, xwendekartî, xwedatî. Ev parkît taybetmendiyê dide dîyarkirin. Hinek nivîskar parkîta "et-atî" tevlihev dikin û dinivîsîn ku bi navê "-yetî-yatî" jî parkîtekê heye. Wek: Komelayetî, mirovayetî... Parkîta "tî" li gor tîpa dawiya bêjeyê tê guhar-tin. Dema du an jî sê tîpên bêdeng li paşiya bêjeyê bin û parkîta "tî" jî bigire, wê demê dikare parkît bibe "etî, îtî" an jî "atî"... Wek kirîvatî, komela yetî, dostîtî... Halbû ku tîpa "y" gîhanek e û dikeve navbera du tîpên dengdêr. Ji ber vê yekê jî, bi navê "ytî" an jî "yatî" parkîteke kurdî tune ye.

13. -avêj

agiravêj, avavêj (fiskiye, artîziyen), bextavêj, bombavêj, derewavêj, dûxanavêj (bom-beya bi duxan), gulleavêj, guravêj, hevavêj, hûravêj (çekê otomatîk), îmanavêj, kemendavêj, kevitavêj, kurtavêj, piştavêj, qûnavêj, ronahîavêj, rimavêj, sêlikavêj (dîsk), roketavêj, tîravêj, topavêj, torpîlavêj, xweavêj... Ev parkît bi alîkariya lêkera "avêtinê" pêk tê.

14. -awe

badilawe, bêawe, germawe, serawe, sermawe... Parkîta "awe" rewşê dide dîyarkirin. Bingehê gotinê "hawe" ye di nav demê de tîpa "h" ketiye û bûye awe.

15. -az

beraz, qelaz, telaz, tolaz.. Rewşeke negatîv dide dîyarkirin û paşkîtekê ne hewqas berhemdar û kêrhatî ye.

16. - bar

alozbar, barbar, berfbar, binbar, birbar (portabel), cazîbebar, cobar, çavnebar, çimbar, dengbar, dîtbar, girbar(î) (tehemul), guhêrbar, guhêzbar, gunehbar, gumanbar, hêsirbar, kehrîbar, kirêbar, kubar, nalebar, nedîtbar, nexwarbar, nêrbar, nûbar (turfanda), razbar, rêzbar, rondikbar, rûbar, serbar, sivikbar, sizabar, sotebar, starbar, stemfar, şekerbar, tawanbar, ta-wangbar, xembar, xetabar, xwarbar, vexwarbar, zêbar, zirêbar... Parkîta "bar" di van wateyan de tê bi kar anîn: zêde, ne stabîl û di lêhatinê de tê bi karanîn.

17. -bare

derbare, dubare, sêbare... Bare, cîyê çend û car digire.

18. -baz

agirbaz, cadûbaz, canbaz, cengbaz, çavbaz, çekbaz, çenebaz, dekbaz, derewbaz, dilbaz, dîlbaz, duzenbaz, efsanebaz, efsûnbaz, eşqebaz, evînbaz, êrîşbaz, fêlbaz, firîbaz, fitnebaz, fîrazbaz, helqebaz, herambaz, heqlebaz, hevbaz (hevsal), hîlebaz, hoqebaz, jinbaz (hovarda), kewbaz, key-sbaz, kînbaz, kozîbaz, laşbaz(î), lewlebaz, livbaz, lîstikbaz, mekirbaz (xêrnexwaz), metrebaz

(şarlatan), mihirbaz, nêrînbaz, nîşanbaz (nimûne), qamçîbaz, qumarbaz, qulebaz (delavereci), rêbaz, rimbaz, rûbaz, serbaz, sîhêrbaz, şahbaz (bi kêf), şanbaz, şaklabaz (dalkavuk), şebêkbaz (sîhîrbaz), şembaz, şerbaz, şûrbaz, tekvandobaz, xemzebaz, zimanbaz, zorbaz, zorbazî...

Ev parkît ji bo kes an jî bûyerên ku bêtir bi çalakî û bizavê ve girêdayîne, ji bo fen û huner jî tê bikaranîn.

19. -bend

avbend, bazbend, çekbend (êleg), çiçikbend (sudyen), darbend, derbend (zixur-geçît), destbend, dîwarbend, dolbend (şarika serê jinan), dorbend, fenerbend, gulbend, goşebend, hevbend, hevalbend kombend, malbend, merbend (baxê solan), nalbend, nexşebend, nêrûbend, pev-bend, qesrbend (mîmar), qelebend (zîndanî), rehîmbend (pesar), rûbend (çarşeva ser doşekê), sazband, serband, sihirbend, sîngembend, sîlebend, solbend, terkîbend, têlbend, xerbend...

Ev parkît di wateya kombûn, çêkirin û girêdanê de tê bikaranîn.

20. -ber

berber, desteber, dijraber, dilber, dîtber (konkret), emîrber, fermanber, guhber, guherber, heyber (heyî), nameber, navber, nûber (turfanda), paşber, peyamber, pêşber, pêveber (artibut), pîber (koruyucu), pîşkber, raber (hember), razber (ab- strak), reneber, rêber, rihber (zindî), sazber, serber, sêber (sêgoşe, ûçboyut), şênber (maddî), xweber (di gramatîkê de navên eşya û tişt), xweşber (tabîî)... Du wateyên "ber" hene: yek ji birînê tê û ya din jî, ji hember tê.

21. -best

darbest, dilbest, helbest, mebest, pêbest (benê ku ling pê girê didin.), pêrbest (daçek), serbest, zimanbest(bêdeng)... Di wateya hunandin û lihevanînê de tê bi karanîn. Di zaravayê soranî de parkîta "best" bêtir aktîv e.

22. -bêj

awazbêj, bêjbêj (ji bo kesên geveze ku pir dipeyîvin), bestebêj, buherkbêj, dengbêj, destanbêj, dîlokbêj, dîrokbêj, çîrokbêj, goranîbêj, gotûbêj, gulbêj, hayranbêj (yê ku stranên hayra-

nok dibêje), henekbêj, hostanîbêj, hûrbêj (gotinên nerm), kombêj, lavebêj, lawjebêj, lawikbêj, mese-lebêj, mêjbêj, niktebêj, niktezan, nûçebêj, pîrbêj, rastîbêj, rewanbêj (hêsa û sivik), rimbêj, serpêhatîbêj, selewatbêj, stranbêj, teraqbêj, wendebêj, wanebêj, wêjebêj, xurdebêj (pêşkît û parkît), xweşbêj (sohbetxweş), xwebêj... Ev parkît ji bêjeya "gotinê" çêdibe yanî yê/ya ku dibêje.

23. -bir

agirbir, avbir, berîkbir (diz), birêvebir, bîrbir, cawbir (meqes), çavbir, çilobir, çolbir (rêbir), darbir, dengbir (aletê ku deng kêr dike), destbir, derbir, êşbir, fermanbir, gotinbir, hesin-bir, hevbir, kevirbir, kumbir, kurtebir, namebir (postaci), nanbir, navbir, navikbir, nermebir (fêlbazên ku bi nermî mirov dixapînin), peyman-bir, pezbir, pêşbir, porbir, qismetbir, qirikbir, qolbir, rêbir, rêvebir, risqbir, serbir, sermabir, sozbir, şûrbir, tabir, têkilîbir, xeberbir, xwebir, xwînbir... Parkîta "bir" ji du lekerên cuda çêdibe: Yek ji lêkera "birîn" û ya din jî, ji lêkera "birin" e. Go-tinbir, namebir, rêvebir, xeberbir.. ji lêkera "birin" hatine çêkirin.

24. -bîn

dûrbîn, hûrbîn, gulbîn, kurtbîn, kûrbîn, malbîn, lezbîn, nobîn, nûbîn, robîn, rojbîn, tengbîn, xwebîn, xweşbîn...

Ev parkît ji lêkera dîtî hatine çêkirin.

25. -bîr

dûrbîr, kûrbîr, rewşenbîr, ronakbîr... Di wateya kese ku bîr pe dibe an jî dizane de tê bikaranîn.
 == 26. -çe == bexçe, boxçe, deryaçe, demançe, derîçe, kemaçe, kuçe, kulîçe, navçe, nûçe, perçe, serçe (mandela ku pê cil digirin), xalîçe, xwençe... Parkîta "çe" biçûk û xweşikbûnê dide dîyar-kirin.

27. -çîn

ewçîn, giyaçîn, gulçîn, mayînçîn, mazîçîn, pembûçîn, perçîn, titûnçîn... Di şûna parkîta "çîn" de parkîta "çin" jî bi kar tînin. Ev parkît ji lêkera çînin pêk tê.

28. -da

bînda, çivda, dengda, gulda, malda,

navda, rojda, ronda, rûda, şaxda, şevda, xwedêda... Ev parkît bi lêkera "dan" çêdibe û mirov dikare bi alîkariya wê gelek peyvên nû biafirîne.

29. -dan

avdan, ardan, benzîndan, biryardan, candan, dengdan, destdan, dûdan, guhdan, guldan, jehrdan, jîndan, kardan, lemdan, mafdan, maldan, nandan, paldan, rêdan, ronahîdan, ruhdan, rûdan, serdan, serlêdan, şîrdan, xwarindan, xwêdan... Ev parkît bi alîkariya lêkera "dan" pêk tê û mirov dikare bîne dawiya gelek bêjeyan.

30. -dan(k)

agirdank, avdank, barûtdank, derzîdank, çaydank, fişekdank, findank (mûm dank), guhdank (ahîze), hêkdank, îsotdank, kevçîdank, kildank, masîdank (akvaryum) mîz dank (kodika mîza zarokan), peldank, peredank (kombara), pevdank, pênuşdank, pêşîrdank (sudyen), qirşdank (sepeta ku mirov kaxez û qirşan davêjê, çöpsepeti), şekirdank, tilîdank (guşpan, gûzvank), xanedan, xwelîdank, xwê-dank... Di zimanê axaftinê de tîpa "k" ketiye û wek "dan" tê gotin. Dank, wateya cîyê biçûk ku mirov tiştêk dike navê. Ji dagirtinê tê.

31. -dar

abrûdar (bi şeref), ahengdar, agahdar, aladar (bayrakdar), armanedar, avdar, axûdar, (bi jehr), azîmdar, badar (bawîbûn), baldar, bedar (feqîr, nedar), behîdar, bejndar, berhemdar, behrdar, berhevdar, bersivdar, berxweddar, beşdar, bezdar (bi bez), bihadar, birîndar, bindar, bijûndar, biryardar, bîdar (hişyar), bîhndar, bîrdar, bîstandar, bondar, candar, cegerdar (bi cesaret), cejndar, celebdar, çekdar, çêjdar, çildar, daxîdar, defterdar, demandar, dersdar, desthilat-dar, dengdar, deyndar, dezgehedar (xwedî kar), dildar, dimîdar, diravdar, dîdar, dîldar (koledar), dîndar, dîzdar, domdar, dozdar, dudar (dema lêkera borî), dukandar, dunder, emekdar, eleqe-dar, eqildar, erkdar, evîndar, ezîmdar, fehldar, fer-mandar, fêmdar, fikirdar, fîrazdar, gazindar, gencînedar, geşedar, gilîdar, giramîdar (muhterem), girdar, giyandar, (giyanewe), goşdar (bi goşt), gotindar, goşedar, guhandar (memeli), guhdar, guhnedar, gumandar, guldar, haydar, heqdar, hevdar (hevbeş), hestdar, hewcedar, hêvîdar, hêzdar,

hingivdar, hişdar, hîmdar, hîndar, hîsedar, hukim-dar, intdar, jandar, jehrdar, jîndar, kardar, karxa-nedar, kasedar, kendar (mîzahî), keremdar, kezîdar, kêfdar, kindar, kirêdar, kirdar, kirîdar, kîndar, koledar, komekdar, kovandar, kujdar, le-kedar, lezetdar, lênûsdar (defterdar), maldar, mafdar, manîdar, merezdar, metirsîdar, mezdar, mêldar, mêvandar, mêweddar, mildar, mijokdar, minetdar, mizdar (şîrîntirş), mizgîndar (mîsyoner), mulkdar, namîdar, nandar, navdar, na/.dar, nedar (feqîr), netndar (şil), nêredar (kontrolor), nimûnedar, nijdar (bijûndar), nirxdar, nîgehbar, nîşandar, nobedar, nojdar, oldar, pakdar, paldar, patdar (ortak), paydar (domdar), payedar, perde-dar, peredar, perendar, pesindar, peyvdar, pêdar (sebat), pêldar, pêdar (şahlanma), pêşdar (pêşeng), piş(t)dar, pişkdar, pîjindar (şivît), pîldar (falavêj), pîtdar, pûldar, qerzdar (deyndar), qewildar, qulix-dar, ramandar, rayedar (xwedîyê dîtin), razdar (qeyde), rexdar, rexnedar, rewîşdar, rezdar, redar, rêzdar, riftdar, rikdar, rimildar, rojdar, rondar, rûndar (bi rûn), selahîyetdar, serdar, sermayedar, serfermandar, semînerdar, serîdar, serxweddar, sirmedar, sîdar, soredar, sozdar, sudar, sûcdar, spasdar, surdar (bi heycan), şanedar, şaxdar, şekirdar, şerdar, şermedar, şetdar, şêdar (şil), şêwirdar, şêndar, şikdar, şikirdar, şîndar, şîridar, tahmdar, temsîldar, tekerdar, terefdar, terşdar (xwedî pez), tevnedar, têkildar, tirsdar, tîndar, tobedar, tuwandar, ulimdar, vîndar, wanedar (dersdar), wefadar, xaldar, xawêndar (bi şeref), xeberdar, xedar, xerîdar, xêrdar, xirêdar, xiznedar, xwîndar, watedar, wefadar, weznedar, wezîfedar, wênedar, wurşedar, zemîndar, zengildar (saeta bi zîl), zêdedar, zilindar, zîpdar, zîyandar, zordar, zordarî...

Parkîta "dar" di wateyên xwedî wezîve, mal, kar, berpirsîyar, hukim û nav û deng de tê bikaranîn. Parkîta "dar" bêtir bi kar hatî ye. Li gor de-veran sê parkîtên ku bêtir tên bikaranîn: "dar, "kar" û "van" tên têkil kirin û carnan bi şaşî tên bi karanîn.

32. -de

balinde, bexşînde, dirinde (wehşî), dîyarde (olgu), firinde, gerînenede, gewende, girîde, kirde, kurdende, mayînde, qûnde, serde, şande (mîsyoner), xwende, zende....

Ev parkît rewş, taybetî û reng dide dîyar û ze-lalkirin.

33. -dek

bindek, girdek (tîpên mezin), hûrdek (tîpên biçûk), nîşandek (îşaret), serdek... Parkîta rewş diyarkirin û rengdêrîyê ye.

34 -der

bader (tornavîda), bender, derbeder, bexjînder, beder, birader, hewleder, jander, jêder, mader, makder, navder, rader, rasteder, şevder, zêder (zayende)...

Rewş û posîzyonê dide dîyarkirin. Carnan wateya xwe ji lêkera "derketin" jî digire.

35. -dêr

afirandêr, avdêr (sulamaci), berhemdêr, berxwedêr, bonodêr, çavdêr (nêrevan), çekdêr (bononêr), dengdêr (tîpên bi deng), deyndêr (ala-cakli), femandêr, guhdêr, hevgirdêr (tomarker), kardêr (patron), kirêdêr (kiralik), mast(d)êr, navdêr (isim), polîçedêr, rengdêr (sifat), serhildêr, şehnedêr, şevdêr, xwepêşandêr,... Di wateyên berpirsiyar, wezîfedar, çêkir û xwedî de tê bikaranîn. Ev parkît bêtir di zimanê nivîskî de tê bikaranîn û bi giranî û pirani bi soranî ye. Di van salên dawiyê de her ku diçe parkîta "dêr" bêtir tê bikaranîn û bi taybetî jî, ji bo bêjeyên nû pêwîstî bi vê parkîtê heye.

36. -dirû

cildirû, çermdirû, genimdirû, kinc-dirû, paldirû, soldirû... Parkîteke lêkerî ye û ji lêkera dirûn tê. Cî û. warê bikaranîna wê gelek teng e.

37. -dîn

guldîn, kadîn, Mêrdîn, paşedîn, şemdîn, sêvdîn, şevdîn, tacdîn...

== Parkîta "dîn" ji lêkera dîtinê tê û ev parkît weha ne zêde bi berhemdar û kêrhatî ye.

38. -doş

çêlekdoş, gadoş (sermezin), gundîdoş, mangedoş, mirovdoş (kedxwar), mîhdoş, pezdoş,.. Ev parkît ji lêkera dotinê te. Di wateyên kelk, kar û zarpêkirinê de tê bikaranîn.

39. -doz

çewaldoz, kînedoz, palandoz, pînedoz, soldoz Parkîteke dîrokî û kevn e. Ji "dirûz" tê û bigu-
haztinê re bûye "doz". Rastiya wê çewaldirûz, pînedirûz û soldirûz e. Lê dîsan jî divê mirov vê
parkîta kurdî biparêze; dibe ku di pêş de, ev bi kar bê û ji bo hinek bêjeyên din jî bê bikaranîn.

40. -e

bêje, beze, bijarte, bineke, dermale, fîroke, gewre, keske, kirde, kûre, sereke, sore, xwende...
Ev parkît zêde ne dewlemend e, bi sînor e û rewş û têviliyan dide dîyarkirin.

41. ek/eke

badek, bendek, bizdonek, çilek, destek, dehek, fîsek, fişek, fortek, gîhanek, hûrek, kevanek,
komek, kotek, kulek, kurtek, mizdanek, nefsek, newêrek, nîşandek, paçek, parsek, perdek,
pêçek, pişteq, qeşmerek, qumatek, qûnek, qulek, rastek (dîrek), rawek (xuya), serek, şanek,
şeşek, tirsonek, tirek, virek, zirek, zîrek... Ev parkît rewş, hejmar û taybetiya kes û tiştan dide
dîyarkirin.

42. -ende

berfende (aşîd), dirinde (rastî dirende ye), gerînende, gewende, gewzende, navende (tîpa "e"
ji ketiyê û bûye navend), nivîsende (katip), şermende (şermok), parakende, pergende, zayende
tîpa "e" ji dawiyê ketiyê û zayend maye... Taybetmendiyê dide dîyarkirin.

43. -eng

bîşeng, çeleng, erjeng (felaket), leheng, peleseng, pêşeng, pirşeng, porşeng, xeleng, xo-şeng...

Mirov dikare bêje ku ev parkîta xweşikbûn û pesndariyê ye.

44. -er

bîner, bû(y)er, dever, firoşer koçer, kujer, koser, lêker, nûner, parêzer, têkoşer...

Yê/ya ku dike an bi alîkariya wî/wê dibe û pêk tê. Di zimanê nivîskî e her ku diçe bêtir tê bika-
ranîn.

45. -erok

çilerok, naverok...

Kesî heta niha behsa vê parkîte nekiriye.

46. -ev

rojev...

Ez nikaribûm ji vê parkîta nû re nimûneya duyem bibînim. Li ser çî prensîbî ev parkît hatiye afirandin kes nizane. Ez texmîn dikim ku orjînalê vê parîtê "-hev" û ji bo ku tîpa "j" û "h" hatine kêleka hev, tîpa "h" ketiye û bûye "-ev". Wek: bahev, berhev, binhev, cemhev, gelhev, paşhev, pêşhev, serhev, tevhev...

47. -ê

bizinê, bûkê, cîranê, çêlekê, dayê, deryayê, jinê, keçê, malê, mamosteyê, piştê, metê, xwişkê...

Mirov dikare bi vî awayî tîpa "ê" bîne dawîya gelek navdêrên mê. Ev ji bo hîtabkirina navdêrên mê û tewangê tê bikaranîn. Ji bo hîtabkirina navdêrên nêr jî tîpa "o" tên dawîya bêjeyan. Wek: nêriyo, zavayo, gayo, kuro, mamosteyo, mamo... Lê, di rewşa gelehejmar de parkîta "e" dibe "no." an jî dibe "ino." Ev him ji bo zayenda nêr û him jî ji bo ya mê derbas dibe. Wek: bizino, bûkno, cîrano... Dema bêjeyeke cara pêşî parkîta "ik" bigire û cara duyem jî parkîta "ê" bê paş wê, bêjeya nû vê carê vê forma han digire. bejziravikê, çelengê, dayikê, dilovanike, jînikê, kinikê, pîsikê, rindikê, xwişkê.... Hinek nivîskar ji vê rewşê re parkîta - ikê/kê dibêjin ku ev ne rast e. Ev ne parkîteke bi serê xwe ye, du parkît li pey hev tên. Mînak: Bêjeya "kin" cara pêşî parkîta "ik" digire û dibe "kinik." Cara duyem parkîta "e" digire û dibe "kinikê." Di kurdî de bêjeyek dikare çend parkîtan li dû hev bigire. Wek: dukan+dar+î, zan+a+tî, bajar +van+tî, şî+van+î, nîştîman+perwer+î

48. -êr ==

dilêr (qehreman), hilbijêr (seçmen),

kûnêr, panêr, serhildêr, şilêr, venêr, weşînêr Yê/ya ku aktîv û lê dinêre, pê mijûl e. Ev parkît ji soranî hatiye nav kurmanci. Di van salên dawî de her ku diçe di zimanê nivîskî yê kurmancî de jî bêtir tê bikaranîn.

49. -firîn == çûkfirîn, dilfirîn, hevfirîn, kevokfirîn, kotelfirîn, kurtefirîn, kevirfirîn (mecenîq), nefîrîn, serfirîn, tirsfirîn, xwefirîn... Ev bi alîkariya lêkera "firîn" pêk tê. Mirov bi vê parkît û metodê dikare gelek bêjeyên nû biafirîne.

50. -firoş ==

ardfiroş, avfiroş, bavfiroş, belafiroş, birafiroş, cilfiroş, dêfiroş, dewfiroş, eşîrfiroş, genimfiroş, goştîfiroş, gulîfiroş, hirîfiroş, jinîfiroş, keçîfiroş, kibrîtfiroş, kurdfiroş, malîfiroş, makînefiroş, mastîfiroş, meyîfiroş, mirovfiroş, nanîfiroş, nazîfiroş, perçefiroş, pirtûkfiroş, pincarfiroş, rûnfiroş, şekîrfiroş, şerfîroş, şîrfiroş, xanîfiroş, xwefiroş, xwînfiroş, welatîfiroş, zembîlfiroş...

Tiştên ku bi gotina "firoş" ve girêdayî be, mirov dikare bi vê parkîta "firoş" bêjeyên nû çêbike. Parkîteke lêkerî ye.

51. -gal

çangal, pergala, şengal, tengal... Rewş û form dide dîyarkirin.

52. -gan

axpîngan, bargan, bazirgan, lalîgan, rûngan (tucarê rûn), xaçirgan...

Yê ku bi kar ve mijûl e, bêjeya pîşeyî diafirîne. Ev parkît hewqas ne kêrhatî ye û mirov nikare ji bo nimûne çend gotinên din jî bibîne.

53. -gar

amojgar, jengar, pingar, rojgar, sazgar, parêzgar, yadîgar...

Di wateya kombûn, zanîn û pêşkêşkirinê de tê bikaranîn.

54. -gaz

belengaz, gerdengaz...

Ev parkîr di wateya perîşanî û pakîyê de tê bi-karanîn û zêde ne bi ber û bereket e.

55.-geh

amojgeh, aramgeh, asêgeh(barîkat, mewzî), azmûngeh, balafîrgeh, balgeh, baregeh (karargeh, bas) bergeh, bingeh, bihingeh(mesîre), borangeh (cîyê kevokan), civangeh, cîgeh, çargeh (meqamê muzîkê), çêregeh, (malîkxane, çiftlik), dadgeh, dangeh, danîşgeh, darêjgeh, dengê, dergeh, destegêh (tersxane), dezgeh, dirûngeh, dîtingeh, dûrgeh, êwirgeh (barinak), fêrgeh, firoşgeh, gorîngeh (di perestgehê de ser dihat jêkirin), havîngeh, hêjageh (hedefa askeri), îbadetgeh, îstegeh, îzgeh, jîngeh(ekolojî), kargeh, kevnargeh, kêlangez, kiblegeh, kungeh, lengergeh (iskele), leşkergeh, lewergeh, lîstikgeh, lîzgeh(ji lîzê), mêrgeh, mêtîngeh, mijûlgeh, nexweşgeh, nêrîngeh(fokos), nimêjgeh, nimînegeh, nivîsgeh (buro), nivîswergeh, pageh(garaj), palgeh (koltuk), pangeh(garaj), pazendgeh, perestgeh, perwerdegeh(talimgeh), peymangeh, pêgeh (rewş), pêşangeh, pîrsgeh, pîrozgeh, qedemgeh, qerargeh, rawestgeh, rewangeh, rûniştgeh, rûxistgeh, safgeh (aritma), sazgeh, sefgeh, sergom-geh, seyrangeh, sêgeh(meqamê muzîkê), sêzgeh, strîngeh, şargeh, şergeh, tavgeh, tarawgeh, têşgeh, tomargeh, vehesîngeh, venîşgeh(menzîl), wargeh, xwaringeh(mutfak), xwendegêh, yarîngeh(stad yum), zanîngeh, ziyaretgeh...

Di wateya cî û war de tê bikaranîn û parkîteke ku cîyê karanîna wê gelek fireh û bi ber e. Kamran Bedirxan di pirûka xwe ya "Rêzimana Kurdî" de, bi hejmara 21 û. bi navê sernivîsa guhêrkerên din yê paşdanî de bi navê "gah" jî parkîrê hejmartiyê û ji bo wê jî mînaka "xwende-gah" daye. Bi rastî bi navê "gah" parkîrê bi serê xwe nîne. Ew ne "gah" e "geh" e û mînak jî dibe "xwendegêh."

56. -gele

hergele, pergele, sengele, şêrgele... Rewşeke negatîv dide dîyarkirin.

57. -ger

bager, banger, bazîger(lîstikvan), bêrgeh (bêrîgeh), cadûger, çavlêger, çayger, dadger (hakim), dager, dermanger(eczaci), dolabger, dozger(savci), efsûnger, gewzeger(sefîh), govend-ger, hesinger, karger, karîger, kirîger (alici), lêkolînger, mertalger, meyger, mêtînger, misoger, neşteger (cerah), pager(devriye), parêzger, peyger, pêger(nesne), rêger, rojnameger, semager, senger, sêlikger(gramafon), sifirger, şanoger, şerbetger, şevger, şevlêger, şîrger, şoreşger, tevger, werger, zêrînger(mucevherci)... Dîsa piraniya gramernivîsên kurdî, dinivîsin ku bi navê "girîn" jî parkîteke kurdî heye û ji bo vê jî mînakên weha didin: "Çixirgerîn, şopgerîn, çavgerîn" û hwd. Ev jî ne rast û durust e. Wek ku xuya ye, ev bêjeyên han bêjeyên hevdudanî ne. Ji bêjeyên "şop" û "gerin" pêkhatine û li derî babeta parkîtan e. Bêjeyeke hevdudanî ye.

58. -gêr

bankgêr(bankacî), bingêr, çapgêr, dagêr, makînegêr, mangêr, saloxgêr(istihbaratçi), sergêr, wergêr(çevirmen), werzgêr, xwegêr...

Ev parkît di zaravayê me yê soranî de bêtir tê bi kar anîn. Di van salên dawî de hêdî hêdî dikeve nav zaravayê kurmancî yê nivîskî jî. Di wateya yê/ ya ku dike û digire de tê bikaranîn.

59. -gir/gîr

ahengir, amadegîr, alîgir, arşîvgir, avgîr (bataklik, sunger), bacgir(xercgir, tehsîldar), balafirgir (keştiyên ku balafiran digirin), bargir (savunma), bargîr, bergir(ewlekar), bertîlger, bigir (alici), bonogir, cangîr, cîgir(yedek), cîhangîr, çepgir(solcu), çekgir, çeşnîgir, dadgir(hakîm), dagir, demîngir(alîşik), dengir(cîhazê ku deng digire), destgir, destegîr, dewletgîr(devletçî), dilgîr, dîyarîgir, giramgir(hurmetkar), dugir, gulaşgîr, hevger, girsegir, herêmgîr, herîgir, jengir, kefgîr, kewgîr, koçegîr(sîlahşor), kungir, layangir, libgir, masîgir, mayîngir (makînen mayînan), mîratgir, mûçegir (yên ku maaş digirin), la yangir, levgîr(enerjîk), nangîr, pargir(xwedî hîse), paşgir, pelgir, pergîr, pêjîngir(duyarli), pêşgîr, piştgir, pişkegîr (partîzan), polîçegir, qedirgir, rast-gir (sagci), rexnegir, rêgir, saltgîr(kirdeya aktîv), şîşgîr, şêrgîr, tagir, wergir(alici), wênegir(aletên ku resim digirin), xelatgir, xercgir, xewgîr, xûgir (demîngir), xûgîgir...

Ev parkît ji lêkera "girtin" tê û di zimanê nivîskî de her ku diçe bêtir tê bikaranîn. Di kur-mancî de ev parkît bêtir wek "gir" û di soranî de jî wek "gîr" tê bi kar anîn.

60. -gîn

bugîn(nesne), cûgîn (olgu), dengîn, dezgîn (dizgin), dingîn, dîyargîn(sifat), fêrgîn, gulgîn, hevgîn, lezgîn, mizgîn, navgîn, paşgîn pergîn(pêşwazî), pêşgîn, sergîn, şevgîn, şingîn, xwazgîn, xemgîn... Ev parkît, pêve girêdayî, hezkirin û rewşê dide dîyar kirin.

61. -go

dewgo, pirgo, qenego, rastgo, xweşgo. "Go", kurtkirina "gotin"ê ye. Bi forma dirêjî jî tê gotin. Wek: Pirogot, rastgot, xweşgot..

62. -guhêz

denguhêz, nûçeguhez(muhabîr), xe- berguhêz(fesad), wêneguhêz... Ji gotina "guhertin," tê û peyvên nûjen çêdike. Di zimanê teknîkê de bêtir tê bikaranîn.

63. -gûn

algûn (pembeyê tarî), argûn (ji agir), avgûn (şîne asmanî), pargûn (coya biçûk ku li derdora konê tê kolan), piştgûn (dûr), şîgûn (genimê avî)...

Celadet Bedirxan û Rizgar Baran, parkîta "gûn" wek ' gon bikaranîne. Ev parkîta han di zaravayê dimilî de jî heye. (Celadet Bedirxan- Roger Lescot Kurtçe Gramerî rûpel 287, Rizgar Baran, Uygulamali Kûrtçe Dersleri- Dersên Kurdî rûpel 332 binêrin.)

64. -heng

aheng, çel(h)eng, ferheng, leheng, pêş(h)eng, serheng, şevaheng... Parkîta "heng" wateya spehî, jêhatî û serûberiyê dide bêjeyê.

65 -hev

bahev, berhev, binhev, cemhev, gelhev, paşhev, pêşhev, serhev, tevhev, tevlihev, têkilhev. Di wateya kombûn, rêzbûn û zêdebûnê de tê bi kar anîn.

66. -hingêv

kevkanokhingêv, şûrhingêv (sîlehşor), rimhingêv, tifinghingêv, tîr-hingêv.... Di wateya hoste û lêdanê de tê bikaranîn û ev parkît di zimanê me de gelek kême.

67. -ik

bendik, birçik, bozik, çavik, çirik, darik, dasik, dilik, jînik, gewrik, gloverik, keçik, kinik, kumik, kurik, lawik, mêrik, pîsik, pirçik, rindik, reşik, sorik, virik, xweşik, zerik...

Di wateya spehî û biçûkbûnê de tê bikaranîn, Selîm Biçûk bi parkîta "ik" re ya "çik" jî nivîsandiye û ji bo vê jî, vê mînakê daye: Rêçik, derçik. Min "derçik" fême nekir ka mebesta wî çi ye. Lê rêçik ne rast e. Ji ber ku kok "rêç" e û parkît jî "ik" e. (Selîm Biçûk Rêzimanê Kurdî rûpel 68.) Ev parkîteke bi ber û dewlemend de, mirov dikare bi ve parkîte bi hezaran gotin biafrîne. Ji bo hezkirin, biçûkdîtin, pîskirin belengazî, xizanî, nêzîktî û ciwantiyê tê bikaranîn.

68. -inde

gerî(ne)nde, keçinde(ji bo kesî ku keça wî/wê tune be, tê gotin), korinde, kujinde, kurinde, mayinde, warinde, za(y)inde.... Parkîta "inde" di wateyên mayîn, tunebûn û girêdayî de tê bikaranîn.

== 69 -ing == aring(nexweşiyê pez û wateya xwe ji ar digire), awing(şebnem, avî), bersing, bêjing, daring, deling, garing, hevling, hevring, kaşing, kuling, paring, paşing, piling, quling, rejing (çirika avê), reving, rojing(ji rojê tê. yanî pence-re), saring, sering, siping(yemek otu), sizing, soring, şijing(sifnîk, melkis), tîfing, ziring, ziving (ji zivistanê tê)... Di wateya wekhev, dişibe hev, nêzîkî hev de tê bikaranîn.

== 70. -istan == Afganistan, Arabistan, Bulgaristan, beristan, bihuşistan, bîyanistan, Çaçanistan, çîrok-istan, çolistan, daristan, dibistan, diristan, dilistan, dojehistan, Ermenistan, germistan, goristan, gulis-tan, guristan(cî û welatê diz û talanê), Gurcis-tan, Halistan(li Kurdistanê herêmek), Hîndistan, îngilistan, kafiristan, karistan, Kazakistan, kewis-tan, Kirgisiztan, Kurdistan, Kuzistan, Loristan, Macaristan, Mogolistan, meyistan(cîyê xwarin û vexwarinê), muristan, Pakistan, qûmistan, rovis-tan(cî û welatê delevêre, dek û dolaban), şaristan, şevistan, şênistan (cîyê şên û xweş), taris-tan, Tacikistan... Partkîta "istan" bi gelemperî ji bo cî û welatê tê bi kar anîn, carnan ji bo rewşê jî dibe. Wek "şevistan, meyistan" û "şênistan...." Ev parkît gelek bi berhemdar û kêrhatî ye û her ku diçe di zimanê nivîskî de cîyê xwe digire.

71. -î

aramî, Amedî, aşî, avî, bajarî, bankgêrî (bankacilik), başî, bejî, berpirsyarî, bihuştî (cennetî), bindarî, birdî, Dihokî, dojebi, çavî, çêkirî, dîtî, ezîzokî(kubar), girtî, gohtî, gundî, hişmendî, kurdî, laşparêzî(parastina laş, vucudê), Mêrdînî, nezanî, nojdarî(selametî), paşdanî, patî, tawî, serfirazî, rizgarkirî, şandî (qasid), şarmendî, şaristanî, şewitî, şikestî, talanî, terasî, tolazî, vekirî, Wanî, xerabî, xwînî, xwendî... Parkîta "î" rewş û cîwazbûnê dide dîyarkirin. Ev parkît jî bêhejmar e. Mirov dikare bi alîkariya vê parkîtê bi hezaran bêjeyên nû çêbike. Di derbarê parkîta "î" de, li pirtûka Feqî Huseyn Sagniç "Rêzimanê Kurdî" rûpel 56-57 binêrin, ka çi tevlihevî û şaşî hene. Dîsa Feqî Huseyn parkît ku navê "qertaf" lê kiriye; bêje, bêjeyên hevdudanî û formê neyînî tevlihev kiriye. Li heman pirtûkê rûpel 90 ku bi sernavê "Rengdêrên Hevedudanî" binêrin. Celadet û gelek gramernivîsên kurd, dinivîsin ku bi navê "ahî" parkîtekê heye û ji bo vê jî mînakên wek agahî, bilindahî, kûrahî, dirêjahî, germahî mezinahî û hwd. didin. Ev jî ne rast e. Ji ber ku parkît -"î" ye û dema parkîta "î" tê dawiyê, tîpa "h" dikeve navbera herdu dengdêran. Heger em li van mînakan binêrin, rastî weha ye: "agaî, avaî, bilindaî ne. Dikare di şûna tîpa "h" de tîpa "y" jî bikeve navberê. Lê divê mirov ji bîr neke ku hemû parkîtên "î" ne di heman wateyê de ne.

72. -în

agirîn, avîn, axîn, bingehîn, birgîn, bengîn, berfîn, cawîn, darîn, dawîn, derewîn, dilîn, dozîn (içgudu), faraşîn, genimîn, gulîn, gurmîn, hesinîn, jêrîn, jorîn, malîn, keçîn, kevîn, kevirîn, kesîn, kurîn, mizgîn, nalîn, navîn, parîn, paşîn, perçîn, pêşîn, rengîn, rojîn, şermîn, şevîn, tavîn, tevîn, vekolîn, xemlîn, xwemalîn, yarîn, zerîn, zêrîn, zîvîn.... Parkîta "în" bêtir rewş û cî dide dîyarkirin. Bi vê parkîtê mirov dikare gelek bêjeyên nû çêbike.

73. -îne

çarîne, kulîne, kurdîne... Tê wateya wek û dişibe wî/wê. Di zaravayên dimilkî û soranî de jî ev parkît heye.

74. -înok

gerînok, şaneşînok, xapînok... Di wateyên fen û filbaziyê de tê bikaranîn.

75. -jen

arjen, avjen, bajen (perwane), bilûrjen, bûjen (malzeme), devjen, diljen, gotinjen, heste-jen, hirîjen, kemanjen, kevanjen (du wateyê vê gotinê hene: Yek ya ku kevanê pembû dijene û yê duyem jî tîr davêje.), livajen, muzîkjen, nûjen, pembûjen, rojen, tembûrjen, xeberjen, zurnejen... Parkîteke lêkerî ye û ji lêkera "jenîn" çêbûye.

76. jimêr

demjitrên(saet), dilopjimêr(enjek-sîyon), geljimêr(geljimar), katjimêr(bi soranî saet), pirjimêr, yekjimêr..

Ev parkîti ji lekera "jimartin" tê. Di kurdiya nûjen de roleke pozîtiv dilîze û her ku diçe bêtir tê bika-ranîn.

77. -kar

afirankar, alîkar, amadekar, amojkar (şêwirmend), aşîkar, avakar, berkar(nesne), ber-hevkar, bestekar, bexişkar, bêrêzkar, binekar, bi-zavkar, cirîtkar, canfedakar, cotkar, cudakar, dawedkar, daxwazkar, destkar, destekar, dirûnkar, dîdarkar, efsûnkar, efûkar, ewlekar, êrîşbaz, êrîşkar, êşkencekar, fedekar, fedîkar, fersendkar, fitnekar, gevizkar, guherînkar, gunehkar, helwestkar, hevtawankar, hevkar, hewezkar, hişimkar, hişmetkar, hîcîzkar, hîlekar, hînkar, hîndekar, hunkar, hurmedcar, îhanetkar, îcatkar, înatkar, îqnekar, îsyankar, îtaetkar, îtîrafkar, koşkar, kedkar, lavekar, mehfiirkar, merdekar, mirzkar, mirêkar, mînetkar, mînekar, navberkar, nivîskar, mêtîngehkar, navenkarj nazkar, nebekar, nebûkar(îtîrafkar), nexmekar, nexjkar, nimînekar, nîvkar, nîvekar(ortak), nîyazkar, parêzkar, perwerdekar, pêjinkar, pêkar, pêşkar, pîşekar, pîşkar(kirde), qebhetkar, qencîkar, rehekar, riyakar, rizgarkar, rozîkar, sarkar, sazkar, sazûmankar, sazişkar, sekar, serkar, (rektor), serfkar(tûketici), sextekar, sînemakar, stemkar, sozkar, şabkar, şakar, şankar, şatafatkar, şenkar, şermîkar, şînazkar, şîretkar, şîwekar, şuxilkar, şûmîkar, tawankar, talankar, te-lebkar, temaşekar, tevkar, tetbîqkar, timakar, tir-skar, vankar, werzişkar xapînkar(xapînok), xilas-kar, xudkar, xwekar(automat), xwendekar (telebe), xizmetkar, wêrankar, zînakar, zulimkar.... Mirov dikare bêje ev parkîteke pîşeyî ye. Yê/ya ku aktîv e û karekî an tiştekî dike. Parkîta "kar" di kurdî de yek ji wan e ku herî zêde tê bikaranîn. Ev di kurdiya kevn û ya nû de jî weha ye.

78. -ker

avaker, avjenker, banker (telal), belav-ker, berlêker, bêtirker, biçûker, boyaxker, cûmker, çavlêker(taqlîtçî), çewtîker (bi qabhat), çeyîker, çêker, dagîrker, darêjker, dehker, dengberzker (amplîfîkator), de-rewker, dilreşker, dilxweşker, dirançêker, diranker, dirûnker, diyarker, elektîker, falker, feneker (fenekqurnaz), filmçêker, fişker, germker (radya-tor), gezker, gilîker, guherker, havilker(çareger), helawker, helawçêker, hesinker, hîleker, hînker, hoker, karker, keremker, kêmkker, korsker, kurtan-ker, kûzeker, lavaker, lêker, lêbarker(isnad), leşker, losker, meraqker, mesrefker, mezinker, mijoker, mirarker, mîzker, nimêjker, nivîşker, paqijker, pareker, parker, parsker, pêdeker, pêjinker (hesas), peyker, pêşker, pirsker, piçûker, pîneker, pîşker, poşeker, qencîker, qiseker, raker, rastker, rawker, rizgarker, rîpoker, sabûnker, sarker, sefar-ker, simker, spîker, sohbetker, solker, şerker, şermker, şiroveker, şîretker, şorker, şuxilker, şûkar, şûmîker, tamîrker, talanker, tevineker, tehdeker, tamamker, tewanker, têrker, tinazker, tomarker, virker, wêranker, xerabker, xebatker, xelasker, xêrker, xîjîker, xurtker, yarîker, zarker(teqlîdçî), zêrker, zîvker, zorker, zûreker. Parkîtên "ker" û "kar" gelek nêzîkî hev in. Heta li hinek deveran di şûna "kar" de "ker" û li hinek deverên din jî di şûna "ker" de "kar" bikar tînin. Herdu weha nêzîkî hev in ku carnar mirov nikare bêje kîjan ji wan rast e. Parkîta "ker" jî wek ya "kar" aktîviyê dide dîyarkirin. Parkîta "ker" bingehî xwe bêtir ji lêkera "kirin" digire. Yanî ew kesî ku vî an jî wî tiştî dike. Mûrad Ciwan di şûna parkîta "ker" de parkîta "kir" bikaranîye. Rast e ev parkît ji lêkera "kirin" tê lê bi hezar salan e ku wek "kar" tê bikaranîn û di nav gel de rûniştî ye. Reşo Zîlan gotinên wek "karkir, şuxulkir" û hwd di wateya "bikêrhatî" de bikaranîye. Ez termînolojiya Reşo Zîlan rast û durist dibînim.

79. -kêş

afîyonkêş, aramkêş, avkêş(hortum), axînkêş, azabkêş, bakêş (havalandirma), balkêş, barkêş, berkêş, bêrikêş(kurekçi), binkêş, cefakêş, cezakêş, cixarekêş, çaqokêş, darkêş, demkêş, derdkêş, destekêş, destkêş, dênkêş, dilkêş, dozêş, dûkêş, esrarkêş, eskerkêş, firçekêş, fotokêş, gankêş, govetidkêş, gunahkêş, hevêş(mûadele), hev-sarkêş, hewakêş(ventîlator), kakêş, karkêş, kêrkêş, kêlindîkêş (tirpanci), kilkêş, kînkêş, kulkêş, makêş, mîxkêş, mîzkeş, neqîşkêş (desînator), nexşekêş, nîgarkêş, otokêş, pênskêş, qayîşkêş, qelemkêş, qelûnkêş, pêşkêş, piştîkêş, mistkeş, renekeş, rêkêş, rikêş, serkeş, serinckêş, sivîlkêş, şûrkêş, takêş, wênekêş, xemkêş, xencerkêş, xedceş, xeyalkêş, xîretkêş, xofkêş, xweşkêş, zehmetkêş... Ev parkît ji lêkera "kêşandin" tê. Parkîtên "keş" û "kêş" jî wek yê "gir" û "gîr" li gor herêm û

zaravayan tê guhertin. Li hinek herêmên kurmancî "keş" û li binek herêman jî "kêş" dibêjin. Giraniya zimanê nmskî li ser parkîta. "keş" e.

80. -kî

Badînkî, badkî, bajarkî, berfiradkî, devkî, dimbilkî, eşîrkî, gundkî, jinkî, kurdkî, Licêkî, mêrkî, mahmûdkî, niviskî, pêxemberkî, qeşmerkî, sorankî, şêtkî, tirkî, Serhedkî... Ev parkît rewş û şibandîne dide dîyatkirin. Parkîteke gelek bi ber û kêrhatî ye. Mirov dikare wê bîne dawîya gelek bêjeyî û bêjeyên nû biafirîne. Li hinek ciyan di şûna "-kî de" "-kanî" jî bi kartînin. Wek: jinkanî, keçkanî, lawkanî, mêrkanî, pêxemberkanî... Ev parkîta "kanî" di za-ravayê dimilî de jî tê bi karanîn. Dîsa di şûna parkîta "kî" de "carnan parkîta "wari" jî bikartînin. Wek kurdewarî, şêrewarî û hwd.

81. -koj

darkoj, hestîkoj, kundirkuj, nankuj, qûnkuj... Ev parkît ji lêkera "kojandin" tê û ne gelek bi-karhatî ye. Wateyê wê ya gelek negatîv heye û di zimanê argo de tê bikaranîn.

82. -kok

delal(k)ok, jinkok, keçkok, meşkok, reşkok, xweşkok... Parkîta biçûkbûn û xweşkbûnê ye. Mirov dikare bi vê metodê gelek bêjeyên nû çêbike.

83. -kuj

agirkuj (îtfaye), birakuj, dengkuj(aletê ku dengê sîlah kêr dîke), evînkuj, hişkuj, hevkuj, hêzkuj, jînkuj, karwankuj, komelkuj(qetlîam), kurdkuj, mirovkuj, mêrkûj, mêşkuj, otomobîlkuj, reşekuj, xewnkuj, xwekuj, zarokuj... Ji lêkera "kuştin" tê. Ji bo afrandina bêjeyên nû parkîteke gelek kêrhatî û berhemdar e.

84. -kut

bankut, dankut, darkut, goşkut, ling-kut, meykut, mîrkut, pîkut, serkut, sîrkut, şekirkut... Parkîteke lêkerî ye û ji lêkera "kutandin" tê û bêjeyên nû diafirîne.

85. -le

pîkole, tirole, zirtole... Ew parkîta han rewşeke negatîv dide dîyar kirin û hewqas ne bikêrhatî ye.

86. -lîn

biriqlîn, hê(k)lîn, xwêlîn... Di wateya ku tiştê jê çêdibe, bîhna wî/wê jê tê an jî nêzîkî wî/wê ye de tê bikaranîn.

87. -lor

çilor, erdgilor, gilor, kilor, nîverdgilor, pilot, şilor... Di wateyên gilor û. berbat de tê bi karandin. Zêde bi kar nayê.

88. -mal

bermal, destmal, navmal, pêşmal, pêş-temal, sermal, xwemal, yekmal... Di wateyên xwedî û parastinê de tê bikaranîn. Ji gotinên "mal" û "malaştin" çêdibe.

89. -man

atîman, deqman, der(d)man, ferman, homan, hewreman, karman, nîştîman, loqman, raman, sazîman, seqman, şadman, şadîman, şazeman, tekman, xoşman, xoşîman, xişman, zûman... Di wateya huner, şeref û hêz de tê bikaranîn.

90. -mend

bawermend, behremend, carmend, çîkmend, dadmend, derdimend, dermend, destûr-mend (îmtîyaz sahbî), dewlemend, eqilmend, ercûmend, ewlemend, gormend, hêjarnend, hişmend, hizirmend, hunermend, karmend, nîyazmend, parmend, parêzmend, pîrozmend, pîşemend, rahijmend (muteşebîs), rûmetmend, sazmend, sermend, sozmend, siyamend, şakirmend, şarmend, şêwirmend, şikomend, şîretmend, taybetmend, tevmend, xoşmend, xwehermend, xweşmend, yekmend, zarmend, zormend, zûmend... Gelek bêjeyên ku bi "mend" diqedin, carnan tîpa "e" û carnan jî tîpa "î" li parkîta "mend" tê barkirin û wê demê li gor rewşa hevokê "mend" formê "mende" an jî "mendî" digire. Wek: pîroz-mende, sermende an jî taybetmendî, dadmendî, sazmendî, şêwirmendî.. Hinek zimanzan û gra-mernivîsên kurd, parkîtên "mende" û mendî" du parkîtên cuda û serbixwe dibînin, ev ne rast e.

91. -mest

bedmest/î, bîhnrest, çavrest, dil-mest, ramanrest, setrest... Di wateya têrbûnê de lê di warê bîrûbawerî, şahî, şademanî û psîkolojîyê de jî tê bikaranîn.

92. -mêj

germêj, hevmêj, kedmêj, marmêj (hekîmê maran, ji xwînmijê tê.), şîrmêj, tozmêj (makîna malpaqijkirinê), xwemêj, xwêdanmêj, xwînmêj... Ev parkîteke lêkerî ye û ji lêkera "mêjandin" tê. Li hinek deveran di şûna parkîta "mêj" de "mij" jî dibêjin.

93. -miz

destmiz (ucrê), kedmiz... Parkîta "miz" di wateya xwedî ked û maf de tê bikaranîn. Ev parkît zêde ne bi ber û kêrhatî ye. == 94. -mîyan == germîyan, hemûyan, memîyan, ser-mîyan... Di wateyên xwedî, giştî û rewş diyarkirinê de tê bikaranîn.

95. -nak

agîrnak, dernak, tîrsnak, xeternak... Ev parkît zêde ne bi kêrhatî ye. Di zaravayê dimilî de bêtir tê bikaranîn.

96. -nas

bernas, ciwannas, civaknas, çavnas, çeknas, dîroknas, dostnas, dûrnas, feleknas, folk-lornas, gernas, hevalnas, hevenas, komelnas, kurd-nas, kurdînas, mafhas, mêrnas, pîrsnasî (termînolojî), qedirşînas, perînas, rênas, rêçenas, rojhilatnas, stêrknas, torenas, wêjenas, xwenas, zi-mannas... Ji lêkera "naskirin" tê. Di wateya zanîn û nas-kirinê de tê bikaranîn.

97. -naz

benaz, ciwannaz, dilnaz, gulnaz, hew-naz, nawnaz, pîrnaz, qurnaz, sewlînaz, serûnaz, şanaz, şabinaz, xatûnnaz, xweşnaz, yarnaz... Ev parkît, bêtir di wateyên nazik û kubarbûnê de tên bikaranîn.

98. -ner

afirîner, awazdaner, çewsêner, daner, derhêner, guherîner, lêhûrbûner, lêkolîner, payer, pêçer, pêfder, nûçer, nûner, reaksiyoner, şaner, weyner, xapîner... Ev parkît bêtir di zaravayê sorani de tê bi kar anîn lê her ku diçe di kurman-ciya niviskî de jî zêde dibe.

99 -nêr

dabeşnêr, damezranêr, danêr, çewsînêr, kunêr, nexweşnêr, panêr, pîşknêr, şahêr, tendurîstînêr...

Mirov dikare bêje ku ev parkît ji soranî hatiye nav kurmanciya niviskî û her ku diçe bêtir tê bi karanîn. Parkîtên "ner" û "nêr" gelek nêzîkî hev in, heta yek in. Li gor zarava û devokan tên guhertin.

100. -nivîs

çîroknivîs, destnivîs, dîroknivîs (tarîhçî), notenivîs, rexsernivîs, romannivîs, rojna- menivîs (nivîskarê meqaleyan), sernivîs, rêzsernivîs (paragraf), sernivîs, xweşnivîs (hattat)... Ev parkîta han ji lêkera "nivîsîn" tê û cî û qada wê zêde û berfireh e.

101. -nûs

çarenûs, lênûs, masenûs, pênenûs, serbûyernûs... Parkîta "nûs" ji soranî derbasî kurmancî bûye. Di kurmancî de "nivîs" e. Hinek nivîskar dixwa-zin di şûna "nûs'a soranî de, "nivîs'a. kurmancî bi karbînin û tînin jî. Wek: pênenivîs. Bi dîtina min ev ne rast e. Divê mirov gotina orîjîlan bigire. Him orîjînal wê dimîne û him jî, ji bo yekîtiya ziman pêngaveke pozîtîv e. 102. -o agiro, bajaro, bavo, cîrano, çemo, geneo, doxoro, gundo, guro, hevalo, kojo, kurmo, mamosteyo, mêşo, mêro, pîso, rêxo, rindo, şahîno, xapo, xwaro, zero, zaroko, zoro...

Ev parkîteke bi ber û kêrhatî ye. Mirov dikare bi vê parkîta han gelek bêjeyên taze biafrîne. Ji bo belengazî, rebenî, biçûkdîtin û biçûkxistinê tê bi-karanîn. Li hinek herêman di şûna parkîta "o" de, parkîta "ko" jî bikartînin. Wek Azadko, rizgarko, aloko, rebenko, perîşanko, belengazko, malxe-ramko... Bi baweriya min "o" ji "ko'ye baştir e hêsantir e û herweha hejmara parkîteke din jî kêr dibe. Mirov dikare bi vî awayî tîpa "o" bîne dawîya gelek navdêran. Parkîta "o" ji bo navdêrên nêr jî tê bikaranîn. Lê di rewşa pirhejmar de parkîta "o" dibe "no." ev hem ji bo zayendên nêr û him jî ji bo ya mê derbas dibe. Di vê babetê de, li parkîta "ê" binêre! Selîm Biçûk û hinek gramernivîsên me dinivîsin ku parkîtek bi navê "iko" an jî "ko" heye, ev jî ne rast

e û ji bo wê jî van mînakên didin: baviko, birako, dilbaziko, pêxwasko, reşiko, rindiko, rezîliko, spîko, xortiko, xweşiko, zeriko... Ev jî wek me di parkîta "ê" de dabû dîyarkirin; du parkît li peyhev hatine: "ik" û "o" bêjeya "reş cara pêşî parkîta "ik" girtiye û bûye "reşik." Piştî carek din parkîta "o" girtiye û vê carê jî bûye "reşiko. (Selîm Biçûk Rêzimanê Kurdî rûpel 69.)

103. -ok avok(matara), axa(y)ok, behcok, bezok, bilqok, bizmok, bihîstok(ahîze), bîhnok, bîtanok, canok, çeçok, çermok, çîvanok, danok, devok, devkenok, fetilok, ferhengok, fortok, gazin(d)ok, gerok, gezok, giriyok, girînok, gulok, hejîrok, hevok, heyranok, hêrsok, kaşok, kenok, keçelok, kesok, laflafok, meyramok, mêjok, mirovok, miz-mizok, naverok, narincok, nivîsok (prînter), payîzok, qehrok, pesnok, revok, rikok, serok, sa-rincok, şemamok, şekirok, tîrsok, xapînok, xebe-rok, xişok, xurok, zirto(ne)k, zarok, zengilok... Biçûkbûn û xweşikbûniyê tînin zimên. 104 -okî çermokî, kevnokî, peritokî, qirêjokî, reşikokî, şilokî... Ev parkît rewş û cîyabûnê dide dîyarkirin. 105. -ole gêjole, hişkole, keşkole, mêşole, piçikole, pirole, reşole, sembole (bi dimilî navê cureyek bîhokê), şepole(sist, livok), zirtok... Di vê parkîtê de giraniya soranî heye. 106. -olekî keskolekî, piçkolekî, reşolekî, spîçol (e)kî, şînokî... Ev parkît bi piranî û giranî bi soranî ye. Rewşeke ne zelal dide dîyarkirin.

107 -one parone Min nikarîbû çend nimûneyên din jî ji parkîta "one" re bibînim. 108. -onek bizdonek, fetlonek, geronek, paro-nek, şermonek, tîrsonek, zirtonek... Li gor hinek herêm, devok û zaravayan parkîtên "ole" û "onek" cî diguhêrin an jî herdu-yan jî bi kar tînin. Wek nimûne him zirtonek û him jî zirtok dibêjin. 109. -oş beroş, îboş, keloş, kinoş, meloş, minoş, mihoş, peroş... Parkîta "oş" di du wateyên cuda yê dijberên hev de tê bi karanîn: a) biçûkxistin û bizarkirinê de b) xweşik û ciwanîyê de. 110. -ox ajotox, çêkîrox, fîrotox, gotox, kîrox, kuştok, şîretkîrox, vegîrotox... Ji zaravayê dimilî derbasî kurmancî bûye. Mirov him di kovara Hawar û him jî di berhemên Cigerxwîn de rastî vê parkîtê tê. Li herêma Licê kurmanc di axaftina xwe ya rojane de bi kar tînin...

111. -parêz agirparêz, bajêrparêz, dînparêz, gelparêz, gundparêz, hevşehrîparêz, herêmparêz, koirîarparêz (cumhuriyetçi), malbatparêz, mezheparêz, nanparêz, olparêz, perçeparêz, tawizparêz, xweparêz, welatparêz, xaçparêz, zimanparêz... Ev parkît ji lêkera "parastin" tê û wateyeke xweş û pozîtîv dide bêjeyê. Bi piranî û giranî ji hezkirin û bawerîyê tê. 112. -perest agirperest, aştîperest, axperest, bajarperest, Bedirxanperest, dahatûperest, deverperest, diravperest, eşîretperest, gelperest, herêmparêz, gundperest, kurdperest, kevneparêz,

komarperest, malperst, namûsperest, neteweperest, pûlperest, niştîmanperest, nijadperest, olperest, perçeperest, regezperest, şehweperest, şerperest, şrwatperest, tixûbperest, welatperest, xweperest, xweşikperest... Parkîtên "parêz" û "perest" ji heman lêkerî tên lê wateyên wan ne yek in. Perest ji parastinê teng-tir û tûntir e. Di perestiyê de wateya fanatîkî tê de heye. Wek nimûne, "welatparêz" pêşverû ye û "neteweperest" paşverû ye ji ber ku yên netewepe-rest gel û neteweyên din biçûk dibînin. Wateyên parkîtên "parêz û "perwer" jî nêzîkî hev in.

113 -perwer asayîşperwer, niştîmanperwer, gelperwer, îlperwer, kurdperwer, mirovperwer, we-latperwer, xweristperwer, zanistperwer... Di wateya hezkirinê tê bikaranîn. 114. -pêj aşpêj, gotinpêj, nanpêj, rûnpêj, kulorpêj, xwarinpêj... Parkîta "pêj" ji lêkera "pijandin" tê. Selîm Biçûk him parkîta "pêj û him jî ya "pi/ bi kar anîye. Yanî wî du parkîtên cuda pejirandiye. Ji parkîta "pêj mînakên "xwarinpêj û "nanpêj daye û ji bo ya "pij jî "nanpij daye. Halbû ku "pêj û "pij' devok in û rastî jî "pêj' e. Weha dîyar e ku Selîm Biçûk bi lez û bez pirtûka xwe nivîsiye û daye çapê. Wî bi parkîta "van" dest pêkiriye û bi ya "e" dawî lê aniye. Parkîtên Biçûk gelek seyr in. Wek mînak, mirov nikare di pirtûka S. Biçûk de rastî parkîtên "geh" û "istan" bê. (Selîm Biçûk Rêzimanê Kurdî rûpel: 68-69 û 89-91.) 115. -revîn balrevîn, derdrevîn, dilrevîn, çav-revîn, çûkrevîn, hevrevîn, hişrevîn, jinrevîn, keçrevîn, kesrevîn, keserrevîn, kulrevîn, mirov-revîn, ramanrevîn, rojrevîn, salrevîn, şevrevîn, tirs-revîn, xeyalrevîn, xemrevîn, xewrevîn, zarok revîn...

Parkîta "revîn" ji navê xwe jî dîyar e ku ji lêkera "revîn" tê. Di wateyên revîn, wendabûn û xemgîniyê de tê bikaranîn. Parkîteke bi berhem-dar û kêrhatî ye. 116. -rêj avrêj (avdestxane-tuwalet), biverêj, çavrêj, hesinrêj, hişrêj, kedrêj, ronîrêj, rondikrêj, hêstirrêj, kulrêj, xwêdanrêj, xwînrêj... Li hinek deveran di şûna parkîta "rêj" de "rij" jî dibêjin. Ev ji lêkera "rêjandin" çêdibe. 117. -ris dolabris, herîris, hevrîşimris, pembûris, teşîris... Ji lêkera "ristin" pêk tê û zêde ne kêrhatî ye. 118. -saz aşsaz, barsaz, berçavksaz, çeksaz, der-mansaz, diransaz, hebûnsazî, hestesaz, hevoksaz, karsaz (patron), komelsaz, otomobîlsaz, pîşesaz, plansaz, radyosaz, saetsaz, şêrînsaz, telefonsaz, tifengsaz, tîrsaz, xurdesaz... Parkîta "saz" bi piranî ji bo çêkirin û li darxistinê tê bikaranîn. 119. -şo destşo, cilşo, firaşo, kineşo, lingşo, mirîşo, serşo... Parkîtek e ku ji lêkera "şûştin" çêdibe û mirov dikare bi vê parkîte gelek bêjeyên nû biafirîne.

120. -şor gotinşor, qelemşor, sîlahşor, tirşor... Di wateya hunermendî û hêzekî mezin de tê bikaranîn. 121. -teraş darteraş, heykelteraş, kevirteraş, neynûkteraş, peykerteraş, pênuşteraş, qelemteraş, sengteraş, serteraş, simteraş... Parkîteke lêkerî ye û ji lêkera "teraşkirin" tê. Di wateya jêkirin de ye û zêde bi kêrhatî ye. 122. -tir baştir, bezatir, bihatir, bilintir, bizdonektir, çaktir, dûrtir, erzantir, germtir, girantir, hêsantir, hişkîr, kûrtir, mezintir, paşketîr, pîstir, qeşmertir, reştir, rezîltir, rovîr, sartir, spîr, şîrîntir, tirsonektir, tirştir, tûjtir, zelaltir... Parkîteke berhevdudanî ye û di pileya duyem de tê bikaranîn. Parkîteke gelek bi ber û dewlemend e û di zimanê devkî û nivîskî yê rojane de gelek tê bikaranîn. Bi gelemperî tê paş bêjeyên rengdêr. Dîsa hinek gramernivîs dinivîsin ku bi navê "tirin" ji parkîtekê heye û mînakên wan jî weha ne: Baştîrîn, bezatîrîn, bi-lintîrîn, erzantîrîn.... Ev jî ne bi serê xwe parkîtek e, du parkîtin. Pêşî parkîta "în" tê û piştî jî ya "tir" tê û dibin "tirîn." Parkîta "tir" latîv" û ya "tirîn" jî dibe superlatîv.

123. -tî balafirvantî, bavatî, biratî, dijmintî, gavantî, gundîtî, hemwelatî, katîtî, kerîtî, malbatî, nezantî, pîrîtî, şivantî, şofertî, zanatî... Parkîteke rengdêrî ye û rewşê dide dîyarkirin. 124. -ûd şerûd Gotina "şerûd" bi kurdî ye û ne bi erebî ye lê gotinên wek bixûd, xesûd xwerû bi erebî ne û têkiliya wan gotina bi parkîta "ûd" re nîn e. 125. -van agirkujvan, ajovan, aşvan, axaftvan, bajarvan, balafirvan, baxvan, bazevan, baqûrvan, berevan(parastin), berdêlvan, bervan(mudafî), bernamevan, berxvan, bexçevan, bezvan, berrîvan, bêdervan, bêrîvan, bihîstevan, bilûrvan, bivirvan, cerdevan(çete), cirîtván, cîjivan(qerargeh), çalakvan, çandevan, çirikvan, çîrokvan, dadvan, dafikvan, darvan, dergevan, deryavan, deholvan, destvan, deştvan, dilvan, dilovan, dîdevan, dîlokvan, êzingvan, gavan, gazîvan, geştivan, gilîvan, giyavan, golikvan, gorevan, guzvan, hel-bestvan, hozanvan, kelekvan, keştîvan, konevan, kevokvan, kulovan, leqatvan, lêgerînván, lîstikvan, lîzvan, maratonvan, malovan, masîvan, mazîvan, mazûvan, mehdervan, melevan, meşvan, mêşevan, mihrîvan, natorvan, negirvan, nêçîrvan, nêrevan (çavdêr), nijdevan, niqovan, nivîsvan(katip), no-torvan(gardiyan), nûçevan, paçvan, partîvan, pay-tonvan, pasvan, parêzvan, paşvan, pavan, pembûvan, pêçvan, pêkevan, pêrgevan, pêşbirkevan, pêşwazîvan, piştîvan, qetilvan(de-metvan), rezvan, ristevan, rojvan, rojnamevan, rûniştivan, satorvan, serdevan, seydván, sînorvan, sîwanvan, sîwaxvan, sîyasetvan, sportvan, stran-ván, şanovan, şehrevan(medenî), şeqlivan, şervan, şoreşvan, şivan, şîretvan, şîrvan, şûrvan, tankvan, tembûrvan, tirşikvan, tolikvan, torvan(yê ku bi torê masî digire), torevan(edîb, gelenekçi), werzişvan(sportvan), wêjevan (edebiyatçi), xame-van,

xanvan, xwendevan(okuyucu), zêrevan, zir-nevan, zirtikvan, ziyaretvan, zorevan(yarişmaci), zozanvan... Parkîteke gelek berfîreh, bi ber û kêrhatî ye. Parkîteke pîşeyî ya aktîv e. Li gor herêm û devo-kan carnar parkîta "van", "wan", "ger", "ker" û "gir" tê hevlihev kirin. Pêwîst e ku mirov di vî warî de baldar be. 126. -Vî kevî, kovî, gakovî, pezkovî, tavî, tovî... Parkîta "vî" ne weha parkîteke bi berdar û kêrhatî ye. Di wateya ji wê/wî an jî dişibe de tê bikaranîn.

Li hinek herêman, di şûna gotina "kovî" de "kûvî" jî dibêjin lê ev ne rast e. Ji ber ku di kur-diya kevn de, ji çiya re "ko" tê gotin. Di zaravayê me yê dimilkî de îro jî, ji çiya re "ko" dibêjin. "Kovî" jî tê wateya çiyayî. 127. -wan ajwan, bax(e)wan, berwan, bende-wan, bêjewan, dadwan, darewan, deştewan, dîwan, jîlwan, karwan, mişwan(tore), noşîrwan, pawan, pasewan, pêhlîwan, pêwan, rewan, rêwan, rojwan, sîlewan, sîwan, şarewan, şaxewan, şehderwan, şerewan, şêrwan, xalwan... Di zaravayê soranî de parkîta "wan" bêtir tê bi karanîn. Ji ber ku soran di şûna tîpa "v" de ya "w" bikartînin. Parkîtên "van" û "wan" hema hema yek in, herdu jî di heman wateyî de tên bikaranîn. 128. -War bendewar, bextewar, cîwar, jîndewar, mehwar, sîdewar(bi kêrhatî), şûnewar, tilwar (tirpan), umîdwar, xwendewar... "Van" û "wan" herdu jî parkîtên aktîvbûnê ne lê "war" pasîv e û hêvîdariyê dipê û carnar ew parkîta cî û mekan e jî. Mûrad Ciwan di şûna parkîtên "war" û "wer" de "ewar" û "ewer" nivîsandiye. Lê ne rast e. Wek mînak, dema mirov analîza bêjeya "bendewar bike; kok ne "bend" e, "bende" ye û parkît jî "war" e. Mûrad Ciwan di pirtûka xwe ya bi navê "Turkçe Açıklamalı Kurtçe Dilbilgisi" de, 56 parkît nivîsiye. Him jî di nav wan de yên gelek bi berhemdar û kêrhatî hene ku qet behsa wan neki-riye. Wek: "an, çîn, çe, dan, dan(k), de, der, dêr, e, ende, er, ê, êr, gaz, gêr, gîn, gûn, guhêz, heng, hingêv, inde, ing, istan, ker, lor, mest, nas, naz, ner, nêr, o, ox, parêz, perest, perwer, saz, xan, xane..." Lê Mûrad Ciwan di warê çêkirina parkîtên lêkerî de formîleke hêja dîtiye: Koka lêkeran a dema niha û ya borî. Ji bo dema niha: avêj, bêj,, kuj, mêj, ji bo ya borî jî: rastgo, xebatkir, karkir. 129. -wer azwer(bi îhtîras), bîrewer, bext (e)wer, bûnewer, cengawer, dilawer(cesûr), jînawer, kamwer(muvaafakiyet), karwer(meşgul), mêrge wer, munewer, navewer, pêşwer, pîlewer (tenekeçî), pîşewer, pîrozwer, rêzanwer, rûmetwer, serwer, şermwer, tarîperwer... Parkîta "wer" ji aliyê wate ve gelek berfireh e: carnar di şûna parkîtên "kar, van, bîr" û "ger" de jî tê bikaranîn. Di zaravayê soranî de bêtir tê bika-ranîn lê di kurmanciya nivîskî de jî îro ev parkît her ku diçe bêtir dibe.

130. -wî bawî, cêwî, efsanewî, kawî, rêwî, sêwî, tawî... Ev parkîta han rewşê dide dîyar kirin û tê dawiya bêjeyên ku bi tîpên dengdêr diqedîn. 131 -xan Bedirxan, canxan, ciwanxan, çiraxan,

dûxan, entîkexan, kulxan, Mehmedxan, Saroxan, Seyîdxan, Şerefxan, şeşxan, têlîxan, werxan, xweşxan, yezdaxan, yezdîxan.... Parkîta "xan" di wateyên cî, war, malbat, xa-nedan û xanî de tê bikaranîn. 132. -xane aşxane, avdestxane, avjenxane (havuz), avrêjxane, bacxane, balyozxane, barxane, barûtxane, bendîxane, benzînxane, betalxane, bîraxane, çapxane, çayxane, dermanxane, dîwanxane, elektrîkxane, fêrxane, girtîxane, karxa-ne, kexane, leşkerxane, lîstîkxane, malîkxane, meyxane, mêvanxane, nexweşxane, pêjxane, polax-ane, polîsxane, postaxane, pûtxane, qehwexane, qehpexane, qûşxane, rasatxane, ragirtîxane, riswax-ane, serbazxane, sêwîxane, şeşxane, tamîrxane, ti-ralxane, tîmarxane, şîrexane, starxane, tersxane, xweşxane, zarokxane, zirtxane... Ev parkîta kurdî ji bo cî, xanî û avahî tê bikar-anîn û gelek fireh û dewlemend e.

133. -xwar bertîlxwar, ereqxwar, gûxwar, hel-alxwar, heramxwar, jehrwar, kedxwar, kertûlxwar, kerîxwar, keserxwar, kulxwar, malxwar, malsêwîxwar, meyxwar, mîratxwar, mûçexwar, parîxwar, stûxwar, şîrxwar, tirşîkxwar, xûgîxwar, xwînxwar, xemxwar, ziqûmxwar... Ji lêkera xwarinê tê û vexwarin û wek xwarin tê bikaranîn. Nabêjin meyvenexwar, ereqvenex-war, dibêjin meyxwar û ereqxwar. 134. -xwaz aşîxwaz, azadîxwaz, baştîxwaz, dahatûxwaz, dadxwaz, daxwaz, dilxwaz, hevalx-waz, jinxwaz, mafxwaz, qencîxwaz, şerxwaz, xcrxwaz, xêrnexwaz.... Ev parkît ji lêkera "xwestin" tê û gelek ber-hemdar û kêrhatî ye. 135. -yar bextiyar, berpirsiyar, bihîstyar, biryar, dadyar, diyar, cotyar, endezyar, geştyar (turîst), hestyar, hişyar, jîyar, kewyar, kiryar (tiştên ku dike an jî kirîye), kirîyar (abone, muşterî), nasyar, nûsîyar, peyar(peya), pirsyar, pîyar (rehim), ratnyar, rêzîyar, rojyar, salyar, şalyar (wezîr), şandiyar, şehneyar, zanyar... Parkîteke nûjen, kêrhatî û bi ber e. Di kurdiya nûjen de her ku diçe bêtir tê bikaranîn. Mirov dikare bêje ku bêtir di soranî de tê biaranîn lê di van 20 salên dawî de her ku diçe di kurmacî de jî ciyê xwe digire. Wateyên wezîfe, bîrûbawerî, ked û zanistiyê didin. Çendek ji gramernivîsên kurdî parkîta "îyar" jî bi serê xwe digirin û bikartînin. Mînakê wan jî, bi tenê "bextîyar" e. Ne "-îyar" e, "-yar" e. Koka bêjeya bextiyar, " bext e lê ji ber ku sê tîpên dengdêr tîpên ba hevdu tîpa "î" dikeve navberê. 136. -za biraza, gumanza, hevalza, mêza(femînîn), mamza, mîrza, neftza(kana petrolê), nêrza, nûza, rasteza, şehreza, xweza... Wateyên zêdebûn, kubarî û zanînê dide. 137. -zan bazarzan(ekonomist), borîzan, cîzan, danezan, dengzan, dîrokzan, dubarezan, dûzan, fêlzan, henekzan, hiqûqzan, hîlezan, hurmetzan, jêzan(pispor), îslamzan, karzan, kevnezan, korîzan, (kêm eqil, tew tewe), kurdîzan, lafezan, makînezan, mêjûzan, niktezan, nirxzan, nûzan, pêçezan(îzçî), pêşekzan, pêzan, qanûnzan, qedir-zan,

qîmetzan, rêzan, rojhilatzan, şerzan, şêrzan, şerîetzan, şopezan, şûrzan, tarîhzan, warzan, werzan, xisîstiyanzan, xwezan, zimanzan, zemînzan...

Ev paşkît ji lêkera "zanîn" pêk tê. Li ser zanîn û zanistiyê ye û war û qada karanîna wê berfireh e. 138. -zar çîmenzar, dengzar, dilzar, gulzar, gulîzar, lalezar, şermezar, tengezar, xweşzar... Ev parkît di wateyên perîşanî, bêkesî, berxwe-ketin, dilxweş û dev liken de tê bikaranîn.

Balkêşî û jêrenotek

Wek pêşkîtan, çend parkîtên ku ne bi kurdî ne lê di kurdî de tên bikaranîn jî hene. Hinek ji wan ji zimanên cîranên me û hinek jî ji zimanên din ketine nav zimanê me. Ji wan çend nimûne. -zade begzade, perîzade, şahzade... -ewî efsanewî, asmanewî.. -medar sîyasetmedar... Ev hersê parkît ji farisî ketîne nav zimanê kurdî. Zêde nayên bikaranîn. Herweha çend parkîtên din jî hene ku me ji farisî wergirtine û di zimanê rojane de bikartînin. Celadet Bedirxan û Roger Lescot di gramera xwe ya kurmançî de parkîtên wek: "ban, asî, niwaz, îtik, îvk, oyî, vanî, dok" û hwd, jî bikar anîne. Çendek ji wan şaş û ne durust in û çendek jî îro di zimanê axaftin û nivîsandinê de cî nagirin. Ji yê şaş û çewt yek jê parkîta ban û ya din jî "vanî" ye. Celadet Bedirxan û Roger Lescot ji bo parkîta "ban du mînak dane wek : pasban û derge-ban. Halbû ku parkîta van herdu bêjeyan "van" e. Pasvan û dergehvan. Parkîtên wek "asî, îtik, îvsk" û hwd. Celadet Bedirxan bi xwe di wê demê de nikaribûye ji wan parkîtan re nimûne bibîne. Parkîtên weha dibe ku di demeke dûr û dirêj de wenda bibin. -îst faşîst, humanîst, împeryalîst, kolonîyalîst, kapîtalîst, komunîst, kemalîst, sosyalîst.... Ev parkît ji zimanê ewropî hatiye û ketiye nav kurdiya rojane. -çî boyaxçî, deveçî, qehweçî.... Celadet Bedirxan, Qanadê Kurdo û Rizgar Baran di pirtûkên xwe yê gramerî de parkîta "cî" an jî "çî" wek ya kurdî bi kar anîne. Ev ne rast e, "çî" parkîteke tirkî ye û ketiye nav axaftina devkî ya kurdî. Di vê mijarê de, li pirtûka Celadet Be-dirxan & Roger Lescot Kûrtçe Grameri rûpel 291 û ya Baran Rizgar ya "Uygulamali Kurtçe Dersle-ri-Dersên Kurdî" rûpel 331 binêre!

Metnên Şanoya Kurdî

Çetoyê Zêdo

Li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê, di warê zanîna dîroka şanoya Kurdî de xîzaniyeke bêpîvan heye. Bêyî berhemên şanoya Kurdî, kifşkirina rabirdû û rewşa şanoyeke Kurdîstanî zelal nabe. Piraniya şanoger û lêkolînerên Kurdî, bi awayekî giştî li ser dîroka şanoya Kurdî û berhemên wê nexebitîne an jî bala xwe nedanê. Digel vê yekê jî, di nav şanoger û wêjekaran de em pêrgî dîtî û gotinên wiha tên ku mîna metnên şanoya Kurdî tunebin tevdigerin. Bi gelemperî “geşedana şanoyê” bi metnan ve girê didin. Ji bo derfet û pêkhatinên şanoya cîhanê, serdestiya nivîskêr/metnê di sedsala 20an de cihê xwe bi “rejî/derhênanî” ve guhertiye, loma ji bo sedsala 20an navê “Serdama Derhênanî” tê gotin. Lê dîsa jî di hebûna vê ezbera mekanîk de “tunebûna metnan” weke sedema sereke ya lawaziya şanoya Kurdî tê destnîşankirin. Ev jî tê wateyê ku piraniya xwendevan û temaşevanên şanoya Kurdî hay ji metnên di dîroka şanoya Kurdî de cih girtine tunene. Tiştê ku divê neyê jibîrkin ev e ku metnên şanoyê, ewil ji bo lîstinê, pişt re ji bo xwendinê ne. Em ê hewl bidin ku di vê nivîsê de, ji dîroka şanoya Kurdî cî bidin metnên çapbûyî.



Bi Yavuz Akkuzu re me xwestibû di pirtûkên “Dîroka Şanoya Kurdî” (Weşanên Peywend, 2015) û “Kürt Tiyatro Tarihi” (Weşanên Evrensel, 2016) de, di warê zanîna

şanoya Kurdî de derbarê metnên girîng ên şanoya Kurdî gelek çavkanî û belge jî hebin. Serpêhatiya şanoya Kurdî ku li welatên weke Iraq, Îran, Sûrî, Ermenîstan, Gurcîstan û Tirkîyê û piştî 1980yî jî Ewrûpayê pêk hatiye, me di gotarên taybet de berhev kiribû. Weke mînak em dikarin destnîşan bikin ku li gel berhemên telîf yê nivîskarên Şanoya Kurdî, gelek werger û adaptasyon ji zimanên weke Erebî, Îngilîzî, Farisî, Tirkî û Rûsî, Ermenkî bo Kurdî hatine wergerandin û sehnekirin cihekî taybet digre.

Weke tevî hemû welatên Rojhilatanavîn, şanoya Kurdî jî di sedsala 20an de forma şanoya Ewrûpî nas kiriye û pêk anîye. Şano weke cureyeke hunerê û bi awayekî gelemperî di nav hemû milletan de heye, helbet di nav milletê Kurd de jî hebûye; ev jî forma şanoya kevneşopî ye. Şanoya Ewrûpî li ser bajarvaniyê pêk hatiye û bingeha xwe ji şanoya Antîk ya Yewnanî û ji çavkaniyên xwe yê gelêrî hilgirtiye. Bi bajarvaniyê re hemû ber bi şanoyeke nivîskî çûne û ji gelek qonaxên dîrokî bihurîne. Şanoyên netewî bi hemû rabirdûya xwe ji dîroka şaristaniyê para xwe stendine û hebûna xwe afirandine. Şanoya Kurdî ya folklorîk/civakî ji rabirdûya şanoya Ewrûpî vediqete. Ji hin formên şanoya gelêrî ya Kurdî; Mîr Mîran (Mîrê Şaş) Kosegelî (Gaxand), Bûka Baranê, Bûkella (Kûkla), Sersal, Lîstik û Temsîlên Newrozê... Her wiha Şanoya Kurdî bi “dengbêjî û çîrokbêjîyê” ve jî dîsa xwedî formên netewî ye.

Li Bakurê Kurdistanê bêstatubûna Kurdan û qedexebûna li ser Kurdî, bûye sedem ku heta 1991ê şanoya Kurdî li Tirkîyê hebûna xwe nîşan nede û îro jî heman rewş li ber geşedana şanoya Kurdî astengiya herî mezin e. Li Tirkîyê weke hemû mijarên Kurdî, şanoya Kurdî jî heta salên 1990î jî ne eşkere ye û mînakên hene jî yê bi dizî ne. Agahiyên ku hene ji bilî du şanomeyên nivîskî “Bîrina Reş” ya Musa Anter (1965) û “Dawîya Dehaq” ya Kemal Burkay(1978) ku li Tirkîyê bi Kurdî û Tirkî bi hev re hatine çapkirin, ji van herdu metnan, pêşandanên şanogeriya bi awayekî aşkere pêk nehatine. Ji ber qedexebûna li ser ziman û çanda kurdî heta sala 1991ê, bi awayekî tund hunera kurdî li Tirkîyê û li Bakurê Kurdistanê (ji bilî şanoyên formên gelêrî) pêk nehatine.

Heta 1991ê li Tirkî û Bakurê Kurdistanê berhem û temsîlên şanoya Kurdî yê perçeyên din, ne li ber çav in. Li Stenbolê bi damezirandina NÇMê (1991) re cara ewil ku şanogeriya bi Kurdî ya Mamoste Cemîl “Mişko” [1] tê sehnekirin. Ev şanogerî ji aliyê lîstikvanên NÇMê ve tê lîstin. Di

heman salê de ji aliyê lîstikvanên “Şanoya Roja Azadî” ve şanogeriya “Dawiya Dehaq” a Kemal Burkay li Stembolê tê sehnekirin.

Dema mirov bala xwe bide dîroka nêz a şanoya Kurdî ya li Bakurê Kurdistanê û li Tirkîyê; koma yekem ya şanoyê “Teatra Jiyana Nû” (NÇM) di sala 1992yan de li Stenbolê dest bi xebatên xwe dike. Şaxên NÇMê li hin bajarên Tirkîyê; di 1994an de li Îzmîrê “Şanoya Hêvî”, di 1995an de li Edenê “Şanoya Yekbûn”, di 1996an de li Mêrsînê “Teatra Arzeba” dest bi xebatên şanoyî kirine. Şanogerên li NÇMê perwerde bibûn, li Bakurê Kurdistanê (piştî salên 2000î bi taybetî li Amedê) û Tirkîyê di şanoyên kurdî de kar kirin û şanoyên xwe hazir kirin û îro jî gelek ji wan kesan weke lîstikvan, derhêner û nivîskar di gelek lîstikan de cih digrin. Di vê serdemê de di nav nivîskarên şanoyê de navê “Hüseyin Kaytan û Kemal Orgun” yên sereke ne.

Nivîskariya şanoya Kurdî, Ji aliyê Şanoya Bajêr ya Amedê, ji 2011an vir de li ser navê “Evdirehîm Rehmî Hekarî” pêşbirka nivîskariya şanoyê heta 2016an pêk hat û bi dehan metnên şanoyê weke pirtûk hate çapkirin. (Di 2016an de ji aliyê Qeyyûm ve Şanoya Amedê û ya Batmanê hate girtin. Tenê li Amedê şanogerên ji kar hatibûn avêtin jinûve “Şanoya Bajêr a Amedê” vekirin.) Ji bo navên hemû şanoyên bi kurdî ku li Tirkîyê û Kurdîstana Bakur ji sala 1991ê heta 2013an derketine, mirov dikare li pirtûka Mîrza Metîn a bi navê “Jêrzemîn”ê hatiye berhev kirin, binêre.[2] (Di vê berhevkariyê de qala “29 komên şanoyê û 104 lîstikên şanoyê” tê kirin.)

Şanoyên çî weke temsîl çî weke nivîskî, li Kurdistanê di avakirina ramana netewî de weke navgîneke “polîtîk” hatiye nixandî û di demên hewldanên netewî de geştir bûye û “nasnameyeke” miletî hilgirtîye. Lewma şanoya nivîskî ya Kurdî, ewil li Stembolê (1919) û piştî avabûna Komara Tirkîyê jî li Silêmaniyê û li Yekitiya Sovyetê (Tiblîs-Gurcîstan, Elegez-Ermenîstan) bi du qenalên dest bi geşandana xwe dike. Lê cihê ku Şanoya Kurdî ji salên 1920î heta roja me bi domdarî xeteke pêşketinê nîşan daye, li Başûrê Kurdistanê bajarê Silêmanî ye. Îro jî Silêmanî, weke cihê ku şanoya Kurdî herî pir tê îcrakirin pêşengiya xwe didomîne.

Di dîroka şanoyê Kurdî de em bala xwe bidin wergerên şanoyê, hin agahiyên balkêş derdikevin pêşberî me. Li Başûrê Kurdistanê em dibînin ku di serî de ji zimanên weke Îngilîzî û Erebi werger û adaptasyonên şanoyê hatine kirin. Bo nimûne; di sala 1921an de temsîla şanogeriya “Selahaddînî Eyyûbî” ya Necîb Heddad, ji aliyê Lijney Niwandinî Şanoyî, li Hewlêrê di Medreseya Erbîl Ûla de bi Kurdî tê lîstin. Daniel Kasab şanoya “Selahaddinî Eyyubî” ji Erebi werdigerîne Kurdî û rejisoriya wê jî dike.[3]

Di 1927an de şanonameya Shakespeare “Julies Jesar” li Silêmaniyê tê sehnekirin; metna Shakespear a ewil hatiye weşandin jî “Gerdaweka” (Bahoz) ye ku bi wergera Dr. Cemal Nebez di 1955an de li Bexdatê weşandin. Di salên 1970î de li Başûrê Kurdistanê, ji zimanê Tirkî jî berhemên “Nazim Hikmet, Aziz Nesin, Yaşar Kemal...” hatine wergerandin û piştî ku hatine lîstin weke pirtûk jî hatine çapkirin.

Şanoya Kurdî ya li Sovyetê, bi şanonameya Ahmedê Mirazî ya bi navê “Zemanê Çûyî” di 1928an de li Tîblîsê tê pêşandan û di 1935an de li Êrîvanê tê çapkirin. Di navbera salên 1930-1935an wergerên şanoyê herî zêde ji Ermenkî û Rusî ne, tevî van wergeran û berhemên sereke ji bo xwendinê jî têne çapkirin. Ji 1937an heta 1947an di Şanoya Dewletê ya Elegezê de, piraniya şanoyên wergerê an jî adaptasyonê têne pêşandan. Ji 1956an heta 1975an bi dehan metnên şanoyê weke listîkên radyofonîk di rayoya Êrîvan de tê weşandin. (Ev yek jî li Bakurê Kurdistanê dibe sedam ku beriya temaşevanên şanoya Kurdî guhdarên wê çêdibin.) Ji 1979an heta belavbûna Sovyetê, li Gurcîstanê û li Ermenîstanê, gelek şanoyên populer yên wê serdemê têne pêşandan. Nivîskarê dawî yê wê serdemê Ezîzê Gerdenzerî ye, şanonameya wî ya bi navê “Zarîna Çiya” di 1989an de li Tîblîsê tê çapkirin.

Di 1985an de cara ewil şanonameyên nivîskareke jin Leylan Şefîqe Elî Hiseyn bi navên “Şaciwanî Derbend Feqerew” û “Keyxan” du şanoname li Silêmanî tê çapkirin. (Di 1957an de bi pêşengiya Nermîn Nakam, jin weke listîkvan di şanogeriya Kurdî de cih girtibû.)

Bi giştî dema em bala xwe bidin dîroka şanoya Kurdî û rewşa wê ya îro, di şanogerî û di metnên wan de mijar û temayên sereke pîranî bi “nasnameya netewî” ve girêdayî ye. Yasîn Qadir Berzincî, di Dîroka Şanoya Kurdî^[4] de li ser 45 şanonameyên ku di navbera 1934-1985an de li Başûr hatine çapkirin, bi awayekî berfireh van metnan dinirxîne. Şanonameyan li gor mijarên wan bi sê babetan vediqetîne: Mijarên civakî 22, yên dîrokî 15 û ji şanoyên sîyasî 8 şanonemayan ji aliyê şêwe û naverokê li gora serdema wan dinirxîne. Di nav nivîskarên herî berhemdar de navê van şanonamenûsan dihejmêre: Heme Kerîm Remezhan Hewramî, Emînê Mîrza Kerîm, Pîremêrd, E. B. Hewrî, Fetah Kerîm Kawe, Mistefa Nerîman, Zekî Ehmed Henarî, Ebdulrezaq Bîmar, Şêrko Bêkes, Mehdî Omêd, Ehmed Salar, Mihemed Ebdulrehman Zengine... Piştî salên 1980yî li Ewrûpa (ewil li Swêd) ji hemû perçeyên Kurdistanê şanogerên Kurd, dest bi hewldanên şanoyî dikin. Ji 1988an û pêve weşandina metnên şanoyê zêde dibin. Ji 1930î heta niha gelek nivîskarên Kurd yên navdar şanoname nivîsîne û wergerandine Kurdî. Ji vir dema em bala xwe didin nivîskarên ji Bakurê Kurdistanê li gora perçeyên din, ji nivîsandinê

bêtir bi wergerê têkiliya xwe bi şanoyê re danîne. Li Tirkiyê û li Bakur lîstikvanan ji wêjekaran bêtir şanoname nivîsîne.

Em dibînin ku berhemên şanoyê herî zêde li bajarên mîna “Silêmanî, Bexda, Hewlêr, Êrîvan...” hatine çapkirin. Di lîsteya jêr de metnên telîf ên nivîskarên Kurd ku di navbera salên 1919-1989an de çapbûyî hatine berhevkerin. Metnên wergerê û yên hatine sahnakerin û çapnebûne, devreyi vê lîsteyê ne.

“Memê Alan”, Evdîrehîm Rehmî Hekarî, Kovara Jînê (Hejmarên 15-16), Stenbol, 1919



“Derdê Derûn” Hisên Huznî Mukriyanî, Kovara Zarî Kurmancî (Hejmarên

7. 8. û 11.) Silêmanî, 1928

“Koçekê Derewîn” Ereş Şamîlov, Êrîvan, 1930

“Mem û Zîn” Pîremêrd, Rojnama Jiyan, Silêmanî (Tefrîka 1932, weke pirtûk 1934)

“Hevind” Celadet Alî Bedirxan, Kovara Hawarê (Hejmar: 20) Şam, 1933

“Dildarî û Peymanperwerî” Ebûbekir Hewrî, Bexda, 1933

“Reva Jinê” Wezîrê Nadir, Êrîvan, 1935

“Zemanê Çûyî” Ehmedê Mirazî, Êrîvan, 1935

“Mehmûd Axay Şîwekel” Pîremêrd, Silêmanî, 1942

“Hawrêy Mindalî” û “Mam Rêwî” Şakîr Fetah, Bexda 1948

“Karkirdinî Bekelk” Refîk Çalak, Bexda, 1952

“Kîç û Qutabxane” Fetah Kerîm Kawe, Silêmanî, 1956

“Afret û Nûşte” Kamîr Jîr, Bexda, 1956

“Elî Fenî” Mistefa Nerîman, Kerkûk, 1957

“Zordarî Tawanbar” Fûad Îzzed, Silêmanî, 1958

“Awat” Mistefa Qeredaxî Salar, Bexda, 1958

“Bîrî Azadî Rêgay Rizgarî ye” Ebûbekir Hewrî, Bexda, 1959

“Peymanî Dûlayî” Hesên Qizilcî, Bexda, 1959

- “Rûxa” Mistefa Nerîman, Kerkûk, 1959
- “Diwarojî Dehakî Zordar” Zekî Ehmed Henarî, Bexda, 1960
- “Şorişî Huner” Fetah Kerîm Kawe, Silêmanî, 1960
- “Zêrîn” û “Otombîlçî” Emînî Mîrza Kerîm, Silêmanî, 1960
- “Bûkî Perde” Ebdulrezaq Bîmar, Bexda, 1960
- “Şanoy Kurdistan” Ebdulrezaq Bîmar, Bexda, 1961
- “Bibûre” Kemal Reûf Mihemed, Silêmanî, 1961
- “Zewaca Bê Dil” Îsmaîlê Dûko, Êrîvan, 1964
- “Birîna Reş” Musa Anter, Stenbol, 1965
- “Memê û Eyşê” Taharê Biro, Êrîvan, 1967
- “Nan û Jiyan” Mihemed Emîn Osman, Bexda, 1970
- “Dasekey Şasiwar” Emînî Mîrza Kerîm, Silêmanî, 1971
- “Kawey Asinger” Şêrko Bêkes, Silêmanî, 1971
- “Falçî” Heme Kerîm Remezhan Hewramî, Silêmanî, 1972
- “Şanogeriya Mindal” Umer Ebdulrehîm, Silêmanî, 1972
- “Zincirey Bo Şano” Mihemed Tofîq Wirdî, Necef, 1972
- “Çîrok bo Şano” Mihemed Tofîq Wirdî, Necef, 1973
- “Le Pênawî Ewîn da” Zekî Ehmed Henarî, Silêmanî, 1974
- “Senger” Ebdulhemîd Ebdulla, Duhok, 1974
- “Şewêk le Jiyanî Xanzad” Heme Kerîm Remezhan Hewramî, Bexda, 1977
- “Ask” Şêrko Bêkes, Bexda, 1978
- “Waney Reşbelek” Ehmed Salar, Silêmanî, 1978
- “Dawiya Dehaq” Kemal Burkay, Kovara Özgürlük Yolu (Hejmar: 37-38)
- “Mirov û Çax û Bîr” Mehdî Umêdî, Bexda, 1978
- “Odîbî Paşa û Berderkey Sîzif” Tofîq Hekîm, Silêmanî, 1978
- “Bûkî Befir” Mehdî Umêdî, Silêmanî, 1979
- “Xec û Siyamend” Fûad Mecîd Mîsirî, Bexda, 1979
- “Dildaranî Baran” Ehmed Salar, Silêmanî, 1979
- “Jan” Fehmî Kakeyî, Silêmanî, 1979
- “Lêbûk Dastana Mem û Zîna Diguhurît” Seyda Îbrahîm Selman, Bexda, 1979
- “Şêxî Senan” Dr. Nafî Akreyî, Bexda, 1980

- “Mangirtin” Mihemed Abdulrehman Zengine, Bexda, 1980
- “Serçawey Janêkî Xamoş” Emînî Mîrza Kerim, Bexda, 1980
- “Gundekem” Heme Kerîm Hewramî, Bexda, 1981
- “Welî Dêwaney Şem” Mihemed Abdulrehman Zengene, 1981
- “Xatû Kilawzer” Heme Kerîm Remezan Hewramî, Bexda, 1982
- “Hawarêkî Tasaw” Celîl Zengine, Bexda, 1982
- “Senger” Celalî Mîrza Kerîm, Li çapxana Şehid Aram (li çiyê tê çapkirin) 1983
- “Felestîn Hemîşe” Letîf Helmet, Bexda, 1983
- “Sê Şanogerî” Tehsîn Şeban, Bexda, 1984
- “Mergî Bexteweriy” Ebdulqadir Seîd, Silêmanî, 1984
- “Qelay Dimdim” û “Şarî Ewîn” Telet Saman, Hewlêr, 1984
- “Şaciwanî Derbend Feqerew” û “Keyxan” Leylan Şefîqe Elî Hiseyn, Silêmanî, 1985
- “Xewn e û Xewn Niye” Heme Kerîm Remezan Hewramî, Bexda, 1985’te Bexdê
- “Siyabend û Xecê” Tosinê Reşîd, Stockholm, 1988
- “Beyanî Baş Ey Xerîbî” Ferhad Pîrbal, Danîmarka, 1988
- “Mehkemekirina Silahiddînê Eyûbî” Şahînê Bekirê Soreklî, Stockholm, 1989
- “Mem û Zîn” Eskerê Boyîk, Stockholm, 1989
- “Zarîna Çiyan” Ezîze Gerdenzerî, Tîblîs, 1989

Sal	Berhem	Nivîskar	Cihê belavkirinê	
1919	Memê Alan	Evdirehîm Rehmî Hekarî	kovara Jîn	
1921	Selahaddînê Eyyûbî	Necîb Heddad	Erbîl Ûla	Hewlêr
1923	Culekey Kolgêr	Şêx Selam	Şêx Selam	Silêmanî
1926	Îlm û Cehil	Teqiyeddîn El Lubnanî	Fûad Reşîd Bekir	Silêmanî
1926	Axa û Axajin	Fûad Reşîd Bekir	Fûad Reşîd Bekir	Silêmanî
1926	Cûte-bira	Teqiyeddîn El-Lubnanî	Mihemed Cewdet	Silêmanî
1926	Dayik	Şêx Nûrî Şêx Salih	Şêx Nûrî Şêx Salih	Silêmanî

1927	Nîron	Mihemmed Lutfî Cim	Fûad Reşîd Bekir	Silêmanî
1927	Julies Jesar	Shakespeare	“Medreseya Zanistî ”	Silêmanî
1928	Qelen	Hakob Xazaryan	Ahmed Mîrazî	Tiflis
1928	Şoreşa Frensa	Fayiq Bêkês - Elîfbê Hewrî	“Medreseya Zanistî ”	Silêmanî
1928	Bedrewîştî	Fûad Reşîd Bekir	Fûad Reşîd Bekir	Hewlêr
1928	Derdê Derûn	Hisên Huznî Mukriyanî	Zarî Kurmancî	
1929	Le Pênaw Tac	Fraucois Corbet	Heqqî El Şûblî	Hewlêr
1929	Sultan Abdulhamîd	Widad ‘Irqî	Heqqî El Şûblî	Hewlêr
1929	Selehaddînî Eyyûbî	Necîb Heddad	Heqqî El Şûblî	Hewlêr
1930	Mamostay Kon	Fûad Reşîd Bekir	Fûad Reşîd Bekir	Silêmanî
1930	Koçekê Derewîn	Ereb Şamîlov	Êrîvan’da yayınlanır.	
1930	Însan Ewey Eyçênê Ewe Edirûytewe	Fûad Reşîd Bekir	Fûad Reşîd Bekir	Silêmanî
1930	Daykêkî Cahîl	Şêx Nûrî Şêx Salih	Şêx Nûrî Şêx Salih	Silêmanî
1931	Kçiy Kurdistan	Xeyrullah Abdulkerim	Abdulxaliq Qutub	Koy
1931	Jinhênanî Kurdewarî	Fûad Reşîd	Bexda Üniversitesi	Bexda
1931	Nîron	Mihemmed Lutfî Cim	Fûad Reşîd	Rewandiz
1932	Mem û Zîn	Pîremêrd	rojnameya Jîn	
1932	Kçiy Kurdistan	Xeyrullah Abdulkerîm	Fûad Reşîd	Hewlêr
1932	Miçêl	Tahir Sadiq	Tahir Sadiq	Rewandiz
1932	Qutiya Dû- Dermana	Hecîyê Cindî		
1933	Hevind	Celadet Alî Bedirxan		
1933	Dildarî û Peymanperwerî	Ebûbekir Hewrî		
1933	Tawanbar	Daniel Kasab	Daniel Kasab	Hewlêr

1934	Bazirginî Vinîsiya	Shakespeare	Mihemed Nafi'e Rustemî	Hewlêr
1934	Bazî Biçûk	Admond Rûsta	Fatma Rojdî	Hewlêr
1935	Reva Jinê	Wezîrê Nadir	Êrîvan	
1935	Zemanê Çûyî	Ehmedê Mirazî	Êrîvan	
1935	Serbazî Aza	Remzî el-Qettan	A. Wezîd Nûrî	Silêmanî
1935	Selahaddînî Eyyûbî	Necîb Heddad	Daniel Kasab	Hewlêr, Koy
1935	Mem û Zîn	Pîremêrd	Mecîd Fettah	Silêmanî
1936	Mehmûd Axay Şîwekel	Pîremêrd	Koma Zanistî	Silêmanî
1936	Şerîf Hemewend	Pîremêrd	Koma Zanistî	Silêmanî
1937	"Celalê Koto"			
1938	Othello	Shakespeare	Cewad Resûl Nacî	Hewlêr
1938	Afatî Taûn	Şêx Selam	Fûad Reşîd Bekir	Silêmanî
1938	Qalay Dimdim	Morîs Îsa Mellak	Koma Rûwab	Hasekî
1939	Dildarî û Peymanperwerî	Elîfbê Hewrî	Elîfbê Hewrî	Halepçe
1939	Xanîmî Mekerbaz	Îbrahîm Elî	Îbrahîm Elî	Halepçe
1939	Sertiraşxana Cabî	Îzedîn Elî	Îzedîn Elî	Duhok
1939	Kürt Radyo Birimi, Bexda'ta kurulur. Rodyofonik oyunlar 29.12.1939'dan itibaren radyodan yayınlanmaya başlanır.			
1940	Romeo Juliet	Shakespeare	Gwî Mukrîyanî	Hewlêr
1940	Dildarî û Peyman	Ebûbekir Hewrî	Ebûbekir Hewrî	Pêncwîn
1940	Othello	Shakespeare	Daniel Kasab	Rewandiz
1941	Bazirganî vinîsiya	Shakespeare	Reûf Yahya	Silêmanî
1942	Pîremêrd'in "Mehmûd Axay Şîwekel" oyunu Silêmanî'de yayınlanır.			
1942	Rêya Niştîmanî	Mistefa Lutfî el- Menefelûtî	Talad Mubarek	Silêmanî
1943	Ebûbekir Hewrî'nin "Dildarî û Peymanperwerî" oyunu Bexda'da yayınlanır. Aynı yıl Mihemed Mehmûd Qudsî tarafından Riwandiz'de tiyatrosu hazırlanır.			

1944	Aheng	Tahir Hewêzî	Tahir Hewêzî	Qeladiz
1944	“Dayîkî Niştiman” Mahabat’ta Koma Kurdistan tarafından hazırlanır. 1945’te Sinê şehrinde de oynanır.			
1945	Kawe û Zuhaq	Mihemed Hemareş	Ahmed Xulam	Halepçe
1945	Dildarî û Peymandperwerî	Ebûbekir Hewrî	Mustafa Nerîman	Kifrî
1945	Kiçî Dawênpak	Abdullah Samî	Abdullah Samî	Rewandiz
1946	Mem û Zîn	Pîremêrd	Lawaniy Silêmanî	Çemçamal
1946	Guliy Xwênawî	Abdullah Goran	Lawaniy Silêmanî	Silêmanî
1946	Dildarî û Peymanperwerî	Elîfbê Hewrî	Elîfbê Hewrî	Silêmanî
1946	Kerreloyê Menûçer	Îbrahîm Ehmed	Reûf Yehya	Silêmanî
1946	Ciwamêrî Kafir	Nûrî Emin Beg	Umer Elî Emîn	Silêmanî
1946	Le Rey Niştiman da	Mistefa Lutfî el Menfellûtî	Refik Çalak	Hewlêr
1947	Operetî Guliy Xwênawî	Abdullah Goran	Kamûran Mukrî	Hewlêr
1947	Dildarî û Peymanperwerî	Ebûbekir Hewrî	Lawaniy Çemçemal	Çemçemal
1948	Menûçer	Îbrahîm Ehmed	Reûf Yahya	Silêmanî
1948	Têkoşaniy Rencderan	Îbrahîm Ehmed	Reûf Yahya	Silêmanî
1948	Şakîr Fetah’ın “Hawrêy Mindalî” ile “Mam Rêwî” oyunları Bexda’ta yayınlanır.			
1949	Berber	Îzzedîn Elî	Îzzedîn Elî	Duhok
1950	Hakîmê Dadperwer	Îzzedîn Elî	Koma Şanoya Mamosteyan	Duhok
1950	Dixtorê Rewiştbaş	Îzzedîn Elî	Koma Şanoya Mamosteyan	Duhok
1950	Mamostayê Gunda	Îzedîn Elî	Dana Raûf	Duhok
1950	Hamlet	Shkespeare	Mecîd Reşîd	Silêmanî

1951	Piyawî Çirûk	Kemal Rîmavî	Kemal Rîmavî	Halepçe
1952	Bûne-Xelîfe be Xeyal	Ebûbekir Hewrî	Ebûbekir Hewrî	Silêmanî
1952	Othello	Shkespeare	Cewad Resûl Nacî	Erbîl
1952	Kilolan	Wictor Hugo	Kameran Mukrî	Silêmanî
1952	Refîk Çalak'ın "Karkirdinî Bekelk" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1953	Gulî Xwênawî	Abdullah Goran	Îzzeddîn Elî	Duhok
1953	Bûk û Zava	Ewnî Seyîd Kaka	Ewnî Seyîd Kaka	Kerkuk
1954	Othello	Shakesperare	Cewad Resûl Nacî	Hewlêr
1954	Birûske û Şîrîn	Emîn Mîrza Kerim	Raûf Yehya	Silêmanî
1954	Cenabî Mufettîş	Gogol- Emîn Mîrza Kerim	Raûf Yehya	Silêmanî
1954	Tamîr Bêg	Yusif Elanî	Kemal Mulî Kemale	Duhok
1955	Shakespeare'n "Gerdaweka" (Firtına) oyunu Dr. Cemal Nebez çevirisiyle Bexda'ta yayınlanır.			
1956	Othello	Shakespeare	Enwer Tuvî	Silêmanî
1956	Bazirganiy vinîsiya	Shakespeare	Ebdullah Şewnim	Halepçe
1956	Jin û Nîştâ	Kamîl Jîr	Enwer Tuvî	Silêmanî
1956	Elewirgey Şûtî Diz	Reûf Yahya	Reûf Yahya	Silêmanî
1956	Destî Mandî Li Ser Zikê Têr e	Nûrî Weştî	Fereydun Elî Emîn	Silêmanî
1956	Pîskey Terpîr	Moliere	Refîk Çalak	Silêmanî
1956	Fetah Kerîm Kawe'nin "Kîç û Qutabxane			
1956	Kamîr Jîr'in "Afret û Nûşte" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1956	Deng û Bas	Usman Reşîd Amêdî	Usman Reşîd Amêdî	Duhok
1956	Mamosta	Usman Reşîd Amêdî	Usman Reşîd Amêdî	Duhok

1957	Êrîvan Radyosu'nun Kûrtçe Birimi 1955'te açılır. Emînê Evdal'ın "Gulîzer" oyunuyla birlikte 1957'den itibaren Kûrtçe Radyofonik oyunlar Êrîvan Radyosu'nda yayınlanmaya başlanır.			
1957	Şehrezad	Tofîq El Hekîm	Mihemed Sukur Xelîfe	Hewlêr
1957	Çwar Qutabî	Ahmed Deng Gewre	Taha Baban	Bexda
1957	"Komeley Hunera Ciwanekanî Silêmanî" Silêmanî Gûzel Sanatlar Birliđi 19.06.1957'de kurulur. Kurucuları arasında; Fûad Reşîd Bekir, Refîq Çalak, Azad Şewqî, Xalîd Saîd, Wilyem Yûhenna, Qadir Dîlan, Nûrî Weştî, Raûf Yehya, Cemal Bextiyar, Hatim Seîd, Taha Xelîl...			
1957	Mistefa Nerîman'ın "Elî Fenî" oyunu Kerkûk'te yayınlanır.			
1957	Pîskey Terpîr	Moliere	Refîq Çalak	Silêmanî
1957	Tawan û Tola	Nûrî Weştî	Enwer Tûvî	Halepçe
1957	Kilkoy Tazey Leyl	Heme Axay Derbend Feqere	Refîk Çalak	Silêmanî
1958	Fûad Îzzed'in "Zordarî Tawanbar			
1958	Mistefa Qeredaxî Salar "Awat"			
1958	Emrî Begim	Yûsif Elanî	Taha Xelîl	Silêmanî
1958	Kaway Asinger	Mihemed Hesên Mengurî	Mihemed Hesên Mengurî	Rewandiz
1958	Pepûla	Ebdurrezak Bîmar	Ebdurrezak Bîmar	Rewandiz
1958	Mistefa Nerîman'ın "Elî Efenî" oyunu Kerkûk'te yayınlanır.			
1958	Mem û Zîn	Emînî Mîrza Kerim	Enwer Tuvî	Silêmanî
1958	Falçî	Nûrî Huner	Nûrî Huner	Kerkûk
1958	Tawaniy Çi Bû	Mistefa Salih Kerîm	Kadir Dîlan	Silêmanî
1959	Harûn Reşîd	El-Qabbanî	Cewad Resûl Nacî	Hewlêr
1959	Ebûbekir Hewrî: "Bîrî Azadî Rêgay Rizgarî ye"			
1959	Hesên Qizilcî: "Peymanî Dûlayî"			
1959	Mistefa Nerîman: "Rûxa"			
1959	Şewî Kotayî	Seîd Nakam	Emînî Mîrza Kerîm	Silêmanî

1959	Şakir, Min Daykitim	Yûsif Elanî	Reûf Mastaw - Fayeq Mihemed Abdulla	Bexda
1959	Bêîşî	Yûsif Elanî	Emîn Mîrza Kerîm	Silêmanî
1959	Le Rêy Nîştîman	Mistefa Lutfi el Menfullûtî	Refik Çalak	Silêmanî
1960	Zekî Ehmed Henarî'nin "Diwarojî Dehakî Zordar" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1960	Pîskey Terpîr	Molîere	Refik Çalak	Silêmanî
1960	Emrekey Begim	Yûsiv Elanî	Emîn Mîrza Kerîm	Silêmanî
1960	Fetah Kerîm Kawe: "Şorişî Huner"			
1960	Emînî Mîrza Kerîm: "Zêrîn", "Otombîlçî"			
1960	Ebdulrezaq Bîmar: "Bûkî Perde"			
1961	Ebdulrezaq Bîmar: "Şanoy Kurdistan"			
1961	Kemal Reûf Mihemed: "Bibûre"			
1961	Bûkî Jêr Dewariy Reş	Ebûbekîr Hewrî	Refik Çalak	Silêmanî
1961	Gilkoyî Tazey Leyl	Refik Çalak	Refik Çalak	Silêmanî
1964	Îsmaîlê Dûko: "Zewaca Bê Dil"			
1965	Musa Anter "Birîna Reş"			
1967	Taharê Biro "Memê û Eyşê"			
1968	Pîremêrd "Mem û Zîn"			
1969	Serînî Badarî	Ahmed Deng Gewre	Tîpî Niwandin	Silêmanî
1969	Biryar û Encam	Emînî Mîrza Kerîm	Ebdulqadir Nurî	Silêmanî
1969	Nefret Lêkraw	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1970	Mihemed Emîn Osman'ın "Nan û Jiyan" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1970	Kawey Asinger	Şêrko Bêkes	Ehmed Salar	Silêmanî
1970	Nefret Lêkiraw	Telet Saman	Ehmed Salar	Bexda
1970	Kîç	Heme Sidîq Mehmûd	Newzad Mecîd	Silêmanî
1970	Çexmaxe	Simko Nakam	Simko Nakam	Silêmanî
1970	Cengawerî Şêt	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr

1970	Kevala Milletî	Mamûn Birîfkanî	Teqyedîn Mihemed Emîn	Duhok
1970	Gezî çî û çawî çî?	Umerî Elî Emîn	Umerî Elî Emîn	Bexda
1970	Otombîlçî	Emîn Mîrza Kerîm	Ehmed Salar - Ebdulwahîd Qurbanî	Silêmanî
1970	Gelor	Makîrînî	Ehmed Salar	Silêmanî
1970	Pênc kes di otêlekê de	Stîward Ridy	Ehmed Salar	Silêmanî
1971	Xebat	Teqyedîn Mihemed Emîn	Teqyedîn Mihemed Emîn	Şengal, Duhok- (1972)
1971	Nalbend	Ebdulhemîd Ebdulla Akreyî	Ebdulhemîd Ebdulla	Akre
1971	Têkoşanî Afretanî Kurdistan	Mêhdî Umêd	Mêhdî Umêd	Kerkûk
1971	Tîrs	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1971	Cenabî Mufetîş	Gogol	Ehmed Salar	Silêmanî
1971	Emînî Mîrza Kerîm: "Dasekey Şasiwar"			
1971	Ebûbekir Hewrî: "Dildarî û Peymanperwerî"			
1971	Şêxî Teple Reş	Elî Qadir – Elî Tiwana	Newzad Mecîd	Silêmanî
1971	Şayî Xoynawî	Lorca	Newzad Mecîd	Silêmanî
1971	Çawî Vîetnam	Dilşad Merîwanî	Teha Xelîl Dilsoz	Silêmanî
1971	Nirxî Azadî	Emmanuel Roblès	Qazî Bamernî	Silêmanî
1971	Şêrko Bêkes: "Kawey Asinger"			
1972	Heme Kerîm Remezan Hewramî: "Falçî"			
1972	Gulî Xwênawî	Abdullah Goran	Ehmed Salar	Bexda
1972	Bilîtû Zawa	Heme Sidîq	Hisîn Nesrawî	Silêmanî
1972	Xemlî Pemo	Hesen Qizilcî- Mistefa Raber	Telet Saman	Hewlêr
1972	Bûkî Perde	Ebdulrezaq Bîmar	Telet Saman	Hewlêr

1972	Umer Ebdulrehîm'in "Şanogeryî Mindal" oyunlari Silêmanî de yayınlanir.			
1972	Mihemed Tofîq Wirdî'nin "Zincirey Bo Şano" eseri Necef'te yayınlanir.			
1972	Merc	Telet Saman	Telet Saman	Bexda- Kerkûk
1972	Memo	Dr. Bedirxan Sindî – Nûreddîn Birahîm	Nasir Hesên	Kerkûk
1972	Pîskey Terrpîr	Moliere	Ehmed Salar	Silêmanî – Hewlêr
1972	Sara Xan	Alfred Ferec – Elî Ehmed Ebdulla Cola	Teha Xelîl Dilsoz	Bexda
1972	Bazirganî vinîsiya	Shakespeare	Enwer Tuvî	Silêmanî
1972	Tawanêk le Asîman da	Tofîq el Hekîm – Teha Baban	Newzad Mecîd	Silêmanî
1972	Pêşmerge û Kotayî Derebegî	Selman Faîk	Selman Faîk	Kerkûk
1972	Gulbihar	Mihemed Seîd Ertûşî	Teqyedîn Mihemed Emîn	Duhok
1972	Kawey Asinger	Teqyedîn Mihemed Emîn	Mihemed Emîn Ezîzhan	Akre
1973	Herdu Lêbuk	Teqyedîn Mihemed Emîn	Teqyedîn Mihemed Emîn	Duhok
1973	Landik	Teqyedîn Mihemed Emîn	Teqyedîn Mihemed Emîn	Duhok
1973	Butkeya Girî	Ebdulrehman Îbrahîm Îsî	Ebdulrehman Îbrahîm Îsî	Duhok
1973	Newroz	Ebdulhemîd Ebdulla	Ebdulhemîd Ebdulla	Akre
1973	Hevrikiya Azad	Ebdulhemîd Ebdulla	Ebdulhemîd Ebdulla	Akre
1973	Berev Azadiyê	Salih Yasîn	Salih Yasîn	Akre
1973	Mihemed Tofîq Wirdî'nin "Çîrok bo Şano" oyunu Necef'te yayınlanir.			

1973	Pijmîn	Umer Elî Emîn	Teha Xelîl	Silêmanî
1973	Goêzan (TV)	Mistefa Raber – Telet Saman	Husên Esrawî	Bexda
1973	Boze Piyaw (TV)	Mistefa Raber	Tariq Kerîm	Bexda
1973	Çawî vîetnam	Dilşad Merîwanî	Teha Xelîl Dilsoz	Kerkûk
1973	Tawanek li Asîman	Tofîq el Hekîm – Teha Ehmed Salih Baban	Newzad Mecîd Kerîm	Bexda
1973	Xaloy Rêbiwar	Mihemed Mewlud – mistefa Raber	Telet Saman	Hewlêr
1973	Zawayekî Kelxo	Wahîd Mercan	Wahîd Mercan	Hewlêr
1973	Nameyek le Xinkawewe Sara Xan	Elfirêd Ferec	Cemal Mihemed	Silêmanî
1973	Birêveberê Nû	Mihemed Sedîq Mehmûd	Newzad Mecîd Kerîm	Bexda
1973	Bilît û Zava	Nûrî Mihemed Emîn Weştî	Newzad Mecîd Kerîm	Bexda
1973	Ayar Serkewtin e	Mihemed Sedîq Mehmûd	Newzad Mecîd Kerîm	Silêmanî
1974	Pirdî Wilat	Ehmed Salar	Fazil Caf	Bexda
1974	Lawaw	Ebdulxenî Elî Yehya – Xelîl Yabe Kerîm	Çeto Hesen Ezîz	Beğdat
1974	Peyker	Bol Birolla	Teha Xelîl	Silêmanî
1974	Zekî Ehmed Henarî'nin "Le Pênawî Ewîn da" oyunu Silêmanîde yayınlanır.			
1974	Dîwar	Sartre	Teha Xelîl	Silêmanî
1974	Bê Qelen	Fêrîkê Ûsiv	Elegez	Elegez
1974	Eve Bû Guhar	Şeban Mezîrî	Refet Receb Cemal	Duhok
1974	Peymangeha Arezûya	Mihemed Reşîd	Refet Receb Cemal	Duhok
1974	Ebdulhemîd Abdulla: "Senger"			

1975	Elawiyê Nivîsevan	Mihemed Remzan Ehmed	Refet Receb Cemal	Duhok
1975	Otêla Sihirkirî	Ebdulrehman Îbrahîm Îsî	Ebdulrehman Îbrahîm Îsî	Duhok
1975	Receb û Piyawxoran	Simko Nakam	Ahmed Salar	Silêmanî
1975	Serkewtin	Mihemed Seddîq- Mistefa Raber	Çeto Hesên Ezîz	Bexda
1975	Haley Derhêner	Mihemed Seddîq Mehmûd- Raber	Îmad Behcet	Bexda
1975	Giryân	Taha Baban	Taha Baban	Hewlêr
1975	Mem û Zîn	Telet Saman	Telet Saman – Ferhad Şerîf	Hewlêr
1976	Waney Reşbelek	Ehmed Salar	Ehmed Salar	Silêmanî
1976	Heley Diktor	Îzet Ehmed Kerîm	Ebdul Heme Ciwan	Silêmanî
1976	Jiyan	Celîl Zengene	Celîl Zengene	Hewlêr
1976	Seley Nanker	Xaîp Toime Ferman	Kamiran Raûf	Hewlêr
1976	Molet	Mihêdîn Zengene	Ehmed Salar	Silêmanî
1976	Palto	Gogol – Cemel Nebez	Simko Nakam	Silêmanî
1976	Beytî Rêzankê	Simko Nakam	Osman Çêwar	Bexda
1976	Jiwanî Rojane	Şêrko Bêkes	Osman Çêwar	Silêmanî
1976	Xwazbînî	Maks Rînê – Pişko Seîd	Teha Xelîl Dilsoz	Silêmanî
1976	Kawey Asinger	Şêrko Bêkes	Husamedîn Ebdulqadir	Duhok
1976	Kotî Komel	Rêwaz Caf	Tariq Fazil	Bexda
1976	Mirov û Zevî	Teha Baban	Teha Xelîl Dilsoz	Kerkûk
1977	Dixtur	Ehmed Hesên	Mehdî Mihemed Mubarek	Duhok

1977	Qutabî	Ehmed Hesên	Remezân Hebîb – Salim Tahîr	Duhok
1977	Ne bo Xwendewariyê	Salim Tahîr – Ehmed Hesên	Salim Tahîr	Duhok
1977	Huner û Jiyan	Mehdî Umêd	Mehdî Umêd	Bexda
1977	Kawey Asinger	Şêrko Bêkes	Teha Xelîl	Silêmanî
1977	Mîrov û Zewî	Teha Baban	Hikmet Zenun	Silêmanî
1977	Heme Kerîm Remezân Hewramî'nin "Şewêk le Jiyanî Xanzad" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1977	Lalo vaniya	A. Çêxov	Osman Çêwar	Silêmanî
1977	Otêllo	Shakespeare	Ehmed Salar	Silêmanî
1977	Diktorî Têlla	Moliere – Refîq Çalak	Ebdul Heme Ciwan	Silêmanî
1977	Jiyan	Celîl Zengene	Hikmet Zenun	Silêmanî
1977	Winbûw	Maks Rînê – Îzet Ehmed Kerîm	Selaheddîn Qadir	Silêmanî
1977	Gulale	Heme Reşîd Heres	Şemal Eberêş	Silêmanî
1977	Pîlan	Mihemed Mewlud	Telet Saman	Koye
1978	Şêrko Bêkes: "Ask"			
1978	Ehmed Salar: "Waney Reşbelek"			
1978	Kemal Burkay "Dawiya Dehaq"			
1978	Mehdî Umêdî: "Mîrov û Çax û Bîr"			
1978	Xec û Siyamend	Fûad Mecîd	Ahmed Salar	Silêmanî – Musul
1978	Tofîq Hekîm'in "Odîbî Paşa û Berderkey Sîzif" oyunu Silêmanî'de yayınlanır.			
1978	Qal û Rûte	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1978	Pêşenga	Mehdî Umêd	Fetah Xetab	Hewlêr
1978	Diwarojî Zuhakî Zordar (TV)	Ehmed Zekî Henarî	Zîrar Mihemed Mistefa	Bexda
1978	Pîrê û Rêwî	Jolhêrm Vîgdiriyoy	Azad Mihemed Biçkol	Silêmanî

1978	Jiyan	Celîl Seîd Hemîd Zengene	Celîl Seîd Hemîd Zengene	Kerkûk
1978	Teyrê Elegezê	Vaçe Harûtûnyan- Emerîkê Serdar	Şalîkoyê Sefo – Rizganê Emo	Elegez
1979	Ker û Kulik	Suren Gînosyan- Heciyê Cindî	Rizganê Emo	Elegez
1979	Sînco Qîza Xwe Dide Mêr	Eskerê Boyîk	Rizganê Emo	Elegez
1979	Mehdî Umêdî' nin "Bûkî Befir" oyunu Silêmanî' de yayınlanır.			
1979	"Mangirtin	Ebdulrehman Zengene	Birayîm Ferşî	Bokan
1979	Fûad Mecîd Mîsirî: "Xec û Siyamend"			
1979	Ehmed Salar'ın "Dildaranî Baran" oyunu Silêmanî' de yayınlanır.			
1979	Fehmî Kakeyî' nin "Jan" oyunu Silêmanî' de yayınlanır.			
1979	Seyda Îbrahîm Selman ""Lêbûk Dastana Mem û Zîna Diguhurît"			
1979	Gêçellekanî Heme Wey	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1979	Direwşîkên	Muhsîn Umsan	Muhsîn Umsan	Duhok
1979	Şaxêt Pêşemana	Rêber Ferec	Rêber Ferec	Duhok
1979	Xoragirtin (TV)	Zirar Mihemed Mistefa	Zirar Mihemed Mistefa	Bexda
1979	Operêtî Dastanî Şoriş (TV)	Medhed Bêxem	Zirar Mihemed Mistefa	Bexda
1979	Pirsyar	Mihêddîn Zengene	Peyan Begok	Hewlêr
1979	Şewket Nagerêtewe	Salim Debax	Şemal Ebdulla Elî Reş	Silêmanî
1980	Gule Mêxek	Simko Nakam	Osman Çêwar	Silêmanî
1980	Dr. Nafî Akreyî' nin "Şêxî Senan" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1980	Mihemed Ebdulrehman Zengine'nin "Man Girtin" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1980	Emînî Mîrza Kerim'in "Serçawey Janêkî Xamoş" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			

1980	Hebû Nebû	Qasim Mihemed	Sebah Ebdulrehman	Hewlêr
1980	Bûkî Befir	Mêhdî Umêd	Telet Saman	Hewlêr
1980	Ew Piyawey Bûbe Seg	Ozvalidirgun – Reûf Hesen	Fetah Xetab	Hewlêr
1980	Gêçelekanî Heme Wey Wey	Mehdî Umêd	Telet Saman	Hewlêr
1980	Lalo vaniya	Çêxov- Osman Çêwar	Ehmed Salar	Selahaddin
1980	Memê û Eyšê	Xelîl Mûradov	Rizganê Emo	Elegez
1980	Pêşî Mirin Paşê Zewicîn	M. Maksîmov	Rizganê Emo	Elegez
1980	Heyfhildan	Eskerê Boyîk	Rizganê Emo	Elegez
1980	Sinco Qîza Xwe Dide Mêr	Eskerê Boyîk	Mirazê Êzo	Tiflis
1980	Cînar	Giyorgî Yogayev	Mirazê Êzo	Tiflis
1980	Elî û Omer	Giyorgî Yogayev	Mirazê Êzo	Tiflis
1981	Heme Kerîm Hewramî: “Gundekem”			
1981	Mihemed Abdulrehman Zengene: “Welî Dêwaney Şem.			
1981	Xecê û Siyabend	Suren Gînosyan – Tosinê Reşîd	Rizganê Emo	Elegez
1981	Xwesî	M. Şamxalov	Mirazê Êzo	Tiflis
1981	Xanî	Viyan Muhemed	Viyan Muhemed – Koma Xanî	Qamişlo
1981	Teneke	Yaşar Kemal – Fûad Mecîd Misrî	Ehmed Salar	Hewlêr, Silêmanî
1981	Zelkaw	Maksîm Gorkî	Osman Çêwar	Silêmanî
1981	Ey Ew Kesey Le Wêye	William Saroyan – Azad Berzincî	Fetah Xetab	Hewlêr
1982	Heme Kerîm Remezhan Hewramî'nin “Xatû Kilawzer” oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1982	Ask	Şêrko Bêkes	Kerim Osman	Bexda

1982	Qelay Dimdim	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1982	Bûkî Befr	Mehdî Umedî	Telet Saman	Hewlêr
1982	Celîl Zengine'nin "Hawarêkî Tasaw" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1982	Kurê min Bajêrvan	Ebdulsalam Ebdulqadir Bamernî	Ebdulsalam Ebdulqadir Bamernî	Duhok
1982	Kawey Asinger	Şêrko Bêkes	Luqman Mistefa	Duhok
1982	Axayê Bêwijdan	Rêber Ferec	Rêber Ferec	Duhok
1982	Eger Roj Helat dê Ava Bît	Mihemed Elî Mihemed	Bedel Ebdulbaqî	Duhok
1982	Nehênî Pîşe	Ehmed Bedîşe	Zirar Mihemed Mistefa	Rewandiz
1982	Elî Welî	Costa Xotagura	Rizganê Emo	Elegez
1982	Hê Erebe Welnegeriyaye	Otia Juselian	Mirazê Ūzo	Tiflis
1982	Simko	Mihemed Xelîl	Mihemed Xelîl – Koma Xelat	Qamişlo
1982	Cotkar û Xak	Ebdulrezaq Cengo	Ebdulrezaq Cengo – Koma Newroz	Qamişlo
1983	Mirov û Şarekey	Azîz Nesîn	Simko Nakam	Silêmanî
1983	Xanzadêkî Itir	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1983	Celâlî Mîrza Kerîm'in "Senger" Şehid Aram (Pêşmêrge Matbası)			
1983	Evdirehim Rehmî Hekarî: "Memê Alan (1919)"			
1983	Dixturê Dilreq	Ebdulsalam Ebdulqadir	Qeyran Ferec Ebdal	Duhok
1983	Axa û Millet	Sebah Abdulla Elî	Sebah Abdulla Elî	Duhok
1983	Newroz	Mihemed Elî Mihemed	Qehar Elî Mihemed	Duhok
1983	Newroz Çi ye?	Fehmî Silêman	Ebdulsalam Ehmed	Duhok
1983	Rezvan	Ebdulsalam Silêman Abid	Ebdulsalam Silêman Abid	Duhok

1983	Banêkew Dû Hewa	Bertolt Brecht	Zirar Mihemed Mistefa	Rewandiz
1983	Sînco Qîza Xwe Dide Mêr	Eskerê Boyîk	Rizganê Emo	Elegez
1983	Zavê ji Welatê Der	Achot Papayan	Mirazê Êzo	Tiflis
1983	Bezor Kirawe Be Diktor	Moliere – Hîwa Umer Ehmed	Ferhad Şerîf	Erbîl
1983	Letîf Helmet'in "Felestîn Hemîşe" oyunu Bexda'ta yayınlanır.			
1983	Seley Nanker	Fûad Mecîd Mîsirî	Kamîran Raûf	Silêmanî
1983	Las û Xezal	Nazim Dilbend	Sebah Ebdulrehman	Hewlêr
1984	Kulîlkên Newrozê/ Newroz Çiçekleri	Ayşe Emel – Mahmut Baksi	Ayşe Emel- Halk	Stockholm
1984	Faylî 67	Îsmâil Fehîl - Osman Çêwar	Telet Saman	Hewlêr
1984	Mala Min Mala Te Nîne	Girair Ananian	Mirazê Êzo	Tiflis
1984	Molet	Mihêdîn Zengene	Ahmed Salar	Silêmanî
1984	Hamlêt	Shakespeare	Ehmed Salar	Silêmanî
1984	Riya Azadiyê	Nesîr Bavê Rewşen	Nesîr Bavê Rewşen – Koma Narîn	Qamişlo
1984	Hêvî, Boyaxçî	Adil Ismaîl	Adil Ismaîl- Koma Xanî	Qamişlo
1984	Tehsîn Şeban: "Sê Şanogerî"			
1984	Operêtî Sewze	Fazil Qesab	Kameran Ehmed Fetah	Halepçe
1984	Ebdulqadir Seîd'in "Mergî Bexteweriy" oyunu Silêmanî'de yayınlanır.			
1984	Telet Saman'ın "Qelay Dimdim" ile "Şarî Ewîn" oyunları Hewlêr'de yayınlanır. Aynı yıl Şarî Ewîn'i Hewlêr'de yönetir.			

1984	Baweriyeka Mukim Çiya Dihejînît	Ebdulsalam Ehmed	Mihemed Ebdulla	Duhok
1984	Çekuç û Kawe	Elî Tahir Emer	Elî Tahir Emer	Duhok
1984	Xewn	Rêber Ferec	Rêber Ferec	Duhok
1984	Rojek dê êt û Newroz e	Qeyran Ferec	Qeyran Ferec	Duhok
1984	Mamosta û Qutabî	Xazî Mihemed	Qehar Elî Emer	Duhok
1984	Nama Serbazekî	Ebdulsalam Sedulla Fetah	Ebdulsalam Sedulla Fetah	Duhok
1984	Qutabiyê, Şîm	Ehmed Hesên	Mihemed Elî Ertûşî	Duhok
1984	Sunnetçî	Ehmed Hesên	Ehmed Hesên	Duhok
1984	Xanzadekî Tir	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1984	Goranî Malawayî	A. Çehov – Reûf Hesên	Selah Xoşnaw	Hewlêr
1984	Nexoşî Didan	Osvaldo Dragun – Dana Raûf	Dilşad Saman	Hewlêr
1984	Feylesofî Axir Zeman	Yusif Biradostî	Yusif Biradostî	Selahaddin
1984	Hawarêkî Tasaw	Celîl Zengene	Yusif Biradostî	Selahaddin
1985	Xumeynî	Ehmed Hesên	Gurgîs Şilîmûn	Duhok
1985	Firotna Ginciyan	Ebdulsalam Sedulla Fetah	Ebdulsalam Sedulla Fetah	Duhok
1985	Azadî	Rêber Ferec	Rêber Ferec	Duhok
1985	Bizav	Baîz Umer Ehmed	Mufîq Nîmet	Akre
1985	Kabra Seyreke	Nazîm Hîkmet	Ebdulî Heme Ciwan	Silêmanî
1985	“Xec û Siyamend	Fuad Mecîd Misrî	Telet Saman	Hewlêr
1985	Şarî Ewîn	Telet Saman	Telet Saman	Hewlêr
1985	Lêwe Bebarekan	Celîl Qeysî – Ebdulla Ehmed Dawid	Mewlud Xidir	Hewlêr
1985	Xizmetkarêkî Goyrayel	Celîl Qeysî – Ebdulla Ehmed Dawid	Ferhad Şerîf	Hewlêr

1985	Leylan Şefîqe Elî Hiseyn'inin "Şaciwanî Derbend Feqerew" ve "Keyxan"			
1985	Heme Kerîm Remezan Hewramî: "Xewn e û Xewn Niye"			
1985	Mangirtin	Mihemed Ebdulrehman Zengine	Koma Niwandin	Halepçe
1985	Qelay Dimdim	Erebê Şemo- Sadûn Îwnis	Sadûn Îwnis	Hewlêr
1985	Gulî Behar Hat	Celîl Alqîsî	Hisên Mîsrî	Silêmanî
1985	Ji Saet Sisêyan Heta Şeşan	Alexandre Tchkhaidzé	Mirazê Êzo	Tiflis
1985	Pêşmerge, Rext û Ziman	Adil Ismaîl	Adil Ismaîl- Koma Xanî	Qamişlo
1986	Berxwedan	Adil Ismaîl	Adil Ismaîl- Koma Xanî	Qamişlo
1986	Kalîgola	Albert Camus	Ehmed Salar	Silêmanî
1986	Dujminî Gel	Henrîk Îbsen	Ehmed Salar	Silêmanî
1986	Qerec	Bekîr Reşîd	Bekîr Reşîd	Silêmanî
1986	Katê Helo Berz Efirê	Ahmed Salar	Ahmed Salar	Silêmanî
1986	Rûbar	Mohemed Ferîq Hesên	Zahîr Ebdulla Reş	Silêmanî
1986	Gurêla	Yocîn Otîl – Şêrzad Hesên	Şemal Umer	Hewlêr
1986	Şarî Ewîn	Telet Saman	Zirar Mihemed Mistefa	Hewlêr
1986	Giryan	Teha Baban	Teha Baban	Kerkûk
1986	Jale	Celîl Zengene – Kawa Ehmed Mîrza	Nasir Hesên	Kerkûk
1986	Efsaney Çiyay Agirî	Yaşar Kemal	Telet Saman	Hewlêr
1986	Qutabiyê Bêrewişt	Rizgar Reşîd	Rizgar Reşîd	Akre
1986	Newroz di Davbera Duhî û Evro	Fehmî Silêman – Ebdulselam Ehmed	Adil Hesên	Duhok

1986	Kurê Kawey	Mihemed Elî Ertûşî	Sadîq Şerû	Duhok
1986	Dixtur	Mihemed Hesên Heyran	Zahîr Hisên	Duhok
1986	Xwîn	Rêber Ferec	Rêber Ferec	Duhok
1986	Mehabad	Ebdilrezaq Osê(Rizo)	Ibrahîm Ehmed – Koma Xelat	Qamişlo
1986	Çiqîlê Spîndarê	Juri Vizbor	Mirazê Îzo	Tiflis
1986	Cînar	Giyorgî Yogayev	Rizganê Emo	Elegez
1987	Temo û Lawik	Wezîrê Eşo	Rizganê Emo	Elegez
1987	Birîna Reş	Yûsiv Alanî	Ibrahîm Ehmed- Koma Xelat	Qamişlo
1987	Wijdan	Adil Ismaîl	Adil Ismaîl- Koma Xanî	Qamişlo
1987	Jiyan û Mergî Morîta	Pablo Nerûda	Zahîr Ebdula Reş	Silêmanî
1987	Serçawey Janêkî Xamoş	Emînî Mîrza Kerim	Koma Niwandinê ya Ezmîrê	Silêmanî
1987	Çawerwanî Godo	Beckett	Şemal Umer	Silêmanî
1987	Împarator Jones	Eugene O’neill – Azad Hesên Şerîf	Azad Mewlud Xidir	Hewlêr
1987	Dengî Mirovayetî	Gezîze	Gezîze	Hewlêr
1987	Teneke	Yaşar Kemal	Ehmed Salar	Hewlêr
1987	Hemedok	Telet Saman	Siddîq Ezîz	Hewlêr
1987	Helhatinî Mang	Lidî Grîgorî	Hisên Misrî	Silêmanî
1987	Bo çî?	Hemdî Ehmed	Ebdulselam Silêman Abid	Duhok
1988	Mirin Xweştir e ji Jînê	Remzan Reşîd	Koma Karî	Duhok
1988	Kovana Doşaffiroşê Hejar	Sedulla Wenûs	Rizgar Reşîd Akreyî	Akre

1988	Kumreşê Dînik	Achot Papayan	Rizganê Emo	Elegez
1988	Ker û Kulik	Suren Gînosyan- Heciyê Cindî	Rizganê Emo	Elegez
1988	Tosinê Reşîd: "Siyabend û Xecê", Stokholm			
1988	Ferhad Pîrbal'in "Beyanî Baş Ey Xerîbî" oyunu Danimarka'da yayımlanır.			
1988	Xewn û Rastî	Hîwa Suad	Şanoy Ezmûngerî	Hewlêr
1988	Mîwan	Manoîl Martinîv	Azad Mewlud Xidir	Hewlêr
1988	Raşmon	Yunsukî Agatacawa – Ebdulla Ehmed Dawid	Ferhad Şerîf	Hewlêr
1988	Ew Piyawey Kamergiley Esle Mêtewe (TV)	Îbrahîm Besrî- Mehmûd Zamdar	Zîrar Mihemed Mistefa	Hewlêr
1988	Katê Helo Berz Efirê	Ehmed Salar	Ehmed Salar	Bexda
1988	Gulekan ok ê?	Mihiyedîn Zengene	Erselan Derwêş	Silêmanî
1988	Diyariya Helepçê	Adil Ismaîl	Adil Ismaîl- Koma Xanî	Qamişlo
1988	Karkerên Windayî	Adil Ismaîl	Adil Ismaîl- Koma Xanî	Dêrazor
1989	Çalawî Tawan	Kemal Hendjîre	Kemal Hendjîre	Zewa Kampı (İran)
1989	Şahînê Bekirê Soreklî'nin "Mehkemekirina Silahiddînê Eyûbî" oyunu Stockholm'de yayımlanır.			
1989	Cezîrî Waney Evîn Dadedat	Ehmed Salar	Ehmed Sala	Bexda, Silêmanî
1989	Eskerê Boyîk'in "Mem û Zîn" oyunu Stockholm'de yayımlanır.			
1989	Yên Xwedê ji Wan Stendî	Şaliko Miraz	Mirazê Ūzo	Tiflis
1989	Ezîze Gerdenzerî'nin "Zarîna Çiyan" oyunu yayımlanır. 1990'da Mirazê Ūzo tarafından sahnelenir.			

1989	Terazû	Emîn Mîrza Kerîm	Hemesiwar Ezîz	Selaheddîn
1989	Segekey General	A. Çêxov	Hîwa Suad	Hewlêr
1989	Derya	Hadî Mehdî	Mîdiya Reûf	Silêmanî
1989	Ew Piyawey Xoy Be Barimte Dana	Mehdî Elîsmawî	Hisên Misrî	Silêmanî
1989	Diwa Şewî Lorka	Celîl Qeysî	Zahîr Ebdulla Reş	Silêmanî
1989	Gele Gurg	Husên Arif	Şefîq Mihemed	Silêmanî
1989	Le Çaweriwanî Siyamendî	Şemal Umer	Nîgar Hesîbî – Mîdiya Reuf	Silêmanî
1989	Dartuweke	Gezîze	Gezîze	Silêmanî
1989	Dergake Nekanewe	Muhsîn Mihemed	Muhsîn Mihemed	Hewlêr
1989	Qerec	Puşkin- Azad Berzencî	Selah Xoşnaw	Hewlêr
1989	Termî Serşosteke	Sedulla Winûs- Usman Şeyda	Ferhad Şerîf	Hewlêr
1989	Yarî	Ludvîx Hulbêrg	Rizgar Reşîd Akreyî	Akre
1989	Şehiyana Şehîdî	Sadiq Şerû	Ebdulselam Silêman Abid	Duhok
1989	Şagirdê Cengawer	Qasim Hisên	Gurgîs Îsheq	Duhok
1989	Xwîn û Xak	Rêber Kasanî	Rêber Kasanî – Koma Xanî	Qamişlo
1990	Zindana Bê Dîwar	Rêber Kasanî	Rêber Kasanî – Koma Xanî	Qamişlo
1990	M. Zîlanî'nin "Xelex û Peyman" Beyrut'ta yayımlanır.			
1990	Neferê Elawat	Şaliko Miraz	Neferê Elawat	Tiflis
1990	Dewê Toros	Aziz Nesin	Adil Ismaîl	Qamişlo
1990	Hût	Ferhan Bavê Kasir	Ferhan Bavê Kasir- Koma Narîn	Qamişlo
1990	Hawar	Beckett – Mehmûd Zamdar	Heme Elî Xan	Silêmanî

1990	Marî	Sihdûn Ebêdî- Azad Mewlud	Azad Mewlud	Silêmanî
1990	Pêlewaniyetî Cengawerêk	Zirar Mihemed Mistefa	Zirar Mihemed Mistefa	Rewandiz
1990	Şêtekanêî Em Rojgare	Ditrî Yasa Nas – Azad Heme Şerîf	Cewher Bapîr	Hewlêr

Tekstên Piştî 1990î (Çapkirî)

- 1- Mişko, Mamoste Cemîl, (Rewşen, 1992, Hejmar:2-3-4)
- 2- Mirin û Jiyan- Hüseyin Kaytan (Rewşen, 1992, Hejmar: 8-9)
- 3- Kula Dêrsimê, Felat Dilgeş, (Weşanên Koral, 1992)
- 4- Zembîlfiroş, Aram Gernas, (Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1995)
- 5- Proveyên Bidarvexistinê, Kemal Orgun, (Weşanên Çima, 2000)
- 6- Qedera Nivîsandî, Marûf Yilmaz, (Weşanên Jîndan, Stockholm, 2002)
- 7- Bajarê Aqil û Aqilmendan, Marûf Yilmaz (Weşanên Jîndan, Stockholm 2002)
- 8- Di Tuwaletê De, Rênas Jiyan, (Weşanên Belkî, 2006)
- 9- Sêva Delalî (Qerf/Şano), Cemîl Denlî, (Weşanên Belkî, 2005)
- 10- Kurteşano, Şalîkoyê Bêkes, (Weşanên F. Çanda Kurdî, Moskow, 2012)
- 11- Kurd û Tûtû, Yên Xwedê Ji Wan Stendî (2002), Şalîkoyê Bêkes, Weşanên F. Çanda Kurdî, Moskva, 2012)
- 12- Mala Extiyaran, M. Emîn Yalçinkaya, (Şaredariya Amedê, 2008)
- 13- Mala Dînan, M. Emîn Yalçinkaya, (Şaredariya Amedê- 2008)
- 14- Zewaca Şaş, Bûbê Eser, (Weşanên Doz, 2009)
- 15- Li Welatên Wendayî Evîn, Gülistan Ötünç, (Weşanên Do, 2008)
- 16- Reşê Şevê, (2008) Berfin Zenderlioğlu, Mirza Metin (Avesta- 2011)
- 17- Derî Veneke, Kawa Şêxê, (Weşanên Sema, 2007)
- 18- Şikeft, Dêwê Bi Çavekî, Kawa Şêxê, (Weşanên Tevn, 2009)
- 19- Stêrk (Kurdên Nejbîrkinê), Nûredîn Zaza, (Weşanên Avesta- 2011)
- 20- Gurî, Hêvî Şanoger (Aram, 2015)

Hin Tekstên Werger

- 1- Selahaddinê Eyyubî, Necip Heddad, (Wer. Daniel Kasab-Hewlêr- 1921) Wergera ji erebî bo Osmanî 1909 Trabzon. (Ji osmananî, bi Tirkiya îro, weşanên avesta (2011)
- 2- Riya Teze, H Şalciyan (1934) (Wer. Cerdoyê Genco, Celîlê Celîl) Rewan, 1934
- 3- Gerdaweka(Bahoz), Shakespeare (Wer. Dr. Cemal Nebez- 1955 Bexda)
- 4- Zimanê Çiya (1991), Harold Pinter, (Wer. Mehmet Uzun), Doz- 1991
- 5- Zimanê Çiyê, Harold Pinter (Wer. Mehmet Çakmak) DBŞT, 2009
- 6- Bexçeyê Vîşnê A. Çêxov (Wer. Firat Cewerî) Nûdem, 1995, Stockholm
- 7- Li Benda Godot Samuel Beckett (Wer. Firat Cewerî) Nûdem, Stockholm, 1995
- 8- Li Benda Godot (Ji Îngilîzî Wer. Hêja Turk, Wêjestêrk, 2013)
- 9- Prometheûsê Zincîrkiî, Asxîlos (Aiskhylos), (Wer. Tahirhan Parlak) Doz, 2009
- 10- Tartuffe/ Sofiyê Sextekar, Moliere, (Wer. Yakup Kandemir) Aram, 2002
- 11- Nexweşê Newxeşiyê, Moliere, (Wer. Yakup Kandemir) Aram, 2006
- 12- Dayîka Wêrîn û Zarokên Wê, Brecht (Wer. E. Cantepe, E. Öpengin, H. Kılıç) BGST, 2008
- 13- Dayka Kûraj û Zaroyên Wê, Brecht (Wer. Casimê Wezîr)
- 14- Bazirganê Venîsiya, Shakespeare (Wer. Cankurd) Weşanên Helwest, Stockholm, 2002
- 15- Romeo û Juliet, Shakespeare, (Wer. Aram Gernas) Weşanên Helwest, Stockholm, 2002
- 16- Girtî, Melih Cevdet Anday (Wer. Cuma Çiçek) Weşanên Aram, 2007
- 17- Hamlet, Shakespeare, (Wer. Kawa Nemir) Weşanên Lîs, 2013
- 18- Xewna Şeveke Havînê, Shakespeare, (Wer. Kawa Nemir) Weşanên Lîs, 2014
- 19- Arîn / Mem û Zîn, Cuma Boynukara (Wer. Fehim Işık, Rahmetullah Karakaya) Weşanên Evrensel, 2008
- 20- Mirin Di Xewê De Bû, Bêpar, Cuma Boynukara (Wer. Lal Laleş, Rêzan Tovjîn, Fehîm Işık) Weşanên Lîs, 2010
- 21- Theodora, Haşmet Zeybek, (Wer. Aydın Orak) Weşanên Pêrî, 2012
- 22- Teneke, Yaşar Kemal (Wer. Aydın Orak), Weşanên Berçem, 2006

- 23- Araf, Cihan Şan, (Wer. Aydın Orak, Weşanên Do, 2008)
 24- Qedehek Din, Harold Pinter (Wer. Bedirxan Mûhsîn Aybar, Wêjestêrk, 2013)

Hin Tekstên Bo Zarokan

1. Bexçeya zarokan, Gabar Çiyan, (Stockholm, 1992)
2. Mindallekan, Gabar Çiyan, (Stockholm, 1992)
3. Kerek û Heft Gur, Gabar Çiyan, (Stockholm, 1992)
4. Kulîlkên Apê Mûsa, Yaqob Tilermenî, Weşanên Zîbeq, 2012
5. Şengê û Pengê, Çetoyê Zêdo, Weşanên Filîtto, 2014
6. Serxwebûna Mirîşkan, Çetoyê Zêdo
7. Pîre û Luye, M. Malmîsanij (Bi Zazakî)
8. Şengê û Pengê, Sîdar Jîr
9. Gera Geçikê, Yusuf Unay
10. Qêrîna Ajalan, Mehmet Erbey
11. Palyaçoyê Winda, Koma Dijberî Dîwêr
12. Masîreşa Biçûk, Rûgeş Kırıcı (Ji Çirokeke Samet Behrengî) NÇM, 2014
13. Papûcên Min Ên Xweşik, Dersu Yavuz Altun, (Wer. M. Emin Yalçinkaya)
14. Zêrên Masîgir, Şehmus Yiğın (Wer. M. Emin Yalçinkaya)
15. Çiya Gîhîşt Behrê, Ülker Köksal (Wer. Leyla Batği- Kemal Ulusoy)
16. Li Rawestgehê Sê Ezezok, Özer Tunca (Wer. Mem Mîrxan, 2010)

Lêkolîn

- 1- Hizirkirin Di Pirsên Şanoyê De (Teoriya Şanoyê), Muhsîn Osman, (Weşanên Spîrêz, Duhok,2008/ Şaredariya Amedê, 2012)
- 2- Mezopotamya (Teoriya Şanoyê), Muhsîn Osman, (Weşanên Spîrêz, Duhok,2008/ Şaredariya Amedê, 2012)
- 4- Şanoya Li Jêrzmînê, Mîrza Metîn, (Şaredariya Amedê, 2014)

- 5- Mêjûy Şano Le Edebiyatî Kurdî Da (Lêkolîn), Ferhat Pîrbal, Dezgey çap û Blawkirdnewey Rewşenbirî (PDF)
- 6- Ebdilrehîm Rehmiyê Hekarî, Ferhat Pîrbal, (Dezgeha Spîrêz, Dihok, 2002)
- 7- Heme Kerîm Hewramî, (2001), Dramay Kurdî Le Naw Dramay Cîhanda, Hewlêr: Ministry of Education Publication.
- 8- Shwan Jaffar, (1992). Le Theatre Kurde. In Les Kurdes par dela l'exode (pp. 207-232). Paris: l'Harmattan.
- 9- Shwan Jaffar, (2012). Le théâtre kurde, espace de protection d'une identité en péril. In M. Gonzalez, & H. Laplace-Claverie (Eds.), Minority Theatre on the Global Stage: (pp. 119-134). Newcastle upon Tyne: Cambridge Scholars Publishing.
- 10- B. Qeredaxî (2004). Şanokarî Kurd le yotobiyay ezmûngerîda, (Silêmanî, Hikumetî Herêmi Kurdistan, Wezaretî Roşinbîrî)
- 11- Hesên Tenya (1985). Şanoy Kurdewari (Bexda)
- 12- Selam Ferec Kerîm(2009). Geşesendinî Dramay Kurdî 1975-1995. (Silemani)
- 13- Yasîn Berzencî, (2007). Şanoy Kurdî, Silêmanî, Govarî Şano
- 14- Ref'et Receb Cemal , (2007). Bizava Şanoyê Li Dihokê 1930-2006
- 15- Ibrahim Ehmed Semo (2007). Şanoy Kurdî le nêwan deqî xomalî û biyanî da. Silemani, Govari Şano.
- 16- Keyfî Ehmed Ebdulqadir (2013). Realism le Şanoy Kurdî da, (Hewler, Wezaretî Roşinbîrî)
- 17- Kawe Ehmedmirza, (2011). Şanoy Kurdî-Silemani: le damezrandinîyewe ta raperini 1991. Silemani: Karo.
- 18- Pîter Birûk (Peter Brook) Le Şanoy Hawçerxî Cîhanî da,
- 19- Gutarî Ezmungerî le Rewtî Şanoy Kurdîda, Dana Reûf, (1995)

Berawirdek Li Ser Çar Varyantên “Siyabend û Xecê”

Zeynep Sultan Atlı

Destpêk

Di dîroka gelan de hin kes bi işq û evîna xwe bi nav û deng bûne. Wan kesan ji ber kû renekî manevî dane gelê xwe, di dilê gel de jiyane, nehatine jibîrkin. Di nav Kurdan de herçiqas navekî taybet ê *Mem û Zînê* hebe jî bê guman ji bilî wê hin destanên din/dîtir jî hene. Ji bo mînak *Hesen û Nazê*, *Dimdim*, *Memê Alan û Sîyabend û Xecê* jî dikare bê gotin.

Poyêma SIYABEND û XECÊ di nav medeniyeta Kurdan de cihekî girîng digire. cudahiyeke din a serpêhatiya Siyabend ew e ku navê wî ne tenê di warê işq û evîna de, di mijara qehremanî û lehengiyê de jî derbas dibe. Bê guman li ser vê destanê gelek varyant derketine holê û gelek nivîskarên qedirbilind li serê rawestiyane. Ji Xeynî nivîskaran ji roja pêş da hetanî niha her dengbêjekî ev poyem ji yê pêşiya xwe hildaye. Her dengbêjekî jî anegorî dewra xwe tiştinan lê zêde kirine an jî jê derxistine û bê guman di navbera wan de cudahî peyda bûne.

Em ê di vê nivîsê de li ser çar varyantên *Siyabend û Xecê* ya Dilbikûlê Cizîrî, Siyabendov Semend, Ahmet Aras û Seydayê Tîrêj rawestin.

Mijarên Hevpar

Di van her çar poyêma de jî mijara sereke evîna *Siyabend û Xecê* ye. Em dikarin lehengî, ‘egîdî, qehremanî û mîrxasiya Siyabendî lê zêde bikin. (Em dikarin lehengî, ‘egîdî, qehremanî, û mîrxasiya Siyabendî wek mijara ku ji aliyê olî ve hevpar jî gerîn û gazindên li ser felekê ye. Herwekî din mijara şêr (şêr belkî bibe motîf) jî hevpare; di poyem a Seydayê Tîrêj de *Siyabend û Elîf*, di poyem a Ahmet Aras de *Siyabend û Hesen Axa*, di poyem a Dilbikûlê Cizîrî de *Sîbend (Siyabend) û Şerîf* di aliyê şêr de zêdetirî ber bi çav e.

Destpêkên Varyantan

Di nav van varyantên em tehlîl dikin de destpêkê cûda û bi renekî cihê ne.?

Siyabendov Semend; “Di demeke biharê de pîreke belengaz, bê xweyî û xudan dema ku di êlê de ji bo parsê dewsa waran digere dengê girîneke zarokekî dibihîse û di nav pêçekekê de

lawikekî dibîne û wek zaroka wê bixwe be lê sahib derdikeve, bi delalî mezin dike. Navê zarokê jî dixê Siyabendê Silivî.”

Ahmet Aras; “Dema ku Siyabend heftê xwe tamam dike û dikeve sala xwe ya heştan li Silîva nexweşiyek derdikeve, dê û bav, xûşk û birayên wî dimirin. Siyabend jî bêkes û êtîm dimîne dikeve destê ap û amojina xwe.”

Seydayê Tîrêj; “Siyabend êtîmekî ber destê ap û amojinê de ye di bin zor û tedayiyê de dijî.”

Dilbikûlê Cizîrî jî destpêka pirtûka xwe wek *Mem û Zîn* a Xanî dest pê dike. Beşên beriya destpêka destanê wiha hildide dest; Pesnê Xwedê, Nîmetê Xwedê yên li ser me, Gazî bo Xwedê, Pesnê Pêxember, Mû’cîzeyên Wî, Welatê bênav, Sebeba nivîsandina pirtûkê û dû re ji gûndê Siyabend êdî gotinê dibê ser jiyana wî, “Hecî Hamîd bê zuriyet û kesekî dewlemend e. Gazi Xwedê dike ku lawekî bide ku ew erd û malê wî bê xwedî nemîne, pîştî duayan Xwedê lê tê rehmê û lawekî didê. Mewlîdekî dide û navê kurê xwe Siyabend taytîne.”

Di Waryantan De Ziman û Uslib

Dema em li ser waryantan radiwestin em dibînin ku varyantên me him bi nezm him jî bi pexşankî û helbestkî hatine nivîsîn.

– **Pexşankî û helbestkî:** Ahmet Aras vê cureyê bikar aniye. Li ciyên ku rewş, nêrîn an jî qewîmîna bûyerekê hebe, zêdetir bi pexşankî ye lê diyalog bi nezmê ne. Honaka bûyeran aloz nîne. Zimanê wê xwerû, zelal û fahmbar e.

– **Nezmî:** Siyabendov Semend, Dilbikûlê Cizîrî û Seydayê Tîrêj jî bi vê terzê nivîsîne lê ya Cizîrî û Tîrêj ji malikan pêk tê.

Siyabendov Semend çîrokê bi zimanê kurmanciya jorîn nivîsiye û wê bi biwêj û gotinên pêşyan xemilandiye. Ji wana hinek ev in; “qudûmê çokê min sist bûn”, “ba tê baran pê ra dilîlîne”, “berf dihele, çiya dimîne”, “çem dikêşe, behr dimîne”, “şêr dimire, çerm dimîne”, “mêr dimire, nav dimîne”. Di ve gotarê de peyvên Tirkî jî hene.

Dilbikûlê Cizîrî jî berhema xwe zêdetirîn di bin bandora berhema *Mem û Zînê* ya Ehmedê Xanî de maye û wezna xwe jî ji wê girtiye, bi terza ‘Mefûlû Mefailû Feûlun’ nivîsandiye. Berhem ji 94 beşan pêk tê 2100 malikên wê hene û di vê gotarê de gelek motîfên olî derdikevin pêş me. Zimanekî herikbar û xemilandî bi kar aniye.

Berhema Seydayê Tîrêj, ji 310 malikan pêk tê. Û pîvana kîteyî ya 11yî bi kar aniye. Her malik di nav xwe de biqafiye ye, cûreyê qafiyeyê jî qafiyeya tam e. Bi zimanê gel vehonandiye.

Lehengên Varyantan

Siyabend û Xecê, di dawiyê de jî pêzkovî, di varyantan de heman lehengên sereke ne, ji xeynî wan, lehengên din em dikarin wiha diyar bikin:

Di berhema Ahmet Aras de ap, jinap, şivan, Qedê, 7 birayên Xecê, Hesên Axa, Êrebê Lêvdoqandî, Pîrê leheng in.

Di berhema Dilbikûlê Cizîrî de Hecî Hamîd, Sînem, Şerîf, Helîme, Emîr, Hacer, birê Xecê, Tahir, Zahir, Qasim, Rasim, Nû'man leheng in.

Di berhema Seydayê Tîrêj de ap û amojin, Umer Beg, Zelîxa, Riza Beg, Qereqetran, 7 kurmam, 4 bira û Elîf leheng in.

Di berhema Siyabendov Semend de jî leheng Ehmed Axa, Mîrê Ereba, Axê, Diya Siyabend, 7 birayê Xecê, pîrê û Hespê şê ye.

Di Waryantan de Dem û Cih

Her wekî cudahîyên di vehonandinê de bi vê ve girêdayî cudahî di cih û demê de jî xwe nîşan didin. Anegorî erdnîgariya ku ev destan lê tê vegotin, taybetmendî û dirûvên wê herêmê jî wek kirasekî dikêşe ser xwe. Di waryantên di destê me de cihê hevpar Çiyayê Sîpanê û deşt û qontarê wê ne. Dem di her çar waryantan de jî ne diyar e tenê di berhema Siyabendov Semend de raste rast em dizanin ku çîrok bi dema biharê dest pê dike.

Di berhema Seydayê Tîrêj de cih; rojhilat, gundê Umer Beg, Hekkarî, Nisêbîn, Birca Belek e.

Di berhema Ahmet Aras de cih; Geliyê Bidlîsê, Mêrga Gulistanê, Textê Hesengolê, etegê Sîpanê û Elcewaz e.

Di berhema Siyabendov Semend de cih; gundê Silîvanê, gundê nêzî hidûdê Ereban, kaniya Newrozê û Deşta Silîvanê ye.

Di berhema Dilbikûlê Cizîrî de jî cih; Mûş, Wan, Qesra Emîr, Kaniya gund, mala Xecê, newala Sîpanê, şikeft û Silîvan e.

Dawiya Waryantan

Dawiya berheman bi heman mijarê diqede, Siyabend li pey pezkoviyekî dikeve ku wî bikuje û ji Xecê re bîne. Dema ku Siyabend tîne ku ser jê bike pezkovî bi qoçên xwe wî ji çiyê diavêje, Xecê jî li pey Siyabend dikeve da ku wî bizivîrîne. Lêbelê dibîne ku Siyabend birîndar e ew jî xwe ji çiyê de diavêje û herdu dimirin û berhem diqedin. Wekî din di berhema Dilbikûlê Cizîrî

de piştî vê beşeke bi navê 'Dawiya çîrokê' lê tê zêde kirin û di vê beşê de ji bo wan dua tê kirin. Nivîskar navê xwe di vê beşê de bi cih kiriye

Encam

Em dibînin ku cudahî anegorî cih, dem, herêma an jî vegêr çê dibin, lê lehengên sereke naguherin û her tim li hemberî leheng asteng çê dibin û ew jî bi serfirazî/serkeftî ji wan difilitin. Hin qalibên hevpar di destanan de naguherin û em dikarin bibêjin ku ev qalib di hişê gel, vegêr an jî dengbêjan de dimînin û ji nifşekî radigihînin nîfşeke din. Bi saya van qaliban jiberkirin jî hêsantir dibe. Di van varyantan de jî em vê yekê dibînin.

Daşinasnayîşê Kitabê “Qetlê Ziwanan”

David Crystal:

Profesor David Crystal wareyê ziwani de pîsporanê dinyayî de tewr verênan ra yo. Serra 1995 de semedê keda ke îngilîzkî rê kerdo “The Order of the British Empire” (Xelata Nîzamê Împaratorîya Îngilizî) dîyayo ci.

Tikê eserê ci:

- Rediscover Grammar (Longman, 2004)
- The Cambridge Encyclopedîa of English Language (Cambridge University Press, 2003)
- English as a Global Language (Cambridge University Press, 2003)
- Words Words Words (Oxford, 2007)
- Dictionary of Linguistics and Phonetics (Blackwell Publishers, 2002)
- Language and the Internet (Cambridge University Press, 2006)
- The Penguin Dictionary of Language (Penguin Boks, 1999)

QETLÊ ZIWANAN [1]

Vateyo Verên

Kongreya Ziwananî ya Mîyannetewî ke Quebec de 1992 de bîya de, zîwananî nê beyanatî dayî:

Vîndîbîyayîşê yew ziwani, semedê însanî ya yew vîndîbîyayîşo bêtelafî bîyayîşî ra, ziwane ke hê mirenî yan zî xeterê mergî de yê hetanî nika ser xebate nêbîyo yan zî nêameyo dokumentekerdişî edebîyatê fekkî yê eyin zî daxîl, qaîdeyanê gramerê înan, ferheng û

metnanê înan semedê namekerdişî, programanê dezgeyanê ziwanzanî teşwîqkerdiş û eke beno paştdayîşî wazîfeyê UNESCO yê tewr verênî yo.

Dima raporê averşîyayîşî de UNESCO wina vat:

Pêro buudê ci nêame zanayîşî zî xeylêk cayê dinyayî de bi çapik a vîndîbîyayîşê ziwanan mutlaq û xeyretanê karê ziwanzanî lezekerdişî wayîrê muhîmîyê tewr berzî yo.

Nê dima çend gamê muhîmî erzîyayî. 1995 de Unîversîteyê Tokyoyî de semedê ziwananê xeternakî ya odayê karanê mîyannetewî dest bi wazîfe kerd. A serre DYA de Fonê Zîwananê ke Tehluke de yê nîya ro. Komîteya fonî, cumleyê akerdişî de her çî, bi tamamî ard meydan:

Ziwanî, tarîx ra nat merdî la ma çî rey sey nika yew vîndîbîyayîşêko top pîya rê rast nêameyî. Ma, pisporê ziwani, duştê yew rasto rutî de yê. Xebatanê ma ra zafî neslê ameyoxî het ra do nêrî şuxulnayîş. Mîrasê kulturî yê xeylêk zaf komelan verê çimanê ma de vîndî benî û şinî. Ma eşkenî sucê o tewir vindertiş û çîyêk nêkerdişî bin ra vejî?

Hewna 1995 de Îngîlîstan de Weqfê Ziwananê ke Tehluke de yê nîya ro. Weqif bultenê ajansê xo yê diyînî de ameyoxî de îhtîmalan rêz kena û texmînê bêresmî yê pirsgirekî wina dana:

Mîyanê ziwanzananî ke no halî ser a sereyê xo dejnenî de, ziwane ke dinya de yê nême ra zafî hê tehlukeyê vîndîbîyayîşî de, yanî nêeşkenî yew nesil ra neslo bînî rê neqilkerdişî het a hemfikîrî esto. Wina aseno ke ma û qîjî ma tarîxê însanîyetî de o qeyde yew ca de vîndenî ke belkî qey her di nesilî zî nêmeyê ziwananê dinyayî mirenî.

Mergê ziwanan rast o. Muhîm o? Ma gereke ser bivînderî? No kitab vano muhîm o û ma gereke ser bivînderî, goreyê îmkanê zanayîşî, rastî bellî biker û dima hîna nêyî akerî xo rê keno armanc.

Mergê ziwani tam çî yo? Kamî ziwani hê mirenî? Ziwanî çî ra mirênî?- û qey nika- Ma hê hîrê persan ver a. Mergê yew ziwani qey wina muhîm o. Ma eşkenî çîyêk bikerî? Gelo çîyêk bêro kerdiş? Cewabdayîşê di persê peyênî xeylêk zor o. Munaqeşeyanê xesas û bi dîqet ci rê lazim o la goreyê fikrê no nuştexî cewabo tewr peyên rê yew “E”yo qewetîn lazim o.

Mergê Ziwanî çî yo?

Xeberdayîşê mergê yew ziwani sey xeberdayîşê mergê yew însanî yo. Yewna qeyde nêbeno zî. Çunke bêînsanî estbîyayîşê ziwanan ra behs nêbeno.

Yew ziwani hinî qalîkerdoxê ci nêmend, mireno. Ziwanê ke pê kitabî ameyê nuştîş û ziwane ke qalîkerdoxê ci zafê rê wina yew îhtîmal çin o.

Hewzê Ziwanî:

Çend hebî ziwanî hê sekerate de? Çend hebî hê tehluke de? Verê cewabdayîşê nê persan ma gereke bizan ke dinya de çend hebî ziman estê? Goreyê tehmînan 1000 ra 10000î ziwanî estî. Ferqê nê tehmînan zehmetîyê hemî dinya de cigêrayîş û tîmîyankerdişê zarava û ziwanan o la ez rêjeyanê xo beynateyê 5000 û 7000î ra weçînen û goreyê nêyî şîrove kena.

Encamê Pirsgirekî:

Yew ziman eke qalîkerdixê ci nêmend merde qebug beno. Qalîkerdixê çewî ke tede qalî bikerî û neslo peyênî ra waştixê musyayîşî çin bî herekîyayîşê xo nêşkenî ramojnî. La di tenî qalîkerdixê tîna mendî se yan zî 20 yan zî 200? Çend tenî eşkenî ciwîyayîşê yew ziwanî garantî bikerî?

Cewabê nê persî zor o. Çunke tena nûfus bê mana yo. Wazîyetê kulturî, yew yew analîzkerdiş mot ra ke hûmara nûfusî tîna bê fayde yo. Yew cayo yabanî de 500 tenê qalîkerdixê yew texmîno pozîtîfî rê îmkân dano. Yew bajaro ke lez beno pîl de bi 500 teno vilabîyayî, îmkânê ganîtepiştişê ziwanî zaf kêmi yo. Dormaleyê Girawayê Pasîfîk de 500 tenî xeylêk zêde û bi îstîqrar aseno la xeylêk cayê Ewropa de 500 tenî nemuhîm ê.

Yew tabloyê Ethnologue de 6784 ziman dîyê û înan ra 6059 ziwanî de malumat esto.

			Kêmbîyayîşo Kumulatîf %	Zêdebîyayîşo Kumulatîf %
	Humare	%		
100 mîlyonî ra 8 vêşer	8	0,13		99,9
10-99,9 mîlyon	72	1,2	1,3	9,8
1-9,9 mîlyon	239	3,9	5,2	98,6
100.000-999.000	795	13,1	18,3	94,7
10.000-99.000	1605	26,5	44,8	81,6
1.000-9.999	1782	29,4	74,2	55,1

100-999	1075	17,7	91,9	25,7
10-99	302	5,0	96,9	8,0
1-9	181	3,0	99,9	

Goreyê înan ma eşkenî vaje ke mîyanê seserrî de %50ê ziwanan benî vîndî. %50, 3000 ziwano keno. Seserre 1200 menge keno. Goreyê nêyî çend hewteyan de hewî tewr tay yew ziwano do bimiro. No, zaf dûrê rastîye de nîyo.

Daraxanê(Sewîye) Tehlukeyî:

Goreyê yew teqşîmkerdişî ya hîrê daraxî estî: Ziwanî, **emnîyetî** de yê, **tehlukede** yê yan zî **merde** yê. Yew zî: Zîwanê ke hetê qijanî ra nêyenî musnayîşî ra hê **sekerate** de vajîyena. No îfade zaf weş îfade keno ke no ziwano maneno ganîyê ke nêyenî zêdebîyayîşî ya.

Yewna teqşîmî de ziwani **Ziwanê dewambîyayî, Ziwanê dewambîyayî la ziwani qijî, Ziwanê tehluke de yê, Ziwanê ke mergê ci rê tay mendo, Ziwanê merdeyî.**

Yewna teqşîmî de **Ziwanê ke ihtîmalî ke tehluke kurî, Ziwanê ke tehluke de yê, Ziwanê ke keylêk tehluke de yê, Ziwanê ke sekerate(doşegê mergî) de yê, Ziwanê merdeyî.**

Netîce:

Mergê ziwani de ma eşkenî wina xulasa biker:

Vîndîbîyayîşê yew ziwani yew rêzberkerdiş nîyo. Hîna zêde çîyo ke însanan hal û hareketanê xo bedilna û ziwananê xo beynateyê neslan de kirişnayîş terikna bena. Bi însanan a nêzdî ra girêdayeyo û sey yew xaçeperso entellektuel nêyeno rojev.

Çi ra wa xemê ma de bo?

Goreyê zaf kesan gereke wa xemê ma de bo. Humara ziwanan de yew kêmbîyayîş trajedîyo ke zaf pîlbîyayîş yew het a, yew fikro ke însanan rê zaf feydeyin o vilabîyaye û raxbetin esto. Goreyê nê dinya de têna yew ziwano wa bibo. Wina zî fehmkerdiş, roşnayî û aşîtî eşkenî peyda bibê. Nê de tayê problemî estî. Tayê mîletî estê ke yew ziwano qalî kenî la hê xo mîyan de şer kenî. O bîn zî ê ke wina îddîa kenî peynî de wazenî ke ziwani xo ziwani dinya bikerî. Yewna fikîr esto ke vano ziwano nasname yo. Kam nasnameyê xo terikneno. Nê de zî problem esto.

Bingeh de persê “yew ziwano bimiro çî ra wa xemê ma de bo?” tewir tewir cîhetanî ra panc cewabê ci estê.

Çunke ma mehtacê zaftewirî yê.

Senî ke tabîatî de heme ganîyî zaf tewirî yê. Ziwananê însanan zî zaf tewirî yê. No fitrî yo. Senî ke tabîatî de muwazeneyo ekolojîk est o mîyanê ziwanan de zî çekuye girewtîş û dayîş est o. No zî ziwanan keno dewlemend. Îngilizkî zî mîsalê no yo.

Çunke ziwan nasnameyî îfade keno.

Nasname , çîyo ke şarê yew komelî qeydeyo ke bêro naskerdiş, keno sey yewbînan. Nê xususîyetî aseyîşo fîzîkî ra zî beno û adetî, bawerî ûsn çîyan ra zî beno. Mîyanê înan de tewr asaye ziwan o. Ziwan aseyeyo esasî, sembol û qeydê nasnameyî yo.

Çunke ziwanî embarê tarîxê.

Merdîm biwazo menşe'ê yew milletî bizano gereke muracaatê ziwanî bikero. Miletanê kovîyan ziwanî nuşteki de çîyêk nêverdayo aye ra ma nêzanî tarîxê eyin ra çîyêk bizan la milletê ke çîyêk nuştî tarîxê înan eşkera yo û ma zanî ke înan se kerdo.

Çunke ziwanî leteyekê pêro zanayîşê însaniyetî yê.

Her zanayîş bi ziwanî yeno vilakerdiş. Ziwan çin bi zanayîş zî vîndî beno. Yew millet bi ziwanê xo zanayîşanê xo kirîşnena neslo bîn. O ziwan ke bi vîndî zanayîşê ci zî beno vîndî.

Çunke ziwanî xo ser a yew çimeyê alaqaqî yê.

Merdîmê ke ziwanzanî ser a nêxebetîyê rê ziwanê eşîrê cayîyan zî sey îngilizkî û frensîzkî tam û temîyankewtebîyayîş tewir yeno. Şarê rojavayî vanî dê qey sey eqsê ci yo. Ê vanî, dê teknolojîyê înan çin o, ziwanê înan zî hema destpêk de yo. No zî mojneno ra ke ziwan bi xo yew çimeyê alaqaqî yo.

Netîce:

Na dinyayê de fikrê bînî, nasnameyê bînî, kulturê bînî zî estî. Heme însanî têduşt î. Ma heme însan î. Cîyabîyayîşê ma est ê. La ma hemeyî bi nê ferqanê xo est î. Gereke ma wayîr ci vejî.

Ziwanî çî ra mirenî?

Tarîx de xeylêk ziwanî merdê. Ziwanî nika hê tehlukeyê vîndîbîyayîşî de. Ê tamam la çî ra nê ziwanî hê mirenî. Gelo ewro ziwanî hîna leze hê mirenî? Gereke ma sebebê înan bizan.

Faktorê ke însanan hetê fîzîkî ra fînenî tehluke

Însanî bimirî, ziwanê înan zî mirenî. Erdlerzî, va û virikî, tsunamîyî, şerî ûsn çîyî ra însanî mirenî. Ancî nêweşîyê pîlî û xela ra însanî mirenî û ziwanê înan zî mireno. Cayek de însanî wina bi top bêrî merdiş ziwanê înan zî mireno.

Faktorî ke kulturê însanan vurînenî (bedelnenî)

Însanî ganî bî zî beno ke ziwanê înan bimiro. No halî rê têgehho tewr hol asîmîlasyonê kulturî yo. Yew kultur, tesîrê kulturo hakim de maneno û şar adetana û hareketanê neweyan geno û nasnameyê xo keno vîndî. No çend qeyde de eşkeno bibo. Nûfus hetî ra taybîyayîş, sey dewrê emperyalîstan de yew grubê însanî yenî û şarê cayîyan kenî bindest û kulturê înan zî heremnenî. Yan zî yew grube yena û ziwanê xo kena standart yan zî ziwano fermî û kulturo bîn helnena.

Netîce

Mergê ziwanî de xeylêk faktorî estê. Ma nêşkenî vaje ke têna no rid û no rid ra yo.

Ça ra dest pêbikerî?

Ma çîyêk nêkerî ziwanî mirenî û şînî. Ê ma se bikerî ke wa ziwanî nêmirî.

Tayînkerdîşê tewr raverîyanê eslîyan

Eşkerayo ke raverîyano tewr verên malumat arêdayîş o. Semedê nê zî ya, pereyî û ziwanzanî lazim î. Ziwanê ke hê tehlukeyê vîndîbîyayîşî de yê hol cigêrayîşan bikerî û hemeyî qeyd bikerî la semedê nê xeylêk manî zî estê.

Mîyanê şarî de ewnîyayîşê musbetan ramotişî

Mîyanê şarî de ewnîyayîşo musbeti xeylêk kemî yo. Vanî ma no ziwana bizan ma pê se kenî? Çî hewceyîyê ma vînenî? No qeyde ewnîyayîş zîrar dano ziwanî. Tîya de teorîya Maslowî kuwena dewre. Merdim pîzevêşan bi û nanê ci çin bi, ti nêşkenî tira vajî ke qey ti ziwanê xo teriknenî.

Çimê ey de meseleyê ey o tewr muhîm pîzeyê xo dekerdiş o. Eke ma wazenî no ziwan bimiro ma gereke ewnîyayîşê şarî bibedeln.

Zafaneyê şarî de ramotişê raştîyî

Ziwan eke mîyanê şar de nêgeyro û nêro şuxulnayîş mireno û gereke ma şarî çim de na raştîye bimojn û însanan îqna bikeri nîyo se ma bi destê dezgeyan a nêşkenî bixelesn. Teknolojî, buroqrasî muhîm ê la esas nîyê. Hîna zêde ho dadî û babî dest de. Dadî û babî qijanê xo rê ziwane xo bimusnî o ziwan xelesîyeno.

Zîwanî, leteyê kulturî vînayîş:

Eke şima wazenî kulturê xo bidomnî şima gereke ziwane xo zî bidomnî. Çunke ziwan yew aîdîyet o. Ti nêşkî ziwane xo qisey bikerî ti a milletî ra nîyî. Ziwane to bedelîya ti hetê etnîsîte ra ancî a millet ra yê la kulturê to o kultur nîyo. Aye ra ma gereke rolê ziwani hol bide şinasnayîş.

Çi eşkeno bîyero kerdiş(?)

Yew ziwani keye de yan zî dormeleyê şar û beynateyê neslan de wasitayê têkilîkerdiş de şertê ewilî estê? Ez nê şeş faktorani rê zaf qiymet dana ci.

1.Yew ziwano ke tehluke de yo eke qalîkerdoxê ci mîyanê komelo hakim de prestîjê xo bizêdnî aver şino:

Armanco tewr verên, wareyê şarî de estbîyayîşê xo eşkerakerdiş û mîyanê şarî de bîyarî hîskerdişî. No zî huquq, kar, îdareyê şarî de muhîm o. Hetanî ke komelo hakim de bîyero têduşt.

2. Ziwano ke tehluke de yo eke qalîkerdoxê ci mîyanê komelo hakim de dewlemendîya xo bizêdnî aver şino:

Eke şarê ziwano ke tehluke de yo, hetê ekonomî ra aver şerî tesîrê vîndîbîyayîşî beno kê m.

3.Ziwano ke tehluke de yo, eke qalîkerdoxê ci çimê komelê hakim de qewetê xo yo meşru bizêdnî aver şino.

4. Ziwano ke tehluke de yo eke qalîkerdoxê ci sîstemê perwerdeyî de cayê qewetîn a birasî aver şino.

5. Ziwano ke tehluke de yo qalîkerdoxê ci qalîkerdişê xo bieşkî binusî aver şino.

6. Ziwano ke tehluke de yo qalîkerdoxê ci teknolojiyê elektrîkî buşuxulnî aver şino.

Rolê ziwanzanî

Ziwanzanî peyê nê şeş şertan de xo nimnenî. Sey yew doxtorî nêweşê xo teşhîs kenî, cigêrênî, name kenî û tedavî kenî. Newe ra ganî kenî. No ganîkerdişî de têna pisporîya ziwanzanî bes nîyo. Seba aktîf yew endamîya programê ganîkerdişî bîyayîş, hunerê îctîmaî û sîyasî zî lazim ê. Dokumentekerdiş, pawitişê ziwani de nêbibo nêbeno. Pêro mesela na ra zî îbaret nîya. Hetanî nika yew ziwani zî bi dokumentekerdiş nêxelesîyo la dokumentekerdiş heme cigêrayîşan de tewr verî de yo û ziwani rîskê mergî nêzdî bo, hîna ho ver de. No dokumentekerdiş bi pêro wasitayan a resmê ziwani antiş o.

Ekîbê newe ra ganîkerdişî

Ziwani seba ciwîyayîşî hewceyîya komelî ci rê estê. No rid ra yew ziwano ke tehluke de yo têna yew komel eşkeno bixelesno. Na nokta esas a.

Seba xelesnayîşê yew ziwani ekîbêk lazim a. Na ekîpe yew îdarekerdiş û plankerdişo hol, gereke bîyero pîya. Dima bê dor gereke nê bîyêrî kerdiş.

-Endamê komelî û xebatxê sahayî ke teber ra ameyî yenî têhet, yewbînan şinasnenî û yew grubek nanî ro.

-Esasê pîrsgirekî ser a umîşî kerdiş şert o. (Ziwani tehluke de yo. Gereke çiyêk bêro kerdiş usn.)

-Wazîyeto heremî gereke hol bêro naskerdiş (dîn, polîtîkaya komelkî usn)

-Seba mudeyo kilmî gureyê acîl estê yan ney û seba mudeyo dergi zî balê ekîp çî ser o bi, qerar girewtiş.

-Şiklê pawitişî rê qerar girewtiş.

-Wazîfeyê endaman bellî kerdiş.

-Qeydkerdiş, dokumentekerdiş, musnayîş usn de armancanê acîlan bellî kerdiş.

-Arêkerdişê malumatan ca ardiş.

-Viraştişê ziwani sey ferheng, rastnuştiş û gramer analîz kerdiş.

-Hem seba nuştiş hem zî qalîkerdişî de standartîzasyon û alfabe weçînayîş.

-Keye de û cayanê bînan de şuxulnayîşê ziwani rê stratejîyan bellî kerdiş.

-Seba mîyanê şarî de vilabîyayîşê ziwani nuşteki stratejî bellî kerdiş.

-Seba mîyanê şarî de vilabîyayîşê ziwani qalîkerdişî stratejî bellî kerdiş.

-Ziwani seba wendegehan a ziwani musnayîşîkerdiş a stratejî bellî kerdiş.

-Seba qijan û pîlan a malzemeyê mufredatî hedrekerdiş.

-Sey hîkaye, şîir û sanikan a balê şarî ziwani ser antiş a nuşteyî nusîyên û çap benî.

-Ziwani, seba ziwano fermî yo heremî kerdiş a dusturan bellî kerdiş.

Ganîbîyayîşê ziwani tena bi ekîban nêbeno la dinya de moto ra ke wina xebatî fikirîyayîşê şarî bedilnenî û ê ziwani ke ser a xebat bîyo hema ra zî ganî yê.

Netîce:

Dinya de xeylêk ziwani hê mirenî. Nika ma çiyêk zî nêkenî û seyr kenî yan zî ma destanê xo erzenî binê kerra û bi pêro qewetê xo xebetîyênî. Çunke mergê yew ziwani sey mergê yew însani yo.

“Zaravayê Kurdî ra zazakî/kirdkî zî ha binê riskî de. No qeyde xebatî xelesîyayîşê zaravaya ma de rayberîye kenî.”

[1] Cyrstal (Davîd), Dillerin Katli, Çarnayox: Gökhan Cansız, Profil, İstanbul, 2010

Mirovê pirziman, miletê pirziman

Murad Ciwan

Ji mêj ve difikirim; me hebûna însanê/a pirzimanî qebûl e, lê fikra miletê pirzimanî qet nayê hişê me û em serê xwe li ser fenomeneke wiha naêşînin. Gelo wek însanê/a pirzimanî, nikare miletê pirzimanî jî hebe?

Hemû milet ne xwedyê take zimanekî ne. Beşek ji wan; ne tenê hin takekes an tebeqeyên wan, seranser civak pirzimanî ne.

Pirzimanîya ku li vir tê behs kirin, ne ya ku dewletek ji yekî bêhtir zimanên resmî di nav xwe de qebûl dike. Gelek dewlet hene ku xwedan du-sê, heta zêdetir zimanên resmî ne, lê civakên wan, hemû an hin ji wan yekzimanî ne. Li Kanadayê ku du zimanên resmî (îngilîzî û fransî) hene, tenê %13ê civakê herdu zimanan dizanin, %87ê xelkê yan tenê îngilîzî, yan tenê fransî dizanin. Tevî hebûna du zimanên resmî, zehmet e ku meriv ji civakên kanadî re bêje yê duzimanî. Lê li Tanzaniyayê %90ê seranserê civakan, xwedan du zimanan, an zêdetir in.

Pêwendîya pirzimanîya civakê raste rast bi qebûlkirina ji yekî bêhtir zimanên resmî tune. Hetta pîrrê caran, di tarîxê de, ferzkirina takezimanê resmî ji ba dewletekê ve, serdestîya li gel êş, azar û texrîbata asîmîlekirina civakên cuda, di armancên xwe de biserneketine, lê bûne sedemê pirzimanîya civakên armanckirî.

Zimanên dînen cîhanşimûlî (latînî, erebî, îbranî, sanskrîtî hwd), yan jî ên xanedaniyên ku piştî bûne împaratoriyeke a ji gelek civakan pêkhatî (rûsî, fransî, almanî, tirkî, farisî, çînî hwd) bêyî ku qesd bikin rê li pirzimanîya civakan vekirine. Împaratoriyeke ku bi sedan sal li ser ruyê erdê welat dagir kirin, kolonî avakirin jî, bi awayekî bêdaletîya tarîxî yan wek hêzeke mezin a

cîhanşimûlî ya siyasî, eskerî, teknoloji-aborî, zanistî û kulturî rol di peydabûna pirzimanîyê de lîst. Înilîzî, fransî, rûsî û hin zimanên din ên ewropî bi vî awayî li Asya, Afrîqa û Ewropaya Rojhilat bûne sedemên pirzimanîya civakan. Amerîkanî îro xwedan roleke wiha ye.

Li vê derê behsa me ya esasî ne sepandina hin zimanan bi ser hin civakan de ya bi darê zorê, an qebûlkirina ji bal civakan ve ji ber hêzdarî û avantajên xwediyên wan e. Ya ku ev nivîs li serê radiweste, bi çî sedemî dibe bila bibe, peydabûna pirzimanîya di civakan de ye. Li gor lêkolînên zanistî, hebûna civakên pirzimanî li ser ruyê erdê, ji yên civakên yek zimanî gelek bêhtir in, tevî ku yek-zimanîya civakan wek normeke seranserî cîhanê di mêjiyan de bi cih buye. Ev îmajeke gelek şaş e. Ji xwe bi lêkolîneke gelek sivik, rastî kare bê dîtin; li ser ruyê erdê, behsa 6-8 hezar zimanan tê kirin, lê li dor 200 dewletan hene. Gava wek hev bê parvekirin, serê her dewletekê dike 30-40 ziman ku çendek ji wan ji ba civakên cuda yên li nav van tînan bikaranîn.

Yek ji berbiçavtîrîn nimûneyên civakên pirzimanî, milletê kurd bi xwe ye. 'Cîlweya tarîxê' û 'qedera' vî milletî wiha kiriye ku carinan bi xweşî, pirranî jî di encama çespendineke bi darê zorê, kurd bûne miletekî pirzimanî. Hebûna kurdan di nav dewleta Sasaniyan de, bi hatina îslamiyeta erebîziman, misilmanbûna wan, îstîlayên tirkan ji Asyaya Navîn û avakirina dewletan li ser wan erdan ku kurd jî li serê ne, piştî peydabûna du împaratoriyan mezin; Osmanî û Îranî ku Kurdistan di nav wan de parçe bû, di destpêka sedsala bîstê de avakirina dewletên ereb, faris û tirk yanî di midetê bi sedan salan de welê kir ku di destpêkê de elît; arîstokrat û tebeqeyên ilm, îrfan, huner û rêberên îdarî-siyasî yên kurdan, piştî re jî di dema me de, milletê kurd buye pirzimanî. Tevî ku civakên serdest bi xwe (tirk, faris, ereb) yekzimanî ne, kurd li her perçeyî bi kêmasî du (kurdî-tirkî, kurdî-erebî, kurdî-farisî), têgihiştî û elîtên civaka kurdan ên warên cuda sê-çar zimanî ne.

Helbet bi vê tesbîtê, qesda min ne ew e ku serdestîya milletên farisî-, tirkî- û erebîaxêv, siyaseta wan a asîmîlekirinê tu pirsgirêk ji ziman, kultur, jiyana ilmî ya civaka me re neanîne. Bileks, heta van salên nêzîk jî ji ber asîmîlekirinê, ziman û hebûna milletê kurd hat ber tunebûnê. Her çendî liberxwedana kurdan ev siyaseta bêyom pûç kir jî, ev nîrxê hêja hê jî di nav xeterên mezin de ye. Lazim e bi her awayî kurd xwedî li ziman û kultura xwe derkevin, derfetên wê yên pêşketinê firehtir bikin.

Lê nabe ku em nebînin, ji ber ku me ev pirzamaniya xwe nedîtiye, bi sedan sal in ku wek miletekî ser ruyê erdê, me para xizmeta xwe ya di avakirina ilm, îrfan û medeniyeta cîhanşimûlî de jî înkâr kiriye, em xwedî lê dernektine. Bi kêmasî ji derketina îslamê bi vir de, bi hezaran zana, edîb, hunermend û her awe ronakbîrên me derketine. Bes ji bo ku bi erebî, farisî an tirkî nivîsîne, me ew red kirine, ked û berhemên wan ên hêja bi avê de berdane û ew xizmetkarê milletên din nîşan dane. Di milletên din de jî gelek dewrên wiha hene ku entelektuelên wan bi zimanên din nivîsîne, lê wan ew red nekirine, xwedî li wan derketine û keda wan ji xwe hejmartine.

Êdî roj hatiye ku kurd jî vê meselê ji nuh ve binirxînin û xwedî li tarîxa xwe ya ilm, îrfan û hunerê derkevin, îtîbara entelektuelên xwe yê bi sedan salan xizmetên hêja kirî li wan vegeînin û bi wan serbilind bin.

FELSEFEYA MORFOLOJIYA ZIMANÊ KURDÎ

Abdusamet Yigit

Em vê yekê divê ku werînine ser ziman ku bi dîrokê re zanîna pêşketîya. Ev gotina, zanîna me bi dîrokê re pêşketîya, weke gotinaka 'razber' a û li vir, dema ku mirov li ser ziman re hewl dide ku rengê pêşketina bi mejiyê xwe re fahm bike, hinekî jî bê, êdî di çerçoveyê re ew razberî wê vegehihê li 'şenberîyeka' ku em li vir dikarê bi heyîn û hebûna ziman re werênina ser ziman a.

Aqil, dema ku em bahse wê dikin, bi dîrokê re pêşketina wê re, her wusa bi pêşketina ziman re mirov wê dihêne ser ziman. Rastkirina pergaliya pêşketina aqilî, her wusa wê li ser darêjka ziman û gotinên re bê. Ev jî, wê weke aliyekî din ê ku em li vir, bi têkiliya ziman û aqil a bihevdu re ku hildina li dest û werênina ser ziman a. Rastî, li vir, dema ku mirov bahse aqil dike, mirov bahse pergaliyek têgînî a li hevdu hûnayî ya ziman jî dike. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku werêne ser ziman ku ziman, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring ê ku mirov li vir weke 'hîm' hilde li dest a. Dema ku mirov di çerçoveya 'gotin' û 'ziman' de dihilde li dest, mirov dibînê ku ziman, weke aqilê li hevdu hûnayî dihe li ber me. Ji xwe filosofên serdemên kevnara û piştre ên serdemên navîn, ku ev rewş hinekî jî bê didîtin û li ser wê re bahse aqil bi 'gotinên ziman' re dikirin. Her wusa, ên ku aqil ji hûnandina gotina a li hevdu û pê ve, dîtina jî, di vê çerçoveyê de li ser vê têgîn û dîtîna re hizrên xwe hanîna ser ziman. Li vir, dema ku mirov di vê çerçoveyê de li rewşê dinerê, her wusa, ya ku dihê li berçavên mirov, ew a ku weke ku 'aqil ji gotinan a.' Ev weke têgîneka ku bi demê re temenê hizirkirina mirov a bi demê re jî ya. Bo vê yekê, têkiliya aqil û ziman, hertimî, ketîya ber nîqaş û lêpîrsînê de. Di vê çerçoveyê de em divê ku ziman baş fahm bikin. Bo hizirkirineka bi aqilî û pêşketina bi demê re ziman û têgîneka wê bi 'rewşên wê wênakirina bi gotin' û hwd, di çerçoveya têgîna morfolojikî û hwd de, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Her wusa, bi gelek minaq û têgînên dîrokî ên felsefîkî dikarê ev mijar werê berfiretir kirin. Emê li vir, bi teybetî, di çerçoveya zanîna morfolojikî de bi dîrokê re hewl bidin

ku têtîna zimên bi pêşketinên wê ên di jîyanê de re fahm bikin. Ev, wê bo pêşketineka hemdemî a bi demê re jî weke pêwîstîtîyeka giring a bi berpîrsîyarî bê. Li vir, divê ku mirov wê yekê li ser ziman re werêne ser ziman ku rêzimanîya ziman, di çerçoveya gotinên wê yên ku bi hevdu re hatina hûnandin re wê xwediye temenekî ku em li vir hewl bidin ku fahm bikin bê. Her wusa, gotinên ziman, dema ku mirov li wan dihizirê, di vê çerçoveyê de em dibînin ku bi ziman re dema ku dihên ser ziman, bi dengê ku bi wê re dihên derxistin re dibin. Ev aliyê gotinê ê morfolojîkî û hwd jî, wê her wusa di çerçoveya darêjka li hevdû hatî, wê xwediye têtînekê bê. Dem, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov bi wê levkirina wê re wê fahm dike. Her wusa, her deng, wê di vê çerçoveyê de xwediye wê adilandina ku bi wê re bê. Ev adilandin, aliyê wê dengî û ankû gotinî, bi wê re aliyê wê fîzyolojîkî ku di laş xwe de biadilandina wê re ku li gorî wê dibê jî, weke mijareka ku divê ku mirov wê li vir bi teybetî hilde li dest û fahm bike ya.

Aqil û ziman, weke mijaraka giring, di vê çerçoveyê de dema ku em bi têtîneka rêzimanîya zimanî re lê dinerin, ew têtîna 'zimannasîya gerdûnî' xwe biwê re dihêne ser ziman. Têtîna aqil û her wusa bi gotina aqil re hewldana fahmkirina ziman, di vê çerçoveyê de, wê me bi xwe re bibe û bigihêne têtîna 'zanîna zimanî a gerdûnî' jî. Ev jî, her wusa, divê ku mirov wê bi teybetî werêne ser ziman ku bi aqil û piştî weke ku me bi felsefeyê re hanîna ser ziman bi'zêhnê' me re ew dihê û dibê.

Em ku ji kîjan aliyê ve jî lê binerin, em dema ku di çerçoveya zanîna ziman de dihizirin, her wusa, di vê çerçoveyê de têtîneka aqil û ankû ya 'aqilê zêhnî' xwe dide dîyarkirin. Ev jî, her wusa, di temenê wê de weke hîmî hişarî heya. Em li divê wê yekê bi aqil kifş dikin. Rewşa aqil, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, di vê çerçoveyê de zêhnê mirov jî xwe dide dîyarkirin. Têkiliya di nava ziman û aqil de, wê bi hişarîya rewşî a ku dibê re rastîyeka zanîna ku em bi zêhn werênina ser ziman, wê bi me re bide têtîhiştin kirin. Ev jî, her wusa, wê weke aliyekî giring ê zimanî û têtîna ê felsefîkî jî bê. Li vir, dema ku em bahse felsefeyê dikin, em di farqê de na ku em bahse zêhn û pêvejoyek pêşketinên bi aqilê xwe re dikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de, em divê ku bi gotina 'felsefeyê' re li ziman û pêşketina wê ya bi demê re bihizirin. Ev jî, wê weke aliyekî giring bê. Ji xwe dema ku em bahse gotinan dikin, di mejiyê me de, ew yeqînî diafirê ku mirov bahse 'aqil' dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de, têtîliyeka dinava ziman û aqil a ji navikê ve ku heya, wê têtîna û hişmendiyê bi me re dide çêkirin.

Em li vir, divê ku vê yekê baş fahm bikin ku ziman, weke gotinna, tenê mirov nikarê wê werêne ser ziman. Her wusa, ji wê zêdetirî, divê ku mirov vê yekê pêşdedit bibe. Felsefeya serdemên navîn, her wusa di çerçoveya 'têgîn û madeyê' de hildeya li dest. Her wusa, felsefeya Manî, di vê çerçoveyê de, wê weke têgîneka hîmî bê ku em karibin wê li vir werênina ser ziman. Piştî wî re, li dûv hevdû Sipînoza û piştî wî re Descartes, wê di vê mijarê de û di çerçoveyê de hizrên xwe werênina ser ziman. Hizrên Descartes ku em dikarin di çerçoveya têgîna 'zêhnê' de werênina ser ziman, li vir, ji têgîneka 'madeyî' na buhurê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin.

Em li vir, vê yekê fahm dikin ku aqil, li vir, pêşketineka dayimî ya ku bi mejî re dide çêkirin. Ev jî, her wusa dema ku mirov li wê dihizirê, bi dayimî û demê re wê bi gotinan reherîkîneka tevgerî ya afrîner jî bide çêkirin. Ev tevgerîya afrînerî, her wusa wê weke temenê têgîneka afrandina zimanê hemdem û dengtêgînîya wê bê. Em li vir, dema ku vê yekê dibêjin, em di mejî xwe de timî têgîna 'darêjkê' jî zîndî dihêlin. Di wê çerçoveyê de, em dema ku gotinên xwe di hunin û dihênina ser ziman, em her wusa bi wê aqiliyê dihênina ser ziman. Lê li vir, dema ku mirov bahse wê têgînîyê dike, em li vir divê ku vê yekê werênina ser ziman ku zanîna ziman, her wusa, wê xwediyê afrînerîyeka bidemê re bê. Zanîna bi aqil, ku ziman, wê dike ku 'kifş bike' û 'werêne ser ziman,' wê her wusa di vê çerçoveyê de weke têgîneka bi dîrokê re ya ku wê were esas girtin bê. Em li vir, di vê têgînê de na ku ziman xwediyê wê pêşketina bidîrokê re ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de, bi ziman re levkirina bi pergali ku heyîya kirin û çêkirin, wê rengê aqilê me jî bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de ziman, weke aliyekî giring ê domandina jîyanê, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Jîyan, di çerçoveya wê pergaliya xwe ya ku bi wê re heya de, ew pêşketina ku em bi wê jîyan xwe re dijîn, wê bi ziman re xwe bi pergaliyeka ku bi wê re di ahengekê de ya re wê werêne ser ziman. Ev jî, her wusa ziman, bi wê rastkirina wê ya bi gotinan re dike ku weke aliyekî têgînî ê di jîyanê de ku levkirî bê, werêne li berçav. Li vir, têgîna darêjkê, divê ku mirov bahse wê bike. Ev jî, wê her wusa bi gotinê re xwe bide dîyarkirin. Her wusa, dema ku em bahse gotinê dikin, em bahse darêjkek têgînî ya bi hişar bûya dikin. Di vê çerçoveya wê têgînê de morfolojîya zanîna ziman û dengên wê xwe êdî biçerçoveyî dihêne ser ziman û dide dîyarkirin. Hizirkirina bi aqil, wê weke aliyekî giring bê. Her wusa, em li vir, vê çerçoveya bi gotina 'hizirkirinê' re ku hewl bidin ku fahm bikin, emê hingî, bi wê re bigihijina wê têgîna zanîna ziman û gotinên wê ên bi demê re ku dibin in. Çêkerîya zimanî a bi zanîna wê re jî, di vê çerçoveyê de mirov divê ku wê werêne ser ziman.

Ku em hewlbidin ku rastîya ziman, di çerçoveya wê ya dîrokî de hildina li dest û fahm dikin, divê ku em di serî de pêşketinên bi dîrokê re di berçav de bi wesîfîye wan re hildin li dest û fahm bikin. Li vir, divê ku ez vê yekê werênina ser ziman ku dema ku ez li ziman, dihizirim, hûy û tevegerîyên mirov ên civatî bi awayekî zêhnî dihênina berbîra mirov. Her wusa, ji vê yekê, dihêê fahmkirin ku bi zêhnî, têkiliya ziman tevger û xûyên mirov re heya. Dema ku mirov ji aliyê zêhnî ve dinerê, bi karîgerî û gêrûfê mirov çerçoveya wê ya zêhnî, her wusa mirov dibînê. Ev jî, her wusa di temenê wê de têtîna zêhnî ên dîrokî ku bi dîrokê re pêş dikevin, di temenê wê de na.

Çerçoveya tevger û xûy, dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê e weke têtînekê mirov kifş dike ku werêne ser ziman ku ew têtîkerîya tevgerî ku mirov li ser bûyîn û kirina tevgerîyan re kifş dike, bi bûyîna wan ya bi demê re, wê weke aliyekî darêjkî xwe bide dîyarkirin. Ji xwe, dema ku em bahse tevgerî û xûyan bikin, divê ku em di çerçoveyeka têtîliyê de her wusa bi fizyolojikî re têtîliya wê bi wê çerçoveya wê ya bandûrî re werêne ser ziman. Tevger, weke darêjkên ku mirov dikarê wan kifş bike û werêne ser ziman in.

Kirin û kiryar, her wusa, bi mejî re xwediyê heyîna darêjkî na. Mejî, dema ku li wê dihizirê, her wusa, bi wê re kifşkirinê dike. Hizirkirina mirov bo fahmkirina mirov, wê her wusa, aliyê mirovî ê aqilî bê. Ev jî, wê her wusa, bi wê re hişariyê weke ardnigarîyê ji xwe re pêşbixe û li ser wê re vê yekê bike.

Aqil, her wusa, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov di kirinîya di jîyanê de wê kifş dike. Kirin, weke tevgerîya zêhnî a ku bi wê re xwe şenber dike, her wusa, di çerçoveya dîtina bi wê re ku bi hişarî dibe re êdî rengê xwe bifahmkirinê re distêne. Her wusa, aqil, li vir, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, bi rengê fahmkirina wê ya di vê temenê de mirov wê dihêne ser ziman.

Di nava rûpelên dîrokê re her wusa, civate kurd, dema ku mirov li hebûna wê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov bi wê pêşketina wê re jî kifş dike. Çerçoveya wê ya têtînî ku em bi pêşketina wê ya zimanî re wê kifş dikin, her wusa, li vir li ser wê re êdî dikin û wê werênina ser ziman. Di kurdî de gotinên weke 'zanînê', hiş' û hwd, gotinên aqil in û bi dîrokên xwe re ta serdemên sûmerîyan diçin. Di vê çerçoveyê de mirov wê dibînê. Gotinên weha ên zanînê gotinên ku aliyekî wan ê giring heya ku mirov dikarê wan kifş dike. Li vir, divê ku mirov vê yekê, fahm bike ku bi demê re gûharinên ku di dengên ziman de dibin, em vê di gotinan de dibînin.

Minaq, gotinên a 'hiş', ku ddi serdemên gûtî, hûrî û mîtanîyan de dihê bikarhan, wê di serdemên medîya de ku weke ku di 'avêsta' de jî dihê dîtîn, gûharîn û herîkîn di wê de bibe û bi rengê 'ûs' û hwd, xwe bide dîyarkirin. Ev rengê gûharînê, ku bi dengê re dibê, her wusa, weke aliyekî giring ê têngîna morfolojikî jî bide dîyarkirin bê. Gûharînên morfolojikî, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov wan bi demê û dîrokê re kifş dike. Her wusa, herîkîna bi demê re ku bi dangan re dibê, wê weke aliyekî giring ê ziman bê. Ev, herîkîn, wê bi demê re temenê çêkerîyekê jî bê bi dengnasî û morfolojikî.

Herîkîna di nava dangan de, aliyekî gûharînî ê bi demê re ê ziman jî dide nîşandin. Her wusa, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov vê yekê bi awayekî vekirî dibînê. Ji wê zêdetirî, ev gûharînên bi herîkînî, wê temenê pêşketinên dengzanî ên ziman ên bi demê re jî bin. Her wusa, vê yekê, divê ku werênina ser ziman, ku dengên ku di mejî de salixkirina wan bûya, her wusa, wê aqil bi hişarî wan di xwe de bi tengîneka afrînerî lê bihizirê. Her wusa, dema ku em di çerçoveya morfolojikîya dengê zimên de ku li wê afirînerîya wê dihizirê, bi wê re mirov vê yekê weke aliyekî wê yê giring kifş dike. Têngîna gûharînê a bi demê re, mirov dikarê di vê çerçoveyê de bi gelek rengên wê ên ku dibin re werêne ser ziman. Lê her wusa, dema ku mirov di çerçoveya bi 'awakirina deng' re li gotinê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov bi salixkirina wê ya ku bûyî re rast tê. Salixkirin, weke têngîneka dagerî mirov wê kifş dike. Di vê çerçoveyê de minaq, di kurdî de gotina 'ga' ku weke navê sawalaka gir a, wê bihemam rengî xwe bide dîyarkirin. Li ser wê re, bi teybetmendî xûy û tevgerîyên xortbûnê jî, wê bi wê re werênina salixkirin. Di wê çerçoveyê de wê gotina 'ga', her wusa xwediyê têngîneka afrînerî jî bê. Ji vê gotinê gotinên ku li ser teybetîyên "wê" re ku jê hatîna derhanîn, bi wan re salixkirina wê, wê bi awayekî pergali, têngînekê bide me. Sawala bi navê 'ga', pîr mazin û gir a. Her wusa, ji vê derhanîna gotina 'gayê gir' wê weke têngîneka xweza a wê bê. Di vê çerçoveyê de wê Ev gotin, dema ku di temenê têngîna şibandinê de dihê ser ziman, weke 'gir ga' de dihê ser ziman. Li bir, bi şibandinê re li pêşîya gotina 'ga' bicihbûna gotina 'gir' ku mazinahiya bi cismî û fizyolojikî û hwd dihê ser ziman, wê aliyekî wê yê giring ê ku mirov li vir wê fahm bike bê. 'Gayê mazin', ku weke 'sawala mazin', jê re 'gamêşê' mazin jî dihê gotin. Li dawîya gotina 'ga, bicihbûna dawika '...mêş'ê, wê di çerçoveya salixkirina wê sawalê de bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ev sawal, her wusa navê 'gamêş'ê stand, êdî li ser wê re bi têngîna şibandinê weke ku me di hunduvê vê paragrafê de ku li jor kir de, wê bi bahskirina tiştê bi cism û mazin ku bi 'gir' bûna wê re werê ser ziman re wê bê gotin 'girgamêş'. Têngîna li vir, bi gotina 'girgamêş'ê

re dihê ser ziman, ew a ku tiştêkî bi qasî wê gayê gir a, bahse wê dihê kirin. Yanî, li vir, weke kirdeyek duyemin ku hatîya afirandin bi wê têngîna şibandîne re li vir bahse wê dihê kirin.

Li vir, dema ku li ser vê rewşê re her wusa bi herîkîna dengî re bahsê bikin, divê ku mirov werêne ser ziman ku di dengê 'gir' de jî, herîkîna bûya. Minaq, di serdemên weke serdemên 'sûmerîyan' û hwd de, wê ev den bi rengê 'gil' jî xwe bide dîyarkirin. Ev herîkîna di deng de bi ber jidandinê ve çûya. Li şûna 'l' yê cihgirtina dengê tîpa 'r' yê, her wusa wê rewşê dide dîyarkirin. Deng, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa biteybetmendiyên mejî ên salixkirina wê re rengê têngîna gûharîne bi herîkîna û hwd jî dide dîyarkirin. Minaq, gotina 'ga', bisesanî û weke ku tiştêk li pêşîya wê nîna derxistina dengê wê, wê aliyê salixkirina wê bê. Her wusa, lê gotina 'gil', her wusa, gûharîna wê ya ku li ser dengê 'l' yê re ku bûya, her wusa mirov kifş dike ku dengê 'l' û yê 'r' ku ew navbera di nava wan de a 'nêzîk', di vê çerçoveyê de xwediyê weynekê ya. Rengê herîkîna dengê 'l' yê bi ber yê 'r' de bi teybetî heya. Ev rewşa dengnasîya tîpan, dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa, weke aliyekî têngîna jî xwe dide dîyarkirin. Deng, xwediyê salixkirineka darêjkî ya.

Dengê 'l' yê, dema ku mirov li wê dihizirê, di derxistin wê de qiriq, di dema derxistinê de hinekî dengê dirêj dike. Di wê çerçoveyê de ew dengê ku dirêj û hinekî ne stûr derdixe, wê ew deng, di wê navbera ne zêde dirêj lê ku hinekî dirêj de wê xwe di temenê salixkirinê de bigihêne salixkirina ku em dikarin vê têngîna herîkîna bi wê re fahm bike û ankû werênina ser ziman. Qiriq, dema ku deng derxist, wê bi regekî ku derxistî wê mejî salixkirina wê bê. Ew salixkirina ku mejî kir, her wusa li ser deng derxistinê û qaydkirina wê ya di mejî de re, wê şibandîna têngîna û ankû hişarî hin bi hin bike. Ev jî, wê êdî li wê darêjka dengî salixkirinê ku werina kirin wê temenê wê biafirêne. Ev weke aliyekî afrînerî ê zimanî û zimanzanîyê ya ku em divê ku li vir wê bi teybetî kifş bikin a.

Her wusa, li vir, divê ku mirov wê yekê werêne ser ziman ku ew deng û tevgerîya ku dike û derdixe li holê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov li wê jî bihizirê. Ev jî, wê weke aliyekî din ê ku divê ku mirov wê li vir kifş bike bê. Li vir, divê ku mirov wê yekê jî werêne ser ziman ku wê ev rewşa ku bi hişarî ku me bahse wê kir, wê bi aqil û li ser aqil re bibe. Zanîna ziman, her wusa, wê aqilê ziman, bi têngîna kirdeyî ya wê re kifş bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê yekê werêne ser ziman ku bi dengî, her gotin, çend ku ji mirov re bêwate heya ku were, wê bi heman rengî biwate jî were. Ev jî, wê weke aliyekî wê gotinê ê ku bi teybetî, ku divê ku mirov li ser

çerçoveya wê re ku lê bihizirê wê kifş bike û werêne ser ziman. Gotin, bi awayekî hesanî fahmkirina wê, ew a ku bi hebûna wê ya têtgînî a têtkerî re mirov dikarê li navaroka wê li kirdeya wê bihizirê. Bi wê re wê fahm bike û werêne ser ziman. Kirde, her wusa çerçoveya wê ya gotinî a darêjkî ku mirov wê kifş dike, bi wê re xwediyê pergeliyek levkirîya ku mirov divê ku wê kifş bike û werêne ser ziman a. Darêjka gotinê, li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê bi teybetî lê bihizirê. Darêjk, têtkerîya wê ya 'têtgînî' her wusa ku mirov wê bi salixkirina wê re kifş dike û ankû dibînê, wê têtgîna hebûna gotinê ya ku bi xwe re salix dike wê werêne ser ziman.

Jîr hêzeka hilberîner a. Her wusa fahmkirin jî, hêzeka hilberî ya fêrsî ya. Têtgîna Zêhnê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa mirov bi gelek awayên wê re kifş dike. Di çerçoveya hêzeka têtgînî de fahmkirina zêhnê û di navaroka wê de hilberîya jîrê û fahmkirinê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov baş fahm bike. Ev fahmkirin jî, wê li ser ziman re bibe. Têtgîna ziman, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, bi tevgerên mirovî re mirov aliyekî wê dibînê.

Her wusa, dema ku mirov bahse ziman dike, li vir, divê ku mirov hinekî di nava dîrokê de herê. Di nava rûpelên dîrokê de mirov wê gelek minaqên ku mirov wan fahm bike û werêne ser ziman wê bibînê. Biharhanîna ziman, her wusa, aliyekî mirov ê ku mirov nikarê wê red û înkâr bike ya. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ziman, giringîya wê ji fahmkirina bi wê zêdetirî, bi navaroka xwe xwediyê aqilê ku em di jîyanê de bikardihênin a. Ev aqil, jîyane jî jî bixwe re rast dike. Li vir, têtgîna bi gotina "çendî ku mirov biaqil dibe, zimanê mirov diadilê û çendî ku zimanê mirov adilî jî wê bi wê re jîyane mirov biadilê", bi xwe re tehereka têtgînî ya bi ziman ku bi aqil re dihêne ser ziman. Ev têtgîn, her wusa, li vir, giringîya bi fahmkirinê derdixe li berçav. Ji vê têtgînê, dema ku em gav biavêji û hewl bidin ku fahmkirinekê pêş bixin, emê ji wê herina zêhn û jîra xwe ya bi aqilê xwe re. Ya ku êdî têtgîneka felsefîkî a bi aqil di jîyanê de bi me re pêş dixê jî ev a. Her wusa, dema ku em hewl bidin ku di nava fahmkirin û têtgîna vê de pêde herin, dive ku em 'zansta gîyanê' jî, her wusa li berçav bigrin û li ser re hinekî jî şîroveyna bi tevger, xûy û her wusa kirinên mirovî ên kirarî re jî werêne ser ziman. Kirinên mirov ên di jîyanê de, fahma di derbarê wan de wê her wusa bi aqilekî bê.

Di serdemên buhurî de felsefe, hinekî jî di vê çerçoveyê de bi hewldanên fahmkirinê re bidest pêşketina xwe dike. Hewldana 'fahmkirinê' her wusa têtgîneka biaqilî a mirovî ya. Lê fahmkirinê, em divê ku di çerçoveya hebûna zindiyî de werênina ser ziman. Her wusa, di jîyanê

de bi jîyane zindî de kifşkirina, ya baş û ne baş, ya ku zirerê dide û ya ku nadê, û hwd, wê bixwe re di vê çerçoveyê de têgîneka felsefîkî a zêhnî pêş bixe.

Bi dîrokê re pêşketina aqil, pirr zêde bûya. Her wusa, li vir, dema ku em bahse pêşketina aqil dikin, em bi wê re bahse pêşketina aqilê ku hatî ser ziman dikin. Ev jî, bi serê xwe weke aliyekî ku mirov di jîyanê de wê bi hişarîya xwe re hîs dike ya. Rewşên jîyanî, ên ku derdikevina li ber me, mirov wan kifş dike bi qilê xwe. Bi wê re wan dahûr dike. Ev jî, wê weke aqilekî zêhnî ê jîrî bê. Li vir, divê ku mirov jîra zêhnê, her wusa di vê çerçoveyê de bi têgîna fahmkirina hişarî re werênina ser ziman. Jîr, weke ku di kurdî de xwediyê wateyê ya, bahse 'mîrovê ku bi zêhnê xwe pêşketî' dike. Ev gotin, weke gotinaka pirr kevn a jî di kurdî de. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ser wê re dihizirê, wê çaxê, mirov digihijê wê têgînê di serê xwe de ku, zêhn, pêşketina wê pirr zêde zû pêşketîya. Mirov, li ser ziman re jî dema ku li rewşê û gotinên wê dinerê, mirov vê yekê dibînê. Heta demên Sûmerîyan, gotinên ku dihên dîtin, ên weke "ga", "ka", "şa", "ha", "hê", "hî", 'za', û hwd in. Em dikarin, di vê çerçoveyê de bi gotinî bi hezaran gotinên ku em dikarin bi ate bikin û yek û ankû du tîpî na kifş bikin. "ga", navê sawalê gir a. "Za", dema ku çêlîyek ji sawalekê bû, têne ser ziman, "şa", navê bidilbûn û tiştê bi wê bi dil dibê ya. "Ka", pirsîna ku li kûderê ya, bi gelek wateyên din re bi xwe re têne ser ziman. "Ha", bi nîşandanê re hinek wateyên bi têgîna hebûnê re dihênina ser ziman. "Hê", wateya demê ya bi 'zûbûn' û ankû 'derengbûnê' bi gelek wateyên din re dihêne ser ziman. "Hî", wateya danîşanê bi gelek wateyên bideng axiftinê û hwd, bi xwe re dihêne ser ziman. Her wusa, navê "jin"ê ku weke navê "pîrekê" ya, wê di van deman de weke "nîn" hebê. Her wusa, navê "jin", di wateya 'jîyanê', 'pîrozî' û hwd de ya. Her wusa, di van deman de jî wusa ya. Ev rengên gotinî ên piçûk û pirr wateyî, her wusa tiştêkî bi xwe re dide nîşandin. Ew jî, her wusa ew a ku hiş di mejî de di temenê biwatekirinê û hwd de pêşketî ya û êdî li ser wê re bi wate dike. Rewşên ku dibin, di çerçoveya deng derxistina bi wan û bo wan de, wê salixkirinê bike. Di vê çerçoveyê de salixkirinên ku dihênkirin jî, bi dengên kin in. Ev jî, teybetîyeka wan heya. Dengên kin, di çerçoveya salixkirina wan de jî, kifşkarîyeka mejî ya xort heya. Zelal û kin in. Zû tên têgihîştin. Her wusa, di mejî de, dema ku ew deng hatina bi gotinkirin, û ew gotin hatina nivîsandin jî, êdî weke ku ew deng weke têrkerîyeka heyberî, wê xwe bide nîşandin.

'Kû', bi awayekî xweza, dema ku bi çav dîtinê re ku hat dîtin, 'nîşandinê' bi xwe re dide kirin a.

Her wusa, di vê çerçoveyê de di çerçoveyek xwezayî de, dengê xwe yê hîmî ê ji qiriqê ku derdixê ya. Li herêma rojhilatê kurdistan û başûrê kurdistanê de, herîkîna dengên kurdî, her wusa, hinekî dîn bi teybetî dihên dîtin. Ev herîkînen ku weke ku ji 'kû' ku dawîya wê bi 'v' bicihkirinê re 'kûv' diafirênê û 'kûv' jî ku hat afirandin dikeve wate ya 'tê herê kû' û ankû 'tê biçê kûderê' û hwd bi hinek wateyên din re bi xwe re dihêne ser ziman, wê li van herêmên kurdistanê ên weke rojhilat û başûr, li şûna 'v', wê 'r' were bicihkirin û wê bê gotin 'kûr' û hwd. Hinek jî, dengê 'kûr' weke kokî bikar dihênin û dibêjin bi 'kûr ve(?)' Di vê çerçoveyê de her wusa herîkîna li ser dangan re dihê dîtin. Lê ev herîkîna li ser dangan re wê, temenê afirandina dengên gotinê ên piştê bin. Li vir, mirov vê yekê bi başî fahm dike ku di demên ku hê nivîsandin pêşneketîya de, gotinên kin weke du û ankû sê tîpî û hwd, wê karekî giring ê di hiş de girtinê jî bibînin. Li vir, mirov vê yekê kifş dike, ku em dema ku li koka gotinên kurdî dihizirin û wan lêdikolin, mirov rastî wê tê, hemû jî, di vê çerçoveyê de xwediyê heyîniyeka hebûnê na. Gotinên du-tîpî, weke teybetîyeka hîmî ya zimanî derdikeve li ber me. Her wusa, "da", "zû", "va", "wa", "la", "na", "ma", "ja", "ka", "ba", "pa" û hwd. Ev gotin û pirranîyan gotinên bi vî rengî du-tîpî ku mirov wan dinivîsîne, wê bi wate bikin û kok bin. "Da", di wate dayîn û koka gotinên wê ya. "Zû", wateya 'lezandin' û ankû 'lezkirinê' de û wateya kokî ên gotinên wê de ya. "Va", di wateya bi destdayîna tiştê li yekî û gotina 'vaya' û her wusa hîmê gotinên dayîne ya. 'Wa', wateya nîşandina li berçav a û keseyetîyê ya. Her wusa, 'va' jî weke jî ya. "La", di wate ya gotinên 'lêkirin' û hwd de ya û kok a. "na", di wateya 'redkirin' û nebûnê de ya û koka wê ya. "Ma", di wateya zayendîtiyê û hebûna wê ya keseyetîyê de ya û minaq tawandina gotinê jî bi rengên weke "mê" û hwd re dibê navê zayendekê û koka wê tene ser ziman. "Ja", ku koka "aidiyete" bi 'ji wê tiyê' dihêne ser ziman û koka wê diafirêne. "Ka", ku wateya kokî ya navkirinê ya û bi tawandina wê re û hwd, weke "kû", "ku", "kê", "ke" û hwd, ku diafirêne weke têngîneka ku temenê pir-rengên dengî ên gotinî ya. "Ba", di wateya "bal kişandina li ser" û ankû kişandine heyê li ser dihêne sser ziman û koka wê balê bi wê re diafirêne. Bal, dema ku heya mirov çû ser tiştê û li ser wê ma dihêne ser ziman. Her wusa, Ba, piştê bal, piştê jî heta ku diçê gotina bawerîyê, wê regekî gotinî li dûv hevdu bide diyarkirin. Her wusa "pa" jî, têngîna "paş", "panî", "par", û hwd bi gelek wate û gotinên din re bi xwe re diafirêne. Dema ku "pa" hat tawandin, her wusa jê "pê", "pêr", "per", "pen", "pêjn", û hwd bi gelek wateyên din re bi xwe re diafirênê. "pêr" di wateya roja duyemin a buhurî de ya. Per" di wateya bask de ya. 'Pen, di wateya xweşikati û bêhnê de ya. Pêjn, di wateyên bêjîngê bejnûbalê û hwd de ya. Her wusa,

her yek ji wan gotinan, weke hemû gotinên li jor, mirov dikarê hinek wateyên din ên ku li wan hatina kirin, bi wan re kifş bike û werêne ser ziman. Ev rewş, hemû jî, tiştêkî didina nîşandin, Her wusa, dengê gotinê, her wusa, di mejî de çi di şibênê û bibîrdixê jî, her wusa wê bi xwe re werêne li holê.

Li vir, dema ku em li ser gotin û salixkirina wan ya li ser deng û wate dayîna wan re dimeşîn, em vê yekê dibînin ku her wusa salixkirina gotinan bi kokî, ji wan afirîn bûya. Lê li vir, gotinên kokî, her wusa, temenê wan li ser rewşên jîyanî ku hatina dîtîn û kifşkirin a. Minaq, em î ro pirr gotina "dîrokê" bikardihênin. Weke koka gotina 'dîrokê' em rastî gotina "dî" tên. 'Dî', em rastî gelek watekirinên bi wê re tên. Lê wateya wê ya hîmî bi 'dîtina ku hatî dîtîn' re dihê kifşkirin. Yanî, tişt û ankû rewşa ku hatî dîtîn, bi wê re dihê salixkirin. Di vê çerçoveyê de weke koka wê ya din jî, "ro" ya. 'Ro, di wateya dîtîn, û rojê de ya. Ji wê, 'rok', 'roj', 'roh' û hwd hatina derhanîn ku hema bêja di wateyên nêzî hevdû de na. Her wusa, ro, navê wê rohnîya rojê ya. 'Rok', li gorî ku hatîya salixkirin, dikeve wateya rojeka ku buhurî de lê ku ne kifşa ku kîjan roj a. Di vê çerçoveyê de hanîna rex hevdû ya 'dî' û 'rok', her wusa, 'rojek buhurî' û ankû dîtinek bûyî û an jî kû 'dîtinek bûhûrî' bi xwe re salix dike û dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de dîrok, weke gotinaka ku hem koka dîtînê a 'dî' yê û hem jî koka rojê ya 'ro' yê di ke temen, hundûr û nava xwe de. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku mirov dikarê li ser koka 'ro' re bi gotinên weke 'ronahî', 'rojbûn', 'rodên', 'rodan', 'rojbîn', û hwd bi gelek gotinên din re biafirênin. Em li vir, hinekî din li ser gotina 'ro' yê kûr herin. Ji ber ku ev hinek wateyên din bi serekeyî ku em divê ku li vir kifş bikin bi xwe re dide kifşkirin. Minaq, dema ku me dahûra gotina koka 'ro' kir, me got bi sereke. Ji wê, 'rok', 'roj', 'roh' û hwd, sê gotinên sereke me hanîn ser ziman. Li vir, gotina dawî a "roh", em divê ku hinekî li ser wê bisekin in. Her wusa, li vir, dema ku mirov li ser wê dihizirê, ku weke koka wê 'ro' ya bi wateya 'rohnîyê re dikeve wateya "ruh" de jî. Ruh, em di zanîn ku roja me de di wate ya gîyanê de, her wusa dihê bikarhanîn û ser ziman. Ev li vir, vê yekê, werênina ser ziman ku di nava têgîna koka 'ro' de têgîna 'dî' ya bi dîtînê re li ser wê têgîna rohnîya rojê ku heya re di nava têgîna koka 'ro' de xwe dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de her wusa têgîna 'dîtineka salixkirî', mirov di nava vê têgîna vê gotinê de kifş dike. Têgîna gotina 'ro' de, wê her wusa weke tiştêkî ku heyî lê ku bi dest nayê girtin, wate distêne. Ev jî, wê êdî bikeve wateya gîyanê bixwe de jî. Li vir, di rengê wateya gîyanê û bi navkirina wê de hanîna ser ziman gotina 'roh' û ankû weke ku di roja me de dihê ser ziman a 'ruh', wê di vê çerçoveyê de xwediyê wateyeka ku em li vir li ser wê bisekin

bê. Hizra têtîna ruh'ê, wê her wusa, weke koka xwe têtîna 'ro''yê bi afirandina xwe ya 'roh' re bike temen û hîmê xwe de. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê re êdî xwe werêne ser ziman. Li vir, em li ser têtîna bi tîpa kurdî ya ku mirov ji wê fahm dike jî bisekinê. Her wusa koka 'ro', dema ku tîpa 'h' di hilde dawîya xwe ya, her wusa, bi wê re têtîna 'tiştêkî ku heyî' jî bi xwe re dihêne ser ziman. Bi rengê kokî 'h''ê, weke kokî "ha" ku mirov wê hilde li dest, têtîna û wateya 'hebû', 'heyîn', 'hey', 'heya', û hwd bi gelek wateyên din ên bi gotinî re bixwe re dihêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de hê, weke têtîna 'hebûnê' êdî xwe dide dîyarkirin. Li vir, di vê çerçoveyê de, dema ku bi koka 'ro' re dihê cem hevdu, her wusa, wateya 'rohnîyeka ku heyî', wê bi xwe re werêne ser ziman û dîyar bike. Li vir, di nava rohnîyê û ankû rojê de, hertimî li hebûnekê lêgerîn bûya. Rohnî, weke heyîneka jîyanî ku bûya temenê hewldanên mirov ên salixkirinê. Hewldanên salixkirina rohnîyê, di vê çerçoveyê de bi hebûnekê, wê di nava têtîna 'roh''ê de xwe bide dîyarkirin. Ev jî, wê herwusa, temenê wê têtîna ku mirov weke zîndî ku dijî, ew jîyandina mirov jî ku weke 'hebûneke dijî' ku were ser ziman. Ev jî, êdî weke têtîneka 'roh' û ankû êdî bi gotinî weke gotinaka 'rohî' ku wê salix dike, hatîya dîtin û ser ziman. Roh, ku bi koka xwe ya 'ro' re her wusa, weke gotinaka giring ya kokî ya. Rengê wate û kirdeya xwe ya ji wê rohnîya rojê a ku heya digirê.

Dengê gotinî, her wusa, weke dengêkî ku ji qiriqê bi du-pêpelokan derdikeve ya. Di vê çerçoveyê de dengê ro'yê, di hanîna wê ya ser ziman de, xwediyê têtîneka giring a heyînî ya.

Em li vir, divê ku hinekî din pêde herin. Li vir, me li jor, bahse koka 'dî' ya zimên kir. Li vir, her wusa, em divê ku hinekî din li vir, bi wê re herin. 'Dî'. di wateya dîtinê de ya. Lê her wusa, dema ku mirov li koka 'dî' dihizirê, her wusa, bi rengê 'weke dîtinaka li şûn mayî' û anû weke 'tiştê duyemin' dike. Bo vê yekê, dema ku di nava hevokê de dihê ser ziman, minaq "Zilan, bahse tiştêkî din dike.", her wusa weke gotinaka ku di wê de ku bi koka 'dî' re tiştêkî din ê duyemin dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de 'dî', weke têtîneka zimanî ya giring a. Li vir, di hundurê gotinê de tiştê ku bahse wê dihê kirin, bi gotina di hundurê gotinê de a "..tiştêkî din .." dike, bahse yek tiştî dike. Li vir, li dawîya 'dî''ê ku tîpa 'n' hatî bicihkirin, her wusa wê di nava gotinê de wê tiştê ku hatî dîtin, wê dîtinê wê salix bike ku hatîya kirin.

Têtîna dengê, her wusa, li vir, divê ku mirov wê werêne ser ziman ku weke aliyekî giring ê salixkirî mirov wê kifş dike. Salixkirina deng, her wusa, wê di mejî de bibe. Bi wate kirina wê, wê bi pêşketina aqil û hişarîya aqilê mirov re bibe. Li vir, li ser gotinên zanînê re dema ku mirov

bi kokî diçê, mirov rastî rewşeka bi vî rengî tê. Minaq, "za", "ji", "jî", û hwd, wê di wateya afirandinê de bin. Koka 'za', di wate ya hanîna dunyê de ya. Her wusa 'jî' jî, wê têtîna û wateya "ji wê" û hwd ji xwe re bike temen. Li vir, di vê çerçoveyê de, têtîna 'tiştta ku ji wê afirî' wê bi wê re were salixkirin. Aqil, ji mejî diafirê. Zanîn, ji aqil diafirê. Her wusa, fahm ji fêrbûnê diafirê.

Weke têtînekê 'ji wê afirîn', her wusa, wê temenê têtîna pêşketina bi zanebûn û bûyîna wê bê. Ji xwe, heta roja me jî, gotina 'za', di wateya welidandina dayikekê, hanîna dunya a sawalakê çêlika wê û hwd de ya. Di vê çerçoveyê de, di wateya bûyîna de ya. Bûyîn, weke ku nû li dînyê bûyî, bi wê re dihê salixkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de têtîna 'afirandinê' di vê çerçoveyê de bi wê re xwe dide dîyarkirin. Dayikek diafirêne bi hanîna dunya a zarokên xwe re. Her wusa mejî jî, diafirêne bi çêkirina aqil û zanîna wê ya di xwe de. Temenê têtîna bûyîna, bi hatina dînyê re her wusa di vê çerçoveyê de xwe dihêne ser ziman. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê biteybetî werêne ser ziman ku têtîna afirandinê, bi gotina 'za' re bi temem a. Li ser gotina 'za' re tiştta ku bû, êdî weke tişttekî ku bûyî ya. Tiştta ku bûyî, êdî heya û bûya. Ev têtîna bi gotina bûyîna re jî, wê bi koka 'ba' û rengê tawandina wê a 'bû', "bî", "bê" û hwd re werê ser ziman. Ev têtîna ku bi gotinên kokî ên weke 'bû', "bî", "bê" û hwd re ku dihên ser ziman, wê bahse wê tiştta ku bûyî bikin. Yanî, wê li vir, ew tiştta ku bûyî û êdî heya wê, bahse wê bike. Ji xwe, bi gotinî, salixkirina wê tiştta bûyî, bi gotina 'bû' re bi ya 'hebûnê' re ya. Her wusa, gotina hebûnê, li vir, divê ku mirov bahse têtîna wê ya bingîhîn, bi wê tiştta ku bûyî û heyî weke hebûnekê re heyî bi têtîna bike. Li vir, têtîna hebûnê, li jîyanê, hebûna ku heya, bahse wê dike. Li vir, cûdahiya di nava koka 'za' û ya tawandina 'ba' yê 'bû' de, ew a ku têtîna bi ya 'za' re ku dihê dîtin, ew tiştta ku hê nû ku ji dayikê dibe û dihê dînyê ya. Lê piştî ku bû, êdî ew li jîyanê heya weke 'hebûnekê'. Êdî wê ji wê re weke tişttekî ku heyî û bi hebûnê bahse wê were kirin û wê bi hebûnê re ew were ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî di çerçoveya dengnasîya zimên de werêne ser ziman ku têtîna dengî, bi salixkirina wê re, bi afirîna deng re rengê gotinê û ankû bi tîpkirinê afirandîya. Ev jî, wê piştê temenê salixkirina wê û piştê jî nivîsandina wî bixwe re werêne. Nivîsandin, wê zimên ji astekê bi buhurêne li astaka din. Em vê yekê dikarin bi teybetî binxatkin û bibêjin. Her wusa, zimanê kurdî, ji rengê pêşketin û pêdeçûna wê ya gotinî û afirandina gotinî, mirov fahm dike ku hê di serdemên sîmerîyan de weke zimanê nivîskî pêşketîya. Her wusa, em vê yekê ji afirandina gotinên dirêj ku du û ankû sê kokakn bi hevdû re dikina nava xwe de ji wan fahm

dikin. Minaq, gotina "gilgamêş" nîşanak û birhana vê yekê ya. Têgîna ziman, her wusa, piştî ku nivîsandin bi wê re dibê, êdî li ser dagerîyên tîpî ên bi nivîskî û hwd re, wê rewşeka xwe ya dengnasî û hwd bi zelaltir bide nîşandin. Li vir, di naskirina dengan de, bi salixkirina dengan û her wusa bi dagerkirina wan salixkirinan û bi tîpkirina wan dageran û her wusa piştî nivîsandina wan, wê her wusa, bi pêvajoyên wê ên pêşketinê ên bi mejî re bin.

Têgîna fahmkirinê a bi nivîsandinê re, wê di serdemên şariştaniyê de pirr zêde pêş bikevin Di aslê xwe de zimanê nivîskî, êdî zimanê pêşketî ê şariştaniya. Her wusa, ev ziman, di çerçoveya dengên ku derdixe û levhanîna bi gotinan re ku dike, pergela xwe afirandîya. Ev pergala jî, wê hin bi hin rengê pêşketina civatê bi pergala bi demê re di çerçoveya jîyane şariştanî û hwd de, bide dîyarkirin.

Jîyane şariştanî, temenê wê li ser bineterên nivîskî ya. Her wusa, ew temenê wê yê li ser bineterên nivîskî ya, em dikarin bi navê 'civatê' re werênina ser ziman. Gotina civatê, koka wê li ser 'ci' ya ku ev dikeve wateya 'cih' û hwd de. Her wusa, gotina civatê, bi koka xwe ya 'ci' re, wê rengê salixkirina kirdeyî ya li hevdû kombûnê bi xwe re bide dîyarkirin.. Di nava têgîna civatîtiyê de kombûn ku weke ku kurd di roja me de jî bi nav dikin 'komelî' û hwd heya. Ev jî, her wusa, di çerçoveyeka zêdebûna mirovan ya bi hevdû re dide nîşandin. Têgîna civatê, her wusa, di nava kurdan de bi kevnerî kevn heya. Gotina 'civatê', di nava kurdan de di du wateyan de serekeyî mirov dikarê werêne ser ziman. Hinek wateyên din jî hena. Lê bi serekeyî, di wateya bi 'civatî' li hevdû rûniştinê û bi hevdû re axiftinê' dihêne ser ziman. Her wusa wateya wê ya sereka a din jî, ew a ku bi girsebûna mirovan a bi hevdû re afirandina civatbûnê dihêne ser ziman. Têgîna bi hevdû re bûnê, wê di vê çerçoveyê de bi li hevdû kombûn û parvekirinê re wê pêşbikeve. Di serdemên civatîtiyê de parvekirin, weke tiştêkî bingihîn a. Her wusa, dema ku em bahse parvekirinê bikin jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku ziman jî, wê weke tiştêkî hevpar ê ku bi wê re têkilîyê bi hevdû re didênin bê. Ziman, wê temenê bi hevdû re axiftinê û têkildanînê bê. Gotinên ziman ên ku hatina bi watekirin û salixkirin, wê her wusa temenê wê bê. Gotina ku dema ku di serê min de di wateya "hilde", "were", "bigrê", "bixwe", "vexwe" û hwd, ku hena, wê di serê mirovên din ên wê civatê de jî hebin. Her wusa, dema ku bahse gotina 'bixwe' hatkirin, ez jî û ên din jî, wê zanibin ku bahse xwarina tiştêkî tê kirin. Her wusa, bi heman rengî wê li ser gotinên din re jî bibe. Di vê çerçoveyê de ziman, weke têgîneka hevbeş ya têkildanînê bê. Tiştê ku temenê têkilîya bi ziman û wateyên wê re diafirîne, her wusa rengê

jîyanê û pêwîstîni û pêdîvîyên mirovî ên jîyanî ku mirov dixwezê ku bi wan bijî na. Her wusa, hewldana domandin û jîyandina jîyanê, wê temenê wê bê. Her mirov, pêwîstîya wî bi xwarinê heya bo ku bijî. Her mirov, dixwezê ku jîyane xwe bide domandin. Ev, weke xwesteka xwezayî ya mirovî a zindîyî ya. Di vê çerçoveyê de li gorî jîyanê biwatekirina li ser gotinan û hwd re jî, diafirê. Têgîna jîyanê, wê her wusa, xwe bi gotinan re werêne ser ziman. Her gotinak, bi hebûna xwe ya ku salixkirî re, wê rewşek ji wan rewşên jîyane me ya ku em wê dijîn wê bi xwe re salix bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de aqilê mirov jî, xwe diadilêne. Têgîna gotinan, temenê xwe bi vî rengî ji jîyanê digirê. Gotin, bi rengê ku weke 'têrkerîyekê' hatî salixkirin, wê xwediyê heyîneka şenber a dîtbar ya bi têgîna rewşa ku bi wê re hatî salixkirin bê. Di vê çerçoveyê de gotin, dîtbarîya wê, dema ku mirov bi nixî li wê dihizirê, wê tiştêkî ji mirov re bibêje.

Li vir, emê ji vir hê mijara xwe bidomênin. Lê li vir, em hinekî li ser tawandina gotinan bisekin. Her wusa, ev jî, wê weke aliyekî ku mirov bi teybetî divê ku wê hilde li dest û fahm bike ya. Tawandina gotina, wê weke teybetîyaka kurdî ya kevn bê. Ji vê teybetîyê, mirov dikarê gavê biavêje û wê weke zimanekî afrîner dikarin werênina ser ziman. Di nava xwe de, gotinên wê yên ku ji hevdû hatina kitakirin û ew kita ku li wan hat hizirin, bi wan xwandina bigotinî, wê weke aliyekî wê yê morfolojikî bê. Di vê çerçoveyê de, di wê çerçoveyê de bi awakirina gotinê û hwd jî, wê weke aliyekî ku di vê çerçoveyê de temem dike bê. Têgîna gotinê, her wusa, li vir, giringa ku mirov hinekî wê fahm bike. Gotin, dema ku mirov wê dahûr dike, mirov ji wê digihijê hevbeşîyeka hevgirtinî ya rewşî. Dema ku kitakirina gotinê çê dibe, weke ku ew were ji hevdûkirin, rewşek dihê li holê. Lê em dizanin ku her gotina ku afirî bi têgîn, awa û kirdeya têgihîştî bû û pê de, wê di vê çerçoveyê de xwediyê awayekê jî bê.

Di kurdî de, xwandina gotinekê bi bi gelek rengan û her wusa bi gotinekê xwandin û derhanîna gelek wateyên ku bi hevdû ve girêdayî li dûv hevdû ku mirov dikarê wan kifş bike jî, wê weke aliyekî giring ê teybet bê. Gotina 'ka', tawandina wê ya bi rengê 'kê' wê li gorî reşê bê. Her wusa, em dema ku tawandinê li ser gotinê re dikin, em dikarin, weke navê ziman, em dikarin gotina 'ziman', di vê çerçoveyê de weke minaq werênina ser ziman. Çerçoveya gotina 'ziman', bi rengê wê yê ku bi wê tê nivîsandin, her wusa bi rengê asayî, weke 'ziman' dihê nivîsandin. Di hundurê hevokê de "ez bi zimanê dayika xwe diaxifim", weke gotinaka ku di wê de gotina 'ziman', bi awayekî xwe yê ku em nûha bikardihênin dihê dîtin. Her wusa, em gotina ku di wê

de 'ziman', dihê bikarhanîn, bahse dayikê dike. Bi wê re jî, dihêne ser ziman ku ew ziman ji dayikê ya. Mirov, ji vê digihijê vê têtîne ku 'mirov, ji dayikê fêrî ziman dibe'. Lê ev gotina, ku bi rengê 'mirov, ji dayikê fêrî ziman dibe', mirov dikarê bi heman rengî gotina ziman di wê de bitawêne û werêne ser ziman. Bi rengê tawandina gotinê, wê weha bê. "mirov, ji dayikê fêrî 'zimên' dibe." Li vir, dema ku em li ser wateya ku ev hevok dide ku mirov dihizirê, her wusa, mirov digihijê wê têtîne ku weke hevdû wateyê dide û ji me re dibêje. Lê dema ku em li hundurê wê dinerê, di yekê de gotina "ziman" bi rengê tawandî ê "zimên" hatîya nivîsandin. Têtîna tawandinê, li gorî demê dibê. Her wusa, têtîna demê ya di hundurê vê tawandinê de berfireh a. Di karê li gorî 'demabuhurî' jî werê xwandin. Her wusa, lê dikarê li gorî rewşa ku biwê hatî ser ziman a wê rewşa wê kêlîkê were xwandin. Weke wê rewşa wê kêlîkê xwandina wê, her wusa, di vê çerçoveyê de adilandinaka li gorî gotinê û hevokê ya bi hevokên din re ya. Ankû, adilandinaka di nava hevokê de ya li gorî rewşê ya. Ev rewşa ku li gorî wê dihê adilandin, wê her wusa, têtîna şenber a gotinê a salixkirinî bi wê dîtbarîya wê re bike temenê gûharînên bi ziman re ên di çerçoveya pêşxistina wê de. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ziman, her wusa, li gorî rewşê adilandinê wê, wê li ser têtîna salixkirî a gotinê re bê. Li ser dengê ku bi wê hatîya kirin re bê. Her wusa, dengî ku hatîya salixkkirin, ew deng, wê her wusa, bi wê hişarîya di derbarê de ku bûya re wê xwe werêne holê û bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî werêne ser ziman ku ev tawandinên ku mirov dikarê bi rewş û demê re di hemû gotinên vî zimanê de bike, bi rêzimanê ê zanîna wê re ziman dike rewşeka hilberîner de. Her wusa, zanîna ziman, ku êdî dikarê biawayekî hilbêrêne, wê bi vê rewşê re xwe bide dîyarkirin. Zanîna ziman a hilberîner, di vê çerçoveyê de li ser têtîna gotinên ziman ên ne 'statik' re dibe. Zimanekî ku gotinên wê xwediyê teybetîya tawandinê na, ew ziman xwediyê zanînaşîyaka zimanê a hilberîner a. Her wusa, em vê rewşê divê ku bi teybetî binxat kin û werênina ser ziman. Têtîna zimanê kurdî, di vê çerçoveyê de dema ku mirov çendî li ser wê dihizirê û di nava wê de bizanînê û fahmkirina xwe re kûr û dûr diçê, her wusa vê yekê mirov bizanistîya ziman û zanîna wê re wê kifş dike. Zanîna wateyê, li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê hilde li dest, Têtîna ziman, di vê çerçoveyê de giringîya wê, bi hebûna wê re dihê li holê. Li vir, bi teybetîya 'tawandina' gotinan re em li vir, divê ku bi 'watekirina kitayan a bi awayîya wêneyî' re lê bihizirê. Ev rewş, her wusa, bi dîroka ziman re li ser awayê pêşketinên wê ên bidemê re di wê de û bi wê re diafirin. Di nava kurdî de, di vê çerçoveyê de, mirov vê rastîya wê bi pêşketina wê û bi dîroka wê ya pêşketinê re bi wê re kifş dike.

.....

.....

Di kurdî de, xwandina gotinekê bi bi gelek rengan û her wusa bi gotinekê xwandin û derhanîna gelek wateyên ku bi hevdû ve girêdayî li dûv hevdû ku mirov dikarê wan kifş bike jî, wê weke aliyekî giring ê teybet bê. Gotina 'ka', tawandina wê ya bi rengê 'kê' wê li gorî reşê bê. Her wusa, em dema ku tawandinê li ser gotinê re dikin, em dikarin, weke navê ziman, em dikarin gotina 'ziman', di vê çerçoveyê de weke minaq werênina ser ziman. Çerçoveya gotina 'ziman', bi rengê wê yê ku bi wê tê nivîsandin, her wusa bi rengê asayî, weke 'ziman' dihê nivîsandin. Di hundurê hevokê de "ez bi zimanê dayika xwe diaxifim", weke gotinaka ku di wê de gotina 'ziman', bi awayekî xwe yê ku em nûha bikardihênin dihê dîtin. Her wusa, em gotina ku di wê de 'ziman', dihê bikarhanîn, bahse dayikê dike. Bi wê re jî, dihêne ser ziman ku ew ziman ji dayikê ya. Mirov, ji vê digihijê vê têtîna ku 'mirov, ji dayikê fêrî ziman dibe'. Lê ev gotina, ku bi rengê 'mirov, ji dayikê fêrî ziman dibe', mirov dikarê bi heman rengî gotina ziman di wê de bitawêne û werêne ser ziman. Bi rengê tawandina gotinê, wê weha bê. "mirov, ji dayikê fêrî 'zimên' dibe." Li vir, dema ku em li ser wateya ku ev hevok dide ku mirov dihizirê, her wusa, mirov digihijê wê têtîna ku weke hevdû wateyê dide û ji me re dibêje. Lê dema ku em li hundurê wê dinerê, di yekê de gotina "ziman" bi rengê tawandî ê "zimên" hatîya nivîsandin. Têtîna tawandinê, li gorî demê dibê. Her wusa, têtîna demê ya di hundurê vê tawandinê de berfireh a. Di karê li gorî 'demabuhurî' jî werê xwandin. Her wusa, lê dikarê li gorî rewşa ku biwê hatî ser ziman a wê rewşa wê kêlikê were xwandin. Weke wê rewşa wê kêlikê xwandina wê, her wusa, di vê çerçoveyê de adilandinaka li gorî gotinê û hevokê ya bi hevokên din re ya. Ankû, adilandinaka di nava hevokê de ya li gorî rewşê ya. Ev rewşa ku li gorî wê dihê adilandin, wê her wusa, têtîna şenber a gotinê a salixkirinê bi wê dîtbarîya wê re bike temenê gûharînê bi ziman re ên di çerçoveya pêşxistina wê de. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ziman, her wusa, li gorî rewşê adilandina wê, wê li ser têtîna salixkirinê a gotinê re bê. Li ser dengê ku bi wê hatîya kirin re bê. Her wusa, dengê ku hatîya salixkirin, ew deng, wê her wusa, bi wê hişarîya di derbarê de ku bûya re wê xwe werêne holê û bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî werêne ser ziman ku ev tawandinên ku mirov dikarê bi rewş û demê re di hemû gotinên vî zimanê de bike, bi rêzimanê ê zanîna wê re ziman dike rewşeka hilberîner de. Her wusa, zanîna ziman, ku êdî dikarê biawayekî hilbêrêne, wê bi vê rewşê re xwe bide dîyarkirin. Zanîna ziman a hilberîner, di vê çerçoveyê de li ser têtîna gotinên ziman ên ne 'statik' re dibe. Zimanekî ku gotinên wê xwediyê teybetîya tawandinê na, ew ziman xwediyê

zanînnasîyaka zimanî a hilberîner a. Her wusa, em vê rewşê divê ku bi teybetî bixat kin û werênina ser ziman. Têgîna zimanê kurdî, di vê çerçoveyê de dema ku mirov çendî li ser wê dihizirê û di nava wê de bizanînê û fahmkirina xwe re kûr û dûr diçê, her wusa vê yekê mirov bizanistîya ziman û zanîna wê re wê kifş dike. Zanîna wateyê, li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê hilde li dest, Têgîna ziman, di vê çerçoveyê de giringîya wê, bi hebûna wê re dihê li holê. Li vir, bi teybetîya 'tawandina' gotinan re em li vir, divê ku bi 'watekirina kitayan a bi awayîya wêneyî' re lê bihizirê. Ev rewş, her wusa, bi dîroka ziman re li ser awayê pêşketinê wê ên bidemê re di wê de û bi wê re diafirin. Di nava kurdî de, di vê çerçoveyê de, mirov vê rastîya wê bi pêşketina wê û bi dîroka wê ya pêşketinê re bi wê re kifş dike.

Têgîna tawandinê, her wusa, mirov divê ku hinekî din jî di çerçoveya watekirina wê de pêde herî. Ev yek, li vir, weke pêwîstînyekê bo fahmkirinê ya. Dema ku mirov li gotinên ziman dihizirê, her wusa, di vê çerçoveyê de, mirov bi vê rengê wê bi wê re kifş dike.

Têgîna tawandina gotinan, her wusan, li vir, çend ku cih bi cih dikarê bi 'demê' re jî were hanîn li ser ziman, wê her wusa bi di nava hevokê de giraniya dîtbarîya bi rewşê re weke ku zêdetirî derdikeve li pêş. Her wusa, têgîna 'demê' jî, wê êdî xwe di nava wê ya rewşê de xwe bide windakirin û yankû veşartin.

Rengê tawandina gotina, ku me bi minaqî li jor hanî ser ziman, her wusa, temenê bikarhanîna ziman bi awayekî afrîner a jî. Her wusa, bi gotinî hilberînerîya têgînê, temenê wê di vê çerçoveyê de bi awayekî xwezayî weke ku di afirê rewşek dihê li holê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku têgîna rewşê, her wusa, têgîna tawandinê, li vir, wi di çerçoveya afirandina zimanî a bi hilberînerê de xwe bide dîyarkirin.

Ziman, gotinên wê bi rengên ku hatina salixkirin, weke ku dervî têgîna demê na. Her gotin, her wusa, wusa wê hîsekî bi xwe re bi mirov re bide çêkirin. Lê gotin, bidemê re ya. Her wusa, ji ber ku her gotin, bitêgîna xwe ya demkî re salixkirina wê bûya. Bi du awayan mirov dikarê salixkirina gotinan werêne ser ziman bi demê re. Yek, weke 'nav' û hwd, wê weke ku dervî demê bin, wê xwe bidina dîyarkirin. Lê bi nirxî salixkirina rewşê û ankû bi navkirina wê, wê di çerçoveya têgînek demî de bê. Di vê çerçoveyê de hebûna têgîna demê, di hundurê zimên de, weke mijaraka ku mirov dikarê ji pirr aliyan ve lê bihizirê û wê werêne ser ziman a.

Têgîna tawandina gotinan, wê weke aliyekî giring ê afrîner ê ziman bê. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de her wusa lê dihizirê, mirov wê aliyê wê, hinek têtgînên din re jî kifş dike. Zimanê ku bi vî rengî karibê hemû gotinên xwe yê zimanî ên ku bi şenberkirina, wê karibê hevgirtinê jî bi xwe re ji hinek aliyan ve bide çêkirin. Li vir, dema ku em li zimanê kurdî dinerin, vê rewşê bi wê re dibînin. Her wusa, hevgirtin(sentez)kirin, weke rewşek ku mirov divê ku ji gelek aliyan ve bi ziman re biteybetî û li gorî xosletên wê ên bi ziman re li wê bihizirê û wê werêne ser ziman. Her wusa, ev alî, weke aliyekî ku wê aliyê tawandinê ji aliyekî din ve jî dihêne ser ziman a. Her wusa, mirov vê yekê jî, divê ku bi teybetî werêne ser ziman.

Di zimanê kurdî de, bi çend gotinan jî bê, divê ku mirov bahse'hevgirtina di hundurê zimanê kurdî de bike. Emê piştî di dewama wê de vegerehina hanîna li ser ziman a 'tawandina gotina û wate û giringîya wan ya di afrînerîya ziman de. Her wusa, li vir, ev wê weke aliyekî giring ê ziman jî bê. Dema ku mirov bahse zimanekî kir, divê ku mirov bi hemû aliyên wê re di derbarê wê de xwediye zanîne bê. Zanîna ziman, temenê têtgiliya baş a bi hevdû û di nava xwe de ya. Bi demê re pêşketina di kurdî de her wusa, wê di çerçoveya hevgirtina gotinan de bi demê re gotin biafirin. Î ro, di jîyane xwe de di nava kurdan de, gelek gotinên weke "jê", "jêr", "jê re", "pêre", "pevre", "jevre", û hwd, ku em dikarin gelek gotinan li van zêde bikin, wê weke gotinên hevgirtî(sentezkirî) bin. Wate gotinên hevgirtî jî çi ya? Wateya wê ew a ku gotinek, ji çend gotinan bi hevdû re pêkhatîya. Her wusa, dema ku ew tê ser ziman, wateya wan gotinên ku bi hevdû re, bi yekcarê dihêne ser ziman. Gotinên hevgirtî, bi serê xwe xwediye hinek teybetîyên cuda na ku mirov divê ku wan bi teybetî fahm bike û werêne ser ziman. Her wusa, ew jî, aliyekî giring ê ziman û zanîna wê diafirînin. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi vê rengê werêne ser ziman ku têtgîna ziman, wê li vir, di vê çerçoveyê de xwe bide der. Fahma ji gotinên hevgirtî, fahmaka ku mirov dikarê ji hevokekê bigrê ya. Herwusa, di hin rewşna de, gotinên hevgirtî, weke hevokekê bi wate û xwedî wate na. Em li vir, divê ku di serî de li vir vê rastiye bi gotinên hevgirtî re fahm bikin ku gotinên hevgirtî, wê xwediye têtgînên giring bin. Her wusa, li ser gotinên hevgirtî de, bahse 'pîrr-zanîne' bi gotinekê re kirin jî, wê rast bê. Di vê çerçoveyê de gotinên hevgirtî, weke xwediye têtgînek livandinê a hevbeş in. Her wusa, dema ku mirov gotinên hevgirtî dahûr dike, bi wê re mirov her wusa bi wê re pîrr-zanetîyê jî kifş dike. Hevbeşîya gotinê, biawayekî vekirî bi wê re heya.

Minaq, gotinên hevgirtî ku me li jor bahse wan kir mirov dikarê bi vî rengî wan ji hevdû derxe. "Jê", weke gotina ku bahse "ji wê" û ankû "ji wî" dihêne ser ziman a. "Jêr", weke gotinaka ku "li jêr" û ankû "ji wî re" û an jî kû weke "ji wî re" dihêne ser ziman. "Jê re", weke gotina ku bi gelek gotinan re bahse "ji wî re" û ankû "ji wê re bike ya. Di çerçoveya levhanîna du tiştan de jî, bi dîtina tiştêkî din re ku bibêje ji "ya din re ya" dihêne ser ziman. "Pêre", bi gelek wateyan re dikarê di wate ya "bi wê re û ankû bi wî re" de werê hanîna li ser ziman. Gotina "pevre", weke gotinaka ku dîsa bi gelek wateyên dikarin werina derxistin re, bi wateya "bi hevdû re" û ankû "bi hevdû re na" û hwd werêne ser ziman. Gotina "jevre", weke gotinaka ku bi wate ya "ji hevdû re" û ankû "ji hevdû re baş in" û hwd, dikarê werêne ser ziman. Weke ku tenê bi gotinên ku me bi watekirina wan re hanî ser ziman de jî, dihê dîtîna ku weke ku her yekê ji du û ankû sê gotinan diafirê. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku gotin, her wusa, bi hevgirtîniya wê re heya.

Gotinên hevgirtî, her wusa, weke rengê li ser wate û ankû gotinê bixwe re ku bi hanîna cem hevdû û ankû bi rêzkirina tîpan û hwd re ku biawayekî nû hatî nivîsandin weke bêjeyek nû ku wan wateyên wan gotinên ku bi wê re hatina cem hevdû bi hevdû re di çerçoveyek nû de ku werêne ser ziman. ..

Li vir, divê ku mirov vê aliyê her wusa, di çerçoveya têgîneka afrînêr de werêne ser ziman. Ev aliyekî bi zanîna ziman ku hilberîn di nava ziman de li ser temenê zanîn, rêzimanî, watekirin, û hwd re ku dikê ya. Di vê çerçoveyê de têgîna hevgirtinê, her wusa, weke têgîneka giring a zimanî ya. Divê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî binxatkê û werêne ser ziman ku bo ku mejiyek wê hilberîna ziman bi zanîna wê re bike, divê li ziman serwer bê. Ev yek jî, weke aliyekî giring ê ziman a. Dema ku ev nebê, wê nikaribê biafirêne. Wê nikaribê wê afrîneriyê bide nîşandin û wê hilberînê bi ziman û gotinê re bike.

Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku di serdemên buhurî de ev hevgirtin û çêkirin di nava zimanê kurdî de hatina kirin. Gelek gotinên hevgirtî ku em î ro bikardihênin, ên wan demên buhurî na. Ev jî, wê dide nîşandin ku di demên buhurî de di derbarê zanîna ziman û gotinê de têgîneka baş ku wan dikarê li ziman serwer bike bi wan re heya. Ev jî, bûya temenê afirandin û hilberînên giring bi rengê hevgirtinkirina gotina û çêkirina gotinên hevgirtinî û hwd. Ev jî, divê çerçoveyê de, weke birhanaka û ankû nîşanayaka ku em divê ku di vê çerçoveyê de ku werênina ser ziman a. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna

hevgirtinî a zimanî, her wusa, di temenê wê zanînaka zimanî a biserwerî heya. Ev jî, temenê wê afirandin û hilberînê de ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ziman, heyîneka giring a ku diafirênê ya her wusa gotinên ziman, dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di nava afirandinaka mazin de na. Ziman, bi aliyê xwe yê ku di karê gotinên xwe bitawêne û her wusa bi aliyê xwe bi afirandina gotinên hevgirtî(sentez) re hertimî di nava hilberînekê de ya. Em vê yekê, her wusa bi ziman û dîroka wê re pirr baş û qanc kifş dikin. Dema ku em li demên ku buhurîna ku li wan dinerin, em vê yekê, her wusa biawayekî vekirî kifş dikin û dibînin. Têgîna ziman, di vê çerçoveyê de weke hêzeka afrînerî ya çêkerî di jîyanê de xwediyê afrînerîyeka zêhnî û têgînî ya di jîyanê de ya. Her wusa, bi teybetî, ev herdû aliyên ziman ên bi tawandina gotinan û her wusa hevgirtin(sentezkirina) gotinan re, wê her wusa, zanîna ziman a hilberîner xwe bide dîyarkirin. Di nava jîyaneka têgîhiştî de jî, her wusa zimanê afrîner, zimanê pêşketinê ê ku dikarê pêvajoyê biadilênê ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ziman, di vê çerçoveyê de di nava afirandinekê de ya. Ev xosletên ziman, her wusa, çendî ku ew ziman li jîyanê werê bikarhanîn, wê afirandinê bi rengê hilberînerîyê bi wê re bide çêkirin. Ev, weke rewşeka xwezayî ya ku mirov dikarê li vir wê kifş bike û werêne ser ziman. Têgîna ziman, di vê çerçoveyê de bi adilîna wê ya bi gotinan re, êdî wê rewşê bi demê re diafirêne. Li vir, em divê ku hinekî li ser têgîna ziman a afrîner biskein in. Piştî hinekî hanîna ser ziman a xosletên ziman ên tawandin û hevgirtinîya bi gotinan, êdî her wusa li ser têgîna pêşxistina bi ziman re jî mirov dikarê li ser wê bisekinê. Ev jî, wê êdî vê temenê fahmkirin û bikarhanîna van xosletên ziman bi xosletên wê ên din re di jîyanê de bide nîşandin.

Têgîna gotinên hevgirtî, di çerçoveya levhanîn û levkirina wan de heya. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov dahûrya gotinên hevgirtî werêne ser ziman, mirov divê ku li ser têgîna kirdeyî û wateyî ya gotinê re wê bike. Di vê çerçoveyê de levhanîn û çêkerîya ku bi kirdeyî hatî çêkirin, bi gotinê êdî li wê bi nivîsandina gotinê bi rengê nû re weke kirasekî ku li wê were kirin dibê. Her wusa, divê çerçoveyê de, têgîna kirdayî, dema ku em bi dahûrîya wê ya di çerçoveya gotina hevgirtî de werênina ser ziman, divê ku mirov bi çêkerîyeka têgîhiştî re wê werêne ser ziman. Ev çêkerî, her wusa, weke aliyekî wê yê giringa ku mirov divê ku werêne ser ziman a. Di aslê xwe de, weke aliyekî afrînerîya zanîna ziman bi awayekî hilberînerî, di vê çerçoveyê de dihê

dîtin. Têgîna afirandinê, di vê çerçoveyê de bi awayekî zêhnî, mirov wê li ser gotinn hevgirtî ên têtîhiştî re kifş dike.

Dema ku mirov ji aliyê aqil û zêhnê mirov re li vê rewşa afirandina gotinên hevgirtî binerê, her wusa rewşeka teybet ya ku em divê ku wê kifş bikin derdikeve li holê. Her wusa fahmkirina, wê têtîna gotina hevgirtî, wê weke levkirina darêjkî ku bi awayekî çêkerî hatîya afirandin, wê temenê fahmkirina aqilê zêhnê mirov jî bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku zanîna ji zêhnê, ji kurdî gotina 'jîrê' ji wê re tê bikarhanîn. Her wusa di wê wateyê de dihê bikarhanîn. Ev gotina jîrê jî, weke gotinaka pirr kevn a serdemên serdemê a kurdî ya. Jîr, têtîna têtîhiştî a zanîna aqilê mirov a.

Ji aliyê aqil ve, dahûrkirina gotinên hevgirtî, wê mirov bi awayekî xweza li ser têtînên ziman û wê çerçoveya wan gotinan û afirandina wan û her wusa bi levkirina wan ya bi wateyî re ku bi çêkerî hatina çêkirin re, wê mirov bigihêne têtîna zêhn û zanîna wê. Li vir, di aslê xwe de, gotinên hevgirtî, weke têtîna zêhnî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Ev jî, her wusa, wê weke aliyekî girîng ê fahmkirin me ya ji zimên bê.

Em li vir, hê jî divê ku di fahmkirina vê gotina hevgirtî de kûr û dûr herin. Ev, weke aliyekî têtîhiştî ê ziman jî ya. Her wusa, di nava ziman de, gotinên hevgirtî, weke aliyekî zêhnî ê di nava zimên de ku êdî dihê afirandin de. Yanî, bi gotinaka din, êdî di nava ziman de bi awayekî şenber bi gotinkirina têtîna zêhnê ya. Li vir, em ku bahse wê hevgirtina wateyî ya gotinê dikin, her wusa pirr-wateyî bi wê re em dibînin ku dihê dîtin. Pirr-wateyî, bi awayekî 'naqşeyî', weke têtînekê jî xwe dide dîyarkirin. Em dema ku di vê çerçoveyê de li wê naqşaya gotina hevgirtî dihizirin, her wusa, bi awayekî bi hanîna cem hevdû û ankû ji hevdû afirandina wateyên wê, têtîneka bi rengîna a naqşayî ya zêhnî jî xwe dide dîyarkirin. Li vir, bi gotinaka din, em dikarin bibêjin ku gotinên hevgirtî, weke naqşayna zêhnî ên ku di nava ziman de bi zanîna zimên re ku hatina afirandin in. Zimanê zanîne ku mirov bahse wê bike, her wusa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê biawayekî ji ewla bahse wê bike.

Zimanê zanîne, li vir, li ser vê rewşê re mirov divê ku hinekî li wê bihizirê. Têtîna zanîne, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov di çerçoveya ziman de wê dibîne. Ziman, bi hanîna ser ziman a aqil re her wusa wê rewşê diafirêne. Li vir, em vê yekê bi awayekî din jî divê ku werênina ser ziman. Zimanê zanîne, her wusa, dema ku mirov bi aqil û zanîna zimên, ku di nava zimên de,

bi têtîneka çêkerî li ser wate û kirdeyê re bi levkirinê re ku mirov bahse wê dike, wê weke aliyekî wê yê zanînê jî bê. Ji vir, mirov divê ku hinekî bi zanînê û afirandina bi zimên re li zanîna zimên jî bi hizirê. Di vê çerçoveyê de ziman, weke awayekî giring ku mirov divê ku wê werêne ser ziman a. Têtîna zanînê, di nava ziman de, her wusa bi gotinê re, bi rengê gotinê re dihê li holê. Piştî ku nivîsandin pêşket û pê de, ew rengê nivîsandin bi gotinan re wê êdî weke aliyekî şenber ê têtînê ê aqil bê. Her gotin, dema ku hat bi tîpkirinê û nivîsandin, ew rengê wê gotinê ê bi tîpkirinê bisalixkirinê di navaroka wê de, wê xwe bi awayekî aqilî bide dîyarkirin. Her gotin, tiştêkî ji me re dibêje. Ev, weke têtîneka zimanê ya ku em divê ku li vir werênina ser ziman a. Têtîna ziman, li vir, dema ku em bi gotinê û li ser nivîsandina wê re lê dihizirin, her wusa em weke aliyê zanînê ziman dihênina ser ziman. Li vir, ziman, weke aliyekî têtînê xwe dide dîyarkirin.

.....

.....

Têtîna şenberkirinê ya gotinan, her wusa, di serdemên berê de jî, wusa dihê ser ziman. Ez dema ku li wê şenberkirinê dihizirê, ew naqşên ku ji destê dayikên kurd derdiketin dihên berbîra min. Her wusa her dayikek kurd, dema ku dirûnişt, bi dirûtinê, ew naqşê kîl bi kîl dihûna. Her kîla ku diavêtiyê de, weke ku ew naqşê berafirandinekê dibir. Ew afirandin, çend ku kîl zêde dibûn û hin bi bin rengê diafirî, wê weke 'naqşaya şahmaran' hwd, wê naqşê werina çêkirinê û afirandinê. Di vê çerçoveyê de ew naqşê, cihê ku gotin, bi şenberê ku bi tîrkerê dibû û dighiştê heyberîyekê. Her wusa divê ku mirov wê rastîya wê ya biwê afirandinê re werêne ser ziman. Gotin, di vê çerçoveyê de dighiştina dagerekê. Rengê gotinan bi wêneyî dibû. Her wusa, di vê çerçoveyê de fahmkirina gotinan, di çerçoveya zanîna ziman de wele têtîneka pêşketî a dema aqil xwe dide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov wê yekê jî, bi wê re werêne ser ziman kî şenberkirina gotinê, weke aliyekî giring ê wê bi wan naqşayan re dihê ser ziman. Her wusa, çawa gotin, dihat bi wênekirin, mirov bi wê rewşê re wê yekê pirr baş û xweşik dibînê. Her wusa, çêkirina naqşaya şahmaran, ku ji destê dayikên kurd derdiket, divê ku mirov weke mînaqeka têtîniştî li vir bi zanîna ziman re werêne ser ziman.

Em bi dîrokê û têtîna gotinê ya bi hevdu re hizirkirina xwe dewam bikin. Ji ber ku hewceyî bi vê rengê bi fahmkirinê heya. Em li ser gotinan dihizirin, em dema ku gotinê dahûr dikin, em hinekî ji aliyê têtînê ve bi kirde û wateya wê re hewl didink ku «aqilê wê» fahm bikin. Ev, aliyê tenê ku mirov bi têtînê fahm dike, tenê aliyekî fahm bikirinê ya. Her wusa, her gotinê serdema

